# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR- 2 HAVÎN Û ÇPAYÎZ 2021



- DÎROKA TEVGERA SIYASÎ YA KURDÎ LI SÛRIYA
- ÊLÊN DÊRAZORÊ
- KOÇBERÎ
- EWLEKARÎYA NIŞTIMANÎ
- BÎRDOZIYA ŞER LI CEM KURDAN
- BANDORA ZIWABÛNÊ LI SER REWŞA JOSIYASÎ YA ROJAVA

KOVAREK DEMSALÎ JI NAENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATÊJÎK VE TÊ DERXISTIN - HEJMAR -2 HAVÎN Û PAYÎZ 2021

Sernivîser: **Ednan Mistefa**

Edîtorê nivîserê: **Taha Xelîl**

Desteya nivîser:

**Hejar Şakir - Rakan Şêxî**

Sêwiran: **Azad Mihemed - Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastiye**

**Hejmara (2 - 3 ) Havîn - Payîz- 2021**

## NAVEROK

**Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê ........................... 6**

**ÊLÊN DÊREZORÊ................................................................................. 39**

**Koçberî ................................................................................................. 62**

**Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê.......104**

**Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan ..............................................................130**

**Bandora ziwabûnê li ser rewşa josiyasî ya Rojava.................................140**

## Gotina hejmarê

Em jimarên (2-3) yên kovara "**Lêkolînên Stratejîk**" ya pêşkêşî xwendvanê xwe dikin. Jixwe sedema ku her du jimar ên werza Havîn û Payîz dê bi hev re werin weşandin ew e ku rewşa karê navendê ye; bi taybet rewşa dosyayên lêkolînê yên ku her endamek pê mojûl bûye.

Ji ber wê jî, tevî berdewamiya mijarên me yên ku di jimara borî de hatibûn weşandin, hin mijarin din dê di vê mijarê de cih bigirin.

Jixwe weke berdewamkirina lêkolîna "**Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya**", rewşa tevgeran ji despêka şoreşa Sûriya di 2011 de ku hevgirtiyên û partiyên siyasî yên sereke li Rojava dide nasîn.

Weke berdewamkirin û bidawîkirina lêkolîna bi navê "**Êlên Dêrazorê**" ev beş li ser rewşa êlên Dêrazorê ji aliyê ewlehî û şer e, ew jî berî û piştî Daişê û rizgarkirina herêmê, her wiha encamên dawî yên vê lêkolînê.

Êdî ji bo berdwamkirin û bidawîkirina lêkolîn a"**Koçberî**", beşa dawî piratîkî digire dest, ew jî weke rapirsînên ku di nav gekl de li herêmê cûda hatin çêkirin, her wiha encamên vê lêkolînê di dawiyê de radixe ber çav.

Di lêkolîna "**Ewlekarîya Niştimanî"** de, bi rehendên sereke yên ewlekariyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dawî dibe.

Jixwe weke beşa yekem a lêkolîna bi navê "**Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan"**, wateya bîrdoziya şer û taybetmendiyên wê diyar dike.

Lêkolîna "**Bandora ziwabûnê li ser rewşa josiyasî ya Rojava**" weke mijareke nû, diyardeya ziwabûnê li Rojava gitiye dest, ew jî bi xalên wateya, karîger, sedem û çaerseriya ziwabûnê vê diyardeyê zelal dike.

**Sernivîser**

# Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê

**(B 3)**

## Tevgera Siyasî ya Kurdî di navbera 20011-2014'an de

Şoreşa Sûrî ya ku di 15'ê adara 2011'an de û Şoreşa Rojava ya ku di 19'ê tîrmeha 2012'an de li dar ketin, guhertineke bingehîn di tevgera siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistanê de, çêkir.

**Di sala 2011'an, qada siyasî ya kurdî sê kom û hêzên siyasî dihewand:**

### 1- Encûmana Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê “ENKS”:

Meclisa Siyasî ya Kurdî û Meclisa Giştî ya Hevbendiyê li beramberî mercên siyasî yên nû ku Şoreşa Sûrî bi xwe re anî, jev ketin; ji wan her du mecilsan Encûmana Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê çêbû ku di 26/10/2011'an de, ku bi piştgiriya birêz Mesûd Berzanî serokê Herêma başurê Kurdistanê hate damezrandin. Ev encûmen piştî damezrandina Meclisa Niştîmanî ya Sûrî hate damezrandin, ango armanc ji damezrandina wê ku rastiya siyasî ya kurdî li forûmên muxalefetê yên Sûrî û navneteweyî binimînie. Her wiha hin partî ji encûmana siyasî hewl dan tugayên leşkerî damezrînin, lê piştre piraniya wan jev ketin. Bi sedema nelihevkirina jêdera siyasî ya kurdî, nakokî di navbera partiyên Encûmana Niştîmanî de çêbûn, ev yek jî hişt ku biryar bi dûrxistina hin partiyan derkevin.

### 2- Hevrêziyên Ciwanan:

Sedemên herî berz ji derketina hevrêziyan li rojavayê Kurdistanê piştî lidarketina Şoreşa Sûrî ev bûn: “Lawazbûna helwesta partiyên siyasî yên kurdî û terduda wan ku beşdarî Şoreşa Sûrî dijî Beşar Essad bibin, piştguhkirina partiyên siyasî ji pêkhateya ciwan re û nerazîbûna ciwanan ji rastiya partiyên siyasî yên heyî re”. Partiyên ENKS'ê hevrêziyên ciwanan bi kar nîn û derbasî desteyên wê yên rêvebiriyê bûn. Di encamê vê yekê de nerîna siyasî ya van hevrêziyan ne zealla bû. Her wiha ji ber berdewambûna destwerdanên partîtî, nexwendina durist ji rastiya siyasî û pêşketinên wê di pêşerojê re û berdewambûna hebûna wê ya dirûvî di meclisên muxalefeta Sûrî de, gelek endam xwe jê vekişandin û di dawiya 2013'yan de hebûna wê li ser zemînê nema.

Yekîtiya Hevrêziyên Ciwanên Kurd hewl da ku endamên xwe kom bike û kongreyeke rêxistinî di destpêka sala 2013'an ve li dar bixe. Her wiha amadekarî dihatin kirin bo ku xwe weke tevgerek an jî partiyeke siyasî ya ciwanên kurd di qada siyasî de, ragihîne. Lê ew hewldan bi bin ketin ji ber nakokiyên partîtî di hundirê yekîtiyê de. Ev yek hişt ku di gelek cihan di hundirê xwe de parçe bibe û pareçebûna dawî jî bi sedema nakokiyên li ser beşdarbûna wê di kongreya Encûmana Niştîmanî ya Kurdî de bû ya ku di heman salê de hate lidarxistin.

**3- Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM:**

Di nîviya sala 2011'an de hate damezrandin, armanc jê rêvebirina Şoreşa Rojava û rêxistinkirina civakê di riya partî û saziyan re. Heyanî dawiya sala 2014'an şeş partiyên siyasî tevlî bûn, berztirîn wan partiya PYD bû, her wiha li kêleka partiyên siyasî nûner ji rêxistina jinê “Yekîtiya Star” û rêxistina ciwanan û saziyên civaka sîvîl jî, tevlî bûn.

**Partiyên Tevgera Siyasî Ya Kurdî di navbera salên 2011-2014'an de**

**- Partiya Azadî:**

Ev partî kongreya xwe di 2011'an de li dar xist. Mistefa Oso wek sekreterekî nû ji partiyê re û Xêredîn Mûrad wek endamek di komîteya navendî de hatin pejirandin. Lê ev partî di hundirê xwe de dabeşî du partiyan bû (ya yekem wek kombûna endamên berê di Partiya Çep de bi serokatiya Mistefa Oso û ya duyem jî wek kombûna endamên berê di Yekîtiya Gelerîtî bi serokatiya Mistefa Cuma). Ev yek jî pêk hat piştî belavkirina pereyên ku Berzanî şandin li ser partiyên Encûmana Niştîmanî ya Kurdî. Serokên her du partiyan derketin derve û li wir bi cih bûn, her wiha her du baskên Azadî tevlî projeya Yekîtiya Siyasî ya Demokratîk a Kurdî di destpêka 2013'an de bûn, ya ku veguherî bo Partiya Demokratîkî a Kurdistanî – Sûriya di 2014'an de. Xêredîn Mûrad dev ji xebatên siyasî berda. Lê piştre vegeriya û da xuyanî ku ew amade ye bo ku pisporiya xwe bixe bin xizmeta vê partiyê, lê ew li gotinên xwe xwedî derneket.

**- Partiya Yekîtî:**

Desthilatdariya Sûrî girtiyên Yekîtî yên ku di destpêka “Şoreşa Sûrî” de hatibûn girtin berda. Di dawiya 2013'an de Yakîtî kongreya xwe ya heftemîn li dar xist û Ibrahîm Biro wek sekreterê partiyê û Hesen Salih cîgerê wî hatin hilbijartin. Yekîtî tevlî projeya Yekîtiya Siyasî ya Demokratîk a Kurdî

bû, lê di hezîrana 2013'an de vekişiya piştî El-Partî- (Ebdilhekîm Beşar) hewl da rê li pêşiya serokên Yekîtiyê veke bo ku tevlî El-Partî bibin. Wek bersiv ji vê yekê re di projeya Yekîtiya Siyasî de, Partiya Yekîtiya Kurdî bi Partiya Yekîtî ya Kurdistanî bi serokatiya Ebdilbasit Hemo re (yê ji Yekîtî veqetiyayî) hate guhertin û Fûad Elîko jî derket derveyî welat û li wir bi cih bû. Di 2014'an de hewldanên de rêxistina Kobanî ya Partiya yekîtî ya Kurdistanî xwe ji Yekîtiya Siyasî vekişand û tevlî seferbeiya ku YPG'ê dijî çeteyên DAIŞ'ê ragihandibû, bû.

**- Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî):**

Piştî koça dawî ya Ebdilrehmen Elûçî sekreterê El-Partî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê, nakokî di navbera pêşengên wê de çêbû û partî dabeşî du partiyan bû : “El-Partî ya Demokratîk a Kurdistanî -Sûriya” bi serokatiya Dr. Ebdilkerîm Siko yê ku tevlî TEV-DEM'ê bû û “El-Partî Demokratîk a Kurdî-Sûriya” bi serokatiya Lezgîn Mihemed yê ku tevlî El-Partî –baska Ebdilhekîm Beşar bû û xwedî li projeya Yekîtiya Siyasî ya Demokratîk a Kurdî derket. Ew proje di destpêka 2013'yan de hate ragihandin wek gaveke destpêkê bo yekbûna çar partiyên kurdî (El-partî, Azadî bi her du baskên xwe, Yekîtî Kurdistanî). Di 3'yê nîsana 2014'an de yekbûn di navbera her çar partiyan de hate ragihandin bi navê “Partiya Demokratîk a Kurdistanî- Sûriya” di kongreyeke yekbûyî ku 600 kes ji nûnerên her çar partiyan tê de hazir bû. Siûd Mele wek sekreterê partiyê û Mihemed Ismaîl wek cîgerê wî û berpirsyarekî îdarî hatin hilbijartin. Her wiha endamên bîroya siyasî ya partiyê ev bûn: Lezgîn Mihemed, Neşaat Zaza, Ebdilkerîm Mihemed Ebû Luqman, Mihemed Elî Ebû Nado, Mihsin Tahir, Nafei Beyro, Ferhad Şahîn, Mislim Mihemed, Kamîran Haco, Beşar Emîn, Mistefa Mamo, Ebdilhekîm Beşar, Mistefa Oso, Mistefa Cuma û Ebdilbasit Hemo. Ebdilhekîm Beşar wek berpirsyarê têkiliyên derve û Mistefa Cuma wek berpirsyarê partiyê li başurê Kurdistanê hatin hilbijartin. Rêjeya endamên bîroya siyasî de weha hate belavkirin “”El-Partî:9, Azadî/Oso:9, Azadî/Cuma:2, Yekîtî Kurdistanî:2”. Gelek hewldan ji hêla hin endamên Partiya Azadî bi her du baskên wê hatin kirin bo ku Partiya Azadî ji nû ve çalak bikin, lê ew hewldan bi bin ketin. Edhem Başo daxuyanî bi navê Partiya Azadî belav dikirin. Her wiha Partiya Yekîtî ya Kurdistanî bi yekîtiya partiyan bandor bû, rêxistina Kobanî jî jê vekişiya û tevlî seferberiya ku YPG dijî çeteyn DAIŞ'ê ragihandibû, bû.

**- Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurd û cûdabûna Tevgera Çaksazî jê:**

Piştî berzûna Tevgera Çaksaziyê di partiyê de bi serokatiya Feysel Yûsif û daxwaza wî ya eşkere bi pêkanîna hin çakzaiyan di hundirê partiyê de, Ebdilhemîd hemû endamên wê tevgerê qewitandin. Lê tevgerê xwe di çarçoveya partiyeke nû de birêxistin kir bi navê “Tevgera Çaksazî-Sûriya” bi serokatiya Feysel Yûsif di kongreya ku di gulana 2012'an de hate lidarxistin. Nakokî di navbera endamên wê de derketin piştî ku sê endam ji desteya rêveber a tevgerê ji wan “Emced Osman” di 1'ê tebaxa 2014an de nameyek ji Feysel Yûsif re şand û tê de bal kişand ser binpêkirina wî ji prensîpên tevgerê re. Di cih de, Feysel Yûsif kongreya duyemîn di 22'ê tebaxa 2014'an de li dar xist û tê de navê tevgerê veguherand bo “Tevgera Çaksazî ya Kurdî-Sûriya” û ew her sê endam jê qewitandin. Lê ev her sê endam û alîgirên wan ev yek red kir û tekez kir li ser berdewambûna xebatên siyasî di bin navê “Tevgera Çaksazî-Sûriya”. Encûma Niştîmanî ya Kurdî tedexul kir bo ku nakokiyên di navbera her du baskên Tevgera Çaksazî çareser bike. Di encamê de biryar bi qebûlkirina endamtiya her du aliyan di encûmanê de hate dayîn. Lê ji ber krîza rêxistinî ya ku rastî encûmanê hat di encama hilbijartinên jêdera siyasî ya kurdî, çespandina endamtiya baska tevgera Çaksazî-Sûriya hate rawestandin.

Lê Partiya Pêşverû, ji ber bicihbûna sekreterê wê Ebdilhemîd Derwîş li derveyî welat, û hilbijartina birayê wî Selah Derwîş wek nûnerê Pêşverû di Koalisyona Niştîmanî ya Sûrî de, rola endamê bîroya siyasî ya partiyê Ehmed Silêman wek rêveberekî serkeftî ku partî di hundir de bi rê ve bir, berz bû.

**- Partiya Yekîtî ya Demokratîk a Kurdî (Yekîtî):**

Serokê partiyê Ismaîl Omar di 2010'an de koça xwe ya dawî kir. Piştre nakokiyên diyar di navbera her du baskên partiyê “Mihyedîn Şêx Alî – Zerdeşt Mihemed” li ser helwesta wan ji “Şoreşa Sûrî”, muxalefeta Sûrî û Tevgera Civaka Demokratîk, derketin. Partî kongreya xwe di nîsana 2013'an de li dar xist û tê de Mihyedîn Şêx Alî wek sekreterê partiyê û Mistefa Meşayix wek cîgerê wî hatin hilbijartin. Zerdeşt Mihemed jî xwe ji bo sekreteriya partiyê namzet kir lê ew bi bin ket. Her wiha ji ber ku nas kir cihê xwe di hundirê partiyê de kêm bû piştî binketina wî di hilbijartinê de, çû

Istenbol û bû şêwermendê hikûmeta Ehmed Toma “koalisyona Niştîmanî ya Sûrî”.

Zerdeşt bi Kamîran Hac Ebdo re berpirsyarê rêxistina Ewropa ya partiyê hevbend bû bo ku Şêx Alî ji sekreteriyê rake. Hac Ebdo sûdeke madî ji hebûna xwe di meclisên muxalefeta Sûrî de girt û û karîbû destwerdan di rêxistinên partiyê di hunirê welat de nemaze li Cizîrê, bike. Hac Ebdo siyaseta çêkirina tevlihevî û alozî di hundirê partiyê de bo birêvebirina wê, meşand. Lewre jî bi endamên rêxistina Ewropa re vekişandina xwe ji partiyê ragihand. Her wiha alîgirên wî di hemû rêxistinên partiyê li Cizîrê û derve xwe vekişandin û dev ji xebatên xwe yên partiyê berdan. Di destpêka 2015'an de, Kamîran Hac Ebdo dîsa alîgirên xwe kom kirin (yên ku dev ji xebatên partiyê berdan) û civînek bi wan re li Girkê Legê li dar xist û tê de ragihand ku ew aliyê rewa ya Partiya Yekîtiyê ye. Şêx Alî rêvebirina partiya xwe li Kantona Cizîrê bi hevbendî bi Mistefa Meşayîx re dewam kir, bêyî ku bi kiryarên ku Hac Ebdo pêk anîbûn, bandor bibe.

**- Partiya Rêkeftin (Wîfaq)**

Baska Fewzî Şengalî xebatên xwe di bin navê “Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdî ya Sûrî” dewam kirin û endamê bîroya siyasî ya partiyê Telal Mihemed û hevalên xwe ji partiyê cuda bûn û kongreya xwe di 22'ê adara 2013'an de li dar xist. Tê de navê partiyê guherandin bo “Partiya Aştî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê”. Piştre jî partî tevlî Tevgera Civaka Demokratîk û pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû. Li aliyê din, Hecî Efrînî baska xwe di Partiya Rêkeftin de jev xist û wek rojnamevan li Başurê Kurditanê li cem “ragihandina navendî ya Yakîtiya Niştîmanî Kurdistan” kar kir. Girêdayî baska Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdistanî, Cegerxwîn Elî Şêxo kongreyek di 30'î berfenbara 2014'an de li navçeya Raco li Kantona Efrînê li dar xist û tê de jevxistina Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdistanî hate ragihandin û Partiya Rêbaz a Demokratîk a Kurdistanî –Sûriya hate damezrandin, tê de rêbaza Berzanîzm ji xwe re kir bingeh.

**- Şepêla Pêşerojê ya Kurdî:**

Piştî kuştina Mişal Temo di 8'ê rezbera 2011'an de ji hêla dezgehên ewlehiya Sûrî ve, nakokî û pevçûnên hundirîn li ser serokatiya şepêlê

derketin. Di 11'ê berfanbara 2014'an de, bîroya têkiliyên civîna xwe ya asayî li dar xist û tê de Narîn Metînî wek serokê bîroya têkiliyan, Ebdilrehîm Temeh wek cîgerê wê û Ebdilhemîd Temo berpirsyarê têkiliyên derve, hatin hilbijartin. Piştî vê yekê, serokê berê yê bîroya têkiliyên giştî Rêzan Şêxmûs yê ku li derve rûniştî ye, bi Siyamend Haco re berpirsyarê rêxistina Ewropa ya şepêlê hevbend bû û bi hev re kongreyek ji kombûna xwe re li Istenbolê li dar xist. Di kongreyê de Siyamend Haco wek serokê şepêlê hate hilbijratin. Piştî vê jî devavêtin di navbera her du aliyan de çêdibin û her aliyek aliyê din cuda dike, bi vê yekê şepêla pêşerojê dibe du partiyên jev cuda.

**- Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD):**

Partî ku PYD kongreya xwe ya pêncemîn a awarte li Qamişlo di 16/6/2012 de li dar xist, sîstema hevserokatî tê danîn. Salih Mislim û Asya Ebdelah wek hevserokên partiyê têne hilbijartin. Partî di dawiya 2013'an de projeya rêvberiya demkî pêşniyar kir û hejmareke mezin ji partî, rêxistin û komeleyan ji hemû pêkhateyên Rojava tevlî dibin. Piştî wê Rêveberiya Xweser a Demokratîk di 21'ê çileya 2014'an de tê ragihandin.

**- Partiya Çep a Kurdî:**

Di destpêka 2012'an de, nakokî di navbera sekreterê partiyê Mihemed Mûsa û Salih Gedo de derketin û di encamê de jev cuda bûn û partî dabeşî du partiyan bûn: “Partiya Çap a Kurdî/ serkreterê wê Mihemed Mûsa Mihemd” û “Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî/ sekreterê wê Salih Gedo”. Partiya duyem hewldaneke cudabûnê ji hêla Şelal Gedo ve nûnerê partiyê li başurê Kurdistanê pêk hat bi piştgiriya hin endamên partiyê di hundir de. Piştre civînek li Serê Kaniyê di 28'ê adara 2014'an de bi navê “Kongreya Awarte a Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî” li dar xist û tekez kir li ser alîgiriya wan ji Encûmana Niştîmanî ya Kurdî re. Her du aliyên partiya Çep di sibata 2014'an de ji Encûmanê Niştîmanî ya Kurdî vekişiyan piştî ku tevlî projeya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bûn ya ku di rêbendana 2014'an de hate ragihandin.

**Partiyên Siyasî Yên Kurdî Li Rojava:**

**1- Partiyên Kurdî di Rêveberiya Xweser a Demokratîk de:**

**- Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM):**

1- Partiya Yekîtîya Demokratîk.

2- El-Partî ya Demokratîk a Kurdistanî- Sûriya/ Ebdilkerîm Seko.

3- Yekîtiya Libral a Kurdistanî/ Ferhad Têlo.

4- Partiya Aşîtî ya Demokratîk a Kurdî/ Telal Mihemed.

5- Partiya Komînîst a Kurdistanî/ Necmedîn Mele Omar.

6- Partiya Hevgirtin a Niştîmanî Kurdistanî.

**1- Partiyên alîgir ji Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) re:**

1- Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê / Mihemed Mûsa Mihmed.

2- Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî li Sûriyê/ Salih Gedo.

3- Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûrî/ Cemal Şêx Baqî.

4- Partiya Guhertina Demokratîk a Kurdistanî/ Kamîran Hesen- Mizgîn Zêdan.

5- Partiya Kesek a Kurdistanî/ Luqman Ehmê.

6- Partiya Yekîtiya Niştîmanî ya Azad/ Tewfîq Hemdoş- Slêman Slêman.

7- Tevgera Nûjen a Kurdistanî/ Rêzgar Qasim.

**2- Partiyên Encûmana Niştîmanî ya Kurdî :**

1- Partiya Demokratîk a Kurdistanî- Sûriya / Siûd Mele.

2- Partiya Yekîtî Kurdî li Sûriyê/ Ibrahîm Biro.

3- Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê / Ebdilhemîd Derwîş.

4- Partiya Niştîmanî ya Demokratîk a Kurdî/ Tahir Sefûk.

5- Partiya Wekheviya Demokratîk a Kurdî/ Neimet Dawûd.

6- Partiya Çaksazî ya Kurdî-Sûriya / Feysel Yûsif.

**3- Partiyên ku di Encûmana Niştîmanî ya Kurdî de hatine cezakirin (biryara derxstina wan ji encûmanê hate dayîn, lê ew li ser endamtiya xwe di encûmanê de îsrar dikin):**

1- Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê/ Mihyedîn Şêx Alî.

2- Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî)/ Nesredîn Berhek.

3- Partiya Rêkeftin (Wîfaq) a Demokratîk a Kurdî a Sûrî / Fewzî Şengalî.

**Partiyên siyasî yên rêdayî li Rojavayê Kurdistanê [(1)]:**

Meclisên zagonsaz li her sê kantonên Rojava di nîsana 2014'an de zagona partiyên siyasî bo rêxistina jiyana siyasî û xebatên partiyan, derxist.

Zagona partiyên siyasî gelek merc danîn ku divê di her partiyekî siyasî de dixwaze rêdanê bistîne, hebin:

**-** Divê bi prensîp, armanc, program, siyaset û şêwaza xebatên partiyê bi prensîpên Hevpeymana Civakî re, bi pêdiviyên parastina ewlehiya niştîmanî ya hemwelatiyên kantonan re û bi parastina yekîtiya neteweyî, aştiya civakî û sîstema Demokratîk re, ne dijber bin.

**-** Divê her partiyek ji partiyên din bi nav, siyaset û şêwaza pêkanîna programa xwe, cuda be.

**-** Divê di programa partiyê de damezrandinên leşkerî û yên nêzîkî leşkerî tune bin û divê dijî tundî bi hemû awayên wê, radîkalî, nijadperestî û hemû dirûvên din ên cudakariyê, bin.

Zagon şert û merc danî ku divê her endamek di partî de ji hemwelatiyên Sûriya û her sê kantonan be û divê ne endamê desteyên dadwerî, hêzên leşkerî û hêzên ewlehiya hundirîn, be.

**Bidestxistina rêdana partiyên siyasî:**

Di madeya /7/ ji zagona partiyan ev yek hate biryarkirin:

Divê daxwaznameyekê der barê damezrandina partiyekê ji serokê Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî ya ku di madeya pey re (madeya /8/) hatiye destnîşankirin bê şandin, tevî wajoya sed endamên damezrînerên wê partiyê. Divê wajoyên wan bi awayekî fermî morkirî be. Her wiha divê endamên wê herî kêm ji pênc bajar an jî bajarokên Sûrî û her sê kantonan bin. Hemû belgeyên girêdayî partiyê nemaze rêziknameya wê, navên endamên damezrîner, daxuyaniyek bi darayên partiyê, jêdera dadaryên wê, bankên ku darayên xwe tê de ne û navê cîgerê partiyê di prosedîrên damezrandinê de. Ew agahî bi daxwaznameyê re tên şandin.

[1]- Dilşad Murad, “Partiyên Rêdayî Li Rojava”, ew raporeke di Rojnameya Ronahî de hatiye weşandin hejmara 146, dîrok 8'ê rezbera 2014'anû agahiyên wê di vê lêkolînê de hatin nûjenkirin.

Daxwaznameya damezrandina partiyê ji komîteya ku me qalê kir re tê pêşkêşkirin di dema pazdeh rojan ji dîroka şandina dawxwaznameyê.

**Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî:**

Her wekî di zagona partiyan de hatiye destnîşankirin, Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî ev endamtî di nav xwe de dihewîne:

1- Hevserokatiya Meclisa Zagonsazî ya kantonê wek serok.

2- Serokê Desteya Dadwerî.

3- Serokê Desteya Hundirîn.

4- Serokê Desteya Karûbarên Civakî û kar.

5- Yek ji endamên Dîwana Dadê.

Di vê zagonê de, Partiya rêdayî xwedî kesayeteke zagonî ye û dest bi xebatên xwe yên siyasî dike ji roja din ji belavkirina Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî ji biryara erêkirna damezrandina wê di rojnameya fermî û postkartên Meclisa Zagonsaz de.

**Rêxistin û yekîtiyên xwedan armanc û rêbazên siyasî:**

Mijara dayîna rêdanan ji rêxistin, yekîtî û kombûnên ku program û armancên wan ên siyasî hene, gelek guftûgo di hundirê Rêveberiya Xweser de derxistin, nemaze piştî ku Yekîtiya Star daxwaznameyek ji aliyên peywendîdar di Rêveberiya Xweser de bo bidestxistina rêdanekê ji rêxistina xwe re, .

Ev pirsgirêk di hundirê Meclisa Zagonsaz li Kantona Cizîrê de hate nîqaşkirin, lê negihaştin tu encamî. Nelihevkirina wan li ser Yekîtiya Star û Tevgera Ciwanên Şoreşger bû heke ew rêxistinên siyasî ne an na, ango heke zagona partiyên siyasî ji hêla dayîna rêdana fermî li ser tê meşandin an jî na. Lewre jî civînek bo vê yekê hate lidarxistin di navbera Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî û endamên Komîteya Zagonî di Meclisa Zagonsaz de bo ku bighêjin çareseriyekê. Li gorê vê yekê Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê giştînameyek di 3'ê rezbera 2014'an de derxist û tê de ev yek hate destnişankirin:[2]

[2] Belgeya resen di dawiya vê lêkolînê de di beşê belgeyan de hatiye weşandin.

1- Hemû rêxistin, yekîtî û kombûnên ku ji bo armanc û erkên siyasî hatine damezrandin li gorî bicihkirina zagona partiyan a ku bi zagona hejmar /5/ dîrok 15/4/2014, di rûniştina hejmar /7/ derket, ji wan tê xwestin ku rêdanê li gorî zagona ku li jor hatiye diyarkirin, bi dest bixin.

2- Ev giştîname li ser lîsteya cîbicîker ya zagona paritya tê zêdekirin di bin benda /2/ ji madeya duyemîn de.

**Lîsteyek bi navê partiyên siyasî yên rêdayî û nasnameya wan li Rojava:**

Piştî derketina zagona partiyên siyasî, partiyên siyasî yên çalak nemaze yên ku di bin sîwana Rêveberiya Xweser a Demokratîk de dixebitin gavên pêwîst bo bidestxistina rêdanan, pêk anîn.

**Hejmara partiyên ku rêdana fermî hayanî meha adara 2015'an de bi dest xistine /13/ partî bûn, ew partî jî ev bûn:**

**1- Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD):**

Ev partî di 20'ê rezbera 2003'yan de hate damezrandin, ew rêbaz û felsefeya birêz Ebdelah Ocalan ji xwe re esas digire û wî wek serok ji xwe û gelê kurd re dibîne. Ew hewl dide Rêveberiya Xweser di çarçoveya Sûriyeke demokratîk û azad de ava bike. Her wiha dibîne ku ew çareya îdeal e bo çareserkirina pirsgirêka kurdî û pirsgirêkên gelên din. Piştî damezrandina PYD'ê, Zerdeşt Haco bo serokatiyê hate hilbijartin heta kongreya duyemîn di 2005'an de ku tê de Fûad Omer bû serokê wê ji 2005-2010'an. Di kongreya pêncemîn a awarte de ku li Qamişlo di 16' ê hezîrana 2012' an de hate lidarxistin, sîstema hevserokatî hate pejirandin û Salih Mislim û Asya Ebdelah wek hevserok hatin hilbijartin. Partî pêvajoya Rêveberiya Xweser di dawiya sala 2013' an de pêşniyarî hemû rêxistinên li Rojava kir û hejmarek mezin ji partî, rêxistin, komeleyên sivîl û kesayetên serbixwe ber bi xwe ve anîn û di 21' ê rêbendana 2014' an de Rêveberiya Xweser ragihand. PYD di 17' ê hezîrana 2014' an de bi awayekî fermê ji hêla Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**2- Yekîtiya Lîberal a Kurdistanî:**

Di 29'ê berfenbara 2011'an de hate damezrandin û beşdarî xwepêşandanên gelerî bû û (her wekî hemû aliyan) banga guhertinê di pergala rêjîm û desthilatdariya li Sûriyê kir û karîbû hin serkêşên kurd ber bi

xwe ve bîne. Ev yekîtî li Qamişlo bi cih dibe û rêbaza hizira lîberal ji xwe re esas digire. Her wiha banga pêkanîna sîstema federal li Sûriyê, wekhevî û pejirandina pêkhateyên welêt ji hev re, dike. Di 19'ê nîsana 2013'an de kongreya xwe ya yekemîn li bajarê Qamişlo bi amadebûna “109” endaman li dar xist û li ser rêzikname û programa partî ya siyasî li hev kirin. Her wiha meclisa sekreteriyê hate hilbijartin û Dr.Ferhad Têlo wek sekreterê giştî yê yekîtiyê hate hilbijartin. Di 24'ê gulana 2014'an de piştî nakokiyên di navbera endamên yekîtiyê de kongreyek awarte hate lidarxistin û tê de desteyeke siyasî ya nû hate avakirin û Dr. Ferhad Têlo wek sekreterê giştî bo gereke nû hate hilbijartin. Di 14'ê rezbera 2014'an de, Ykîtiya Lîberal a Demokratîk bi Partiya Yekîtiya Demokratîk re gihaşte lihevkirinê li ser hevpariyeke rasteqîn di Meclisa Gel a Rojavayê Kurdistanê de. Her wiha tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û ew yek ji damezrînerên wê bû. Yekîtî di 17'ê hezîrana 2014'an de ji hêla Komîteya Karûbarên Partiyên Siyasî ve hate rêdankirin.

### 3- Partiya Aşîtiya Demokratîk a Kurdî:

Ev partî berdewambûn ji Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî re bû (yek ji her du baskên Rêxistina Tevgera Rêkeftin a ku di 2004'an de hate damezrandin)û di kongreya ku li bajarê Qamişlo di 22'ê adara 2013'an de û bi amadebûna /83/ endamên nûner ji hemû bajarên Rojava hate lidarxistin, navê xwe guhert bo Partiya Aşîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê û tê de rêzikname û bernameya xwe ya siyasî danîn û Telal Mihemed wek sekreterê partiyê hate hilbijartin. Ev partî rêbaza çanda demokratîk ji xwe re esas digire û di daxuyaniya xwe ya damezrînerî de daxwaza pêkanîna xweserî li herêmên kurdî li Sûriyê dikir. Partiya Rêkeftin beşek ji Encûmana Niştîmanî ya Kurdî bû û piştî guhertina navê wê li derveyî encûmanê ma. Piştî wê nêzîkî PYD'ê bû û pê re beşdarî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk de bû û yek ji damezrînerên wê bû. Her wiha tevlî Meclisa Gel a rojavayê Kurdistanê bû. Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdî bi awayekî fermî di 17'ê hezîrana 2014'an de ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

### 4- Partiya Yekîtiya Suryanî:

Ew partiyeke siyasî suryanî ye, di 1'ê cotmehs 2005'an de hate damezrandin. Ew nûnertiya gelê suryanî li Sûriyê dike. Kongreya wê ya

yekemîn di 20'ê berfenbara 2014'an de li Dêrîkê hate lidarxistin û Eyşoa Gewriya wek serokê partiyê hate hilbijartin. Ev partî daxwaza misogerkirina mafên neteweyî yên rewa ji gelê suryanî re dike û dibîne ku federalî û nenavendî sîstema herî îdeal e bo ku li Sûriyê bê pêkanîn. Ew beşdarî pêvajoya Rêveberiya Xweser bû û yek ji damezrîerên wê bû. Ev partî di 7'ê tîrmeha 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**5- Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê:**

Ew berdewambûna baska Çep di tevgera kurdî li rojavayê Kurdistanê de ye, ya ku di 1965'an de dest pê kir û ji 1996'an ve heya niha Mihemed Mûsa Mihemed serokê wê ye. Ev partî beşek ji Encûmana Niştîmanî ya Kurdî bû, lê ew jê vekişiya piştî ku tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û ji rêxistinên damezrîner jê re bû. Ev partî di 7'ê tîrmeha 2014'an de ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**6- Partiya Demokratîk a Kurdistanî- Sûriya:**

Ev partî berdewambûn ji şepêla Berzanî re (Mele Mistefa Berzanî) di tevgera siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistanê ye. Serokê wê Dr. Ebdilkerîm Siko ye. Ew tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û yek ji damezrînerên wê bû. Partî Hevpeymana Hevkariyê bi Meclisa Gel a rojavayê Kurdistanê re mor kir û piştre bi awayekî fermî tevlî bû. Partiya Demokratîk a Kurdistanî di 23'ê hezîrana 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**7- Partiya Komînîst a Kurdistanî:**

Ev partî di nîviyê tebaxa 1981'an de hate damezrandin, kongreya xwe ya damezrîner a yekemîn di tîrmeha 1983'yan de li dar xist û ya duyemîn jî di 1995'an de li dar xist. Xebatên partiyê demekê hate rawastandin û careke din di 2012-2013'an de dewam kir holê. Ev partî rêbaza markisî-Lînînî ji xwe re esas digire û banga rizgarkirina Kurdistanê. Necmedîn Mele Omar serokê partiyê ye û Partî tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û ew ji rêxistinên damezrîner jê re bû. Partî Hevpeymana Hevkariyê bi Meclisa Gel a rojavayê Kurdistanê re mor kir û piştre bi awayekî fermî tevlî bû. Partiya Demokratîk a Kurdistanî di 23'ê hezîrana 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê ve hate rêdankirin.

**8- Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî:**

Ev partî di dema nakokiyên di navbera serokên Partiya Çep a Kurdî di kongreya xwe ya dawî de ya ku di bihara 2012'an de hate lidarxistin derkete holê, serokê wê Salih Gedo ye. Ev partî beşek ji Encûmana Niştîmanî ya Kurdî bû, lê ew jê vekişiya piştî ku tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û yek ji damezrînerên wê bû. Di 30'î hezîrana 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**9- Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûrî:**

Di 12'ê mijdara 1978'an de hate damezrandin, serokê wê Cemal Mihemed Baqî Mele Mehmûd (Cemal Şêx Baqî). Ew ji partiyên kurdî yên neteweyî ye û siyaseteke nerm di nerîn û rêbazê xwe de dimeşîne. Ew tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û yek ji damezrînerên wê bû. Di 30'î hezîrana 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**10- Partiya Yekîtiya Niştîmanî a Azad li Sûriyê:**

Ev partî di 1999'an de li Almanya bi navê “Partiya Demokratîk a Kurdistanî-Sûriya” hate damezrandin û Dr.Tewfîq Hemdoş wek serokê partiyê hate hilbijrtin. Kongreya xwe ya yekemîn di tîrmeha 2006'an de li dar xist û federalî ji bedêla xweserî pejirand. Di dema Şoreşa Rojava de, partî karîbû pargala xwe di hundir de çêke û Silêman Silêman wek sekreterê partiyê hate hilbijarin. Partî tevlî Rêveberiya Xwesera Demokratîk bû û di 30'î hezîrana 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê ve hate rêdankirin. Lê ji ber gelek partiyên din hene bi heman navê ne, serokatiya partiyê biryara lidarxistina konferansekê awarte da, konferans di 12'ê berfenbara 2014'an de hate lidarxistin û tê de navê partiyê hate guhertin ji Partiya Demokratîk a Kurdistanî-Sûriya bo “Partiya Yekîtiya Niştîmanî a Azad li Sûriyê”.

**11- Partiya Kombûna Niştîmanî Kurdistanî:**

Navê partiyê beriya ku daxwaznameya rêdanê bide ev bû “Partiya Hevgirtina Niştîmanî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê”bû, serokê wê Mihemed Ebas e (sekreterê giştî yê partiyê). Ev partî tevlî pêvajoya Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û yek ji damezrînerên wê bû. Di 25'ê tebaxa 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê ve hate rêdankirin.

**12- Partiya Guhertina Demokratîk a Kurdistanî:**

Ev partî li Qamişlo di 2014'an de hate damezrandin, hevserokên wê Dr.Kamîran Hesen û Mizgîn Zêdan in (hevserokên partiyê). Ew tevlî Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û di 1'ê rezbera 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê ve hate rêdankirin.

**13- Tevgera Nûjen a Kurdistanî- Sûriya**:

Serokê wê Dr. Rêzgar Qasim e, yê ku Tevgera Guhertina Demokratîk a Kurdistanî di dawiya 2005'an de damezrand û xebatên xwe yên siyasî li Ewropa û başurê Kurdistanê meşandin. Di rêbendana 2015'an de Qasim serdana Rojava kir û kongreyek bo tevgera xwe di 20'ê çileya 2015'an de li dar xist, tê de navê tevgerê guhert bo “Tevgera Nûjen a Kurdistanî”. Tevger tevlî Rêveberiya Xweser a Demokratîk bû û di 22'ê sibata 2014'an de bi awayekî fermî ji hêla Komteya Karûbarên Partiyên Siyasî li Kantona Cizîrê hate rêdankirin.

**Hin agahiyên giştî der barê partiyên siyasî yên kurdî li Rojava (kurtenivîsek li ser dîrok, armanc, rêbaz û rêziknameyên wan) :**

Ev agahiyên der barê partiyan de ji hevdîtinên ku bi kesayetên partîtî hatine pêkanîn û agahiyên ku li malperên fermî yên van partiyan û malperên din li ser enternête, hatine wergirtin.

Hêjayî gotinê ye ku gelek partiyên siyasî li Rojava tu agahiyên zelal der barê rêbaz, rêzikname û îdyolojiya wan de nehatin bidestxistin, dîsa jî li ser enternêtê ev agahî nayên peydakirin û tevî ku em bi gelek kesayetên partîtî li Qamişlo têkil bûne lê me nekarîbû bighêjin bîroyên siyasî yên van partiyan ji ber cihên dayîm û diyar ên van partiyan re tune in. Her wiha hin partiyên din jî me nekarîbû hevdîtin bi wan re pêk bînin ji ber yan li derveyî welat in yan jî rêziknameya wan di qonaxa venêrîn û pêşxistinê de ye.

- **Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûrî, kurtenavê wê “P.D.K.S”:**

Di 12'ê mijdara 1978'an de Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûriyê hate damezrandin, serokê wê rehmetî Mihemed Şêx Baqî bû. Di 5'ê gulana 2008'an de, piştî koça dawî ya damezrînerê vê partiyê (yê ku bi Şêx Baqî dihat naskirin) – mirina wî bi sedema krîza dil bû li malê xwe li bajarokê Şebaa li gundewarên Şamê jiyana xwe ji dest da û li Goristana Şêx Xalid

Neqeşbendî li Taxa El-Ekrad li Şamê (Rûknedîn) hate binaxkirin-, kurê wî Cemal Şêx Baq bû serokê partiyê. Hêjayî gotinê ye ku partî di 2009'an de tevlî danûstandinên Meclisa Siyasî ya partiyên kurdî bû. Her wiha rojanmeya partî bi navê "Dengê Kurd" bi zimanê erebî tê weşandin.

Ev partî xwe wek partiya mak û mirasgirê rastîn a partiya ku di 14'ê hezîrana 1957'an de hate damezrandin ango partiya Apê Osman Sebrî "Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê", dibîne. Ev partî dibîne ku gelê kurd li herêmên xwe yên dîrokî dijî û ji mafên xwe yên neteweyî û niştîmanî yên rewa mehrûm maye, her wiha neteweya kurdî rastiyeke dîrokî ye û gelê kurd li Sûriyê beşek ji neteweya kurdî ye û di heman demê de beşek ji gelê Sûrî ye û pêkhateyeke bengehîn ji pêkhateyên dewleta Sûrî ya nû ye. Ew hemû welatparêzên birûmet ji gelê kurd ên ku bi rêbazên partiyê pêbend in û li gorî rêziknameya partiyê dixebitin, di nav refên xwe de qebûl dike. Her wiha hemû gelê Sûrî yên ku bi rewatî û dadweriya tekoşîna gelê kurd bawer dikin û doza Kurdî wek yek ji dozên neteweyî yên di welat de dipejirînin û bi rêbazê partiyê pêbend in û li gorî rêziknameya wê dixebitin, di nav refê xwe de dihewîne.

**Armancên partiyê:**

**Girîngtirîn armancên partiyê di warê siyasî de ev in:**

1- Partî têdikoşe bo ku gelê kurd li Sûriyê ji zordestiyê xelas bike.

2- Partî têdikoşe bo ku pêvajoya erebkirinê li herêmên kurdî rawestîne, li hemberî Projeya Kembera Erebî bisekine, rewşa herêmê vegerîne weke berê û erdên ku di riya Kembera Erebî de hatin desteserkirin li ser welatiyan bên belavkirin. Dîsa jî tezmînatkirina ziyanxwarên serjimartina awarte ya ku di dema Hikûmeta Veqetiyayî de di 1962'yan de pêk hat û bergiriyên wê yên awarte ku li herêmên kurdî pêk hatin , her wiha dîtina çaresriyekê bo kesên ku qeyda wan mektûm e.

3- Partî têdikoşe bo ku hemû planên şovînîst û keyfî û hemû tevdîrên awarte yên dijî gelê Kurd li Sûriyê rawestîne û rake.

4- Partî têdikoşe bo ku itîrafeke zagonî bi rastiya hebûna gelê kurd li Sûriyê, nasnameya wî ya neteweyî bi dest bixe û doza gelê kurd bi awayekî dadwer di hundirê Sûriya de bê çareserkirin, di riya rêzgirtin ji vîna gelê

kurd û armancên wî yên rewa re di çarçoveya dewleteke sûrî xwedan demokrasiyeke pirreng de.

5- Partî têdikoşe bo ku gelê kurd mafên xwe yên siyasî, neteweyî û demokrasya rastîn bi dest bixe û rê bo prensîpên azadî û mafên mirovan ve veke.

6- Partî têdikoşe bo ku azadiyên siyasî yên giştî wek pirrngiya siyasî, azadiya nerîn, çapemenî û weşandinê li gorî makezagon û zagonên birêxistina jiyana siyasî û demokrasiyê li welêt, bi dest bixe.

7- Partî têdikoşe bo ku gelê kurd mafên xwe yên çandî, civakî bi dest bixe û taybetmendiyên xwe yên serbixwe biparêze.

**Girîngtirîn armancên partiyê di wraê çandî de:**

1- Partî têdikoşe bo qedexekirina li ser ziman û çanda kurdî rake û bi zimanê kurdî wek zimanekî fermî li Sûriyê bê itîrafkirin.

2- Avakirina çapxan û weşanxaneyên bi zimanê kurdî.

3- Partî têdikoşe bo ku sembolên çandî, neteweyî û dîrokî yên hemû mezheb û neteweyên civaka Sûrî biparêze dûrî şovînîzm, olperestî yan jî mezhebperestî. Her wiha bang dike bo pşngavên vekolîn û vedîtina şûnwarên dîrokî bêyî ku nasname û nîşaneyên wê yên dîrokî bêne veşartin û bervajîkirin dûrî rastiya zanistî.

4- Partî têdikoşe bo ku hawîrdora guncav bo danûstandin bi şarestanî û çandin cîhanî re, misoger bike.

**Girîngtirîn armancên partiyê yên civakî:**

**1-** Partî têdikoşe bo ku cejin û helkeftên neteweyî yên kurdî vejîn bike û itîraf bi mafê kurdan di vê der barî de bê kirin û itîrafkirin bi Cejna Newrozê wek cejneke neteweyî ya gelê kurd.

2- Partî têdikoşe bo ku hemû destwerdan û erêkirinên ewlehî li ser karê welatiyan di sektorên dewletê de bisekinîne û vê yekê tenê di warên girêdayî ewlehiya neteweyî de bihêle.

3- Partî têdikoşe û li kêleka berjewendiyên gelên kedkar û pêşxistina wan a civakî disekine dûrî kedxwariyê.

**Girîngtirîn armancên wê di warê aborî de:**

**1-** Partî destek dide pirrngiya aborî ya ku pêwîst e xwe bispêre pirrengiya siyasî.

**2-** Partî hewl dide sektora giştî biparêze bo ku roleke bingehîn di pêşxistina aborî û civakî de bilize.

**3-** Partî destek dide hemû bergiriyên dijî kedxwariyê û piştgirî dide çandiniya li welêt.

- **Partiya Yekîtîya Gelerî ya Kurdî-Sûrî:**

Partî di 5'ê tebaxa 1980'î ji hêla Selah Bedredîn yê ku istîfaya xwe di 2003'yan de da hate damezrandin, piştre jî Mistefa Cuma bû sekreterê vê partiyê heyanî kongreya giştî ya partiyê di 20-21/5/2009'an de, ku tê de partî bi Partiya Çep baskê Xêredîn Murad re bû yek di çarçoveyeke partiyeke nû ku navê Azadî lê kir. Lê piştî çend mehan hin serkêş ji Partiya Yekîtîya Gelerî dijî vê yekê derketin û ji nû ve partiya xwe damezrand.

- **Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (baskê Nesredîn Ibrahîm):**

Ev partî di 1998'an de hat damezrandin û Nesredîn Berhek serokê wê bû. Piştî jevketina bloka Hevbendiya Demokratîkû di 2009'an de, ew bi Partiya Çep re hevbendiyek bi navê Komîteya Bilind a Hevbendiyê di 12'gulana 2008'an de ava kir. Her wiha beşdarî danûstandinên Meclisa Siyasî ya Partiyên Kurdî bû. Berztirîn serokên vê partiyê Nesredîn Berhek e, yê ku li Qamişlo ji dayîk bûye û dîplomaya master di fîzîkê de ji Zanîngeha Helebê wergirtiye.

Kesayeta duyemîn jî Xalid Sîno ye, ew berpirsyarê ragihandina partiyê bû. Mehane belavok bi zimanê erebî bi navê “Dengê Kurd” dihate weşandin.

- **Partiya Demokratîk a Kurdî- Sûriya:**

Ev partî di tîrmeha 2007'an de, piştî vekişîna bloka Alûçî ji yekîtiya bi El-Partî - baskê Ebdilhekîm Beşar re wek itîraz li ser piştguhkirina bloka wî di kongreya gulana 2007'an, hate damezrandin. Rojnameyek mehane bi

zimanê erebî (Dengê Kurd) dihate weşandin û pirî caran rehmetî Alûçî yê ku li Hesekê bi cih dibû, gotar li ser malperên enternêtê diweşandin, mijarên wê bi giştî der barê tevgera siyasî ya kurdî de bûn.

- **Partiya Wekhevî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê:**

Ev partî di gulana 2008'an de hate damezrandin, rehmetî Ezîz Dawûd yê bi navê “Ezîz Dawî” dihat naskirin serokê wê bû. Berê, navê wê Partiya Demokratîk a Pêşverû bû; lê di kongreya dawî de di 2008'an de Ezîz Dawî û Tahir Sefûk ji Partiya Pêşverû veqetiyan û navê wê guhert bo Partiya Wekhevî. Her wiha navê bultena xwe jî veguhert bo “Wekhevî”. Serokê vê partiyê Ezîz Dawî bû, ew ji gundewarên Amûdê ye. Ev partî ji Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdî li Sûriyê (baskê Ebdilhemîd Derwîş) veqetiya. Niha serokê wê Namet Dawûd e.

- **Partiya Niştîmanî ya Demokratîk a kurdî li Sûriyê:**

Di 2008'an de hate damezrandin. Serok wê Tahir Sefûk bû yê ku bi Ezîz Dawûd re ji Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdî li Sûriyê veqetiya û bi hev re Partiya Wekhevî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê bi serokatiya Ezîz Dawî, damezrandin. Piştre ji Partiya Wekhevî bi demeke kin veqetiya û Partiya Niştîmanî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê damezrand. Partiya navborî hevbendiyek bi El-Partî –baska Ebdilhekîm Beşar re çêkir.

- **Rêxistina Yekîtiya Niştîmanî ya Azad- Sûriyê:**

Di 17'ê nîsana 2008'an de hate damezrandin bi serokatiya Ebdilfetah Dihêr. Piştî ku damezrînerên wê ji Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdî ya Sûrî vekişiyan, Kongreya damezrîner a rêxistinê di 16-17'ê nîsana 2008'an de hate lidarxistin. Di daxuyaniya damezrînerî bang li gel kir ku tevlî rêxistinê bibin bêyî ku navên damezrînerê wê, armancên wê, bernameya wê ya siyasî û rêziknameya wê zelal bikin, her wiha bêyî ku tu navgîneke têkiliyê bi rêxistinê re belav bikin. Li gorî daxuyaniyeke Rêxistina Maf di rojên 15-16/8/2009'an de, sekreterê rêxistinê Ebdilfetah Dihêr ji hêla ewlehiya leşkerî ve li Şamê hate gazîkirin. Rêxistinê di 2009'an de gelek daxuyanî di gelek helkeftên kurdî de derxistin, her wiha bultena “Nûdem” derdixist, lê niha di 2005'an de me tu navnîşan an jî çalakiyên vê rêxistinê di tevgera siyasî ya kurdî de nehatiye dîtin.

- **Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdî ya Sûrî (baskê Şengalî):**

Ev partî di 26'ê mijdara 2009'an de hate damezrandin bi serokatiya Fewzî Şengalî piştî derketina nakokî û parçebûn di navbera serkêşên Partiya Rêkeftin de ku li Slêmaniyê (başurê Kurdistaê) bi cih dibûn. Ev yek jî piştî kongreya duyemîn a ku di 2007'an de hate lidarxistin, pêk hat. Wê demê, rêveberiya Rêkeftinê (koordînasyona Giştî) ev kes tê de cihê xwe digirt: Fewzî Şengal (koordînatorê giştî), Hecî Efrînî/ berpirsê ragihandinî, Salih Sofî Biro, Neşaat Mihemed û Nedîm Yûsif nûnerê partiyê li Ewropa, her wiha Telal Mihemed ji Qamişlo û Cegerxwîn Şêxo ji Helebê; di navbera salên 2008-2009, Rêkeftin dabeşî du blokan bû:

1- Blokek “Şengalî û Sofî” tê de bûn, ew alîgirê Ebdilhemîd Derwîş bûn û alîgir bû ku partî têkeve hevbendiyên partitî.

2- Blokek “Efrînî, Neşaat, Cegerxwîn” tê de bûn, ew muxalif bûn ji Ebdilhemîd Derwîş re û red dikir tevlî hevbendiyên partîtî bibin.

Di dawiya 2008'an de, Nedîm Yûsif ji partiya Rêkeftin vekişiya, lê nehat naskirin Telal Mihemed alîgirê kîjan blokê ye.

Di 12'ê hezîrana 2009'an de, Fewzî Şengalî bi navê partiya xwe lihevkirinek bi Hoşeng Derwîş (serokê Şepêla Azadiya Kurdistana Sûrî) û Ebdilbaqî Kolo (serokê tevgera 12'ê adarê ya Niştîmanî) der barê avakirina çarçoveyek yan jî yekîtiyek bi tevgerên wan re, mor kir. Roja din, Hecî Efrînî wek berpirsê ragihandinê, daxuyaniyek derxist û tê de dijberî tişta hatiye xuyakirin weşand û diyar kir ku tu peywendiyê Rêkeftin bi vê lihevkirinê re tune ye. Di dawî de bloka Şengalî kongreya xwe ya giştî bi navê “Kongreya Sêyem ya Rêkeftin”di 25-26'ê mijdara 2009'an de li dar xist, tê de pergala rêxistinî ya partiyê hate guhertin li gorî vê yekê:

Koordînasyona Giştî hate guherandin bo sekreteriya giştî û bîroya siyasî ya partiyê ya nû ev kes tê de cihê xwe digirt:

Fewzî Şengalî, Hoşeng Derwîş, Salih Sofî, Farûq Baba Mîran, Enwer Mihemed û Salih Şerîfî.

Di 4'ê berfenbara 2009'an de, civînek ji bîroya siyasî re hate lidarxistin tê de Fewzî Şengalî wek sekreterê giştî yê partiya Rêkeftin hate hilbijartinû bloka Hecî Efrînî ji partiyê hate qewitandin, bi vê boneyê Şengalîgelek

nameyên pîrozbahiyê ji hêla Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanî, Pêşverû, Azadî, Yekîtî û El-Partî wergirtin.

- **Partiya Demokratîk a Kurdî a Sûrî / Baskê Efrînî:**

Di 7-8'ê berfanbara 2009'an de, bloka Efrînî civînek berfireh li dar xist û tê de ev biryar da:

Neitîrafkirin bi “Kongreya Rêkeftin a Sêyemîn” (Şengalî) ya 26'ê mijdara 2009'an û endamên beşdarî wê kongreyê bûn wek veqetiyayî hatin hesibandin, her wiha hewldan bo ku kongreya sêyemîn ya partiyê di dema herî nêzîk de bê lidarxistin; di 17'ê berfanbara 2009'an de, Neşaat Mihemed di hevpeyvînekê bi rojnemevan Şevger re da xuya ku tu niyaz tune ne ku navê Partiya Rêkeftin ango stratejiya wê bê guhertin piştî ku parçebûn tê de çêbû.

- **Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdî li Sûriyê:**

Ew kevntirîn partiyên ku li rojavayê Kurdistan û Sûriya dixebite, serokê wê Ebdilhemîd Derwîş e. Destpêka partiyê dirûvê şepêla “Rast” bû ku li gorî têgînên wê demê yên ku di nav gel û serkêşa siaysî ya kurdî li Sûriyê bû di 1962'yan de. Hin endamên vê partiyê dibînin ku ev partî yekemîn partiya kurdî ye ku di 14'ê hezîrana 1956'an de hatiye damezrandin, lê gelek nerînên din ên cuda di hundirê vê partiyê û partiyên din jî hene. Her wiha gelek çavdêr dibînin ku ew partiya herî nêzîkî rêjîma Sûrî ye û carinan dihat gotin ku ew alîgirê rêjîmê ye û bi rêjîmê re bi awayekî eşkere û ne nehînî têkil dibe. Rêbazê vê partiyê ji destpêkê ve dûrî bikaranîna hestên gelê kurd e, Ebdilhemîd Derwîş jî di civînên xwe de bêhtirî carekê ev yek tekez kir (li gorî kesên ku di van civînan de hazir bû) û hin jî dibînin ku ev partî bazarê li ser pirsgirêka kurdî li Sûriyê dike. Di dema dawî de, her wekî hemû partiyên din, gelek nakokî di hundirê partiyê de derket, ev yek jî hişt ku gelek şepêl di hundirê partiyê de derkeve ku gel pê mijûl bibin li ser hesabê pirsgirêkên bingehîn. Niha jî şepêlek bi navê Şepêla Çaksaziyê hate avakirin bi serokatiya Feysel yûsif; tevî lêgerîna me ya demdirêj li ser bernameya siyasî ya vê partiyê, me tiştek bi dest nexist, lê tenê rêzikname û pergaleke wê ya rêxistinî zelal hene.

Partî bi navê “Partiya Demokratîk a Kurdî” di destpêka salên 1967'an de hate damezrandin bi serokatiya Ebdilhemîd Derwîş pêşengê yekem û

partiyê û yek ji damezrînerên Partiya Demokratîk a Kurdistanî a ku di 1957'an de hatibû damezrandin (partiya Apê Osman Sebrî). Di kongreya çaremîn de di 1997'an de, gelek biryar hatin girtin, girîngtirîn wan biryaran guhertina navê partiyê ji "Partiya Demokratîk a Kurdî" bo "Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdî li Sûriyê", bo ku nêzîkbûna di navbera navê wê û navê partiyên din ên ku heman nav hildane, rake. Ji hêla siyasî û hizirî ve, kongre biryar da bi kûrkirina bingeha civakî ya partiyê û kalîteya kadir, bingeh û alîgirên wê, her wiha destek û piştgirî bide tekoşîna gelê kurd li her çar parçan dijî hikûmetên şovînîst bo ku mafên xwe yên rewa bi dest bixe. Li gorî biryarên ku di kongreya çaremîn de hatin girtin, komîteya navendî hewldanên xwe kir bo ku peywendiyên partiyê bi partiyên din ên Kurdistanî re xurt bike. Di dawiya 1980'î de lihevkirinek çêbû der barê damezrandina komîteya hevkarî û hevrêziyê di navbera partiya Pêşverû û van partiyan de: Partiya Demokratîk li Îranê, Partiya Sosyalîsat a Kurdistanî-Tirkiya (Kemal Bûrqay), Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanî (Celal Telabanî)û her du partiyên komînîst ya Sûrî û Îraqî wek çavdêr. Piştî van danûstandinan di navbera van komîteyan, ew komîte derkete qadê û gelek xebat pêk anîn bo ku bi ser bikeve ji ber ev komîte gelek hêvî li ser hatin danîn. Komîte dixebitî da ku tevgera niştîmanî ya kurdî bi pêş bixe û cihê xwe di nav raya kurdî û cîhanî de xurtir bike. Kongreya partî a pêncemîn di 1982'an de hate lidarxistin û tê de xebatên partiyê yên piştî kongreya çaremîn û xebatin komîteya navendî hatin nirxandin.

Piştî têkçûna Komîteya Hevkarî ya Kurdistanî, sarbûnek di peywendiyên partiyên kurdî û kurdistanî de çêbû, tevgera neteweyî ya kurdî di sarbûn û lawazbûnekê re derbas bû. Ev yek jî li gel welatparêzên kurd mertirsî û xembarî li ser pêşeroja tevgera kurdî ya çekdarî li Îran û Îraqê, çêkir. Di van mercan de, kongreya partiyê ya şeşemîn di cotmeha 1986'an de hate lidarxistin. Di kongreyê de, girîngî hate dayîn bo rewşa tevgera kurdî ya çekdarî di dema mijûlbûn bi şerê Îranî-Îraqî ve û pêşeroja wê heke ew şer sekinî. Piştî ku di kongreyê de metirsî û hestên berpirsyariyê der barê vê yekê de hate nîqaşkirin, gihaştin nerînekê ku komîteya ku di kongreya şeşemîn hatiye avakirin hewldanên xwe li gel partiyên kurdistanî yên nêzîk û partiyên dost ên bi awayekî rasterast têkilîdarê rewşê ye bikin, bo ku şerê hundirîn di navbera her du aliyên pevçûyî de bisekinînin, serxwebûna tevgerê biparêzin û pêdiviyên pêwîst bo berdewambûna têkoşîna çekdarî

piştî bidawîbûna şer peyda bike, da ku kareseteke neteweyî wek ya ku di 1975'an de çêbû dûbare nebe (li gorî nerîna partiyê)û parastina gelê kurd yê ku rastî qirkirinê li ser destê desthiladarên îraqî yên faşîst tê. Li gorî vê yekê jî, komîteya navendî têklî bi partiyên din re re kir tevî ku nakokî di navbera wê û wan aliyan de hebûn û nerîna partiyê der barê rewşa Kurdistanê bi giştî da û pêwîstiya xebatên hevbeş anî ziman, bo ku dirûvekê ji hevkariyê di navbera partiyên kurdistanî û kurdî de bê dîtin her wekî  Komîteya Hevkarî û Hevrêziyê.

Di dawiya vê kurtenivîsa der barê dîroka vê partiyê de, em dikarin bibêjin ku me hemû aliyên rêxistinî bi awayekî sereke anîn ziman.

Di 16'ê tîrmeha 2009'an de, Ebdilhemîd Derwîş holek di bîroya partiya xwe de li bajarê Qamişlo bi navê “Hola Textor Nûredîn Zaza” vekir û di dawiya rezbera 2009'an de kongreya giştî ya Partiya Pêşverû hate lidarxistin (Kongreya sêzdemîn). Tê de Ebdilhemîd Derwîş wek sekrterê partiyê bo gereke nû hate hilbijartin û bi vê yekê Derwîşê xwediyê 73 salan heyanî roja vê kongreyê di gelek cihên serokatiyê de dihat erkdarkirin û jê 43 sal wek serokê partiyê. Bi vê yekê ev dibe 49 sal in ku bo serokatiya partiyê tê erkdarkirin heyanî dîroka 16/3/2015'an de û hîna jî cihê xwe tê de digire.

- **Partiya Yekîtiya Kurdî li Sûriyê:**

Partiya Yekîtî li Sûriyê partiyeke siyasî kurdî ku qada Kurdî ya Sûrî de dixebite. Partî kongreya xwe ya damezrîner di 1'ê nîsana 1993'yan de li dar xist. Ew partiyeke radîkal e bi çalakbûn û akatîvbûna xwe di nav gel de tê naskirin. Berztirîn çalakiyên vê partiyê kampaniya pankartan di salên notî ji sedsala çûyî de, yekem xwepêşandaneke eşkere di salvegera Danezana Naneteweyî ya Mafên Mirovan di 10'ê berfanbara 2002'yan de li pêşiya Perlemana Sûrî, di encama vê yekê de gelek serokên vê partiyê hatin girtin wek: Merwan Osman û Hesen Salih. Partî ji wê demê de bi berdewambûn xwepêşandanan li herêmên Kurdî û li paytexta Sûriya Şamî li dar dixe.

- **Partiya Yekîtî ya Demokratîk li Sûriyê (Yekîtî):**

Di 1988'an de, komek ji serok û bingehên Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) bi serkêşiya Îsmaîl Omar ji partiyê veqetiyan. Piştre lihevkirinek bi bi Partiya Kar a Kurdî li Sûriyre bi serkêşiya Mihyedîn Şêx

Alî, tevî hinek endamên Çep ên kurdî bi serokatiya Sedîq Şernex, tevî Partiya Kedkarên Demokratîk a Kurdî li Sûriyê, lihevkirink çêkir. Piştî vê yekîtiyê, Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê di 1990'ê hate avakirin û Ismaîl Omar ji wê dîrokê heyanî koça wî ya dawî di 2010'an de serokê wê bû. Ev partî wek hemû partiyên Sûrî partiyeke qedexekirî bû û ji partiyên damezrîner ya “Daxuyaniya Şamê” bû, her wiha beşdarî damezrandina Encûmana Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê bûbû.

Ev partî hewl da têkilî û hevkarî bi hemû çalakityên neteweyî yên demokratîk, rêxistinên mafên mirovan, komîteyên civaka sîvîl û serbixweyan çêke, bi armanca çêkirina danûstandinan li hemû bajar û parêzgehên sûrîde û çêkirina hevrêzî û karê hevbeş bo:

1- Betalkirina dadweriya awarte û her du biryarên “49/64” ya sala 2008'an û li kêleka wê jî komek biryarên awarte ku li gorî rewşa awarte û zagonên şer di dirêjahiya 4o salî de derketin, her wiha pêkanîna rêgeza cudakirina desthilatdariyan (desthilata rêveberî, zagonsaz û dadwerî).

2- Derxistina biryareke nûjen ku xebatê partiyên li Sûriyê bi rêxistin bike.

3- Misogerkirina azadiya nerîn û axaftinê bêyî tu tirsî û careke din di ber çavan re derbaskirina zagona çapkirinê ya ku hatiye sînorkirin.

4- Sekandina binçavkirina keyfî û vexwestina ewlehî yên der heqê welatiyan de ji ber nerîn û berhemên wan ên çandî, her wiha serbestberdana hemû girtiyên siyasî û ramyarî.

5- Parastina mafên sivîl û olî yên kurdên Êzîdî.

6- Hetikandin û nîşandayîna kiryarên ne durist yên pêvajoya “Çakkirina Çandinî” û encamên wê, bo ku careke din lêveger jê re çêbibe nemaze di herêmên kurdî de.

7- Dayîna girîngiyeke mezin ji rêgeza hemwelatîbûn û têgîna maf û armanc re di bin sîwana dewleta maf û serweriya zagonê de.

8- Derxistina zagoneke nû ya hilbijartinan ku azadiya hilbijêr û duristiya meşandina pêvajoya hibijartinê misoger bike, di bin serperiştiya desthilatdariyeke dadwerî ya durist û serbixwe bo ku veguhestina serwerî bi awayekî aştiyane misoger bike.

9- Ji nû ve lênêrîn di materiyaên perwerdehî de bo ku neteweperestî û olperestî bê rakirin û derfetên xewendinê ji hemû qonax û astan re bê misogerkirin.

10- Sekin li kêleka jinê û têghiştina şêwe û dirûvên dijbertiya wê, ji ber ew nîvê civak, mirovahiyê ye û nîvê civakê ya din jî perwerde dike. Mafê wê bi temamî di xwendinê bi astên wê yên herî bilind, azadiya nerînê û kar de heye. Rola wê li kêleka mêr di pêkanîna demokrasiyê de bo avakirina dewleta nû de jî heye, li ser esasê parastina malbatê ji jevketinê û lênêrîneke sazîtî ji pirsgirêkên wê re.

11- Çareserkirina pirsgirêka Kurdî çareserkirineke demokratîk di çarçoveya bidestxistina mafên hemwelatîbûnê bi temamî û itîrafkirineke zagonî bi hebûna wan, bo ku mafên xwe yên rewa pêk bînin di riya rêveberiyeke xweser ji herêmên kurdan re di çarçoveya yekbûna welat de.

12- Hevgirtina têkoşîna gelê kurd li her aliyên Kurdistanê, di riya balkişandin li ser zilm û zordestiya ku di riya bername û siyaseta hikûmetên Enqere, Bexdad û Tehranê rastî birayê me yên kurd tê û derketin hemberî siyasetên tûnd û terorîstî.

Ev partî Rojnameya “Yekîtî” bi zimanê erebî derdixe, tevî hin rûpelên elektronîk, torên medya civakî, Rojnameya “Newroz” bi zimanê kurdî, Kovara “Hîwar” her sê mehan carekê bi zimanê erebî û Rojnameya “Press” bi zimanê kurdî ew jî her sê mehan carekê derdikeve.

- **Şepêla Pêşeroj a Kurdî li Sûriyê (3):**

Ev şepêl, partiyeke kurdî muxalif û liberal e û endamê Encûmana Niştîmanî ya Kurdî ye. Şepl banga avakirina dewleteke sivîl a pirengî û demkratîk, danpêdan bi gelê Kurd û beşdarbûna kurdan bi hevparî û wekhevî di Sûriya de , dike.

Mişal Temo ev şepêl di 2005'an de damezrand, ev şepêl partiya herî radîkal di muxalefeta kurdî de ye. Bi Partiya Yekîtî û Azadî re Komîteya Hevrêziyê di 2006'an de damezrand ku di 2011'an de tevlî Encûmana

[3] Navenda Karîngî ya Rojhiata Navîn

Niştîmanî ya Kurdî bû. Tevî vê yekê jî, ew niha partiya Kurdî ya tekane ku di Encûmana Niştîmanî ya Kurdî de mane ku piraniya endamên wê ereb in.

Şepêla Pêşeroj ya Kurdî têkiliyên xwe yên xurt bi rêxistinên ciwanên Kurd re çêkir û tevlî xwepêşandanên muxalefetê ya di destpêka Şoreşa Sûrî de bû. Bi rastî muxalefeta Kurdî Şepêla Pêşerojê bi guhdana wê jî Şoreşa Sûrî û bibinketin di piştgiriya berjewendiyên kurd û parastina wan, tawanbar kir. Berevajayî piraniya partiyên kurdî li Sûriyê, Şepla Pêşeroj doza Kurdî wek pirsgirêkek herêmî nabîne. Ew banga çarenûsiya Kurdî nake, lê banga beşdarbûna temamî li hikûmeta nû li ser bingeha rêjeyê dike û daxwaza danpêdan bi gelê Kurd wek nijadeke bingehîn û ne duyme di Sûriya de dike.

Damezrînerê şepêlê siyasetmedarekî kurd, navdar û çalak bû û serokê tevgera ciwanên kurd bû. Di cotmeha 2011'an de li Sûriyê hate kuştin û dihat gumankirin ku hikûmeta Sûrî pişt kuştina wî disekine. Di 6'ê hezîrana 2012'an de, hin ji endamên şepêlê Cengîda Mihemed wek serokekî nû bo bîroya têkiliyan û bo komîteya serokatiyê ya partiyê re hilbijart. Ev yek jî di encamê de parçebûn bi xwe re anî. Komeke rikber ku piştgiriya Rêzan Behrî Şêxmûs serokê berê ya bîroyê dikir, didît ku ew hilbijartinên hundirîn ne rewa bûn.

**Bernameya siyasî:**

**Siyaseta partiyê beramberî aloziya li Sûriyê:**

**1-** Banga destwerdana leşkerî ya dervayî dike.

**2-** Banga çekkirina muxalefetê dike.

**3-** Danûstandin bi rêjîmê re red dike.

**4-** Piştgiriya Plana Enan ya Aştîtiyê dike.

**Armancên siyasî**:

**1-** Avakirina Sûriyeke sivîl a pirreng û demokratîk.

**2-** Danpêdan bi gelê Kurd wek nijadeke sereke di Sûriya de.

**3-** Beşdarbûna gelê Kurd bi wekhevî wek hevpar di karûbarên Sûrî de.

Hin çavdêr dibînin ku axaftina Şepêla Pêşerojê tenê slogan in, ku bi hêza wê ya rêxistinî re ne aheng e: berztirîn serokên wê ev bûn:

1- **Mişal Nehiyt Temo:** Mişal Temo li Dirbêsiyê di sala 1957'an de ji dayîk bû, piştre ew li Qamişlo bi cih bû. Dîploma endeziyariya çandiniyê wergirtiye. Ew zewicî ye û 6 zarokên wî hene (4 xort û 2 keç). Ew di destpêka jiyana xwe ya siyasî de tevlî Partiya Yekîtiya Gelerî ya Kurdî (Selah Bedredîn) bû û bû endamê wê, heyanî zêdetirî 20 salan endamê wê bû. Di 1999'an de li Qamişlo bi hin çalakvanên din re du hevgirtinên çandî “Komîteyên Vejînkirina Civaka Sivîl li Sûriyê” û “Yane Celadet Bedirxan a Çandî” damezrandin. Piştre jî di 2005'an de piştî komkujiya Qamişlo Şepêla Pêşeroj a Kurdî damezrand, lê di cih de bi awayekî fermî hate qedexekirin. Desthilatdariya Sûrî di 15'ê tebaxa 2008'an de Temo bin çav kir û piştî du hefteyan ji binçavkirina wî Şaxê Istîxbaratên Ezmanî li Helebê wî radestî Şaxê Ewlehiya Siyasî li Şamê kir û li wir rasdetî dadgeriyê bû. Di 11'ê gulana 2009'an de sê sal hikûm stand bi tawana “lawazkirina heybeta dewletê”, “lawazkirina hestên neteweyî” û “lawazkirina morala neteweyê”.

Di hezîrana 2011'an de, Mişal Temo serbest hate berdan bi niyaza aramkirina pêla protestoyan a ku li her derê welêt belav bûbû. Piştî serbestberdana wî, beşdarî çalakiyên “Kongreya Xelaskirin Niştîmanî ya Sûrî” yê ku li Istanbolê hate lidarxistin bû. Di hundirê Sûriya de axaftinek tê de got û di axaftina xwe de li ser “yekîtiya gelê Sûrî” tekez kir. Mişal Temo, piştî derketina wî ji zinadnê, gelek vexwendin ji rêjîma Sûrî girt bo ku beşdarî kongreyên danûstandinan bibe, lê wî red kir û alîgirî da çalakgerên dijî rêjîmê [4]. Piştî damezrandina Encûmana Niştîmanî ya Sûrî bo “nûnertiya muxalefeta Sûrî di civaka navnetewetî de bike”, Mişal temo bû endamek ji vê encûmanê.

Mişal Temo di 8'ê rezbera 2011'an de rastî hewldaneke kuştinê hat, lê ew hewldan bi bin ket. Hin aliyên muxalif dibêjin ku dema Temo ji zindanê derket û dest bi xebatên xwe yên siyasî wek muxalif ji rêjîmê re kir, rastî gefdanên bi kuştinê dihat. Lewre jî hewl dida xwe dûrî çavan bixe û bi awayekî nehînî tevger bike. Lê di 7'ê cotmeha 2011'an de, 4 kesên çekdar ên nenas gihaştin devre Temo lê bi cih dibe û derbasî mala wî bûn û gule li

[4] Ji Wîkîpediya, ensîklopediya azad.

serê barandin û di kêmî xuleyekê de reviyan. Her wiha kurê wî Marsêl û çalakvana jin Zahîde Reşkîlo (yên ku pê re di mal de bûn) birîndar bûn. Lê piştre operasyonek ji kurê wî re hate çêkirin û rewşa wî baş bû, lê Mişal Temo di cih de jiyana xwe ji dest da.

2- **Xerbî Hiso:** Ew ji Qamişlo ye, endamê Bîroya Têkiliyên Giştî ye û endamê meclisa rêveber ya "Komîteya Çavdêr (Rasid) a kurdî ya Mafên Mirovan" e. Ew niha li başurê Kurdistanê bi cih dibe.

3- **Hervîn Osê:** Navê wê ya rastîn Fehmiya Salih Osê ye, ew ji Dêrika Hemko ye û li Şamê bi cih dibû, dîplom di dîrokê de standiye û ew endamê Bîroya têkiliyên Giştî ye û endamek di meclisa rêveber ya Komîteya Çavdêr (Rasid)bû.

4- **Ibrahîm Mistefa:** Ew ji Kobanî ye û endamê bîroya ragihandinê di şepêlê de ye, ew di tebaxa 2008'an de tevlî şepêlê bû.

5- **Xelîl Hesen:** Ew li Qamişlo ji dayîk bûy, niha li Ewopa bi cih dibe. Ew berê serokê Bîroya Têkiliyên Giştî bû û di 2009'an de berpirsyarê bîroya Ewropa ya şepêlê bû. Hikuma paşmile bi deh sal zindankirin lê hatiye birîn.

6- **Nûman Şêx Ehmed:** Ew ji Kobanî yeû endamê Bîroya Têlkiliyên Giştî ye, niha li Siwîsra bi cih dibe.

Her wiha Ferhad Xidir ji Derbêsiyê heye, Zahîde Reşkîlo ji Hesekê, Mihemed Hemo/ nûnerê şepêlê li Herêma Bşûrê Kurdistanê e, Narîn Metînî (navê wê ya rastîn Fatîma Newaf e), Mihemed Osman ji gundê Cewheriyê (gundên Amûde) û Yûnis Hisên ji Amûdê (gundê Cewheriyê).

Şepêl rojnameya xwe bi navê (El-Musteqbel/ Pêşeroj) bi zimanê erebî diweşîne.

- **Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê:**

Ev partî di 1996'an de hate damezrandin, serokê wê Mihemed Mûsa Mihemed e. Di dawiya gulana 2008'an de, partiyê kongreya xwe ya giştî li dar xist û tê de tevlîbûna Salih Gedo sekreterê berê ya Partiya Sosyalît a Kurdî û hevalên wî bo partiyê hate ragihandin. Salih Gedo bû cîgerê sekreterê Partiya Çep. Di dawiya sala 2008'an de, Mihemed Mûsa ji ber çalakiyên partiyê hate girtin û sê mehan hikum bi zindanê lê hate birîn, piştre jî hate berdan. Lê ew nekete zindanê ji ber di dema binçavkirinê de

ew sê meh derbas kir, tevî vê yekê jî careke din di 9'ê tebaxa 2009'an de hate girtin û 21 roj di zindanê de ma û di 31'ê tebaxa 2009'an de hate berdan. Di 6'ê sibata 2009'an de, Partiya Çep endamtiya xwe di Hevgirtina Çep a Markisî li Sûriyê de rawastand ji ber helwestên wê yên neyînî beramberî gelê kurd û sembolên kurdî. Lê di gulana 2009'an de partî ji wê biryarê vegeriya û careke din endamtiya xwe di hevgirtinê de aktîf kir bêyî ku bide xuyakirin heke hevgirtin ji helwestên xwe yên neyînî beramberî gelê kurd vegeriya yan na, tevî ku tê zanîn ku Hevgirtin ji dema damezrandina wê de di nîsana 2007'an de tu daxuyanî der barê Kurdan û doza kurdî de neda. Berztirîn serokên vê Partiya Çep ev bûn:

1- **Mihemed Musa:** Sekreterê Partiyê, ew ji Dirbêsiyê ji gundê Şorik e û dîplom di felsefeyê de standiye.

2- **Mihemed Salih Ebdo:** Endamê bîroya siyasî ya Partiya Çep e, ew ji Dirbêsiyê ye û niha li Hesekê bi cih dibe.

3- **Fetihalah Hûseynî:** Berpirsyarê ragihandinê ya Partiya Çep li Kurdistana Îraqê bû.

4- **Şêxmûs Mûsa:** Endamê bîroya siyasî û cîgerê hevserokê Kantona Cizîrê li Rojavayî Kurdistanê ye.

- **Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê:**

Ev partî di 21'ê gulana 2005'an de hate damezrandin û Xêredîn Murad bû serokê wê. Bi yekîtiya di navbera Partiya Çep û Yekîtiya Gelerî de, ev partî hate avakirin . Di navbera gulan û tebaxa 2005'an de bi sedan endamên nû tevlî bûn, piraniya wan ji ciwanan bû, her wiha rêxistina Kobanî ya Partiya Yekîtiyê bi serokatiya Mislim Mihemed bi temamî tevlî bû û êdî rêxistinên Azadî li hemû herêmên Kurdî û bajarên Sûrî (Şam û Helebê) belav bûn. Lê di cih de nakokî di hundirê partiyê de di navbera alîgirên Çep bi serokatiya Xêredîn Murad û alîgirên Yekîtiya Gelerî bi serokatiya Mistefa Cûma, derketin. Her aliyek hewl dida ku beriya lidarxistina Kongreya yekgirtî, hejmarek mezintir ji desteyên partiyê bi dest bixe. Her du alî li ser lidarxistina kongreyê di gulana 2006'an de li hev kir û ev encam jê derketin:

1- Jevxistina komîteya navendî li derve û dûrxistina Mihemed Reşîd û Rêhan Ramadan ji karê rêxistinî ûmerkdarkirina Xêredîn Mûrad ji kesên

nêzîkî xwe re ji rêxistina li derve. Ev yek jî hişt ku Reşîd û Ramadan xwe ji partiyê vekişînin û ji nûve Yekîtiya Gelerî vejîn bikin.

2- Paralel bi kampaniya Xêredîn Murad re ya li ser endamên Yekîtiya Gelerî li derve, rojnameya navendî ya partiyê weşana xwe sekinand, her wiha goşenivîsa di rûpela yekem de ku nivîsandinên Selah Bedredîn tê de dihatin weşandin, sekinî.

3- Endamine berê di Yekîtiya Gelerî de hewl da ku rewşa rêxistina derve sererast bikin di riya lidarxistina kongreyeke awarte di adara 2006'an de. Lê Xêredîn Murad di cih de biryar bi qewtandina hemû kesên mehsûb li ser Yekîtiya Gelerî di rêxistina derve de, derxist. Lê wan ev biryar red kir û karê xwe yêrêxistinî berdewam kir.

4- Nakokiyên pir giran di navbera her du aliyan di rêxistinên Dêrik û Qamişlo de çêbûn. Di encamê vê yekê de, gelek kes karên rêxistinî sekianadin.

5- Di rêxistina Koçerat de, nakokî di navbera çepgiran bi xwe de bû jî, Xêredîn haziriyên xwe dikir ji bo ku Hişyar Ehmed biqewitîne û Îbrahîm ji bedêla wî ve erkdar bike, di riya belavkirina propagandakê di nav bingehên rêxistinî ku dibêje Hişyar Ehmed bû sedem ji aloziyeke civakî di gundê Tebkêde (kuştina keçikekê li ser destên birayê wê).

Di kongreya yekgirtî ya partiyê ya ku di 17-19'ê gulana 2006'an de hate lidarxistin, hilbijartinên dirûvî bo serokatiya partiyê çêbû û Xêredîn Murad wek serokê partiyê hate hilbijartin.

Berztirîn serokên vê partiyê:

1- **Xêredîn Murad**: Ew sekreterê partiyê ye, li Dêrikê ji dayîk bûye û li Tirbespiyê bi cih dibû, niha l iNerwîcê ye û bû serokê yek ji baskên Çep ji 1996'an ve heyanî damezrandina Partiya Azadî di 2005'an de ku serokê wê.

2- **Mistefa Cûma:** Cîgerê sekreterê partiyê ye û serokê Partiya Yekîtiya Gelerî bi cîgertî ji dema ku Selah Bedredîn itîfaya xwe di 2003'an de û heyanî damezrandina Pratiya Azadî.

3- **Beşar Emîn:** Ew Ji Dirbêsiyê ji gundê Bîrik e. Niha li Hesekê bi cih dibe û ew berpirsyarê ragihandina Partiyê ye.

Hin endamên komîteya siyasî jî hene wek: "Fewaz Mehmûd ji Qamişlo, Luqman Oso ji Şamê, Mistefa Oso ji Hesekê", li kêleka wan jî endamên serokatiyê hene wek "Mihemed Saidûn/ berpirsê rêxistina Dêrik e, Ibrahîm Xelef/ berpirsê rêxistina Koçerat e, Saidûn Şêxo, Mihemed Saîd El-Omar û Rifaat Mistefa nûnerên partiyê li Ewropa".

Partî ji destpêka damezrandina xwe de rojnameyek bi navê "Azadî" bi zimanê erebî derdixist, lê li ser danîbûn ku ew hejmara 361'ê ye, ew tişta herî balkêş bû. Her wiha rojnameya "Deng" bi zimanê Kurdî derdiket.

- **Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) / baskê Ebdilhekîm Beşar:**

Ev partî di 1998'an de hate damezrandin û Ebdilhekîm Beşar di 2007'an de bû serokê wê. Ew pir nêzî Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Îraqê ye û wek hevbendê wê ya kevneşop ya li ser rêbazên Berezaniyê ye.

Di 2009'an de, nakokî û hevrikiyên giran di navbera komikên wê yên sereke de" Ebdilhekîm Beşar, Siûd Mele, Mihemmed Ismaîl û Nesredîn Berhek", derketin.

- **Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD):**

Di kongreya damezrîner a ku di 23/10/2003 de hate lidarxistin, ev nav hate lêkirin. Ji ber ku bingeha neteweya demokratîk, gelek nav di kongreyê de hatin pêşniyarkirin ku bi rêbazê partiyê de aheng bin û piraniyan ev nav pejirandin. Di kongreyên li pey wê re gelek pêşniyarên din jî hatin dayîn bo guhertina nav an jî zêdekirina navê kurd an Kurdistanî li ser navê partiyê, lê ew pêşniyar nehatin pejirandin, ji ber ku baweriya wan ew e ku partî siyaseta hemû pêkhateyên Sûrî nexşe dike û mafên wan di pêvajoya guhertin û veguhestina demokratîk de, misoger dike.

Di kongreya yekemîn de ya ku 160 delege tevlî bûn û di 23/10/2003de hate lidarxistin, Zerdeşt Haco wek serokê partiyê hate hilbijartin, lê ji ber mercên wê û mayîna wî li derveyî welat nekarîbû rola xwe tam bilîze. Di kongreya duyemîn di 2005'an de hate guhertin û Fûad Omar bû serokê wê. Piştî ku du gerên Fûad Omar bi dawî bû, di kongreya çaremîn Salih Muslim wek serokê partiyê hate hilbijartin. Di kongreya pêncemîn a awarete ya ku li Qamişlo di 16/6/2012'an de hate lidarxistin, sîstema hevserokatiyê

hate pijrandin û Salih Muslim û Asya Ebdelah wek hevserokên partiyê, hatin hilbijartin.

PYD, jo bo çareserkirina pirsgirêka Kurdî û pirsgirêka veguhestina demokratîk li Sûriyê, rêbazên birêz Ebdelah Ocelan di çareseriya demokratîk de ji xwe re esas digire. Her wiha armanca wê pêkanîna Rêveberiya Xweser a Demkratîk di çarçoveya civakeke exlaqî, siyasî û demokratîk de ye û xurtkirina biratiya gel û neteweyan di çarçoveya vîna azad de.

- **Partiya Demokratîk a Kurdistanî-Sûriya PDK-S :**

Ev partî di kongreya yekgirtî ya Yekîtiya Siyasî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê ya ku di 3-5/4/2014 de hate lidarxistin, çêbû û serokê wê Siûd Mele bû, ew yekîtî çar partiyên Kurdî yên di Encûmana Niştîmanî ya Kurdî-Sûrî de bûn dihewand, ew partî jî ev in:

1- Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê/ baskê Xêredîn Murad.

2- Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê/ baskê Mistefa Oso.

3- Partiya Yekîtî Ya kurdistanî li Sûriyê, serokê bû Ebdilbasit Hemo ye.

4- Partiya demokratîk a Kurdî –Sûriya (El-Partî) / baskê Ebdilhekîm Beşar.

Li gorî rêziknameya vê partiyê, ew partiyeke demokratîk xwedan nerînên lîberal e, ku demokrasiya perlemanî, dada civakî û mafê çarenûsiya gelê kurd û gelên ji xwe re bingeh digire û di têkoşîna xwe de sûd ji dîroka têkoşîna gelên din û bi taybet rêbazê nemir Berzanî digire, ku bi rastbîniya gelê Kurd li Sûriyê re di çarçoveya têkoşîna siyasî û demokratîk de aheng be; her wiha ev partî bo van armancan têdikoşe:

1- Rakirina zagon û siyasetên şovînî der heqê gelê kurd de, çi ji Kembera Erebî çi ji serjmêriya awarte û siyasetên erebkirinê, her wiha çareserkirina bandor û encamên wê, tawîzkirina zirakeran û vegerandina rewşê li serdema beriya pêkanîna van siyasetan.

2- Di ber çavan re derbaskirina dabeşkirinên îdarî yên nihayî bi awayekî ku yekîtiyeke siyasî, îdarî û neteweyî hevgirtî ji herêmên kurdî re pêk bîne di çarçoveya Herêma Kurdistana Sûrî de.

3- Pirsgirêka Kurdî beşeke sereke ji pirsgirêkên niştîmanî yên giştî li welêt e, her wiha û çareserkirina wê di riya itîrafeke makezagonî bi gelê kurd û mafên wî yên neteweyî û rewa ku federaliyet ew dinimîne di çarçoveya yekîtiya welat û serxwesbûna wê de.

Armancên vê partiyê li ser asta neteweyî ya Sûrî ev in:

1- Ji nû ve navlêkirina dewletê bi Komara Sûrî.

2- Guhertina ala Sûrî bi awayekî ku bi pêkhateyên din re guncav be.

3- Li gorî makezagonê, belavkirina destrewatiyên cur bi cur yên zagonsazî, siyasî, îdarî, aborî û dadwerî di navbera navend û herêmê de.

4- Wekheviya di navbera jin û mêr ji hêla zagonî ve û betalkirina hemû şêweyên cudakirin û zordestiyê.

5- Partî têdikoşe bo yekîtiya refa kurdî li Kurdistana-Sûrî.

**Armancên vê partiyê li ser asta neteweyî ya Kurdistanî ev in:**

1- Tişta ku di Kurdistana Îraqê de ji federaliyet û veguhertinên demokratîk pêk hatin wek destkeftî ji neteweya kurdî re tên hesibandin û divê bêne parastin û wek peywireke neteweyî û mirovî lê bê nêrîn, lewre jî ev partî bang li hemû welatiyên kurd li Kurdistan û derve dike ku bi vê peywira giran rabe.

2- Ev partî piştgirî dide têkoşîna gelî kurd li Tirkiya û Îran ji bo ku mafên xwe di çarenûsiyê de bi dest bixe.

3- Ev partî piştgirî dide têkoşîna gelê Kurd li Yekîtiya Soviyetî ya berê û li Lubnanê û banga itîrafkirin bi nasnameya wan a çandî dike.

**Armancên vê partiyê li ser asta herêmî ev in:**

**1-** Pêkanîna aştiyeke dadmend û herdem di herêmê de di navbera Ereb û Îsraîlyan de, li gorî biryarên Netewyên Yekbûyî.

**2-** Ev partî piştgirî dide çareserkirina demokratîk ji pirsgirêkên kêmneteweyan li herêmê.

**Armancên vê partiyê li ser asta navneteweyî:**

**1-** Dijderketin hemberî siyasetên nijadperest di cîhanê de û hemberî terorê bi hemû şêweyên wê.

**2-** Ev partî bang li civaka navneteweyî dike ji bo ku piştgirî bide gelê Kurd da ku bi xwe biryara çarenûsiya xwe bide.

**3-** Ev partî alîgirê diyaloga şarestaniyan û hevjiyana aştiyane di navbera hemû ol û çandan de ye.

**4-** Ev Partî alîgirê hewldanên navnetweyî yên ji bo sekinandina pêşbirka çekdarî û derketina dijî terorê ye.

**5-** Ev partî banga rizgarkirina bazirganiya navneteweyî û zêdekirina istîsmarên hilberîner dike.

PDK-S xwe wek mîrasgirê rewa ji yekem partiya siyasî ku li Rojavayê Kurdistanê(El-Partî) di 1957'an de hate damezrandin, dibîne, her wiha ew berdewambûna wê ye. Lewre jî dîroka damezrandina El-Partî (ya Apê Osman) 1957 li kêleka logo û sembolên PDK-S datîne.

Gelek çavdêr dibînin ku ev partî şaxê Sûrî ji Partiya Demokratîk a Kurdistanî –Îraq e. ev yek jî ji hêla vê partiyê yan jî ji El-Partîli başurê Kurdistanê nehate redkirin, her wiha piraniya çalakî û civînên wê li başurê Kurdistanê tên lidardixistin.

# ÊLÊN DÊREZORÊ

(Beşa dawî)

## Çekên êlan:

Bidestxistina çekan ji kevnşopiyên êlan e. Ev bidestxistin ji bo gelek armancan e; weke berevaniya li hemberî êrîşên êlên din, berevaniya li hemberî lawirên dirande mîna gur, keftar û kûçikên nekedîkirî. Her wiha pêwîstya wan bi van çekan heye ji bo tolhildan û êrîşa li ser êlên din. Armanc jê  ew e ku hevsingiya hêzê di nav wan de biparêze. Gelek  şer di navbera van êlan de qewimîne, weke şerê ku di sala 1947an di navbera êlên Egêdat û Cibûr de qewimî, sedema wî şerî nakokiyên li ser çêrgehan bûn. Eger artêşa Sûrî bi tang û belafiran ji bo rawestandina şer derbas nebûya[1] dê hejmara qurbaniyan bigihaştana hezaran.

Çekên sivik mîna tiving, dermance û narnciok yên herî belav in. Bi zêdebûna endamên êlê, pêwîstî bi çekan zêde dibe, lewma hin kesan bazirganiya çekan ji xwe re bi kar aniye. Ev bazirganî di dema dagirkirina Emerîka ji Iraqê re di sala 2003an de û bi peydabûna girûpên çekdar re, geş bû. Ji ber ku dirêjbûna êlên Dêrezorê dighêje hundirê Iraqê û ji ber cihê wê yê sînorî, asayî ye ku bazara reş li her du aliyên sînor geş bibe û nirxê çekan erzan bibe. Vê jî derfet li pêşiya hin êlan vekir ku hin çekên din jî bikirin mîna avêjerên R.B.G û P.K.C, mayîn û hwd. Ev bazirganî bi zanîna rêjîma Sûrî pêk dihat. Tişta ku vê yekê tekez dike jî tawankirina Emerîka ya rasterast ji rêjîma Sûrî re ye, ya ku di wê demê de alîgiriya girûpên Iraqê yên çekdar dikir[2]. Dibe ku armanca rêjîmê jî ew be ku tundrewan li pişt sînorê Sûrî bixe û dijberiya di navbera êlan de gur bike da ku rêjîm ji bo çareserkirina dijberiyên wan, lêvegera tekane be. Di kirîza Sûriyê de êlan ev çek di riya şerê ku ji ber piştgiriya wan ji alîyên cuda re di navbera wan de derket, wan êlan bi awayekî karîger bi kar anî. Her wekî êlên li bajarokê

1Êlên Şamê, Wesfî Zekeriya.

2 http://www.voltairenet.org/article90005.html

Hetle ku piştgiriya rêjîmê dikin û êlên piştgiriya girûpên islamî ên tunderew dikin, mîna Cebhet Elnusre û DAIŞ û êlên ku piştgiriya Artêşa Azad dikin.



Ji aliyekî din ve ev çek ji bo raserkiria li ser bîrên Petrolê, zeviyên gazê, embarên dexl û dan û zeftkirina li ser dahatiyên wê, bi kar tanîn. Her wiha hin girûpan karên revandin, talankirin û kuştinê pêk anîn. Vê yekê hişt ku gelek pirsgirêkên mirovî yên mezin di nav niştecihên herêmê de peyda bibin, zehmetî li wan bar bibin û gelek rewşên tolhildanê li gorî kevneşopiyên êlî peyda bibin. Heger ev îdyolojiya tunderew a olî û neteweyî û zagonên êlî yên taybet bi tolhildanê, dûrî zagona giştî bimînin, dê rewşa nifşê bê ne baş be. Dibe ku gelek pêvajoyên tolhildanê di demên pêş de hebin.

**1- Rewşa êlên Dêrezorê berî krîza Sûriyê:**

Êlên herêmê ji dema vekişîna Osmanî û Ferensiyan ve ta destpêbûna şerê li Sûriyê di sala 2011an de, çek li hemberî rêjîmên ku desthilatiya Sûriyê kirine nehildane, ji bilî çend rewşên tekane ku nayên bîra mirov. Jixwe sedema wan şerên biçûk jî pirsgirêkên di hundirê partiya Bas a Sûrî û Iraqî de bûn. Dibe ku sedema nehildana wan ji çekan re li dijî rêjîmê, hişmendiya dogmayî (neteweyî û olî) ya ku bi hestên neteweyî yên endamên êlan dilîze, be. Her wiha doza Filestînî, ji bo ku peyabilindên neteweyî û olî û şêxên êlan ji dozên demokratîk û mafên mirovan dûr bixe, bi kar anî. Ya ku ev tişt dikir jî çîna bercewazî, derebegeî (fewdalî) û şovenî li Dêrezorê bû.

Tevî ku dilsoziya sereke ya endamên êlê ji êlê re ye û nerînên wan ên ramyarî bi nerînên serokên êlan ve girêdayî ne, lê vê yekê rê li ber hin endamên êlê negirt ku tevlî tevgera ramyarî bibin, ew jî di riya "Ixwan Elmuslimîn" re li gundên Elqoriye, Şihêl, Xerîbe, Elbûdelîn, Elmohesen û Elcirzî , jixwe di bûyerên ku li dijî Hafiz Elesed[3] di salên heştêyî de qewimîn, beşdar bûn. Her wiha di riya Partiya Komonîst re jî beşdar bûn, a ku hin endamên êla Elbûxabûr li bajarokê Mohesen û hinên din jî bi aliyê xwe ve kişandin. Partiya ku herî bêhtir xelkên Dêrezorê tê de çalak bûn, partiya Bas bi her du aliyên xwe yên Sûrî û Iraqî bû. Yek ji mercên karmendî û payebilindiya karmendiyê, tevlîbûna li partiya Bas bû. Vê jî hişt ku Dêrezor weke herêmên Sûriyê yên din, ji dualiya ramyarî astengiyan bikşîne; aliyek piştgiriya neteweya erebî dike û aliyek piştgiriya islamê dike, ta ku di sala 2011an de şer di navbera van her du aliyan de rû da û êl bûne du beş; beşek alîgiriya rêjîmê dikir û beşek li dijî wê bû, di encamê de jî xelkên herêmê xwîn û canê xwe di vî şerî de dan.

Di sala 1961ê de hejmarek ji şêxên êlan piştgiriya cudabûna ji Misrê kir, sedema wê jî ew bû ku di sala 1959an de Cemal Ebdilnasir zagona êlan rawestand. Rawestandina vê zagonê şêxên êlan ji girtin û xweyîtiya erdan bê par kirin.

Di sala 1970î de, ji bo ku desteserkirina li Dêrezorê misoger bike, rêjîma Sûrî du rêbaz bi kar anîn; a yekem lawazkirina binyada êlê di riya peydakirina nakokiyan di hundirê êlê de û piştguhkirina kategoriya şêxan û kategoriyeke ku di nava êlê de bê bandor bû, xist xwedî peyayên rêxstinî da ku li hemberî wan şêxan bisekinin, a duyem jî êlên mezin dûr xistin û rê li ber endamên van êlan girtin da ku nikaribin bi rolên mezin rabin. Her wiha çîna bercewazî bi ser xwe de kişand û hewildanên ku dixwestin destdirêjiyê li sawya rêjîmê bikin, piştguh nekirin. Ji bo ku rêjîm vê yekê baş bi cih bike, di sala 2009an de Serleşker Camii Camii[4] weke berpirsiyarê ewlehî û leşkerî li ser Dêrezorê danî û karîbû hin êlan bi ser rêjîmê de bikşîne, her wiha hin kursî di perlemana Sûrî de bi dest xistin.

[3] Zaroyên êlan li Dêrezorê, ji aramiyê ber bi şoreşê ve, dînamîkiya dijberî û faktorên aştiya xwecihî, rêxistina dadweriya ji bo jiyanê (Eledala min ecil elheyat).

[4] Serleşkerekî bi dilsoziya xwe ya li gel rêjîmê navdar e, jixwe navê wî di reşkujiya serokwezîrê Libnanê yê berê Refîq Elherîrî de navdar bû. Di şerekî li dijî rikberiya çekdar de hat kuştin.

Di bûyerên ku Sûrî tê re derbas bû, endamên êlên Dêrezorê xwedî roleke bibandor bûn. Hin ji wan di jiyana ramyarî û leşkerî de gihaştin peyayên herî bilind, weke Hesen Hiwêdî ku di sala 1980yî de bû serkarê giştî ji girûpa Ixwan Elmislimîn re. Sretîp Casim Elwan ku di yekîtiya Misir û Sûriyê de xwedî rol bû û di artêşa Sûriyê de rahênerê Hafiz Elesed û Mistefa Tlas bû[5]. Her wiha hin kesên din jî hene; wezîrê darayiyê Mihemed Elhisên yê ji êla Elcihêş[6] û Riyad Ferîd Hicab di sala 2011an de bû serokwezîr û vê dawiyê dev ji rêjîmê berda û bû rêveberek di Kiwalisyona Sûrî de û hwd. Jixwe ev di aliyê ramyariya hundirîn de.

Di ramyariya Sûrî ya derveyî de, êlên Dêrezorê di piştgiriya locistîk û di operasyonên leşkerî yên girûpên islamî ku li dijî hêzên Emerîkî li Iraqê piştî hilweşîna rêjîma Sedam di 2003yan de pêk tanîn, roleke sereke lîstin. Ew jî di riya rêdariya Saloxgerên Sûrî re. Armanca rêjîma Sûrî ji vê yekê ew bû ku hêzên Emerêkî di çirava Iraqê de bifetisînin û ziyanên mezin bigihînin wan da ku serokê Emerîkî Corc Boş dûrî dagirkeriya Sûrî û hilweşîna rêjîma wê bike. Cîgirê Serkarê Giştî yê Emrîkî yê ku çavdêriya çek û ewlehiya derveyî dike, di 16.9.2003an de li pêşiya komîteya perlemana Emerîkî bi van gotinan da xuyakirin: **Sûriyê di riya xaka xwe re rê li pêşiya şervanan vedike da ku derbasî Îraqê bibin û li dijî hêzên hevpeyman şer bikin. Her wiha tekez kir ku Sûrî derfet ji derbasbûna çekan li Iraqê berî şer û di şer de vekirbû û rêjîma Iraqê ya berê, êvara ku dê şer dest pê bikirana çekên kîmawî derbasî Sûrî kirin[7].**

Lê tirsa rêjîmê ku nikaribe desteserkirinê li ser van girûpên sunî yên tunderew ên li Dêrezorê bike û egera peydabûna tevgerên islamî yên radîkalî ku şaxek ji rêxistina Elqaîde ne hebe, hişt ku hişmendiya rêjîmê ya ewlehî û tundî, hişmendiya neteweyî û şovenî ya ku li cem hin endamên êlên Dêrezorê heye li dijî Kurdên Rojava bi kar bîne. Raperîna Kurdên Qamişlo di sala 2004an û belavbûna wê li tevahî bajarên kurdan ji encamên wê siyasetê bû. Her tim hêzên Sûrî yên ewlehiyê kiryarên xelkên Dêrezorê li her deverê li dijî Kurdan, piştguh dikirin, ta ku kiryarên wan di 12ê Adara 2004an de gihaşt lutkeyê. Di wê rojê de piştevanên tîma Fitiwê

[5] http://www.algherbal.com/2015/02/27/1994/

[6] Zaroyên êlan li Dêrezorê, ji aramiyê ber bi şoreşê ve, dînamîkiya dijberî û faktorên aştiya xwecihî, rêxistina dadweriya ji bo jiyanê (Eledala min ecil elheyat).

[7] http://www.voltairenet.org/article90005.html

ku temsîla Dêrezorê dikir êrîşî piştevanên tîma Cîhad ku temsîla Qamişlo dikir, kir. Ev êrîş bi kevir û çekên sipî yên ku berê bi xwe re anîbûn, pêk hat. Destpêkê dirûşmeyên nijadperstî gotin û dûvre kevir avêtin Kurdan, vê jî hişt ku milet hevdu dehif bide û di encamê de çend zarokan jiyana xwe ji dest dan. Ev tev bêyî ku hêzên ewlehî bilivin. Berovajî wê agir li hemberî sivîlan vekir, di encamê de hin şehîd ketin û hin birîndar bûn. Piştre rêjîmê dest bi girtina sivîlan kir û ew îşkence kirin û hejmarek ji wan kuştin. Her wiha endamên êlan di gelek bajarên Sûriyê de li dijî Kurdan bi kar anîn, vê jî derî ji şerekî dualî re vekir. Di dawiyê de jî ew raperîna kurdî vemirand.

Piştre rêjîmê xwest ku careke din vê dijberiyê gur bike, ew jî di riya kuştina Şêx Mihemed Maşoq Elxiznewî re (yek ji şêxên Neqşebendî) û hewldana rêjîmê ku hin niştecihên Dêrezorê bi vê kuştinê tawan bike. Lê hişyariya peyabilindên Cizîrê li hemberî vê yekê rawestiya û rê li ber şerekî nijadperestî girt.



Raperîna kurdan li hemberî destdirêjiyên şoveniyan, 12. 03. 2004

Dibe ku du armencên rêjîmê ji vê kuştinê hebin; yek ji wan ajaweyeke (fitne) nû di navbera Ereb û Kurdan de geş bike, ya din jî nameyeke zelal ji mirîdên rêça Neqşebendî re şand heke rojekê bixwazin xwe ji bin desthilatdariya rêjîmê vekişînin. Di kuştina Şêx Mihemed Elxiznewî de birayê Şêx Maşoq li Erebistanê, heman name hebû.

Hêj hewldanên Fitnê berdewam in; yek ji wan, hewldana şexê êla Elbegare Newaf Raxib Elbeşîr e yê ku kirêkarê saloxgerên Sûrî, piştre yê Saloxgerên Tirkî bû û niha jî yê saloxgerên Îranê ye. Hewl da ku bi çend şêxên din re agirê fitneyê gur bike, lê felsefeya neteweya demokratîk a ku serokê navneteweyî Ebdela Ocelan pêşkêş kir, ji hêla niştecihên herêmê û

payebilindên wê ve bi dilekî gerim hat qebûlkirin. Niştecihên Dêrezorê, Cizîrê ji xwe re weke cihekî ewleh dît û Rêveberiya Xweser li Rojava-Bakurê Sûriyê alîkarî baş bi wan re kir û parastina wan kir. Li hemberî vê jî, rêjîmê nikarîbû xwe li ser erebên sune ferz bike, ji ber ku hevpeyman bi Îran û mîlîsên wê yên nijadperest re girê dabû û gelek destdirêjî li ser mafên mirovan kiribû, destdirêjiyên rêjîmê gihaştibûn tawanên şer.



*Dêrezor..hêzên rêjîmê duyên kor û 3yên din dikuje[8].*

### 2- Êlên Dêrezorê piştî destpêkirina kirîza Sûrî di 2011an de:

Tevî ku rêjîmê desteserkirina xwe li ser Dêrezorê baş xurt kiribû, lê nikarîbû miletê wê bi ser xwe de bikşîne, ew jî li sedemên ku berî niha me anîne ser ziman vedigere. Dibe ku sedemên herî girîng ev bin: hişmendiya olî ya dogmaî, nepeydabûna demokratiyê, nehvesengiya derfetan, dilsoziya hinan bi serokê Iraqê yê berê Sedam Hisên re ê ku têkiliyên wî bi rêjîma Sûrî re ne baş bûn, her wiha xizanî û kêmbûna xizmetgozariyan tevî ku dewlemendiyên li herêmê pir in. Van gişan hişt ku hestên nerazîbûnê û daxwaza maf û jiyaneke birûmet li nik wan kom bibin. Van hestan di xwepêşandanên ku di 2011an de li dijî rêjîmê qewimîn, xwe dan pêş. Lê rêjîm jî bi tundî li hemberî van xwepêşandanan sekinî. Piştre ev çewsiandin bû kuştineke pilankirî û ji hêla her du aliyan ve pêk hat. Piştî ku xwepêşandan zêde bû û rêjîmê nikarîbû bi çewsandina ewlehî vê pirsgirêkê çareser bike, di 28ê Tîrmiha 2011an de, bajarê Dêrezorê dorpêç kir û xwest bi hêza leşkerî wan xwepêşandanan biçewisîne. Lê rewşa êlî ya herêmê û

8https://www.zamanalwsl.net/news/article/81739 /

veguhaztina kirîza Sûrî ber bi kirîzeke mezhebî ve, hişt ku bûyer rêyeke nû bigirin, bi taybet piştî ku Artêşa Azad hat damezrandin û komek leşker ji artêşa rêjîmê cuda bûn. Dûvre hin girûpên çekdar ava bûn, armancên wan ji hev cuda bûn; hin ji armanca wan berevanî bû û hin ji bo desteseriyê li ser bîrên petrol û gazê bikin û hin jî çete bûn da ku berjewendiyên hin aliyên herêmî û navneteweyî pêk bînin.

Lawaziya girûpên niştimanî yên çekdar û nekarîna êlan ji yekirina rêzên xwe re, rê li ber girûpên islamî yên tunderw vekir, da ku li herêmê baş bi cih bibin, weke Cebhet Elnusre û DAIŞ. Lewma şer bi şêweyekî cuda derket holê, mînak: Şerê di navbera rêjîm û oposizyonê de, şerê di navbera serokên êlan de li ser herêm û cihên zengîn û şerê di navbera Artêşa Azad, Cebhet Elnusre û DAIŞê de. Şer bû şerekî berjewendî û girêdayî ejindên ramyarî. Hemû aliyan jî rewşa sivîlan a aloz, weke birçîbûn, nepeydabûna xizmetgozariyan, wêranbûna binesaziyê (jêrxane), mirin, çûna karmendiyan û mewdanan, piştguh kir.

Di encamê de gelek winda bûn û gelekan jiyana xwe ji dest da, her wiha bi sed hezaran mirov penaberî herêmên biewleh li Cizîrê û dewletên cîran bûn. Vê jî tevlihevî çêkir. Vê tevliheviyê gelek êş û pirsgirêkên civakî, aborî û derûnî peyda kirin. Dibe ku bandora wan bi salan bidome û vegera ewlehî û avakirinê dûr bixe. Milet ji hêla rêberên xwe ên ku nikarîbûn yekîtiya wan çêkin, bi xiyanetê hatin tawankirin. Gelek jî li pey misogerkirina berjewendiyên xwe meşîn û bûn çete ji hêzên herêmî û navdewletî re û devê tifingên xwe dan pismamên xwe yên êlên din.

Her wiha her êlek bi dahatên diravî ên petrolê mijûl bû û her yekê dest danî ser bîrên petrolê ên li herêma wê, mînak: Desteserkirina Endamên êla Elbikêr a ku şaxê Elkebîse û Elmişrif e û beşdarbûna wan li gel êla Elbokemal di desteserkirina kargeha "Gaza Konîko" de, desteserkirina şaxê Elenabize ya ji Elbikêr li ser zeviyê Konîko yê petrolê, desteserkirina êla Elbokemal ji zeviyê Elumer ê petrolê re, desteserkirina hin girûpên Artêşa Azad yên ji êla Elbegare li ser Bîra Elmalihe, desteserkirina endamên şaxê Elmeşhûr-Elbegare li ser zeviya Dêro yê petrolê, desteserkirina tabûrên encûmena leşkerî yên li navçeya Mohesen-êla Elxabûr li ser zeviyê Elteym û Îstgeha wê ya zayîna kehrebeyê, desteserkirina Tugaya Elehwaz a ji

şaxê Elenabize-êla Elbikêr li ser embara bizûran a li herêma 10.km. Gelek êlan li ser parvekirina dahatan şer kir.

Piştî pênc salan ji temenê kirîza Sûrî, bi taybet di sala 2017an de û piştî tunebûna dilsoziya ji êl û serokên wê re, êdî endamên êlê dikarin bi hêsanî şerê bira û pismamên xwe bikin. Niştecihên Dêrezorê di navbera çar hêzên sereke de dabeş bûne, ew jî ev in: Hêzên rêjîma Sûrî, girûpên Artêşa Azad, DAIŞ û QSDê.

**Der barê rêjîma Sûrî de**

Piştî gurbûna şerê li Sûriyê, rêjîmê êdî nikarîbû destserkirinê li ser tevahî Dêrezorê bike û tenê mayîna wê li hin taxan bû, mînak: taxên Elcûre, Elqisûr, Herabîş, Elbexêliye û balafirxaneya Dêrezorê ya leşkerî. Van deveran nêzî 200,000 kesî dihewîne, piraniya wan ji herêmên din ê Dêrezorê penaber bûbûn û di rewşeke herî zehmet de dijîn û di bin destê rêjîma ku destesriyê li ser her tiştî dike, mane û her tişt di riya balafirxaneyê re digihêje milet. Alîgirên wê tenê ev mane: Hin kesên xwedî hişmendiyên şovenî, hin sîxûr, hin şêxên êlan, hin berciwaziyên ku reviyane bin sîka rêjîmê, hin endamên êla Elşiêtat ên ku Tugayê Siqûr Elfirat damezirandine, milîsên Ceyş Eleşair, milîsên Eldifa Elwetenî di taxên Elcibûre û Elqisûr de yên ku di bin desthilatiya rêjîmê de ne[9], her wiha Hizbulaha Libnanî, milîsên Zên Elabidîn û Elqaid Elxalid û ji bilî wan jî ên ku Îran alîgiriya wan dike[10]. Hemû alîgirên rêjîmê û hevlbendên wê yên ku endamên êlan in, tu tişt ji êl û pismamên xwe re yên li Dêrezorê pêşkêş nekir, lê belê wan berovajî vê yekê kir, ew jî bi vî rengî bû: tolhildana ji endamên êlên ku dijminên rêjîmê ne, alîkarî nedan pismamên xwe, li ser rewşa penaberan ranewestiyan, tenê xwesteka wan berjewendiyên wan bûn, biserketina rêjîmê tekez dikirin, şêwazeke nû bikaranîn ew jî di riya payeyan re desthilatî li ser sivîlan pêk anîn. Ji ber van sedeman jî rêjîm û milîsên xwe bi alîkariya endamên êlan ên ku pê re alîgir in, karîbû destserkirinê li ser Dêrezor û hin bajarên din bike. Di meha 11an a sala 2017an de van hêzan herêma rojavayê Feratê xist bin kontirola xwe.

[9] Di rewşine nepenî de, kuştina serkêşê Ceyş Eleşair li Dêrezorê yê ku alîgirê rêjîma Sûrê bû
[10] Dêrezor, bajarê jibîrbûyî, navenda Refîq Elherîrî ji bo Rojhilata Navîn.

**Ji bo Artêşa Azad:**

Gelek endamên êlan tevlî wê bûn, her wiha da ku şerê rêjîm û rêxistinên Islamî yên radîkalî bike, piştgirî ji derve girt. Lê tevî vê yekê nikarîbû xwe weke hêzeke sereke bide xuyakirin, her wiha nikarîbû parastina hevgirtina "Artêşa Sûrî ya Nûjen" a ku herêma Eltenef ji xwe re kiribû navend, bike. Hevpeymana Navneteweyî piştgirî dida vê artêşê da ku şerê terorê bike, lê li hemberî rêjîm, Cebhet Elnusre û DAIŞê têk çû. Bi awayekî resterast rola wê di mayîna sivîlan di bin desthilatiya rêjîm û DAIŞê de hebû. Piştre jî gelek kiryarên tund ji hêla milîsên Heşda Şabî ve li wan sivîlan hatin kirin. Ev tev ji ber lawazbûna stratejîk, pisporiya leşkerî û destserkirina hişmendiya şovenî li ser mejiyê piraniya rêberên wan. Ji ber vê hişmendiyê jî hevpeyman bi QSDê re pêk neanîn da ku Dêrezorê di riya operasyona Bagera Cezîrê re, rizgar bikin. Lewma jî endamên êlan ên ku tevlî Artêşa Azad bûn, berpirsiyariyeke sincî pir mezin hildigirin ser milên xwe û di pêşerojê de dê ji aliyê miletê Dêrezorê ve werin tawankirin.

Hin girûpên çekdar li Dêrezorê[11] "Encûmena Şêwirmend a Mucahidî Elşerqiye Ji Bo Şerê DAIŞê" saz kirin, paşê DAIŞ ew herêm dagir kir û ev meclis hilweşiya, ew girûp jî ev in:

**1- Tugaya Cafer Elteyar:** Endamên wê ji êla Elbokemal û hin êlên herêmê ne. Selîm Elxalid serkêşiya vê Tugayê dikir, vê Tugayê alikarî ji van aliyan digirt: Hin girûpên Kendava Erebî, Encûmena Leşkerî Li Herêma Rojhilat, Encûmena Şoreşgerên Dêrezorê, piştire jî alîkarî ji dahatên firotina petrolê ji bîrên Elwerd li çolistana Elbokemalê, girt. Peyman bi Ceyş Elislam re da ku şerê DAIŞê bikin, girê da.

**2- Tugaya Elixlas:** Ji ber nelihevkirina li ser parvekirina dahatên petrolê, ji Tugaya cafer Elteyar cuda bû. Endamên wê ji êla Elbokemal/Gundê Elşihêl bûn.

**3- Tabûra "Elhemze-Şoreşgerên Elşiêtat":** Ji ber pirsgirêkên êlî ji Tugaya cafer Elteyar cuda bû û zeviya Eltenik a petrolê desteser kir. Piraniya endamên wê ji êla Elşiêtat bûn.

**4- Tugaya Elqaqa:** Piraniya endamên wê ji êla Elqerian/şaxê Elbûewad in. Elî Meter û Ibêde Elehmed serkêşiya vê Tugayê dikin. Navenda wê jî

[11] Zaroyên êlan li Dêrezorê, ji aramiyê ber bi şoreşê ve, dînamîkiya dijberî û faktorên aştiya xwecihî, rêxistina dadweriya ji bo jiyanê (Eledala min ecil elheyat).

bajarokê Elqoriye ye. Ev Tuga ji ber pirsgirêkên hundirîn û hevrikiya li ser serwerî û takemafan, li ser çar beşan hat pervekirin.

**5- Tabûrên Ferat ên Islamî:** Serkêşê wan Ibêde Elehmed e ku ji Tugaya Elqaqa cuda bû û piştre tevlî Cebhet Elnusere bû.

**6- Cebhet Elqaqa û Elqaqa 112:** Piştî reşkujiya serokê Tugaya Elqaqa Elî Meter û piştî serwerî kete destê birayê wî Mehmûd Meter, Ji Tugaya Elqaqa cuda bû.

**7- Tugaya Elqaqa ya Islamî:** Mehmûd meter serkêşiya wê dikir û vê dawiyê tevlî DAIŞê bû.

**8- Tabûrên encûmena leşkerî li herêma rojhilat a girêdayî destaya erkanên Artêşa Azad:** Navenda wê li bajarokê ElMohesen bû. Pirsgirêk di navbera wan û endamên êla Elbûxabûr de yên ku ji artêşa rêjîmê cuda bûbûn, derketin.

**9- Ceyş Elqadisye:** Di herêma Elbisêre de ye. Serkêşê wê jî Ibrahîm Eletiye ye yê ku ji êla Elbikêr e. Ev girûp ji êlên Elbekêr û Elbegare pêk tê.

**10- Tugaya Zîqar:** Ji Ceyş Elqadisiye cuda bû. Piraniya endamên wê ji êla Elabid/hoza Elbegara ne.

**11- Tugaya Cinûd Elheq:** Serkêşê wê serdar "Hemed Elmihemed" e. Hemû endamên wê ji êla Elbegara ne. Ji ber dijberiyên li ser rêveberiyê tûşî çend cudabûnan hat. Girûpên ku jê cuda bûn ev in: Tugaya Şuhedai Bedir bi serkêşiya sitvan "Samir Şihade" ji şaxê Elbûereb/êla Elbegare, girûpa Elerûr bi serkêşiya Hisên Elebdela û şaxê Elhemed Elabid dinimîne, Tugaya Fursan Elxilafe ji şaxê Elebid Elcadir bi serkêşiya Amir Elbeşîr ji şaxê Elbûereb.

**12- Tugaya Ibnulqeyim:** Ev Tugay xwedî şêweyekî felsefî ye. Her wiha Tabûra Ehfad Ayişe bi serkêşiya Xalid Elehmed û Mihemed Elxidir. Piraniya endamên wê ji êla Elşiêtat/gundê Xeranîc in.

**13- Ceyş Elume:** serkêşê wê Ebû Yûsif Elşiêtî ji gundê Elkişkiye ye. Ji ber hin sedemên sincî ji Erebistanê berdanê, piştre tevlî DAIŞê bû. Piraniya endamên wê ji êla Elşiêtat/gundê Ebûhemam in.

**14- Tugaya Elhemze:** Serkêşê wê Mihêdî Elciêle ye. Piraniya endamên wê ji êla Elşiêtat/gundê Ebûhemam in. Ceyş Elume û Tugaya Elhemze bîrên petrolê yên li herêmên wan (zeviya Eltenik a petrolê) desteser kirin.

**15- Tugaya Elehwaz:** Serkêşê wê sitvanê yekem Ismaîl Elebdela ye. Piraniya endamên wê ji/êla Elbikêr/şaxê Elkibêse ne. Piştî ku bi Tevgera Ehrar Elşam re bû hevalbend, şerê DAIŞê kir.

**16- Koma Tabûrên Ebdela Kurê Zubêr:** Piraniya endamên wê ji êla Elbikêr/şaxê Elenabize/ bajarokê Xeşam in.

**17- Girûpên leşkerî yên li herêma êla Elbûseraya:** Tugaya Tariq kurê Ziyad bi serkêşiya Ibrahîm Eltaha, Tugaya Şehîd Muaz Elrekad bi serkêşiya Mihemed Elsalih ji şaxê Elbûşiêb û Tevgera Ehrar Elşam li Dêrezorê ji şaxê Elbûhemed/ bajarokê Buqris.

**18- Girûpên leşkerî yên li herêma êla Elbokemal**: Tugaya Muite bi serkêşiya Sedam Elnofel ji gundê Elşihêl. Berê hevalbendê Cebhet Elnusre bû, lê ji ber dijberiyên li ser parvekirina Petrolê jê cuda bû.

**19- Artêşa Ehil Elsune û Elcemae:** Ji Cebhet Elesale û Eltenmiye cuda bû. Alîkariyê ji hin girûpên ku li Erebistana Siûdî ne, digire.

**20- Tugaya Beşair Elnesir:** Di sala 2012an de ava bû. Serkêşê wê Tilas Elselame ye. Ev Tuga ji gelek kesên ku ji çend êlên li navçeya Elişare ne, pêk tê. Girêdayî Cebhet Elesale û Eltenmiye ye. Komeleya Hifiz Elturas Elislamî di riya Emîndarê giştî ji Cebhet Elesale û Eltenmiye li Sûrî Xalid Elhemad re, alîkariya vê Tugayê dike. Vê Tugayê şerê rêjîmê kir û weke sîxûran bi Cebhet Elnusre re beşdarî şerê li dijî YPGê li gundewarên Hesekê bûn, her wiha li dijî DAIŞê jî şer kirin.

Girûpên sereke ên ku Ceyş Sûriyê Elcedîde (Artêşa Sûrî ya Nûjen) ji wan pêk dihat ev in:

**Ji bo Cepehet Elnusre û DAIŞê:**

Rêxistina DAIŞê ya teror xwedî bandoreke mezin li ser niştecihên Dêrezorê bû. Herêm bû meydaneke vekirî ji şerê di navbera rêxistinên Radîkal, oposizsyon û rêjîma Sûrî de a ku Îran û Hizbulaha Libnanê piştevaniya wê dikirin. Gelek kiryarên tund li ser milet hatin meşandin û avahiyên bingehîn hatin hilweşandin.

DAIŞ ji bo ku êlan bi ser xwe de bikşîne siyaseta geşedan û tirsê li dijî wan bi kar anî. Ew jî di riya gedên (karakter) diravî û derûnî re, Mînak: Payeyên bilind dixistin destên wan û alîkariya diravî pêşkêşî wan dikir. Li kêleka wê jî siyaseta "jev cuda bike, tu yê bi ser bikevî" bi kar tanî. Di riya

endamên hin êlan re, dîlên hin êlên din ên girtî, didan kuştin. Komkujiya ku êla Elşiêtat tûşî wê hat, vê yekê tekez dike. Lewma DAIŞê dîwana Elelaqat Elame (Dîwana Têkiliyên Giştî)[12] ya li ser rewşên êlên parêzgehê radiweste, damezirand.

Cihê Dêrezorê û nêzîkatiya wê ji sînorê Iraqê re, roleke mezin di beşdarbûn û damezrandina milîsên çekdar de lîst. Ji ber ku hişmendiya dogmatîk a hin payebilindan a ku bandora wê li ser niştecihên herêm heye, herêm di navbera nijadperestên neteweyî û tunderwên islamî de dabeş kir. Gelek ji wan bi girûpên sunî re beşdarî şerê li dijî Emerîka û Ewrûpa bûn. Di riya alîgiriya çek, leşker û pereyan re, Dêrezor bû weke dergehekî locistîk ji bo piştgiriya wan girûpên Iraqî yên sunî. Vê jî hişt ku hin kesên ji Dêrezorê, di warê şer û rêxistinê de bibin xwedî pisporiyekê. Piştî sala 2011an dema ku şer bi awayekî mezhebî derket holê, jîngeheke guncav ji rêxistinên islamî yên radîkal re hat damezirandin û di nav êlan de baş belav bû. Weke Cebhet Elnusre ku beşek ji Elqaide li Sûrî ye û DAIŞ ku beşek ji Elqaide li Iraqê ye. Di sala 2012an de Cebhet Elnusre karîbû li gundên Elşihêl û Xerîbe, her wiha li Cedîdet Egêdat li rojhilata bajarê Dêrezorê ya ku hin endamên êla Elegêdat lê dijîn, xwe bi rêxistin bike. Piştre hin endamên êlên din ên ku di nîvê sala 2011an de ji girtîgeha Sêdnaya hatin berdan, beşdarî wan bûn û di çileyê 2012an de ji wan kesan Cebhet Elnusre hat damezirandin. Piştre jî gelek endamên êlên din jî bi aliyê xwe ve kişandin.

Vê rêxistinê karîbû êlên herêmê bi ser xwe de bikşîne, lewma hêzdariya wê li herêmê xurtir bûbû. DAIŞê ji vê rewşê qet nerazîbû, ji ber ku wê jî dixwest di riya êla Elbikêr re hêzdariya xwe li herêmê zêde bike. Ew jî di riya sûdgirtina ji nakokiyên di navbera êla Elbikêr û pismamên wan êla Elbokemal de yên ku li gundê Elşihîl dijîn û çend bîrên petrolê yên weke Elumer û Konîko desteser kiribûn. Piştî ku DAIŞê di 2014an de damezrandina dewleta xwe ya angaştî li Sûrî û Iraqê ragihand, nakokiya di navbera her du rêxistinan de zêdetir bû.

---

[12] DAIŞ û êl li Dêrezorê, . https://www.aljumhuriya.net
Gelo êl dê şer li Sûriye bi dawî bikin? Dergehê Tevgerên Islamî.
Nakokoyên DAIŞ û Elnusre dibin sedema şerên Êlan http://www.annafir.com/syria/2014/03/28/1166

Sedema beşdarbûna êlên din li nava DAIŞê bi taybet êlên biçûk, ew e ku êl û malbatên mezin û bihêz hemû jêderên hêzê û mewdanan desteser kiribûn û rola êlên din piştguh kiribûn û ew xistibûn bin desthilatdariya xwe.

Piştî kuştina Dr. Ebulreyan ku di tevgera Ehrar Elşam de rêveber bû û bi Cebhet Elnusre re li Girê Sipî hevalbend bû, şerê çekdarî di navbera her du rêxistinan de dest pê kir. Cebhet Elnusre bi saya alîkariya êlên Elbûkamil, Elşiêtat, Elbûseraya, Elbûhesen, Elqeliyîn û hin endamên êla Elbegare hişt ku DAIŞ bi paş de vegere û vekişe. Paşê Cebhet Elnusre kiryarên tolhildanê li dijî malbatine ji êla Elbikêr ku şaxek ji êla Elegêdat in, bi kar anî. Lê DAIŞê piştre karîbû careke din hêzdariya xwe li herêmê xurt bike. Ew jî di riya bêalîkirin an jî kişandina hin êlan bi ser xwe de, weke: Êla Elqeran yek ji şaxên êla Elegêdat li bajarê Elqoriye ye, roleke wê ya sereke di avakirina Tugaya Elqaqa de ku mezintirîn girûpa leşkerî li Dêrezorê ye, hebû. Girûpên Mohesen ên ji êla Elbûxabûr û hinên din jî xwe dane aliyê DAIŞê. Bi vî awayî DAIŞê karîbû di 20.7.2014an de tevahiya Dêrezorê desteser bike û hemû êl jî ketin bin serweriya wê. Tenê hin taxên bajêr û balafirxaneya leşkerî di bin destê rêjîmê de man. Piştre DAIŞê dest bi operesyoneke berfireh li dijî dijminên xwe yên berê kir bi taybet êla Elşiêtat. Di encamê de zêdeyî 700 kesî kuşt û bi sedan girt an jî ji gundên wan derxist. Her wiha çek jî ji destên êlan derxist û tenê di nav hevalbendên xwe de hişt. DAIŞê dîwana Elelaqat Elame (Têkiliyên Giştî) damezirand, armanca wê ji vê dîwanê ev bû: Hevalbendiyan bi êlan re bike da ku wan bide aliyê xwe, nasnameya nijadperestî tune bike û ji bo ku dijminên xwe yên ku xwe radest kirine bi zorê tevlî perwerdeyên tobedariyê bike[13]. Piraniya şêxên êlan, ji ber ku hin ji wan hevalbendên rêjîmê bûn weke şêx Mihena Elfeyad (şêxê êla Elbûseraya) û hin jî hevalbendên Cebhet Elnusre bûn, ne li Dêrezorê bûn. Vê yekê hişt ku DAIŞ xwe bispêre kesên di rêza duyem ên di rêveberiya êlê de.

Ji ber qelsbûna birêvebirina DAIŞê ji herêmên di bin destê xwe de, desthilatdariya leşkerên biyanî li ser biryarên DAIŞê, topbarankirina cihên wê ji hêla Hevpeymana Navneteweyî, balafirên Rûsî û Sûrî û ziyanên mezin ên ku moşekên Îranî gihandinê ew jî piştî operasyona xwekujiyê ya

[13] Perwerdeya tobedariyê: Ev perwerde hin tiştên bingehîn di eqîde, fiqih û hukmên cîhadê de vedihewîne. Dibe ku ev perwerde çend hefteyan an jî çend mehan bidiome.

ku DAIŞê nêzî perlemana Îranî û gora Xumeynî[14] di 7.6.2017an de pêk anî, ji ber van sedeman bi hezaran sivîl koçber bûn, bingeha jêrîn hilweşiya, xizmetguzarî kêm bû û heyber buha bûn. Lewma nerazîbûna şêniyên herêmê li ser DAIŞê zêde bû û hişt ku gelek ji wan tevlî girûpên ku şerê DAIŞ dikin, bibin. Hin tevlî milîsên ku alîgiriya rêjîmê dikin, bûn, hin jî tevlî QSDê bûn weke Encûmena Dêrezorê ya Leşkerî û hinên din jî tevlî girûpên Artêşa Azad ku Ceyş Isûd Elşerqiye, Hêzên Mexawîr Elsewre û Ehrar Elşerqiye wê dinimînin, bûn. Rêjîmê, di sala 2017an de bi laîkariya hêza asîmanî ya Rûsî û hêza bejahî ya Îranî û bi alîkariya milîsên Şîî yên cihêwaz, hêza xwe vegerand. Ji ber ku Dêrezor xwedî petrol û cihekî stratejî yê girîng ji bo Îranê ye, ew û milîsên xwe giringiyê didinê. Îran dixwaze rêyeke bejahî di navbera Tehran û Bexda ta Şam û Beyrûtê veke. Van hêzan karîbû hin berjewendiyên xwe pêk bînin, lê piştî ku Encûmena Dêrezorê ya Leşkerî tevlî QSDê bû, QSDê di 9.9.2017an de dest bi operasyona Bagira Cizîrê kir, da ku bi alîkariya Hêzên navneteweyî, Dêrezorê rizgar bike. Sedemên vê operesyonê ev bûn: Rizgarkirina sivîlên di hemû herêmên Sûrî de bû. Li gorî felsefeya neteweya demokratîk a ku Rêber Apo pê bang dike, didît ku parastin û alîkarî erkekî neteweyî ye. Penaberên ku di kampên Elhol û Elşedadê de bûn, Zor û zehmetî dikşandin û ji ber tirsa ji kuştin û kiryarên tund ên ku ji hêla rêjîm, milîsên Îranî û girûpên islamî ve dihat bikaranîn, venedigeriyan malên xwe. QSDê Ji ber van sedeman û tevî ku dest bi operasyona Xezeba Feratê ji bo rizgarkirina Reqayê kiribû, dest bi vê operesyonê jî kir. QSDê tevî hemû astengiya serkeftinên girîng pêk anîn. Rûberên berfireh li rojhilata Feratê bi alîkariya xelkên herêmê rizgar kir. Li hemberî hemû êrîşên rêjîm û hevalbendên wê û êrîşên DAIŞê, rawestiya. QSDê bi dehan sivîl rizgar kir û birin herêmên ewleh û gelek cihên stratejîk jî rizgar kir. Hemû hewildanên rêjîm, DAIŞ, Artêşa Azad û oposizyona Şovenî ya hevalbenda Tirkiyê ji bo ku di riya belavkirina agahî û nûçeyên derew re wêneya QSDê reş bikin, bi ser neketin.

[14] http://www.dw.com/ar



Siyaseta DAIŞê li dijî şêniyên Dêrezorê[15]

Mijûlbûna QSDê bi rizgarkirina Reqayê, fişara Tirkiyê li ser Kantona Efrînê û dorpêçkirina aborî li ser Rojava-Bakurê Sûriyê, van sedeman rizgarkirina Dêrezorê ji destê DAIŞê li ber QSDê dereng xist. Lewma hêzên rêjîmê desteseriya xwe li ser bajarê Dêrezorê pêk anî. Tiştên ku alîkariya rêjîmê kir ev in: Alîkariya mezin a ku ji balafirên Rûsî û milîsên Şîî bi dest xist. Her wiha xiyaneta DAIŞê û neşerkirina Artêşa Azad ji ber hişmendiya wê ya dogmatîk û şovenî. Rêjîm û hevalbendên xwe û bi alîkariya milîsên Heşda Şabî ya Şîî li Îraqê karîbûn dorpêçkirineke giştî li ser tevahî bajarê Elbokemalê a ku li ser sînorê Iraqê ye, bi dest bixin. Vê yekê jî hişt ku şêniyên herêmê bikivin bin desthilatdariya mezhebî ya şîî. Van sedeman hemiyan hişt ku xelkên herêmê bêhtir hemahengiyê bi QSDê re xurt bikin û xwe ji hişmendiya dogmatîk ya şovenî ku rêjîma Sûrî û Iraqî û rêxistinên radîkal di serê wan de çandibû, rizgar bikin. Her wiha hişt ku heval û dijminan ji hev nas bikin û hewl bidin ku bajar û gundên xwe rizgar bikin da ku bi awayekî serbest û li gorî nirxên civakê yên baş jiyan bikin. Dibe ku tecrubeya Rojava-Bakurê Sûriyê ku li ser jiyana hevbeş û xweparastin ku li ser bingehê Neteweya Demokratîk ava bûye, nimûneyeke pir baş be ji herêma Dêrezorê re, da ku xizmeta civaka xwe bike, wê bi pêş bixe û xwe ji şer û tolhildana êlî rizgar bike.

DAIŞ stratejiyeke taybet bi xwe, bi kar anî da ku destesrkirina xwe li ser endamên êlan xurt bike û girûpên leşkerî ên ku ne pê re ne, belawela bike. Jixwe ev girûp vê dawiyê di navbera rêjîm û Artêşa Azad de li herêmên derveyî Dêrezorê belav bûn. DAIŞê ji bo ku desteserkirina xwe xurtir bike,

[15] http://www.islamist-movements.com/33070

hewl da ku tirsê belav bike û çekan ji endamên êlan bistîne û li eniyên şer li Iraq û Sûriyê belav bike.

Hêzên me berî niha qala wan kir, tu destkeftin ji bo niştecihên Dêrezorê pêk neanîn, lê belê êş û azar li wan zêde kirin. Hişmendiya şovînî ya ku Partiya Bas, Nasiriyîn, Ixwan Elmislimîn, Selefî û ji bilî wan di serê milet de çandibû, bûye weke sînorekî di navbera gel de ku jiyana hevbeş nepejirînin. Ev yek di hişmendiya şovînî ya li cem endamên êlên Dêrezorê ku ji QSDê[16] re nebûn hevalbend, xuya bû. Vê hişmendiyê nehişt ku êl beşdarî QSDê bibin ji bo ku herêmê azad bikin, demokrasiyê bi cih bikin û rêvebirina herêmê radestî encûmeneke sivîlî bikin, da ku ev encûmen vegera koçberan misoger bike, xizmetguzariyê pêşkêş bike û herêmê ji nû ve ava bike. Tecrubeya rizgarkirina Minbic, Tebqe û Reqayê mînakeke xurt e ji jiyana hevbeş re.

Dema ku hezarên sivîlan ji endamên êlan ber bi herêmên ewleh ên Rojava ve koçber bûn û rêveberiya vê herêmê pêşwaziya wan kir, ewlehî ji wan re peyda kir û li wan xwedî derket, nerîna wan li ser miletên Rojava ber bi başiyê ve guhert. Wêneyê sexte û nedurist ê ku rêjîm, opesizyon û rêxistinên radîkal di serê wan de çandibû, zelal bû. Lewma li têkiliyên xwe yên bi QSDê re vegeriyan.

Ji ber mijûlbûna QSDê bi rizgarkirina Reqayê re, rêjîm û hevalbendên xwe hewl da ku ji lawaziya DAIŞê sûdê bigirin, lewma dest bi operasyona xwe ya leşkerî ji bo destesrkirina li ser Dêrezor û gundewarên wê, kir. Yanî herêm careke din li xala sifrê vegeriya û tundî ji nû ve lê dest pê bû. Bi vê yekê Encûmena Dêrezorê ya leşkerî hat damezirandin û tevlî QSDê bû. Her wiha Encûmena Dêrezorê ya sivîlî jî hat damezirandin û gelek endamên êlan tevlî bûn, di nav wan de hin endamên êlên Elşiêtat û Elbegare bûn ên ku ji Hêzên Elnuxbe vekişiyabûn. Ev hêz jî girêdayî Serokê Îtilafê yê berê Ehmed ElCerba ye. QSDê operasyona Bagera Cizîrê ji bo rizgarkirina Dêrezorê, ragihand. Tevî ku QSDê bi operasyona Xezeba Feratê mijûl bû, karîbû rûberên berfireh û cihên stratejîk weke zeviyên enerjiyê (Elumer û Konîko), rizgar bike û bi hezaran sivîl birin herêmên ewleh. Yanî QSDê zêdeyî %85 ji rûbera li rojhilata Çemê Feratê rizgar kir.

[16] Hêzên Sûriyaya Demokratîk:Kurtenivîsa wî bi kurdî "QSD" e, bi erebî "قسد" e û bi ingilîzî "SDF" e.

### Çaremîn: Têkiliyên êlên Dêrezorê bi Tirkiye û Îranê re:[17]

Nakokiya di navbera Tirkiye û Îranê de, vedigere sedên salan. Piştî cenga Caldîranê di sala 1514an de, sînor di navbera her du dewletan de hat destnîşankirin, zencîrek ji şer û nakokiyên siyasî û civakî di navbera emperatoriya Osmanî û Sefewî di navbera 1623 û 1636an de, dest pê bû. Armanca wan jî desteserkirina li ser Iraqê bû. Ev şer bi serkeftina Osmaniyan û tevlîkirina Iraqê li Emerotariya Osmanî bi dawî bû. Piştî şerê cîhanê yê yekem di sala 1914-1918an de Iraq ji destê wê çû.

Tenê tiştekî ev her du dewlet digihandin hev, ew jî binpêkirina mafên kurdan bû. Ev yek di peymana Qesra Şêrîn a di navbera Osmanî û Sefewiyan di sala 1639an de hat lidarxistin, xuya bû. Ev yek hêj bêhtir di helwesta wan a li hember Rêveberiya Xweser de ku di riya wê re kurd û pêkhateyên din mafê xwe standin, zelaltir bû. Her wiha di helwesta wan a li hember refrandoma çarenûsê ya ku li başûrê Kurdistanê pêk hat de jî zelal bû.

Piştî hilweşîna Emperatoriya Osmanî û parvekirina herêmê di navbera Ferensa û Berîtaniya de, têkiliya di navbera Tirkiye û Dêrezorê de qut bû. Êl li kêleka hêzên Elşerîf Hisên sekinîn û karîbûn Osmaniyan têk bibin û wan ber bi bakur ve vekişînin. Bi destpêkirina kirîza Sûrî re di sala 2011an de, gelek endam û şêxên êlan ji ber şerê ku destê Tirkiye jî tê de hebû[18], koçî herêmên ewleh û dewletên cîran di nav de Tirkiye jî, bûn. Tirkiye jî alîkariya locistîk ji opesizyona ku li Ixwan Elmislimîn vedigere, pêşkêş kir. Bi pêşveçûna bûyeran li Sûrî, opesizyona girêdayî Tirkiye qels bû. Ya ku gelekî Tirkiy bêzar dikir, damezirandina Rêveberiya xweser bû ku weke metirsiyekê li ser ewlehiya xwe ya neteweyî didît. Lewma ev yek ji xwe re kir bihane da ku destdirêjiyê li ser Sûriyê bike, bi tayebet piştî dagirkirina wê ji Cerabuls, Bab, Izaz û Gundewarên Helebê re, ev yek diyar bû. Ev tev jî ji bo ku tecrubeya demokratîk a Rojava-Bakurê Sûriyê hilweşîne. Ew jî ji

---

[17] http://www.alhayat.com/Articles/19484698
http://www.orient-news.net

[18] Ebdilezîz Elhemada yê êla Elbikiyer û Rihêman Kewan Elcibara yê êla Elborehma, di rêya alîkariya hin şêx û rîspiyên êlên din re, her wiha di rêya encûmena hoza Elbekara, encûmena Elşiêtat û encûmena Elboseraya re û di rêya hin kesayetên leşkerî re, encûmena hoz û êlên Dêrezorê li bajarê Orfayê ava kirin. Zaroyên êlan li Dêrezorê, ji aramiyê ber bi şoreşê ve, dînamîkiya dijberî û faktorên aştiya xwecihî, rêxistina dadweriya ji bo jiyanê (Eledala min ecil elheyat).

ber ku  ev tecrube li dijî pirojeya Tirkiyê ye ya ku dixwaze desteserkirinê li ser milet û mewdanên herêmê bike.

Tirkiye bi hemû awayan hewl dida ku fitneyê di navbera pêkhateyên bakurê Sûriyê de geş bike. Ji bo ku vê yekê pêk bîne, xwe gihand şêx û endamên êlan ên ku li Tirkiye dijîn û di nav girûpên Artêşa Azad de cih digirtin. Bi hemû awayan hewl dida ku êlan bi çek bike da ku şerê kurdan bikin. Nimûne li ser vê yekê Newaf Raxib Elbeşîr şêxê Elbegare bû yê ku serkêşiya girûpeke sîxûran dikir da ku şerê Serê Kaniyê bikin, lê vê dawiyê têk çû. Her wiha Tirkiye hewl da ku artêşa êlên Herêma Ferat û Cizîrê mîna Diri Elfurat (Mertala Feratê) damezrîne, ji bo vê yekê jî çend civîn di 2017an de li dar xist. Ev civîn di navbera saloxgerên Tirkiye, hejmarek serbazên ku ji artêşa Sûrî cuda bûbûn, serokê hikûmeta Sûrî ya Demkî Cewad Ebulheteb û hejmareke ji şêxên êlên mîna Egêdat, Begare, Şiêtat, Benî Sexir, Bûdelîl, Bikêr, Meşahide, Zefîr û ji bilî wan bû. Hemû aliyan li ser şerê QSDê, rêjîm û DAIŞê li hev kir. Di rastiyê de armanca wan a sereke şerkirina QSDê û têkbirina pirojeya wê ya demokratîk bû. Lê wan nikarîbû armanca xwe pêk bînin, ji ber ku endamên êlan bi wan re ne alîkar bûn. Hêj Tirkiye li derfetan digere da ku armanca xwe pêk bîne. Ragihandina wê jî her roj  hewl dide ku rastiyan biguherîne û fitneyê belav bike da ku pêkhateyên Rojava-Bakurê Sûriyê li dijî hev rake.

Ji bo Îranê jî, herêma Dêrezorê weke cihekî pir girîng e. Ew jî ji ber van sedeman:  Cihê wê yê stratejîk di pirojeya Îranî de û dewlemendiya wê ji aliyê petrol, gaz û fosfatê ve û dibe ku yoranyom jî lê hebe, ji ber ku gelek gotin piştî topbarankirina Israîl ji Elxeber re, li ser hebûna yoranyomê çêbûn. Îran bi hemû awayan hewl da ku xelkên herêmê bi ser xwe de bikşîne, lewma dest bi operasyoneke şîatiyê li ser xizan  û nexwendan kir, ji ber ku ew çîna ya herî zêde li herêmê ye. Her wiha hewl dida ku koka hin êlan bighîne Alulbeyt û Îmamên şîa (weke êla Elbegare). Tevî ku karîbû hejmareke baş bi alîkariya rêjîmê bike şîî, lê di heman demê de rastî astengiyan dihat, ew jî ji ber ku rastî hişmendiya neteweyî ya Erebî û mezheba sunî dihat.

Piştî destpêkirina kirîza Sûrî di sala 2011an de, Îran li kêleka rêjîmê beşdarî şer bû û di nav şîa de Cîhad ragihand. Şîiyan ji Sûrî, Îran, Iraq, Libnan, Efxanistan, Misir, Yemen û ji bîlî wan, berê xwe dan Sûrî. Êlên Şîî

yên li Dêrezorê piştgirî dan rêjîmê, vê jî hişt hin girûpên Sune tolê ji wan bixwazin, bi taybet ji şîiyên bajarokê Hetle[19]. Her wiha Îranê piştgirî da êlên Sune yên bi rêjîmê re û hewl da ku Heşda êlan damezrîne, da ku ew jî weke Heşda Şabî ya Iraqê be. Kesê ku ji bo serkêşiya Heşda êlan hat pêşinyarkirin, şêxê êla Elbegare Newaf Raxib Elbeşîr bû, yê ku dev ji xizmeta saloxgerên Tirkî berda û berê xwe da saloxgerên Îranê, nemaze piştî ku koka êla wî gihandin Îmamê Şîî (Mihemed Elbaqir).

Di sala 2017an de, piştî ku QSDê Reqa rizgar kir û berê xwe da Dêrezor û herêma rojhilata Firêt, rêjîm û milîsên Îranê herêma rojavayî Feratê, Dêrezor, Meydîn û Elbokemal, zû desteser kirin ku roleke Heşda Şebî ya mezin di destesrkirinê de hebû. Vê jî tirsa vekirina rêyeke bejahî ku Tehranê bi Bexda, Şam û Beyrûtê ve girê bide,  li cem dewletan çêkir. Ev jî dê armancên Îranê pêk bîne ku dixwaze hemû gelên herêmê yên ku ne şîa ne û ji xwe re kirine armenc, her wiha şîayên ku ne pê re ne.

**Dêrezor piştî DAIŞê û hevrikiya serweriyê li serê:**

Piştî şeş salan ji temenê kirîza Sûrî, herêm di navbera rêjîm û QSDê de dabeş bûye; QSDê herêma rojhilata Feratê desteser kiriye û rêjîmê herêma rojavayê Feratê û bajarên Dêrezor, Meyadîn û Elbokemalê desteser kirine.

Qelsiya rêxistina endamên êlan û parvebûna wan di navbera rêjîm, opesizyon, Cebhet Elnusre û DAIŞê de, gelek astengî û êş bi ser wan de anîn û herêm bi dehên salan bi paş de vegerand. Bajar di van şeş salan de rastî gelek topbaranên balafirên Hevpeymana Navneteweyî, Rêjîm, Rûsiya û Îranê hat. Her wiha rastî şerê di navbera girûpên çekdar ên cihêreng û Rêjîmê de jî hat. Bi awayekî giştî %70-80 ji herêmê xira  bûye. Her wiha bi hezaran kes hatin kuştin, winda bûn, an jî penaber bûn. Çend nifş ji dibistanan dûr ketin. Ev ji bilî hişmendiya ku DAIŞê di serê xelkên herêmê de çand. Her wiha awayê êlî yê herêmê û kevneşopiyên wê, dê roleke wê ya neyînî di pêşerojê de hebe, bi taybet meseleyên tolhildan û hisabjêxwestinê, ew jî ji ber tundiya şerê di navbera êlan di bin siya serkêşiya girûpên cuda de, weke Egêdat, Şiêtat, Begare û ji bilî wan. Tevî ku DAIŞ dê ji herêmê vekişe jî, lê dê bihêle dijberî di navbera êlan de

[19] http://arab-worlds.blogspot.com.tr/2013/06/blog-post_8235.html

bimîne. Yanî dê herêm di bin astengiyan de bimîne û dibe ku kiryarên li dijî mafên mirovan li ser wan pêk werin.

Piştî ku herêm ji hêla aliyekî ve were desteserkirin, tirsa tolhildanê dimîne. Ew jî ji ber ku şer di navbera girûpên hin êlan û rêxistinên çekdar de, di navbera du êlan de an jî bêhtir, an jî di navbera endamên heman êlê de, hebû. Ev tev ji ber nakokiyên di navbera rêxistinên çekdar û hevalbendên wan ji êlan, nekokiyên li ser bîrên petrol û heyberan û nakokiyên kesayetî û êlî.

**Hin mînak[20] li ser şerê di navbera êlan de:**

- Şerê di navbera Cebhet Elnusre û endanên şaxê Elesaf/ êla Elbûseraya li gundê Elmesreb. Sedema wî jî daxwaza Cebhet Elnusre ku Sehrîca (tank) petrolê ya ku jê hat dizîn vegere. Cebhet Elnusre girûpin ji êla Elbokemal û Elbegare dan hev û dest bi şer kirin. Di encamê de nêzî 42 kes ji her du aliyan hatin kuştin.
- Şerê di navbera êla Elbegare û êla Tey de ya ku li gundê Cezret Elmîrac dijî. Sedema şer dijberiya li ser jeneratoran bû. Di encamê de 14 kes hatin kuştin, di nav de biraziyên şêx Hacim Elesed Elbeşîr jî hatin kuştin. Her wiha girûpên Artêşa Azad jî ji bo alîkariya Begare bikin, beşdarî şer bûn.
- Kuştina bi sedan ji êla Elşiêtat li ser destên êlên din ên ku ji hêla DAIŞê ve hatibûn erkdarkirin.

**Em dikarin pêşeroja herêmê bi çend xalan zelal bikin:**

1. **Herêma di bin destê rêjîmê de ye:** Tê pêşbînîkirin ku rêjîm dê li siyaseta xwe ya berê veger. Dê ji nû ve dest bi girtin û lêgerîn û kuştina der heqê her kesê ku berî niha şerê wî kiribû yan jî bi awayekî aşîtî li hemberî wî sekinîbû, bike. Yanî dê herêm vegere xala sifrê. Ev jî dê bihêle gelek sivîl vegera li malên xwe nepejirînin û dibe ku careke din çekan li dijî rêjîmê hildin. Ya ku vê yekê tekez dike, nepejirandina endamên êlên ku di Artêşa Azad de ne, ji mayîna rêjîmê di Dêrezorê de û daxwaza şer li cem wan heye. Her wiha endamên DAIŞê yên ku xwe diyar nekirine dê çalakiyên xwe yên mîna teqîn berdewam bikin, bêyî ku guh bidin ewlehiya niştecihan.

[20] Zaroyên êlan li Dêrezorê, ji aramiyê ber bi şoreşê ve, dînamîkiya dijberî û faktorên aştiya xwecihî, rêxistina dadweriya ji bo jiyanê (Eledala min ecil elheyat).

Ev ji bilî tirsa neteweyî ya ku herêmê ber bi meydaneke Îranî ve bibe. Ev jî dibe sedem ku vegera ewlehiyê dereng bimîne.

2. **Ji bo herêma ku QSDê rizgar kiriye:** Dê weke hemû herêmên ku di bin rêveberiya wê de, be. Her wekî geşkirina rola Encûmena Dêrezorê ya Sivîlî ya ku ji endamên herêmê pêk tê. Ev encûmen dê li ser van tiştan raweste: peydakirina xizmetguzarî, ewlehî, heyberên xwarinê, vekirina dibistanên dûrî hişmendiya şovînî û dokmatîk a olî, xurtkirina demokrasî û avakirinê. Dê dahatê petrolê ji bo vê yekê werin bikaranîn. Her wiha dê rê li ber vegera sivîlan were vekirin û dê nasnameya neteweyî û jiyana hevbeş di riya felsefeya neteweya demokratîk re were geşkirin. Demokratî, peydabûna kar û tunekirina nijadperestiyê ji tiştên ku herêmê bi salan winda kirine. MSDê vê yekê jî pir dizane.

Hişmendiya desthilatdariya gişgirî ya rêjîma Sûrî û hevalbendên wê, ku di riya şer re be jî, dê berê rêjîmê ber bi desteserkirina herêmê ve bidin. Lewma gerek e niştecihên herêmê xwe bikin yek da ku karibin li hemberî fitne û pilanên ku dibe ji hêla hin aliyan ve werin ristin, rawestin. Ev fitne dê ji hêla şaneyên veşartî yên rêjîmê, hevalbendên wê û opesiziyona xwedî hişmendiya şovînî û dokmatîk a olî ve, were ristin. Ev jî dê gelek astengiyan ku li pêşberî Encûmena Dêrezorê ya sivîlî û peyabilindên neteweyî derkevin, bi xwe re bîne.

Ji hinga ku ev êl li vê herêmê bi cih bûne, hişmendiya êlperestî ya ku xwe dispêre desthilata êl û hêzê, ji hebûna xwe re kirine bingeh. Ev yek berê di dijberiya wan a li ser çêrgehan û niha jî li ser petrolê, tê xuyakirin.

Êlan nikarîbû xwe ji van regezan rizgar bikin û nikarîbûn xwe li ser bingha jiyana hevbeş û nasnameya neteweyî bikin yek, lewma jî bûne nêçîra alîyên şer li Sûrî. Her wiha hin jî ketin tora pilanên ku tên ristin. Ev alî jî dibe ku rêjîm be an jî hêzên herêmî û neteweyî bin. Ev jî sedema sereke ye ku nahêle pêşketin li herêmê çêbe û tim astengiyan bikşîne. Lewma jî du rê li pêşiya wan hene; yan li rêjîmê vegerin û çewsandin û hişmendiya wê ya şovînî bipejirînin, an jî demokratî û felsefeya neteweya demokratîk bipejirînin.

Rêberê neteweyî Ebdela Ocelan dibêje: "Gihaştina şaristaniya koletiyê ta asta impiryalîzimê, ji aliyê pêkhateyên etnîkî ve, tê wateya ku gihaştiye qonaxa komên etnîkî yên zane." Mirov dikare vê qonaxê ji aliyê pêşketina dîrokî ve bi vî awayî bişopîne:...

Fidraliyên ku hatin damezirandin (fidraliya êlan) du encam li pêşiya wê hebûn; an serkeftin, yanî navendiyeke mezintir û avakirina dewletine xwedî bajarine navendî, yan jî binkeftin, yanî belavbûn û hewldana xweparastinê di riya çûna li çiya û çolistanan re, yan jî ji çîna desthilatdar re bibin dîl û di nav de bihelin. Her tim dek û dolabên jiyanê bi vî awayî dizîvirin.

Ev rêgeza hişmendiya êlî di nava xwe de hişmendiyeke neteweyî û lipaşmayî "ne weke gelekî an jî neteweyekî" dihewîne. Hişmendiya neteweyî piştî hişmendiya êlî tê û piştre pêş dikeve û ji wê derbas dike. Cihên ku hişmendiya êlî tê de xurt be, hişmendiya neteweyî tê de zû bi pêş nakeve. Avakirin û hişmendiya neteweyî gaveke nû di qonaxên ku binyada êlî tê de ne bes be,  an jî astengiyekê çêdike, dide. Ev gav bi piranî siyasî an jî leşkerî ye.  Em van pêşveçûnan di dahûrandinên ku di dîrok û erdnîgariya Rojhilata Navîn de çêdibin, dibînin..."

**Di dawiya lêkolîna me de em gihaştin van encaman:**

Rêjîma Sûrî di riya partiya Bas a şovînî re, hizirên şovînî bi navê neteweyitî û kûrahiya netewperstiyê, di serê gel de çandiye. Ji aliyekî din ve îran jî hewl da ku hizrên mezhebî di riya belavkirina şîîtiyê re di mejiyan de biçîne. Her wiha bi navê ola islamî, rêxistinên terorîst ên weke Cebhet Elnusre û DAIŞê olperestiya mezhebî di mejiyan de çand. Ev jî bûn sedema kuştin, talankirin û koçkirina bi hezarên sivîlan ji herêmên xwe.

Çareserî jî di felsefeya neteweya demokratîk de ye ya ku ramangêrê navneteweyî Ebdela Ocelan bi pêş xistiye. Ev felsefe hemû netewe û çandên cihêreng vedihewîne, ji ber ku dewlemendiyek ji welêt re ye. Olê di meydana çandê de bêyî ku têkildarî siyasetê be, bi cih dike. Rêzgirtinê di navbera olan de çêdike û rêgeza jiyana hevbeş a li ser bingehê demokratiyê ava dike. Demokratî di nêrîna Ramangêrê Navneteweyî de, ew rêveberiya xweserî ye ya ku hemû kes di hemû aliyan de (siyasî, çandî...) beşdar dibin. Demokratî hevsengiyekê di navbera kes û civakê de diafirîne. Yanî neteweya demokratîk ne tenê hevbeşiya hişmendî û çandî dipejirîne, lê belê jê zêdetir yekîtiyê di navbera hemû hêmanên wê de çêdike û di bin sîwana karê dezgehî de bi rê ve dibe.

Nimûneya herî baş li ser bikaranîna vê felsefeyê, tecrubeya Rojava-Bakurê Sûriyê ye. Vê tecrubeyê guhertinên xurt di hemû aliyan de pêk

anîne; ji aliyê bajarvanî ve komîn, meclis û saziyên ku niştecih rêveberiya wan dikin, ava kirin. Ji aliyê ramyarî ve MSDa ku vîna gel rave dike û li ser rêgeza jiyana hevbeş a hemû pêkhateyan radibe, hat damezirandin. Ji aliyê leşkerî ve, QSDa ku gelek serkeftin li hember rêxistinên terorîst bi dest xistin û gelek herêm ji destên wan rizgar kirin û milet piştî çend sal ji astengiyan vegerandin malên wan, hat damezirandin. Ji aliyê olî ve jî gelek desteyên ku çalakiyên olî bi serbestî di wan de tên meşandin, hatin avakirin. Her wiha di beşên jiyanê yên din de jî guhertin çêbûn.

------------------------------------------------------------------------------------------

**Jêder û çavkaniyên din:**


- *Ebdela Ocelan, Ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve, 2002.*
- *Elî Hesen Mûsa, Parêzeha Dêrezorê 1993.*
- *Maks Firayhêr Fon Opinhayim, Koçer, beşa yekem, di navbera her du çeman de Îraqa bakur û Sûriye 2004.*
- *Endamên êlên Dêrezorê, Ji aramî ber bi şoreşê ve, Dînamîkiyên Dijberiyê û Karîgerên Aşîtiya Xizmî-Sazûmana Dadwerî Ji Bo Jiyanê.*
- *Wîkîpîdiya.*
- *Ehmed Wesfî Zekeriya, Êlên Şamê 1983.*
- *Êlên Dêrezorê, kesayet û nevdarên Dêrezorê.*
- *Umer Elbezonî, Êl çi ye? Pênasekirina Wateya Êlê 2011.*
- *Mihemed Hesan, Ronîkirin li Ser Êlên Dêrezorê 2017.*
- *Mihemed Elşewa, Dêrezor û Asoyên Guherînên Siyasî 2017.*
- *Ehmed Elxelef, Gund û bajarên êla Elbegare li Dêrezorê 2009.*
- *Elai Elebadî, Tuxmê Êla Elegêdat 2010.*
- *Benî Rebîa, Benî Kilab, Tuxmê Êla Ellehîb 2013.*
- *Necimedîn Necim, Ragihandina Damezirandina Artêşa Êlan li Cizîrê û Feratê 2017.*
- *Xeber 24, Bagera Cizîrê, Armanc û Encam 2017.*
- *Elimarat Elyewm, Xwejêqutkirina Tabûran ji Hêzên Peyabilindan Ên Ku Girêdayî Kiwalisyona Sûrî û Tevlîbûna Wan Li QSDê.*
- *Nûçeyên Sûriyê û cîhanê, Êlên Sûrî Beşar Elesed Dipejirînin û Bi 4200 Leşkerî Tevlî Artêşa Wî Dibin 2017.*
- *Êlên Dêrezorê-Kesayet û Navdarên Dêrezorê-*

# Koçberî

## Sedem û Encamên Wê - Koçberiya Kurdan

(Beşa dawî)

**Dahurandina agahîyên ankêta taybet bi Kantona Cizîrê**

**Encamên rapirsîna helwestan ji hêla Navenda Rojava li ser dîyardeya koçberîyê**

**Bi giştî 1342**

| Zayend | Nêr %62.8 | Mê %37.2 | Rewşa malbatî | Nezewicî %39.8 | Zewicî %60.2 |
|---|---|---|---|---|---|
| Asta perwerdehî | | | | | |
| Seretayî %21.3 | | Navîn %17 | Amadayî %20.4 | Peymangeh %11.7 | Zanîngeh %29.9 |

**1-Tu piştgirêya koçberîya li derveyî welat dikî?**

○ Erê %13.9 ○ Na %86.1

**2-Li gorî te, Sedema sereke ya koçberîyê çi ye?**

○ Aborî ye %54.7 ○ Ramyarî ye %16.4 ○Ewlehî ye %14.6

○ Civakî ye %4.4 ○ Qelsbûna xizmetguzarîyê ye %9.9

**3-Li gorî te, sedema aborî ya sereke ji koçberîyê re çi ye**?

○ Derfetên kar ne peyda ne %38.3 ○ Bihabûna heyberan %27.1

○ Kêmbûna dahatên kesayetî %18.2 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %16.4

**4-Li gorî te, sedema sîyasî ya sereke ji koçberîyê re çi ye**?

○ Ji ber ku lihevkirineke sîyasî di navbera alîyên sîyasî de pêk nehatîye %38.1

○ Handana hin alîyan ji pêrewên xwe re li ser koçberîyê %25.6

○ Zagonên ji hêla Rêveberêya xweser ve derketî (leşkerêya neçarî, zagonên jinê...) %20.3

○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %16.1

| |
|---|
| **5-Li gorî te, sedema ewlehî ya sereke ji koçberîyê re çi ye?** |
| ○ Dirêjbûna dema kirîzê %35.3 ○ Nearamîya rewşê %41.4 |
| ○ Parastin kêm e %4.2 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî %19.0 |
| **6-Li gorî te, sedema civakî ya sereke ji koçberîyê re çi ye?** |
| ○ Belavbûna tevlîhevî û sincên nebaş %25.0 |
| ○ Revîna ji ber astengîyên civakî (kevneşopî) %12.5 |
| ○ Parvebûna malbatî %32.1 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %30.3 |
| **7-Li gorî te, sedema xizmetguzarî ya sereke ji koçberîyê re çi ye?** |
| ○ Tendirustî (kêmbûna dermanan, amûrên tendirustîyê, ekîpên tendirustîyê) %14.2 |
| ○ Qelsbûna asta zanistî %11.0 |
| ○ Pêdvîyên jiyanê yên rojane (kehrebe, av, nan...) %53.7 |
| ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %21.2 |
| **8- Tiştên ku koçberîyê gur dikin çi ne?** |
| ○ Ragihandina nerast %19.3 ○ Xweşbûna jiyanê li derve %45.0 |
| ○ Koçberîya bigiştî( çavlêvkirin) %23.2 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %12.4 |
| **9-Handanên koçberîyê çi ne?** |
| ○ Nerazîbûna li ser rewşê %27.9 |
| ○ Hêsankarîyên ji koçberan re tên pêşkêşkirin %11.8 |
| ○ Lêgerîna li jiyaneke xweştir %50.7 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %9.7 |
| **10- Sedema mayîna te li welat çi ye?** |
| ○ Erkekî netewî ye %78.8 ○ Derfeta çûnê bi dest min neketîye %5.6 |
| ○ Li benda derfeteke guncav im %8.9 ○ Ne yek ji van xalên derbasbûyî ye %6.7 |

Hemû pêkhateyên civakê ji Kurd , Ereb û Suryanan, her wiha hemû astên zanstî; zanîngeh, peymangeh û nexwendevan hewandin. Hejmara kesên lêkolîn li ser wan hate çêkirin 1342 kes bûn.

Dabeşkirina van ankêtan li ser bigneha asta zanistî, bi vî awayî bû:

- Hejmara nexwendeyan 71 kes bû.

- Hejmara kesên bawernameya seretayî wergirtine, gihaşt 215 kesî.
- Hejmara kesên bawernameya navîn wergirtine, gihaşt 224 kesî.
- Hejmara kesên bawernameya amedayî wergirtine, gihaşt 274 kesî.
- Hejmara kesên bawernameya peymangehê wergirtine, gihaşt 157 kesî.
- Hejmara kesên bawernameya zanîngehê wergirtine, gihaşt 401 kesî.

Ji alîyê dabeşkirina tmenî ve, temenê lêkolînberên ku ankêt ji wan re hat çêkirin, ji 18 salan û bi jor de dest pê dikir. Ew jî li ser sê beşên temenî hatin dabeşkirin:

- **Beşa yekem:** Kesên temenê wan di navbera 18 û 30 salî de ne, hejmara wan gihaşt 617 kesî.
- **Beşa duyem:** Kesên temenê wan di navbera 31 û 45 salî de ne, hejmara wan gihaşt 422 kesî.
- **Beşa sêyem:** Kesên temenê wan 46 sal û bi jor de ye, hejmara wan jî gihaşt 303 kesî.

Hejmara giştî gihaşt 1342 kesên ezmûnkirî. Rêjeya mêran tê de %62.8 bû, lê ya jinan gihaşt %37.2.

Ew jî bi vî awayî li bajar û bajarokên Kantona Cizîrê dabeşkirî ne:

- Bajarê Dêrikê 77 kes.
- Bajarê Girkê Legê 133 kes.
- Bajarê Çilaxa 60 kes.
- Bajarê Tirbespîyê 152 kes.
- Bajarş Qamişlo 238 kes.
- Bajarê Amûdê 129 kes.
- Bajarê Dirbêsîyê 176 kes.
- Bajarê Serê kanîyê 67 kes.
- Bajarê Hesekê 195 kes.
- Bajarê Tiltemirê 115 kes.

<u>**Ankêt, bi benda yekem dest pê dike:**</u>*Tu piştgirêya hizra koçberîya li derveyî welat dikî?* Rêjeya giştî bi bersiva (erê) %13.9 (piştgir) bûn û rêjeya bersiva (na) %86.1 (rikber) bûn.

**<u>Benda duyem ev bû:</u>** *Sedema sereke ya koçberîyê çi ye?* Sedemên aborî ji sedemên sereke yên koçberîyê bûn. Bi rêjeyeke giştî %54.7 derket holê.

Ew jî di Serê Kanîyê de bi awayekî zelal bi rêjeya %75 hat xuyakirin. Ew jî li sedemên şer û dorpêçkirina di herêmê de vedigere. Her wiha li nearamîya rewşa ewlehî ya herêmê ji ber sedemên êrîşên ku ji hêla girûpên çekdar û çeteyan ve li ser hatin kirin, vedigere. Ji ber vê yekê jî bandor li ser rewşa aborî û tevgera bazirganî di bazarê de hat kirin.

Ev jî pirsa me li ser têkilîya di navbera rewşa aborî û koçberîyê de, tekez dike. Piranîya koçberbûnên dawî ji bo lêgerîna li kar û gepa nan bû. Ji me re hat xuyakirin ku sedema ewlehî di koçberîyê de, ne sereke ye.

**<u>Benda sêyem:</u>** *Sedema aborî ji koçberîyê re çi ye?* Derfetên kar ne peyda ne bi rêjeya %38.3 bû. Ew jî li Bajarê Serê Kanîyê bi rêjeya %54 dîyar bû. Ev rêje li sedemên derbasbûyî vedigere.

**<u>Benda çarem:</u>** *Sedema ramyarî ya herî girîng ji koçberîyê re çi ye?* Ji ber ku lihevkirineke sîyasî di navbera alîyên sîyasî de pêk nehatîye bi rêjeya %38.1 bû. Serê Kanîyê rêjeya herî mezin tomar kir. Ew jî ji ber ku bajarê Serê Kanîyê tûşî êrîşên pir giran hat, her wiha ji ber dijkarîyên ramyarî di herêmê de û ji ber ku ev dijkarî li ser milet nû ne.

**<u>Benda pêncem</u>:** *Sedema ewlehî ya sereke ji koçberîyê re çi ye?* Nearamîya rewşê bi rêjeyeke giştî %41.4 bû. Ew jî li bajarên Hesekê û Dirbêsîyê bi rêjeya 46% hat xuyakirin. Ji ber ku Bajarê Hesekê di gelek deman de tûşî êrîşan hat. Bajarê Dirbêsîyê bi bajarên li derdora xwe mîna Tiltemir, Serê Kanîyê û Hesekê bandor bûbû.

Me pirsek kir: *Gelo sedema ewlehîyê sedema koçberîyê ya sereke ye*? Bi rêya vê pirsê re em gihaştin wê yekê ku ne ew sedema sereke ji koçberîyê re ye, lê belê nearamîya rewşê sedema sereke bû. Tê xuyakirin ku bêhtirî koçberîya n, demkî bûn û piştî aramîya deverên ku tûşî êrîşên çeteyan hatine, milet careke din vedigerêya malên xwe.

**<u>Benda şeşem:</u>** *Sedema civakî ya herî girîng ji koçberîyê re çi ye?* Jihevketina malbatî bi rêjeyeke giştî %32.1 bû. Ew jî bi awayekî zelal bi rêjeya %49 li Serê Kanîyê hat xuyakirin. Lê rewş li Tiltemirê cuda bû, ji ber

ku sedema civakî ya koçberîyê li cem wan, belavbûna nakokîyên civakî û gêre û tevlîhevî bû. Rêjeya vê sedemê jî %37 bû.

Ev jî pirsa me ya li ser têkilîya di navbera koçberî û jihevketina malbatî de, tekez dike. Ji ber ku malbatê bi rêya koçberîyê re dixwest carake din xwe bighîne hev.

**<u>Benda heftem:</u>** *Sedema xizmetguzarî ya herî girîng ji koçberîyê re çi ye?* Pêdivîyên jiyanê yên rojane bi rêjeyeke giştî %53.7 bû. Bajarê herî bêhtir ji vê sedemê gazin dikir, Dirbêsîyê bû. Rêjeya wê li Dirbêsîyê %66 bû. Ji ber ku di wê demê de Dirbêsîyê rewşeke buhabûna heyber û ardû dijîya. Her wiha rûxandina jenetorên kehrebê jî didîtin. Ev jî li gorî agahîyên ku rêveberêya bajêr di wê demê de dane me.

**<u>Benda heştem:</u>** *Tiştên ku koçberîyê gur dikin çi ne?* Xweşguzarêya jiyana li derve bi rêjeya %45 bû. Bajarê Çilaxa bi rêjeya %53 piştgirêya vê sedemê dikir, ji ber tevgera partîyên di bajêr de û handana wan ji koçberîyê re. Her wiha ji ber ku bajar ji têkelên kategorî û çînên niştecihî ên cûr bi cûr pêk tê.

Ev jî pirsa me li ser têkilîya di navbera koçberîyê û daxwazîya xweşguzarêya jiyanê de, tekez dike.

**<u>Benda nehem:</u>** *Handanên koçberîyê çi ne?* Lêgerîna li jiyaneke baştir bi rêjeya %50.7 bû. Ev sedem bi awayekî dîyar li bajarên Dirbêsîyê û Serê Kanîyê bi rêjeya %58 hat piştgirtin. Ji ber ku dema gel li xweşguzarêya jiyanê bigere dê hewl bide ku jiyana baştir bi dest bixe. Ev yek di benda heştan de dîyar bû. Her wiha ji ber nezelalbûna pêşveçûna kirîza Sûrîyeyê û nadîyarbûna pêşeroja wê.

**<u>Benda dehem:</u>** *Sedema mayîna te li welêt çi ye?* Ji ber ku erkekî netewî ye, bi rêjeya %78.8 bû. Rêjeya herî mezin li Bajarê Girkê Legê bû %89. Ev jî tekez dike ku mezintirîn bajarê li dijî koçberîya li derveyî welat disekine, Girkê Legê bû bi rêjeya %93.

Her wiha encamên hijimaran ên lêkolînê wisa dan xuyakirin:

Rêjeya giştî ya alîgirên koçberîyê %14 ye; ji wan, hejmara mêran 843 anku %63 û ya jinan 499 anku %37 ye.

Ev dîyar dike ku têkilîyeke xurt di navbera zayend û koçberîyê de heye, ji ber ku rêjeya alîgirên koçberîyê ji jinan %16 bû, lê ya mêran 12% bû. Ev jî pirsa me li ser têkilîya di navbera koçberî û zayendê de tekez dike.

Alîgirêya jinê ji koçberîyê re li çend sedeman vedigere. Ji wan sedeman; dabûnerîtên civakî yên li ser hatine ferzkirin. Ev jî yek ji sedemên civakî yên piştgirêya ramana koçberîyê dike. Ev yek di serjimarên ku me li ser nêrînên jinan çêkir de, bi rêjeya %37 dîyar dibe. Her wiha sedemên aborî jî sedemine sereke yên koçberîyê bûn. Ji wan sedeman bidestnexistina kar bi rêjeya %40 bû. Ew jî li zihnîyet û dabûnerîtên civakî ku derfetên kar li pêşîya jinan teng kirine, vedigere.

Ji sedemên ewlehî jî, nehedarêya rewşê bi rêjeya %51 bû. Ew jî li handana dayikî û tirsa wê li ser zarokên wê vedigere.

Ji sedemên xizmetguzarî jî kêmbûna pêdivîyên jiyanê yên rojane (kehrebe, av, nan...) rêjeya wê %58 bû. Ew jî ji ber ku bêhtirê jinan bêkar in û tenê karê malê dikin, Loma ew ji mêran bêhtir van kêmasîyan jiyan dikin. Her wiha xweşîya jiyanê jî yek ji handanên koçberîya li derve bi rêjeya %55 bû. Ji handanên koçberîyê (lêgerîna li jiyaneke baştir) bi rêjeya %57 bû.

- Der barê têkilîya di navbera asta fêrbûn û koçberîyê de. Hejmara nexwendeyan 71 yanê %5; Seretayî 215 yanî %16, Navîn 224 yanî %17, Amedayî 274 yanî %20, Peymangeh 157 yanî %12, Zanîngeh 401 yanê 30% bû.

Tu cudahîyên dîyar di navbera rêjeyan de nîn bûn. Tev nêzî rêjeyên giştî bûn. Rêjeya herî bilind a nexwendeyan yên ku alîgirêya koçberîyê dikirin bi rêjeya %17 bû. Kesê ku bawernameyên navîn û amadayî wergirtine, rêjeya wan %15 bû. Kesên bawernameyên zanîngehê wergirtine, rêjeya wan %14 bû. Kesên ku bawernameyên Peymangehê wergirtine rêjeya wan %11 bû. Rêje wekhev bûn. Ev jî dide xuyakirin ku helwestên civakê li ser koçberîyê di hemû kategorîyên xwende û nexwende de nêzî hev in.

- Ji bo têkilîya di navbera kategorîyên temenî û koçberîyê de, wisa hatin dabeşkirin:

- Ji temenê 18 ta 30 salî, kategorêya yekem e. Rêjeya wê %46 ji rêjeya giştî bû.

- Ji temenê 31 ta 45 salî, kategorêya duyem e. Rêjeya wê %31 ji rêjeya giştî bû.
- Ji temenê 46 salî û zêdetir, kategorêya sêyem e. Rêjeya wê %23 ji rêjeya giştî bû.

Kategorêya ku bêhtir piştgirêya koçberîyê dikir, a yekem bû ya ku temenê wan di navbera 18-30 salî de bû. Rêjeya wan jî %17 bû.

Kategorêya duyem a temenê wan di navbera 30-45 salî de, piştgirêya wan ji koçberîyê re bi rêjeya %14 bû.

kategorêya sêyem a temenê wan ji 46 salan û zêdetir bû, piştgirêya wan ji koçberîyê re bi rêjeya %8 bû.

Kategorêya herî bêhtir ku piştgirêya koçberîyê dikir, gênc bûn. Ev jî li hin sedeman vedigere: Yek ji wan sedeman daxwaza zanist û fêrbûnê li zanîngehên bajarên ku ji alîyê lêkolînên zanistî ve pêşketî ne. Ji ber ku derfetan li ber bipêşxistina zanist û karînên wan vedike. Sedemeke din jî peydabûna karan li wan dewlatan. Her wiha elek sedemên jî hen; şer û nakokîyên di welatê wan de derdikevin, revîna ji dabûnerîtên civakî, pêşbînîkirina wan a şaş ji bûnmendîyê re, agahîyên şaş ên li ser Ewrûpa birine, negirêdana wan bi welatê wan ve, revîna ji erkên wan derbarê welatê wan de, kêrhatina wan ji zûguhertinê re û jiyankirina li gorî rewşa nû û hezkirina wan ji vedîtin û serpêhatîyan re. Berevajî kategorîyên din ên ku bêhtir giringîya welat dinasin, her wiha serxwebûna wan ji alîyê malbat û kar ve.

Ev jî rastîya pirsa me li ser têkilîya di navbera temen û koçberîyê de tekez dike.

**<u>Rapora serlêdana komînan:</u>**

Ji ber ku em nikarîbûn bighêjin hejmareke mezin ji gel, Girûpa lêkolînê bi rêya ankêta taybet ji koçberîyê re, di her herêmeke ji herêmên Kantona Cizîrê de, serdana hin komînan kir. Ew jî bi mebesta gihaştina rêjeyeke nêzî hejmara koçberan (tekane-malbatî) û naskirina hejmara penaberên ku hatine her herêmekê. Her wiha bi komîteyên komînan re li ser rewşên civakî, aborî, tendirustî û xizmetguzarîyê, li gorî malbatên di komînê de da ku sedemên sereke yên dihêlin gel koçber bibe, hat guftûgokirin.

**Bi rêya serlêdanan de, ev agahî hatin bidestxistin:**

**<u>Herêma Dêrikê:</u>**

Ew jî ji alîyê pêkhateyên xwe yên civakî ve, herêmeke cihêreng e. Ji ber nêzîktîya wê ji Sînorên Başûr re û pevguherînên bazirganî di navbera wan de, tevgera aborî tê de dîyar e. Her wiha derbenda herî girîng e ji têveçûnê re. Ji destpêka şoreşê ve, ev herêm ji herêmên din bi ewlehî û aramîyê tê cudakirin. Tevî wê jî xelkên herêmê ji ber sedemên aborî, ewlehî, geşedana partîyan ji koçberîyê re berê xwe didin derve.

Bi rêya serlêdana me ji komînan re, ew jî 5 komîn bûn, me dît ku hejmara malbatên di her komînekê ji van komînan de 100 malbat bû. Hejmara malbatên ku ji her komînekê koçber bûne 5 malbat in.

Koçberîya gêncan hem li welatên derdorê hem jî li welatên Ewrûpî zelal û bi rêjeyeke mezin bû.

Tevî van agahîyên me anîn li ser ziman, divê were gotin ku penaberî ji herêmên derdorê jî bi ser Rojava de pêk hatîye, piranîya van penaberan ji Şingal û bajarên Sûrîye (Idlib, Reqe, Heleb...)ê bûn.

Piranîya penaberan ji zarok û jinan bûn. Hejmara malbatên ku rojane penaberî Rojava dibûn, naverastî 15 malbatan bû û hejmara kesên di nava her malbatekê de nêzî 5 kesan bû.

Ji bo nexweşîyên vedidin, tu nexweşî di nav wan de nîn bûn, ji bilî ku hejmareke kêm ji kêmendamên ji alîyê aqil an jî laş ve hebûn.

**<u>Navçeya Girkê Legê:</u>**

Bêhtirê niştecihên wê ji Kurd û Erebên ku hatinê de, pêk tê. Hin ji wan li bajarên Sûrî yên din kar dikirin, bi taybet bajarê Şamê. Lê piştî kirîzê vegerêyan bajarê xwe. Ji ber peydanebûna kar, berê xwe dan derveyî welat. Bêhtirê wan ji çîna gêncan bûn. Piştre jî malbatên wan li pey wan çûn. Hejmara wan jî li gorî agahîyên ku me ji endamên komînan bi dest xistin, (200) malbat bû.

Ji wan malbatan, nêzî 15-20 malbatî koçber bûye.

Lê hejmara penaberên gênc pir mezin bû bi taybet ên nêr. Ew jî li pey lêgerîna li kar diçûn.

Ji bo malbatên ku ji Girkê Legê penaber bûne, hejmara wan nêzî (20) malbatan bû û hejmara endamên her malbatekê nêzî (5) kesan bû, bêhtirê wan ji zarok û jinan bûn.

**Navçeya Çil Axa:**

Bêhtirê niştecihên wê Kurd û Erebên ku lê bi cih bûne. Ji alîyê êlan ve cihêreg in. Ev navçe ji ber ku bêhtirê wê Ereb in, rêxistinên sawkarîîst karîbûn wan biçewisînin û li ser têla neteweyî bilîzin. Loma ji alîyê kêmewlehî û kêmpeydabûna kar ve cuda bûn. Ew hejmara mezin a ku koçber bûn yan jî piştgirêya koçberîyê dikirin Tê de nîn bû.

Hejmara komînên ku hatin serdankirin 3 komîn bûn. Me tu tevgereke koçberîyê bi awayekî dîyar nedît. Piranîya penaberên hatinê ji herêm û gundên wê bûn.

**Navçeya Tirbespîyê:**

Ew navce ji têkeleke gelêrî (Kurdî, Mesîhî û Erebî) pêk tê, lê hejmara pêkhateya Ereb a ku Rêjîmê ew ji hundir anîn da ku dîmoxrafîya Cizîrê biguherîne, her wiha hejmara kesên di bin sîya Partîya Basê de kar dikirin, di hin navçeyan de ji ya Kurdan bêhtir bû. Vê sedeme hişt tirs ji nemana ewlehîye bikeve dilê kesên herêmê. Her wiha Partîyên ramyarî yên ku bi derve ve, bi taybet bi Tirkîye ve girêdayî, roleke wan a dîyar li ser têkbirina daxwaza li jiyankirina li herêmê, hebû.

Serlêdana hin komînan bi awayekî keyfî hat kirin û hejmara malbatên di her komînekê de nêzî 100 malbati bû û hejmara malbatên koçber nêzî 10 malbatan di her komînekê de bû. Hejmara malbatên penaberî wir bûne nêzî 10 malbatan di her komineke de bû. Bêhtirê wan ji zarok û jinan bûn. Hin kesên kêmendam jî hebûn, lê tu nexweşîyên ku vedidin, nîn bûn.

Koçberîya kesane ya gêncan ji bo lêgerîna li kar, bi awayekî dîyar dihat xuyakirin. Her wiha welatên dijminê Rojava bi rêya ragihandinê re rola wan li ser handana koçberîyê û hêsankirina wê, hebû.

**Bajarê Qamişlo:**

Ji bajarên herî mezin ên Kantona Cezîrê ye. Têkilîyeke gelekî baş ji alîyê xweşkbûna têkilîyên civakî ve, di navbera niştecihên wê de heye. Ev yek bandorekê ji hemû alîyan ve li ser tevgera bajêr dike. Tevî ku derfetên

kar lê peyda ne û ewlehî jî lê heye, lê tevgera sîyasî bandoreke wê ya zelal û dîyar li ser koçberîyê hebû. Ev jî di hejmara malbatên di her komînekê de û karîgerêya wan di komînê de di bin dirûşmeya "komîn min temsîl nake" zelal bû.

Di her komînekê de nêzî 300 malbatî hebû. Hejmara malbatên ku di her komînekê de koçber bûne nêzî 20 malbatan bû.

Ji alîye koçberîya tekane ve, hejmara katogorêya gêncên nêr pir mezin bû. Bêhtirê wan xwedî pîşe û pisporîyên cihêreng bûn. Ev kategorî xwedî xwestek û lêgerîna li jiyana baştir bû.

Penaberên hatine herêmê, bêhtirê wan ji bajarên Sûrîye yên din in. Hejmara wan a di her komînekê de nivîsandî, nêzî 20 malbatan bû. Hejmara endamên her malbatekê nêzî 7 kesan bû.

**Navçeya Amûdê:**

Ev herêm piranîya wê Kurd in. Bi têkilîyên xwe yên êlî tê pesinkirin. Ev herêm bi helwestên xwe yên welatparêzî û têkoşîna xwe, tê naskirin. Debara xwe ji berhemên deverê dike. Ev berhem kar ji piranîya kesên herêmê re peyda dike. Lê tevî wilo jî, hejmara koçberan lê dîyar e.

Hejmara malbatên di her komînekê de nêzî 100 malbatî bû û hejmara malbatên di her komînekê de koçber bûne, nêzî 5 malbatan bûn. Ev ji bilî koçberîya tekane, bi tayebet ji hêla kategorêya gêncan ve.

Hejmara malbatên penaberî wê bûne nêzî 10 malbatan di her komînekê de bû. Piranîya wan ji herêmên derdorê bûn. Her wiha ji bajarên Sûrîyê jî bûn. Tu nexweşîyên vedidin di nav wan penaberan de nîn bûn.

**Herêma Dirbêsîyê:**

Ev herêm bi rêxistina xwe ya derebegî tê nasîn. Li ser berhemên çandinîyê ku bandorê li tevger û bazarên herêmê dikin, debara xwe dikin. Ji destpêka şoreşê ve, ev herêm di aramî û ewlehîyê de jiyan dike. Rêxistina Derebegî bandor li dabeşkirina gel kirîye û ew xistîye du beş; xizan û dewlemend. Partîyên li herêmê, li ser xala lawaz a gelê xizan, bi rêya fêrkirina wan ji xwesipartina li ser alîkarîyên ji derve ve, û belavkirina çanda birçîbûnê di nav gel de, dilîzin.

Hejmara malbatên di her komînekê de li gorî belavbûna erdnîgarî ya herêmê, cuda bû. Hejmara wan di navbera 100-200 malbatî di her komînekê de bû. Hejmara malbatên koçber bûne nêzî 10 malbatan di her komînekê de bû. Koçberîya tekane bêhtirê wê ji kategorêya gêncên ku li jiyana baştir digerin, bû.

Hejmara malbatên penaberî wê bûne, di her komînekê de nêzî 10 malbatan bû. Her malbatek nêzî 5 kesan bû. Piranîya wan ji herêmên derdorê û ji bajarên Sûrîyê bûn. Tu nexweşîyên vedidin di nav wan penaberan de nîn bûn.

**Serê Kanîyê:**

Derfetên kar di vê herêmê de pir bûn, loma gel ji herêmên derdorê bi ser de hatin, bi taybet ji Kobanê. Hejmara Ereban lê gelek e. Ji ber ku di demên dawî de, bû qada şer. Vê jî bandor li ser mayîna gel tê de kir. Bêhtirê gelê wê ji ber neewlehî û êrîşên li ser herêmê ji hêla çeteyan ve hatin kirin, koçber bûn. Tevî wilo jî, di dema serlêdana me ji komînan re, hat xuyakirin ku komîn bi rola xwe ya handana gel ji bo vegerê radibûn, tevlîhevîya tê de kontrol dikirin û hewil didan rêxistinî û aramîyê lê vegerînin. Ji ber ku Kantona Cizîrê û Girê Sipî jî bi hev ve girê dide, tevgereke bazirganî lê hebû. Lê ev bazirganî ji hêla kategorîyeke tenê ku malgirêya bazarê dikir, dihat meşandin. Loma derfetên kar jî di nav vê kategorîyê de bûn. Ev jî bûbû sedema koçberîya tekane, bi taybet a gêncan.

Hejmara malbatên di her komînekê de nêzî 100 malbatî bû, ji wan nêzî 15 malbatan di her komînekê de koçber bûbûn.

Hejmara malbatên penaberî wê bûne, di her komînekê de nêzî 10 malbatan bû. Her malbatek nêzî 5 kesan bûn. Piranîya wan ji herêmên derdorê bûn. Her wiha ji bajarên Sûrîyê bûn. Tu nexweşîyên vedidin di nav wan penaberan de nîn bûn.

**Herêma Tiltemir:**

Ev herêm bi biratîya di navbera pêkhateyên wê (Kurd , Ereb û Aşorî) de, tê naskirin. Çend êrîş ji hêla çeteyan bi ser vê herêmê de hatin. Vê jî hişt ku neewlehî, qelsbûna aborî û qelsbûna asta jiyanî lê peyda bibin. Ji ber van

sedeman peydakirina kar lê ne gengaz bû. Tevî wilo jî di dema serlêdana me ji rêveberêya herêmê re, hat xuyakirin ku bi rola xwe radibû. Tevlîhevîya tê de kontrol dikir û hewil dida rêxistin û aramîyê li hemî deveran vegerîne. Her wiha rêxistina niştecihan di hemî alîyên jiyanê de, bi taybet bi rêya parastina kesayetî re, da ku ji her êrîşekê re amade be, pêk anî. Vê jî hişt milet lê vegere.

Ji ber dûrbûna vê herêmê ji navenda Kantonê, gazin ji ber piştguhkirin û kêmbûna derfetên kar, dihatin kirin.

Serlêdana me ji komînan re di dema bidawîbûna êrîşên çeteyan de bû. Lewre helwestên gel di navbera mayîna li dervê û vegerîna li welat de bûn.

Me serlêdana 4 komînan kir. Hejmara malbatên di her komînekê de nêzî 100 malbatî bû, ji wan malbatan nêzî 20 malbatî di her komînekê de koçber bûbû.

Gelek gênc jî ji bo gerîna li derfetên kar, koçber bûbûn.

Tiltemir ji herêmên ku tevî êrîşên çeteyan li serê jî, pêşwazîya penaberen dikir.

Hejmara malbatên penaberî wê bûne, di her komînekê de nêzî 10 malbatan bû. Her malbatek nêzî 5 kesan bû. Piranîya wan ji zarokan bû. Tu nexweşîyên vedidin di nav wan penaberan de nîn bûn.

**<u>Herêma Hesekê:</u>**

Ev herêm jî, ji alîyê ewlehî û hedarîyê ve weke herêmên Serê Kanîyê û Tiltemirê ye. Ji ber ku ew di dema rêjîma Sûrîyê de navenda parêzgehê bû û ji ber ku piranîya sazîyên dewletê li wir bûn, van tiştan hişt ku derfetên kar lê peyda bibin û karker jî xwe lê bigirin. Lewre bi kombûneke niştecihî ya pir mezin hat naskirin. Lê di demên dawîn de ji ber êrîşên ku ji hêla girûpên sawkarîîstî ve li ser hatin kirin, milet berê xwe da koçberî û penaberîyê.

Di dema serlêdana me ji herêmê re, rêveberêya wê sazîyên xwe ava dikirin û malbat vedigerêyan herêmê. Loma hejmara malbatên di her komînekê de ne dîyar bû.

**Dahûrandina agahîyên rapirsîna helwestên taybet bi başûrê Kurdistanê :**

**Rapirsîna helwestan ji Navenda Rojava, li ser dîyardeya koçberîyê:**

| | |
|---|---|
| **Zayend**: ○ mê %31.0 ○ nêr %69.0<br>**Temen**......................<br>**Rewşa malbatî**<br>○ zewicî %77.4 ○ nezewicî %22.6<br>**Malbata te bi te re dijî**<br>○ erê %86.9 ○ na %13.1 | **Karê ku niha dike**..................<br>**Asta perwerdehîyê**................<br>**Dema mayîna te li derveyî Rojava...**<br>**Cihê niştecihbnê**<br>○Di hundirê kapê de %76.2<br>○ Li derveyî kampê %23.8 |
| **1-Sedema bigehîn a koçberîya te çi ye?**<br>○ Aborî %44.0 ○ Ramyarî %4.8 ○Ewlehî %40.5<br>○Civakî %4.8 ○Bedbûna xizmetguzarîyê %6.0 | |
| **2-Tu li hemberî astengîyên dîtina xanîyan hatî yan jî têyî?**<br>○ Erê %52.4 ○ Na %47.6 | |
| **3-Tu li hemberî astengîyên dîtina kar hatî yan jî têyî?**<br>○ Erê 63.1% ○ Na 36.9% | |
| **4-Tu di çarçoveya pîşeya xwe de kar dikî?**<br>○ Erê %73.8 ○ Na %26.2 | |
| **5-Tu tûşî çewsandinê ji hêla xwedîyê kar ve têyî?**<br>○ Erê %19.0 ○ Na %81.0 | |
| **6- Tu astengîyan ji nêrîna kêm ji hêla kesan ve dijî?**<br>○ Erê %33.3 ○ Na %66.7 | |
| **7-Rêjeya zayînê di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %57.1 ○ Na %42.9 | |

| |
|---|
| **8-Rêjeya berdanê (jihevketina malbatî) di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %41.7 ○ Na %58.3 |
| **9-Rêjeya şûkirina pêşwexet di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %53.6 ○ Na %46.4 |
| **10-Rêjeya fêrkirinê di nav zarokên penaber de, zêde dibe?**<br>○ Erê %89.3 ○ Na %10.7 |
| **11-Rêxistinên mirovahî bi rola xwe di parastina mafên penaberan û çareserêya pirsgirêkên wan de, radibe?**<br>○ Erê %3.6 ○ Na %96.4 |
| **12. karê van rêxistinên mirovahî tenê di warê karê hewarhatinê de ye?**<br>○ Erê %98.8 ○ Na %1.2 |
| **13-Te astengî di bidestxistina belgeya niştecihbûnê de de, dît?**<br>○ Erê %63.1 ○ Na %36.9 |
| **14-Rewşa jiyana di kampê de sazkar e?** ○ Erê %29.8 ○ Na %70.2 |
| **15-Gendelî û alozî di kampê de belav in?**<br>○ Erê %60.7 ○ Na %39.3 |
| **16-Nelihevkirina partîyên ramyarî bandorê li têkilîyên civakî dike?**<br>○ Erê %34.5 ○ Na %65.5 |
| **17-Tu handana kesên li Rojava mane, dikî da ku koçber bibin?**<br>○ Erê %8.3 ○ Na %91.7 |
| **18- Jiyana li başûrê Kurdistanê ji ya Rojava...**<br>○ baştir e %19.0 ○ xirabtir e %71.4 ○ Weke hev in %9.5 |

| |
|---|
| **19- Mayîna te di herêma Kurdistanê de..**<br>○Timî ye %10.7 ○ Demkî ye heta vegera li Rojava %71.4<br>○Pirojeya çûna Ewrûpa heye %17.9 |
| **20-Berî hatina te li Herêma Kurdistanê , tu li kîjan bajarî dijî**<br>**....................................................................................** |
| **21-Çareserkirina nexweşîyan bi şêwaz û rêbazên tendirustî pêk tên?**<br>○ Erê %4.8 ○ Na %95.2 |
| **22- Nexweşîyên demdirêj û yên vedidin ên bêhtir di nav penaberan de belav bûne, heger hebin, çi ne?** |

Ji bo naskirina rewşa penaberên li Başûrê Kurdistanê bi awayekî nêzîk û rasterast, girûpa me ya lêkolînê pirsîyarnameyeke nêrînan, li ser rewşa wan çêkir. Tê de komek piris li ser rewşa penaberan di hundir û derveyî kampan de hebûn. Ev pirsîyarname li ser 82 kesan çêbû.

**Nimûne:** 82

**Zayend:** (nêr-mê)

**Rêjeya wan wisa bû:** mê %31 nêr %69

**Rewşa malbatî:** zewicî %77.4 nezewicî %22.6

**Rêjeya kesên di malbatê de dijîn:** %86.9

Kesên ku rapirsîn li ser wan hat çêkirin: %76.2 ji penaberên di kampê de bûn û %23.8 ji derveyî kampê bûn.

**Pirs bi vî awayî hatin rêzkirin:**

○ Sedemên koçberîyê çi ne? Sedema sereke, aborî bû, bi rêjeya %44.

Ew jî ji ber ku piranîya van penaberan bi mebesta gerîna li kar, li derveyî Rojava (Şam, Humis û Helebê) dijiyan. Dema ku şer li van deveran qewimî, vegerêyan Rojava. Lê kar bi dest wan neket, loma berê xwe dan başûrê Kurdistanê .

Her wiha beşek ji wan ji ber ku rewşa dewletên din ên ku şer, kuştin û talankirin li wan dewletan çêbûbû, li ser mewdanên xwe tirsîyan, loma dest bi koçberîyê kirin. Ev li kêleka kiryarên ku ji hêla rêjîmê ve li ser miletê Kurd hatibûn kirin.

○ Sedema duyem, ewlehî bû bi rêjeya %40.5.

Rewşa ewlehî di 2012an de bi derbasbûna komên tunderew li Serê Kanîyê, xuya kir. Destpêkirina şerê leşkerî, nezelalbûna asoyên şoreşê û rewşa Rojava, van sideman hişt ku pirsgirêkeke ewlehî li cem gel peyda bibe. Rewşa tirs û pêwendîyê hişt ku xelk penaberî Başûr bibin da ku jyana xwe biparêzin. Divê were gotin ku piranîya penaberên ji ber sedema ewlehî koçber bûne, Kobanî bûn. Ew jî ji ber kuştin, talankirin û xirabkirina Daişê revîyan.

Ji bo sedema xizmetguzarî tenê ev pirsgirêk di demeke sînordar de hebû (av, kehrebe û nan). Lê piştî guherînên li Rojava pêk hatin, rewşa xizmetguzarîyê baştir bû.

Ji bo heyberên betrolî, ew jî hatin kotrolkirin û ji bo berjewendîyên gel hatin bikaranîn û negihaşt wê rewşa aloz.

Ji bo sedema civakî û ramyarî, rêjeya wan gihaşt %4.8 Dema ku em vê encamê li gorî rewşa dawî ya ku Rojava jiyan dike binirxînin, em ê bizanin ku tu sedemên berçav ji koçberîyê re nemane. Ji ber ku Rêveberêya Xweser gihaştîye asteke bilind ji alîyê peydakirina kar, başkirina xizmetguzarîyê, belavkirina ewlehî û aramîyê û rizgarkirina piranîya herêmên Kurdan ji hêla Yekînîyên Parastina Gel ve.

Bendên du û sê yên li ser zehmetîya bidestxistina xanîyan ku bi rejeya %52.4 û zehmetîya peydakirina kar ku bi rejeya %63.1 bû, radiwestîyan. Ev rêje li sedemên li jêr vedigerin:

1- Bi hejmarên mezin herikîna penaberan ji Rojava û vê dawîyê Erebên *Iraq*û Kurdên Şingalê jî ber bi Başûr ve, hişt pirsgirêka nepydakirina xanî û kar derkeve holê. Ev yek jî bû sedema buhabûna kirêya xanîyan û arzanbûna heqdestê karkeran. Her wiha çewsandin jî zêdetir bû. Rêxistinên mirovahî bi karê xwe baş ranedibûn. Ev jî bi rêjeyê %96.4 dîyar e. Tenê bi karê hewarhatinê radibû, Rêjeya wê jî %98.8 bû.

Vê jî hişt ku karker, karinan ji bilî karê ku tê de pispor in, bikin, da ku xwe û malbata xwe xwedî bike. Rêjeya van kesan %73.8 bû. Wan jî tenê karên ku keda gewdeyî jê re pêwîst e, dikirin (lêkirin, xwaringeh, mêvanxane [hotel]…).

Her wiha ev karker, ji hêla xwedîyê kar nemaze ji hêla xwedîyên beşgehên ku tuxmê wan Turk in ve, tûşî gelek çewsandinan dihatin. Vê jî hişt ku gelek ji wan karkeran dev ji karê di beşgehan de berdin û li nik sivîlan bi kirêyeke kêm kar bikin. Loma rêjeya çewsandinê kêm bû û gihaşt %19.

2- Rewşa ol û parastinê ya ku di başûr de belav bûye û nekirêdayina xanîyan ji gêncan re û tenê kirêdayîna xanîyan ji malbatan re, hişt ku piranîya çîna gêncan di kampan de jiyan bikin, an jî li karekî ku niştecihbûneke di hundir de ji wan re peyda bike, bigerin.

Der barê nêrîna gelê Başûr li ser penaberan. Li gorî agahîyên penaberan, destpêkê nêrîna wan ji penaberan re erênî bû, lê piştre bû neyînî û rêjeya vê nêrîna neyînî gihaşt %66.7. Ji ber sedemên dirêjbûna dema kirîza Sûrîye û dirêjbûna mayîna penaberan li Başûr. Her wiha ji ber ku gelên wir ên resen tu sedemeke xurt ji mayîna penaberan re nabînin, nemaze piştî ku deverên wan ewlehî û aramî lê peyda bû. Her wiha ji van sedeman binpêkirina hin penaberan ji dabunerît û kevneşopîyên gelê Başûr re.

Ji bo dîyardeyên civakî, em nikarin bi awayekî giştî wan danehev bikin, ji ber ku ji kampeyekê heta kampeyeke din tên guhertin.

Rêjeya berdanê %41.7 bû. Şûkirina pêşwexet %53.6 bû. Ev jî li sedemên weke valahî û bêkarêya penaberan û xwesteka malbatan ku hejmara endamên xwe zêde bikin, vedigerin. ji ber ku dema malbat zêdeyî şeş kesan be, rûbera serzemîna dayî wan zêdetir dibe. Her wiha ji bo mêjereke bêhtir ji alîkarêyan jî bi dest bixin.

Ji ber ku derfetên xwendinê nîn bûn û tirs ji pirsgirêkên sincî di hundirê kampan de hebû, şûkirina pêşwexet derdiket holê. Dibe ku sedemên derûnî, civakî, zehmetîyên jiyanê, nehizrîna bi pêşerojê û tengbûna asoyên civakî jî ji sedemên şûkirina pêşwextin bin.

Ji bo kêmbûna asta zanistî di nav penaberan de ku rêjeya wê %89.3 bû. Ew jî li sedemên nepeydabûna mamoste, alavên xwendinê, sedemên

handana xwendinê û kêmasîyên rêxistinên mirovahî yên di vî warî de, vedigere.

Ji ber ku karê rêxistinên mirovahî tenê di warê xizmetguzarîyê de bû û ji ber ku tu girîngî nedida tendirustîyê, rêjeya rewşa tendirusî ne li cih e. Ev rêje %70.2 bû. Ev jî bi awayekî dîyar di qirêjîya avê, çareserkirina avê bi awayekî nedirust û nepeydabûna alavên tendirustîyê bi rêjeya %95.2 tê xuyakirin. Vê jî hişt ku gelek nexweşîyên domdar û yên vedidin di nav penaberan de peyda bibin (zikçûna domdar, gurîbûn, sipeh, kulbûna kezebê û nexweşîyên gurçikan).

Her wiha nebaşî û gendelî di nav penaberan de, ji ber nepeydabûna nirxên sincî bi rêjeya %60.7 belav bûbû.

Van sedeman hişt ku penaber gazî Kurdên Rojava bikin da ku li Rojava bimînin û tu carî koçber nebin ew jî bi rêjrya %91.7 bû. Ji ber ku jiyana wan penaberan li Rojava baştir bû, rêjeya wê jî %71.4 bû.

Ji bo zehmetîya bidestxistina nîştecihbûnê, rêjeya wê jî %63.1 bû. Ew jî li rêbazên ku di sazîyên fermî yên Başûr de tên bikaranîn, vedigere. Her wiha rêxistinên mirovahî tu alîkarîyê ji bo bidestxistina niştecihbûnê nadin penaberan.

Dîyar bû ku nelihevkirinên ramîyarî bandoreke rasterast li têkilîyên civakî di navbera penaberan de bi rêjeya %65.5, dikir. Ev jî dide xuyakirin ku gel hîna ji serdaran re pêrew e û hêj negihaştîye asta xwendina rewşê bi awayekî rexnegerî û negihastîye asta bidestxistina encaman.

Her wiha girûpên me rapirsînek li ser rewşa penaberan çêkir. Ew rapirsîn bi rêya hevdîtinên bi desteya rêveberêya kampê re bû. Van rêveberêyan ji hêla rêxistinên mirovahî yên girêdayî Netewên Yekbûyî, meşandina karê penaberan spartibû xwe. Her wiha ev rapirsîn bi rêya hevdîtina hin malbat û kesan re jî pêk hat. Divê were gotin jî ku ev serlêdan di meha Mijdara 2015an de pêk hat û rapora me bi vî awayî hat:

## Rewşa rêxistinî ya kampa Barîke:

UN xwedîyê vê kampê ye. Ev kamp ji heft beşan pêk tê. Her beşek ji 256 malbatî pêk tê.

Her malbateke ku ji 6 endaman pêk were, rûbereke 80m$^2$ ji wan re derdikeve. Heger endamên malbatê ji 6 an pêhtir be, ev rûber duqat dibe û dibe 160 m$^2$.

Rêxistin, bi rêya endamên xwe (encûmen) re li ser karê penaberan radiweste.

Ev endam ji hêla penaberan ve li ser şeş mihan hatine hilbijatin.

Karê van endaman jî xwebexş e. Ji her beşeke kampê re tenê endemek hatîye pejirandin.

Kamp ji heft beşan pêk tê, şeş ji wan penaber tê de ne û ya heftan ji rewşên hewarî re ye. Ev bes pêşwazîya penaberên herêmên nearam dike.

Hejmara malbatên di kampê de gihaşt 1792 malbatî.

Her malbatek ji nêzî pênc kesan pêk tê.

Vê dawîyê Ji ber sedema çûna li Ewrûpa, nemaze Elmanîye û vegera beşeke ji wan li Rojavayê Kurdistanê , hejmara malbatan kêm bû.

Piranîya malbatên di kampê de ji Kantona Cizîrê bûn (Dêrik, Girkê Legê, Tirbespîyê, Qamişlo, Hesekê, Dirbêsîyê, Amûdê, Serê Kanîyê). Her wiha malbatin ji Efrîn û Kobanê jî hebûn.

Divê were zanîn ku piranîya van malbatan, berê li parêzgehên Sûrîye (Şam, Heleb, Humis…) dijiyan. Lê piştî şer li wan deveran qewimî, ji wan parêzgehan revîyan û penaberî Başûr bûn.

**Pêvajoya amadekirin û avakirina Kampê:**

Destpêkê bingehên çemento yên bi çadirên paçikî li penaberan hatin belavkirin. Dûvre hiştin ku xanîyên ji çemento, her çiqas ne li gorî zagonên kampê jî bûn, ava bikin. Ew jî ji ber ku penaber di rewşine xirab re derbas dibûn (baran, ba û şewtîna konan).

Ji avakirina her xanîyekî re ku rûbera wî ji $80m^2$ pêk tê, di navbera 500 heta 700 Dolarî pêwîst bû.

Vê dawîyê zagonine pir bi tund ji hêla Rêxistinê ve derketin. Tê de avakirina nebirêxistinî ji ber pirsgirêkên weke avakirina keyfî û firotina hin penaberan ji xanîyan re, qedexe kirin.

**Rewşa perwerdeyê:**

Di kampê de sê dibistan hene; dibistaneke seretayî, navîn û vê dawîyê yeke amedayî jî. Lê hêj tenê avahî ne. Avakirina wan bi dawî nebûye.

Hejmara xwendekarên refa yeka seretayî di sala 2015an de gihaşt 265 xwendekarî/ê. Dabeşbî heft polan bûbûn. Hejmara xwendekarên ku perwerde li wan çûbû, gihaşt 250 kesî.

Bi awayekî giştî, hejmara xwendekaran di hemû astan de gihaşt 1300 xwendekarî/ê.

Ji bo perwerdeyê 55 mamoste pêwîst bûn, lê tenê 9 mamoste li wan dibistanan hebûn.

Di van dibistanan de biranşê Desteya Fêrkirinê ya Herêma Kurdistanê bi zimanê Erebî û Soranî tê dayîn. Kesên ku sudê ji vê perwerdeyê dibînin, tenê %30 ji zarokên penaberan bûn.

Rewşa perwerdeyê ji ber kêmbûna mamoste û berdevkan û kêmbûna alavên ku ji perwerdeyê re pêwîst in, pir aloz e.

Destpêkê maomoste bi awayekî xwebexş anku bi fonekî kêm kar dikirin, lê piştre gelekan ji ber ku Rêxistin û ferwerîya herêmê fon nedane wan, dev ji kar berdan.

Jixwe rêveberêya dibistanan ji niştecihên Herêma Kurdistanê tên pejirandin û mamoste ji nav penaberan tên hilbijartin.

**Rewşa aborî:**

%10 tenê ji malbatên penaber rewşa wan a aborî ne baş e, lê belê yên din rewşa wan a aborî baş e.

Derfetên kar di hundirê kampê de nînin, piranîya karkeran li derveyî kampê kar dikin.

Ji sê heyvan û şûn de (yanî ji miha heftan a 2015an ve) alîkarî li ser zêdeyî %50 ji penaberan hat sekinandin. Ew jî ji ber herikîna penaberan ji parêzgehên *Iraq*î û ji Şingalê.

Şerê sîyasî di Kantonê de hişt ku gelek beşgeh rawestin, loma bêkarî di nav penaberan de belav bû.

Tenê rêxistina RÊC alîkarêyan di nav penaberan de belav dike û niha serjimêrîyekê di hundirê kampê de ji bo asta pêdivî û xizanîyê nas bike, çêdike. Da ku ji dêvla zembîlên xwarinê, girtekan (şîkan) bide penaberan.

**Rewşa civakî:**

1- Belavbûna şûkirina pêşwexet.
2- Zêdebûna rewşên berdanê ji ber van sedeman:
- Zewicîna pêşwext.
- Naskirin berî zewacê di navbera wan de nîne.
- Rewşa xizanîyê, nemaze ji ber bêkarêya hevser.
- Hêsanîyên ji bo zewacê tên dayîn (qelenê arzan).
- Dûrbûna her duyan ji xizmên wan û ranehiştina wan ji pirsîyarîyê re.
3- Ji ber kirîza ku Başûr tê de dijî, bêkarî belavbûye. Ev kirîz ji ji ber dijberîyên sîyasî û ji ber hin sedemên din, heye.
4- Asta fêrbûnê di nav zarokan de kêm dibe û nezanî belav dibe.
5- Rêjeya zayînê di nav penaberan de zêde dibe.
6- Hin rêbazên nesincî di nav penaberan de belav bûne.

**Rewşa xizmetguzarîyê:**

Xizmetguzarî pir qels bû. Tenê hin alîkarîyên destpêkê û hin rêbazên dermankirinê yên hêsan weke êşbir û hin zindîdij, peyda dibin.

Nexweşîyên ku di nav penaberan de belav bûne, ev in:

Zikçûna domdar, gurîbûn, sipih, nexweşîyên gurçikan, penceşêr, kulbûna kezebê. Ev tev ji bilî rewşên derûnîyê yên ku penaber tê re derbas dibin.

**Rewşa koçberîyê di kampê de:**

Gelek sedeman di demên dawî de koçberî zêdetir kir ew jî ev in: kirîza ku Başûr tê re derbas dibe, zêdeherkîna penaberan ji parêzgehên *Iraq*î, rawstandina alîkarêya n, belavbûna bêkarîyê, hêsanîyên ji bo çûna Ewrûpayê tên pêşkêşkirin, handana çûna Ewrûpa bi rêya ragihandin û qaçaxvanan re û arzanbûna çûnê (1300 dolar).

Bi dehan malbat koçberî Ewrûpayê bûn. Piranîya wan ji gêncan bûn. Rêjeya wan gihaşt %50. Hin ji wan vegerêyan Rojava, nemaze xelkên Kobanê.

Li gorî serjimêrên destpêkê li Parêzgeha Silêmanîyê, hat xuyakirin ku di kampê de 29 hezar penaber hene û derveyî kampê 1660 penaber heye. Ev jî li gund û kolanên Silêmanîyê, bi vî awayî belavbûyî ne:

**Navçe:**

Navçeya Xebat 125 malbat, Serçinar 140 malbat, Qolêrîsê 100 malbat, Raperîn 135 malbat, Ewlobe 100 malbat, Çarbax 100 malbat, Qereke 100 malbat, Şêx Mihîyedîn 125 malbat, Zergade 70 malbat, Ewal 65 Malbat, Aşitî 60 malbat.

**Gundewar:**

Seyid Sadiq 200 malbat, Bazîyan 400 malbat, Şingal 200 malbat, Ranîye 300 malbat, Qeladiz 90 malbat.

**Ji bo penaberên ku li derveyî kampê dijîn:**

**Astengî û berhengarîyên ku herî zêde li pêşberî wan derdikevin, ev in:**

1- Penaber ji hêla beşgehan ve tûşî teşqele û bikaranîna ji bo berjewendîyan tên, loma piranîya penaberan li nik kesên sivîl bi nirxekî kêm kar dikin an jî dev ji kar berdidin.
2- Zehmetîya peydakirina kar, heger peyda bibe jî, piranîya vî karî di xwaringeh û karên lêkirinê de ye.
3- Misogerîyên tendirustî nînin û dermankirin ji kîsî penaberan e, ev ji bilî bihabûna dermankirinê, nemaze di nexweşîyên domdar de.
4- Fêrbûn ji zarokan re peyda dibe lê zehmetî di çûn û hatin û bihabûna kirê de heye.
5- Bihabûna kirêya xanîyan. Ev kirê di navbera 500 heta700 dolarî de ye.
6- Alîkarî li ser %60 ji penaberan hat rawestandin û bi girtekan (şîk) hatin guhertin. Ev girtek bi 400 dolarî tê nirxandin.

**Têkilîya Ferwerîya Silêmanîyê û asayîşên wê bi penaberan re:**

Destpêkê, şêwazeke baş bi penaberan re bi kar anîn û bi erkên xwe ji bo penaberan ji alîyê peydakirina ewlehî, parastin, piştevanî û çareserkirina pirsgirêkên wan, baş radibûn.

**Niştecihên Silêmanîyê û nêzîkatîya wan ji penaberan re:**

Destpêkê nêzîkatîya wan pir baş bû û gelek alîkarî didane wan, lê piştre şêwaza wan hate guhertin û alîkarîyên xwe rawestandin. Ew jî ji ber sedemên li jêr:

1- Dirêjbûna dema mayîna penaberan li wir.

2- Hedarî û ewlehîya li Rojava, bi taybet li Kantona Cizîr û Efrînê, peyda bûye.
3- Başbûna rewşa aborî ya piranîya penaberan dîyar e. Mînak: kirîna siwareyan, di kampê de li şûna konan avakirina xanîyan û kirîna xanîyan li Rojava.
4- Ji ber ku gelê Rojava gelekî hilberîner e, nerazîbûnek li cem gelê Başûr peyda bû. Jixwe weke tê zanîn gelê Başûr bi karbir û xwesipartina li ser tiştên ji derve, tê naskirin,.
5- Binpêkirina hin penaberan ji dabûnertî û kevneşopîyên olî yên gelê başûr re.

**Rêxistinên Mirovahî:**

Tenê karê wan di warê alîkarîyê de ye. Gelek gendelî, bertîl û xal û xwarzêtî di nav karmendên wê (encûmen) de belav bûne.

**Sedemên herî girîng ên ku nahêlin penaber berê xwe bidin Rojava, lê belê didin Ewrûpayê, ev in:**

1- Tu nîşanderên bidawîbûna şer li Sûrîyeyê xuya nakin û pêşeroja wê winda ye.
2- Zehmetî û bihabûna jiyanê li Rojava. Her wiha derfetên kar nînin.
3- Derfetên fêrbûnê li Ewrûpayê baştir in
4- Hêsankirinên ji koçberan re yên ji hêla dewletên ewrûpî ve tên pêşkêşkirin.
5- Daxwaza jiyana baştir li Ewrûpayê.

**Daxwaz û pêşinyarên penaberan ji Rêveberêya  Xwesr re da ku ew vegerin Rojava, ev in:**

1- Peydakirina derfetên kar.
2- Peydakirina niştecihbûnê.
3- Pêşkêşkirina alîkarîyên mihane.
4- Pêşkêşkirina hêsanî û siwareyan da ku wan bighînin Rojava.

**Dahûrandina agahîyên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê:**

**Serjimêrêya  civakî ya ku Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk çêkir, da ku rewşa koçberên Bakur û Tirkîyeyê bide xuyakirin.**

| | |
|---|---|
| **Zayend**: ○ mê %52.9 ○ nêr %47.1<br>**Rewşa malbatî**<br>○ zewicî %52.9 ○ nezewicî %47.1<br>**Malbata te bi te re dijî**<br>○ erê %75 ○ na %25<br>**Cihê niştecihbnê**<br>○Di hundirê kapê de %2.9<br>○ Li derveyî kampê %97.1 | **Karê ku niha dike...................**<br>**Asta perwerdehîyê**<br>○ Nexwende %11.8<br>○ Seretayî %13.2<br>○ Navîn %30.9<br>○ Amedayî %19.1<br>○ Peymangeh %2.9<br>○ Zanîngeh %22.1 |
| **1-Sedema bingehîn a koçberîya te çi ye?**<br>○ Aborî %38.2 ○ Ramyarî %11.8 ○ Ewlehî 32.4%<br>○ Civakî %5.9 ○ Bedbûna xizmetguzarîyê %11.8 | |
| **2-Tu li hemberî astengîyên dîtina xnîyan hatî yan jî têyî?**<br>○ Erê %73.5 ○ Na %26.5 | |
| **3-Tu li hemberî astengîyên dîtina kar hatî yan jî tê?**<br>Erê 82.4% Na 17.6% | |
| **4-Tu di çarçoveya pîşeya xwe de kar dikî?**<br>○ Erê %27.9 ○ Na %72.1 | |
| **5-Tu tûşî çewsandinê ji hêla xwedîyê kar dihatî?**<br>○ Erê %58.8 ○ Na %41.2 | |
| **6- Tu astengîyan ji nêrîna kêm ji hêla kesan ve dijî?**<br>Erê %76.5 Na %23.5 | |
| **7-Rêjeya zayînê di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %72.1 ○ Na %27.9 | |
| **8-Rêjeya berdanê (jihevketina malbatî) di nav penaberan de zêde dibe?**<br>E○ rê %54.4 ○ Na %45.6 | |
| **9-Rêjeya şûkirina pêşwexet di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %80.9 ○ Na %19.1 | |

| |
|---|
| **10-Rêjeya fêrkirinê di nav zarokên penaber de, zêde dibe?**<br>Erê %91.2 Na %8.8 |
| **11-Rêxistinên mirovahî bi rola xwe di parastina mafên penaberan û çareserêya pirsgirêkên wan radibe?**<br>○ Erê 26.5% ○ Na 73.5% |
| **12. karê van rêxistinên mirovahî tenê di warê karê hewarhatinê de ye?**<br>○ Erê %72.1 ○ Na %27.9 |
| **13-Te astengî di bidestxistina belgeya niştecihbûnê de, dîtin?**<br>Erê %73.5 Na %26.5 |
| **14-Tu bi aramî û hedana derûnî dihise?**<br>○ Erê %20.6 ○ Na %79.4 |
| **15-Gendelî û alozî di nav koçberan de belav e?**<br>○ Erê %77.9 ○ Na %22.1 |
| **16-Nelihevkirin û dijberêya partîyên ramyarî bandorê li têkilîyên civakî dike?**<br>○ Erê %73.5 ○ Na %26.5 |
| **17-Tu handana kesên li Rojava mane dike da ku koçber bibin?**<br>○ Erê %27.9 ○ Na %72.1 |
| **18- Jiyana li Bakurê Kurdistanê (Turkîye) ji ya Rojava**<br>○ baştir e %17.6 ○ xirabtir e %61.8 ○ Weke hev in %20.6 |
| **19- Mayîna te di Bakurê Kurdistanê (Tirkîye) de..**<br>○ Timî ye %2.9<br>○ Demkî ye, heta vegera li Rojava %67.6<br>○ Pirojeya çûna Ewrûpayê heye %29.4 |
| **20-Tu ji ber berdana Rojava, poşman bûye?**<br>○ Erê %73.5 ○ na %26.5 |
| **21-Berî Koçbûna te ber bi Bakurê Kurdistanê (tirkîye) ve, tu li kîjan bajarî dijî?** |

Ji bo naskirina rewşa penaber û koçberên li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, me bi rêya ankêtê re pirsîyarnameyeke nêrînan, li ser rewşa wan çêkir. Em gihaştin 64 kesî. Jixwe ji ber ku me nikarîbû raseterast wan bibînin ji ber sedemên ewlehî, têkilîya me bi wan re bi rêya alavên pêwendîyên civakî re bû.

Bakurê Kurdistanê û Tirkîye:

- Ev pirsîyarname li ser 64 kesî çêbû. Li gor zayendê: nêr %47.1, mêrêjeya wan tenê %52.9 bû.
- Rewşa malbatî: zewicî %52.9 nezewicî %47.
- Rêjeya kesên bi malbata xwe re dijîn: %75 rewşa kitane %25.
- Kesên ku rapirsîn li ser wan hat çêkirin: %2.9 ji penaberên di kampê de bûn. Lê %97.1 ji derveyî kampê bûn.
- Asta xwendinê: %11.8 nexwende ne, %13.2 seretayî ne, %30.9 navîn in, %19.1 amedayî ne, %2.9 peymangeh in, %22.1 zanîngeh in.

Sedema sereke ya koçberîyê, aborî bû, rêjeya wê %38.2 bû. Ew jî ji ber ku piranîya van koçberan ji ber kêmbûna derfetên kar li Rojava û ji ber sedemên ziwabûnê di herêma Cizîrê de, ji zû ve berê xwe dabûn bajarên Sûrîyeyê yên mezin. Her wiha ji ber zagonên zordar ên ku li ser gelê Kurd pêk hatibûn, mîna "zagona 49 ya ji bo avakirin, serjimêr û kembera erebî".

Paşê şer li van deveran qewimî û ew kes vegerêyan Rojava. Lê ji ber dorpêçkirina li ser herêmê, nezelalbûna rewşa pêşeroja wê û kambaxbûna rewşa aborî, ji Rojava koçber bûn.

Ji bo zehmetîya bidestxistina xanîyan, rêjeya wê %73.5 bû, ji ber ku piranîya wan bi rêjeya %97.1 ne li kampan bijîn. Vê yekê hişt ku niştecîbûn peyda nebe û kirê biha bibe. Jixwe sedemên weke dûrbûna xanî ji cihê kar û bi pozbilindî li penaberan meyzandin, bi rêjeya %76.5 derdikeve holê.

Zehmetîya peydakirina kar bi rêjeya %82.4 bû. Ew jî ji ber ku piranîya penaber û koçberan karker bûn, loma hejmara karkeran zêde bû û derfetên kar kêm bûn. Nepeydabûna derfetên kar di karên ku ew tê de pispor in, hişt ku karker hin karan ji bilî karê ku tê de pispor in bi rêjeya %73.1 bikin. Ev jî ji ber ku rêxistinên mirovahî parastina mafên koçberan nakin û pirsgirêkên wan bi rêjeya %73.5 çareser nakin û tenê karê wê di çarçoveya alîkarîyê de bi rêjeya %72.1 bû.

Yek ji dîyardeyên malabatî yên ku di nav koçberan de derket, ew e ku rêjeya zayînê bi rêjeya %72.1 pir bûye. Her wiha rêjeya berdanê %54.4 bû û şûkirina pêşwexet %80.9 bû. Ev jî li nedewamkirina wan ji xwendina wan re vedigere. Ji ber ku asta xwendinê di nav zarokan de bi rêjeya %91.2 qels bûbû. Her wiha rewşa aborî û dabûnerîtî ya ji dabûnerîtên wan cuda û parastina zarokan ji nebaşîyê, ev hemû sedemên şûkirina pêşwext in. Ev jî di nav penaberan de bi rêjeya %77.9 belavbûyî bû. Lewre rewşek ji nerehetîya derûnî di nav penaberan de bi rêjeya %79.4 peyda bûbû.

Ji ber ku jiyana li wir ji ya Rojava bi rêjeya %61.8 kambaxtir bû, gelek ji van penaber û koçberan bi rêjeya %73.5 poşman bûne. Loma  jî gazî Kurdên Rojava nedikirin û li berçavên wn xweş nedikirin da ku ji Rojava koçber nebibin. Rêjeya wê jî %72.1 bû. Ji ber van sedeman jî mayîna van koçberan li Bakurê Kurdistanê  û Tirkîyeyê bi rêjeya %67.6 demkî ye û ew ê vegerin Rojava.

Dîyar bû ku nelihevkirinên ramîyarî bandoreke rasterast li têkilîyên civakî di navbera penaberan de bi rêjeya %73.5, dikir. Van nelihevkirinan cudahî û dûrbûnek di nav penaberan de peyda dikir.

Piranîya penaber û koçberan ji Kurdên ku berî şoreşê ji bajarên Sûrîyeyê yên mezin penaberbûyî bûn. Her wiha hin ji wan ji bajar, bajarok û gundên Rojava jî bûn.

**Dahûrandina pirsyarnameya helwestên taybet, bi koçberên Ewrûpayê:**

**Encamên vedîtina helwestan li Ewrûpayê**

| | |
|---|---|
| **Zayend**: | **Karê ku niha dike**................... |
| ○ mê %58.6 ○ nêr %41.6 | **Asta perwerdehîyê** |
| **Rewşa malbatî** | ○ Nexwende %1.8 |
| ○ zewicî ○ nezewicî | ○ Seretayî %12.4 |
| **Malbata te bi te re dijî?** | ○ Navîn %17.7 |
| ○ erê %45.9 ○ na %54.1 | ○ Amadeyî %25.6 |
| **Cihê niştecihbnê** | ○ Zanîngeh %27.4 |
| ○Di hundirê kampê de %16.8 | ○ Peymangeh %15 |
| ○ Li derveyî kampê %83.2 | |

| |
|---|
| **1-Sedema bingehîn a koçberîya te çi ye?**<br>○ Aborî %44.2 ○ Ramyarî %8.8 ○ Ewlehî %15.9<br>○ Civakî %19.5 ○ Bedbûna xizmetguzarîyê %11.5 |
| **2-Tu li hember astengîyên dîtina xnîyan hatî yan jî têyî?**<br>○ Erê %47.8 ○ Na %52.2 |
| **3-Tu li hember astengîyên dîtina kar hatî yan jî têyî?**<br>○ Erê %59.3 ○ Na %40.7 |
| **4-Tu di çarçoveya pîşeya xwe de kar dikî?**<br>○ Erê %18.6 ○ Na %81.4 |
| **5-Tu tûşî çewsandinê ji hêla xwedîyê kar ve dihatî?**<br>○ Erê %25.7 ○ Na %74.3 |
| **6- Tu astengîyan ji nêrîna kêm ji hêla kesan ve dijî?**<br>○ Erê %44.2 ○ Na %55.8 |
| **7-Rêjeya zayînê di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %53.1 ○ Na %46.9 |
| **8-Rêjeya berdanê (jihevketina malbatî) di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %55.8 ○ Na %44.2 |
| **9-Rêjeya şûkirina pêşwexet di nav penaberan de zêde dibe?**<br>○ Erê %56.6 ○ Na %43.4 |
| **10-Rêjeya fêrkirinê di nav zarokên penaberan de, zêde dibe?**<br>○ Erê %50.4 ○ Na %49.6 |
| **11-Rêxistinên mirovahî bi rola xwe di parastina mafên penaberan û çareserêya pirsgirêkên wan radibe?**<br>○ Erê %64.6 ○ Na %35.4 |
| **12. Karê van rêxistinên mirovahî tenê di warê karê hewarhatinê de ye?**<br>○ Erê %46 ○ Na %54 |
| **13-Te astengî di bidestxistina belgeya niştecihbûnê de, dîtin?**<br>○ Erê %59.3 ○ Na %40.7 |
| **14-Tu bi aramî û hedana derûnî dihisî?**<br>○ Erê %40.7 ○ Na %59.3 |
| **15-Gendelî û alozî di nav koçberan de belav e?**<br>○ Erê %77 ○ Na %23 |
| **16-Nelihevkirin û dijberêya partîyên ramyarî bandorê li têkilîyên civakî di nav penaberan de dikin?**<br>○ Erê %67.3 ○ Na %32.7 |

| |
|---|
| **17-Tu nakokîyê di kesayeta xwe de dijî? (hizra rojhilat û jiyana dewletên Rojava)**<br>○ Erê %54 ○ Na %46 |
| **18- Te karîbû parastina kesayeta xwe ya Kurdî li bîyanistanê bikî?**<br>○ Erê %94.7 ○ Na %5.3 |
| **19- Lawazî di têkilîyên civakî di navbera koçberan de heye û hesta tenêtîyê li cem wan peyda dibe?**<br>○ Erê %70.8 ○ Na %29.2 |
| **20-Tu fêrî jiyana xwe ya nû li bîyanistanê bûye?**<br>○ Erê %54 ○ Na %46 |
| **21-Tu handana kesên li Rojava mane dikî da ku koçber bibin?**<br>○ Erê %42.5 ○ Na %57.5 |
| **22- Jiyana li Ewrûpayê ji ya Rojava...**<br>○ baştir e %66.6 ○ xirabtir e %23.9<br>○ Weke hev in %9.7 |
| **23-Tu li ser berdana Rojava, poşman bûye?**<br>○ Erê %48.7 ○ Na %51.3 |
| **24-Berî hatina te li Ewrûpayê, tu li kîjan bajarî dijîyaî?..................................** |

Ji ber ku hejmara kesên ji Rojava koçberî Ewrûpayê bûne pir mezin bû, me dixwest bi awayekî nêzîk rewşa wan binasin. Loma me rapirsînek li ser helwestan bi rêya pirsîyarname û alavên pêwendîyên civakî re, çêkir. Ev rapirsîn li ser 113 kesî çêbû.

- Rêjeya wan wisa bû: nêr %41.6 û mê %58.6
- Kesên bi malbatên xwe re dijîn %45.9
- Ne bi malbatên xwe re dijîn %45.1
- Kesên di kampan de dijîn %18.6
- Kesên li derveyî kampan dijîn %81.4

Astên xwendinê:

- nexwende %1.8
- Seretayî %12.4
- Navîn %25.6
- Amedayî %27.4
- Zanîngeh %27.4
- Peymangeh %15

Sedema sereke ya koçberîyê, aborî bû. Rêjeya wê %44.2 bû. Ew jî ji ber ku piranîya van koçberan ji ber kêmbûna derfetên kar li Rojava û ji ber sedemên ziwabûnê di herêma Cizîrê de, ji zû ve berê xwe dabûn bajarên Sûrîyeyê yên mezin. Her wiha ji ber zagonên zordar ên ku li ser gelê Kurd pêk dihatin, mîna (zagona 49 ya ji bo avakirin, serjimêr û kembera erebî).

Piştî ku şer li van deveran qewimî, ew kes vegerêyan Rojava, lê ji ber dorpêçkirina li ser herêmê, nezelalbûna rewşa pêşeroja wê û kambaxbûna rewşa aborî, ji Rojava koçber bûn. Ev rêje di nav mêran de bêhtir bû, ji ber ku ew di malbatê de, xwedîkerên bingehîn in. Rêjeya mêrzayendan %44.7 bû  û ya mêzayendan %43.9 bû.

Zehmetîya peydakirina kar bi rêjeya %59.3 bû. Rêjeya nepeydabûna derfetên karên ku ew tê de pispor in, %73.1 bû. Sedemên astengîyên ku li pêşîya wan hatibûn danîn, ev in: sedema yekê: Zehmetîya bidestxistina niştecihbûnê ku rêjeya wê %59.3 bû, Her wiha ji ber ku kar ziman jê re pêwîst e û ji ber ku bawernameyên zanîngehên Sûrî heta ku neyên sererastkirin napejirînin. Ew jî demeke dirêj dixwaze.

Ji bo pirsa me der barê rasthatina wan ji çewsiandinê re, rêjeya bersiva wan bi (na) %74.3 bû. Dibe ku ev jî li zagonên koçberîyê vegerin. Rêjeya kesên ku ji hêla xwedîyê kar rastî çewsandinê tên %25.7 bû. Ew jî ji ber ku rêxistinên mirovahî parastina mafên koçberan dikin û pirsgirêkên wan çareser dikin rêjeya wê %64.6 û karê wan ne tenê di çarçoveya alîkarîyê de bû. Rêjeya wê jî %45 bû. Berovajî karê rêxistinên ku li Başûr, Bakur û Tirkîyeyê kar dikirin, bû. Rêjeya koçberên ku li cem kesên ji derveyî zagonê kar dikin û tu misogerîyên civakî yên koçberan bi wan re nînin, rêjeya vê çewsandinê piştrast dike. Her wiha rêjeya kesên bêkar %77.9 bû. Ew jî li sedemên derbasbûyî vedigerin.

Koçberan, astengî ji nêrîna gel a kêm bi rêjeya %55.8 nakişînin. Ew jî ji ber ku ew têkilîyên xurt di navbera koçber û niştecihên resen de nînin. Her wiha ji ber ku piranîya wan, niştecihbûna wan li bîyanistanê hîna nû bû.

Hin rêjeyan dîyardeyên malbatî yên nû li bîyanistanê destnîşan kirin. Weke zêdebûna rêjeya zayînê bi rêjeya %53.1 bû. Ew jî ji ber ku dewletê hemû mezaxtîyên wan girtine li ser milê xwe. Her wiha koçberîyê rêjeya berdanê zêde kir û bû %55.8. Ew jî ji ber ku cihê jinan li Ewrûpayê pir buha

ye û misogerî ji wan û ji zarokên wan re hene, berovajî jiyana li welatê wan. Her wiha jinan ji ber dabûnerêtên civaka xwe, nikarîbûn li hember stemkarîyê rawestin, vê jî hişt ku rêjeya berdanê zêde bibe.

Ji alîyekî din ve şûkirina pêşwexet bi rêjeya %56.6 bû. Ew jî ji bo parastina zarokan ji nebaşîyê û da ku di civaka ewrûpî de winda nebin.

Rêjeyan, ew cudahîya mezin di paşketina asta xwendinê di nav zarokan de dîyar nekir, rêjeya wan jî: erê %50.4 û na %49.6 bû. Dibe ku ew jî li sedemên zehmetîya ziman û neguncandina wan bi jiyana xwendinê ya nû re, vegere.

Ji bo nakokîya kesayetî rêjeya wê %54 bû. Ew jî li sedemên nepejirandina jiyana nû ya berovajî jiyana wan ji alîyê (dabûnerît, kevneşopî û hişmendîya ku ji zarokatî ve di serê wan de hatîye çandin) ve, vedigere. Her wiha şermkirin, nebawerêya bi xwe, zarvekirina (teqlîdkirin) wan ji Ewrûpîyan re û dûrketina wan ji kesayeta wan re, van sedeman hişt ku koçber ji alîyê derûnî ve bi rêjeya %59.3 ne hedar bin

Her wiha rêjeyan dîyar kir ku gendelîya sincî di nav koçberan de bi rêjeya %77 belav e. Ew jî li sedemên lawazbûna têkilîyên civakî, dûrbûna ji çavdêrêya malbatî, belavbûna bêkarîyê, têgihiştina şaş ji azadîyê re û zarvekirina kesên din, vedigere.

Lawazbûna têkilîyên civakî di nav penaberan de li tenêtî û pêhesîna bi tenêtîyê vedigere, rêjeya wê jî %70.8 bû. Ew jî li sedemên dabeşkirina wan li ser gund û derdora kantonan, her wiha ji ber dûrbûna wan ji hev, vedigere. Nevalabûna wan jî ji ber kar, rê li pêşîya têkilîyên civakî girtîye. Her wiha yek Ji sedemên vê lawazîyê yên ku bandorê li têkilîyên civakî dikin, dijberêya di navbera partîyên ramyarî de ye. Rêjeya wê jî %67.3 bû.

Rêjeya parastina kesayeta Kurdî %94.7 bû. Ew jî li azadîya ziman, dabûnerît û keveneşopîyên neteweyî û nûnertîya neteweyî vedigere. Her wiha ji ber ku piranîya koçberan nû hatibûn Ewrûpayê û hîna di nav civaka Ewrûpî de nehatibûn pişaftin.

Ji ber ku sedema koçberîyê ya sereke aborî û nearamîya rewşê û ewlehî bû, koçberan dît ku jiyana li Ewrûpayê ji ya Rojava bi rêjeya %66.4 baştir e. Ew jî ji ber hedarêya jiyana wan ya aborî û ewlehî.

Rêjeya guncandina bi koçberîyê de %54 bû. Lê tevî guncandinê û tevî ku jiyan li Ewrûpayê baştir e jî, rêjeya poşmanîyê ji ber devjêberdana Rojava %48 bû. Her wiha rêjeya gazîkirina wan a ji bo gelên li Rojava da ku koçber nebe %57.5 bû.

Piranîya koçberên li Ewrûpayê ji penaberên ku li Başûr, Bakur û Tirkîyeyê bûn, an jî ji penaberên ku berê li bajarên Sûrîyeyê yên mezin, mîna (Şam, Heleb, Reqa, Hums û Hema)ê, bûn.

**Rapora lêkolînkirina rewşê:**

Jiyana mirov a rojane bi têkilî, pêwendî, rewş, rûdan, astengîyên cur bi cur û berdewam, bêhêvîkirin, dijberîyên cihêreng, dagirtî ye. Mirov hemû di vê bûnmendîyê de dijîn û her tim hewl didin ku bi rêya têkilîya wan bi astengîyên wan re, bi hin rêbazên reftarî û zanistî rabin. Mebesta wan jî ew e ku hevsengîyekê di navbera pêdivîyên xwe ji alîyekî û ji alîyekî din ve di navbra pêdivîyên derdorê de çêkin. Tevî ew qas kedê, dibe ku hin ji wan nikaribin vê hevsengîyê çêkin. Ji ber vê jî nikarin pirsgirêkên xwe li gorî hêvîyên wan bi xwe û hêvîyên kesên din bi wan, çareser bikin. Ev jî dihêle rewşeke ji nakokî û qelsbûna lihevkirinê li ba wan peyda bibe. Ew nakokî di nekarîna avakirina wan ji têkilîyên dirust bi kes, derdora wan a heyberî, civakî û malbatî re, dîyar e. Yanî qelsbûna guncankirinê di gelek alîyan de dîyar e, dibe ku di alîyê malbatî, aborî û ramyarî de be.

Çi qas şaristanî, rêxistin, zagonên aborî, civakî û ramyarî, sedemên pêşberkirinê, şer, bûyer, bobelatên xwezayî yên ku jiyana mirov dixin metirsîyê de zêde dibin, wisa astengîyên mirov jî zêde dibin.

Em dikarin bibêjin jiyana mirovê hemdem jiyaneke astengî û ragirtinê ye, di heman demê de pêdivîyên ku rojane zêde dibin wî diwestînin û wî dixin metirsîya hêvîşikestinê de.

Ev rewş û ew astengî bi xwe sedemên pirsgirêkên nelihevkirinê ne û ew bi xwe jî dihêlin ku mirov bi hemû awayên ku ji destên wî tên, hewl bide xwe dûrî wan bixe yan zora wan bibe.

Hin ji van awa û rêbazan, berê xwedîyê xwe didin hevsengî û lihevkirinê û hin ji wan jî pirsgirêkên wî zêde dikin. Ev jî dihêle kirîzên wî yên derûnî li gorî rewş û kesan bi rêjeyên cihêreng zêde bibin.

Bi serdemkirina bûyer û pêşveçûnan û ji ber pêşketina xurt li Rojhilata Navîn û bi hewldana ku bi vê pêşveçûnê bimeşin, teqîneke mezin di hemî alîyên jiyanê de çêbû. Vê jî asoyeke berfireh ku gelek enerjî, hêz û alavên cihêreng da ku karibin bi vê pêşveçûnê re guncan bin, li pêşberî kesan vekir.

Ji ber rewşa herêmê (şer, têkbirin û pêşeroja nedîyar...) weke nelihevkirinekê bi daneyên sehkî û şênberî re di jiyana mirov de çêdibe. Mezintirîn parçebûna ku metirssîyeke mizin di jiyana mirov de çêdike, "dîyardeya koçberîyê ye". Ev dîyarde dihêle ku mirov biryarinan bide, dibe ku ew biryar nelihevkirinekê di navbera pêdivî û armancên wî û daxwazên jiyana wî ya nû de çêbike. Ji ber ku zorî û zehmetîyên jiyanê bi berdewamîya mana mirovan, berdewam e. Her wiha ji ber ku biryardaneke bi vî rengî (koçberî) di gelek ast û rewşan re derbas dibe, ji bingeha laş, yanî ji derûnîyê (bihesî û bêhesî) dest pê dike û gelek astengîyên ku bandora wê li ser laş û tevgera laş heye, bi xwe re diafirîne. Ev jî bandorê li ser rola mirov di jiyana malbatî û civakî de dike û tu tişt ji bilî xweradestkirina ji rewşa têdeyî û neçarîyê, li pêşberî mirov namîne.

Me jî bi rêya lêkolîna li ser rewşa xwedîyê biryara koçberîyê ev tişt bi dest xistin. Her wiha bi rêya endamên malbata wî yên ku dixwazin koçber bibin û xwe jê re amade kirine jî me ev tişt bi dest xist. Ev malbata ku dev ji welatê xwe berdaye û di hembêza welatên xelkê de rûniştîye, nizane ka çi pêşeroj li benda wî ye, penaber bûye.

Yek ji astangîyên ku li pêşberî pêkanîna pêdivî û daxwazên van malbatan tê, "hêvîşikestin" e. Komek astengîyên derdorê yên alînegirî, fîzîkî, civakî (dabûnerît û kevneşopî), rêxistin, zagon û kesên din, Ji sedemên vê hêvîşikestinê ne, an jî sedem kesayetî ye di hundirê mirov de û her ku mirov mezin dibe û arezû zêde dibin, zelaltir dibin.

Bê guman her ku daxwazên mirov bi domdarî pêk nayên û dişikin. Her mirov di xiroşîyeke tund re ku zêdeyî karîna wî ye, derbas dibe. Ev tişt jî gelek kêmasîyên ku mirov nikare ji ber bazde û neçar dimîne ku berê xwe bide rêbazine din, da ku ji vê rewşê bireve, bi xwe re tîne.

Her wiha bandora nakokî û dijberîyê, bi taybet dema ku du daxwaz an pêdivî di heman demê û heman hêza bandorê de hebin û nabe her du bi

hev re pêk werin, dîyar bû. Ev nakokî wekî hêvîşikestinekê dihat nimandin. Bandora vê nakokîyê li ser derûnîyê ji ya hêvîşikestinê, bêhtir bû. Piranîya van nakokîyan di hilbijartin û armancên dijberî hev yên di hundirê heman kesî de, bûn. *Mînak*: nirxên ramyarî, civakî, nakokîyên pîşeyî, dijberêya di navbera erk û mafan de û hwd.

Tişta ku balê dikşîne, pileya xweragirtina li hemberî hêvîşikestin û dijberîyê ye. Ev pile ji kesekî heta kesekî cuda ye. Kesên ku xweragirtina wan qels bû û bi wan re digihaşt asta teqînê û rewşa hundirîn bi awayê nexweşîyên laşî mîna serêşî, bilindbûna xwînpestinê, lerizîn, êşa zikî, zikçûn, zikgirtî û tevlîhevîya pergala hilandinê, derdiket. Bersivdayîna hinan, ji ber nehedarêya dirûnîya wan, tundî bû. Ev bersivdayîn bi awayê êrîşên devokî mîna dijberîyê, bi taybet ji hêla xortên nêrzayend ve derdiket holê.

Revîna ji rewşên ku pirsgirêkên kesayetî geş dikin ango yên ku derûnîya mirovan şepirze dikin, li cem çîna rênîşnderan (xwedîyê malê) zelaltir bû. Ev yek jî weke nepejirandina rewşa biêş a ku li benda wan û zarokên wan e, derdikeve holê. Her wiha nebawerêya wan bi nûçeyên ne xweş, tevî ku ew dizanin ku ev nûçe rast in jî, vê yekê zelal dike. Bi vê yekê xwe dixapînin da ku xwe biparêzin û ji ber ku bi vê nebawerîyê tevlîhevîyên laşî sivik dibin û ji ber ku ev nûçe lêdana dil zêde dikin û lerizînê dixin laş de.

Hevbeşîyek di nav van malbatan de hebû. Ew hevbeşî di rêbaza hincetan de dîyar bû. Hêncet jî rêbazeke zanistî ye, bi rêya wê re mirov biryar û reftarên xwe yên şaş bi awayekî hizrî û zanistî ku li cem civakê pejirandî be, derdixe, da ku rastîya reftarên xwe yên şaş veşêre û da ku lihevkirinekê di navbera xwe û pirsgirêk û kirîzên xwe de çêke.

Pirsgirêka herî mezin a ku dibû mîna sînorekî di navbera van malbat û lihevkirinê de, pirsgirêka aborî bû. Vê pirsgirêkê roleke herî girîn û mezin di cudakirina jiyana van malbatan û qelsbûna hizirîna wan de, dilîst. Bi taybet dema ku kirîzên aborî yan jî windakirina kar bi yek carê li pêşberî wan derdiket. Vê jî bandoreke neyînî li ser rewşa wan ya derûnî dikir. Ji ber vê jî nema karîbûn pêdivîyên jiyanê pêk bînin. Ji alîyekî din ve astengîyên civakî û bi taybet ên xwendinê û lêgerîna li pêşerojeke aram ji zarokan re, hebûn.

Hestên herî girîng ên ku bi van rewşan re dihatin, hestên nehedarî yên mîna: xem, astengî, qehirîn û kovanî bûn, her wiha westandin û tengazîya ku ji nearamîya derûnî jî çêdibû. Ev hemî jî di giriftîya wan a ku di çalakîyên wan ên zanistî û lêanînê de dîyar dibû. Her wiha di guncandin, hilberîn, kontirolkirina kesayeta xwe, astengîyên zor û astnengîya reftara civakî de jî dîyar dibû.

Rastîyek heye divê tu carî neyê jibîrkirin. Ev rastî ew e ku di jiyana mirov de gelek astengîyên ku li pêşîya pêdivî û armancên mirov derdikevin, hene. Ev astengî dihêlin pêkanîna van armanc û pêdivîyan ne gengaz bin. Loma divê mirov pêdivî û armancên xwe li gorî rewş û derfetên gengaz eyar bike. Ev jî tê wateya ku lihevkirina kesayetî û lêanîna wê, ew e ku bi rewşa têdeyî re lihevkirî be. Dibe ku ev rewşa têdeyî pêdivîyên te pêk bîne û dibe ku pêk neyîne, yan jî biguhere, lê divê tu di navbera xwe û wê de lihevkirinekê çêkî.

Mirovê hemdem dikare di pêşketina xurt a şaristanîyê de serwext bibe, lê di encamê de karîna xwe ya laşî û derûnî ji dest dide û berxwedana wî namîne. Kesayeta mirovahî di aramîya mirov de ne sereke ye, Ji ber ku mirov dixwaze pêdivîyên xwe yên neraserast razî bike û pêdivîyên xwe yên bingehîn daqurpîne, loma bi gelek rolan radibe. Ev yek jî dihêle kesayeta wî xurtir û baştir bibe, loma em dibînin ku kesê hemdem ji ber tirsa wî ji civaka ku tê de dijî bêhtirê caran berê xwe dide revîn an jî hincetan.

**<u>Pêşinyarên gel:</u>**

Ji bo rawestandina koçberîyê û ji bo em li ser sedemên wê yên herî girîng rawestin, me bi rêya rapirsîna helwestan re ya ku li ser niştecihên Kantona Cizîrê hat belavkirin, me pirsek kir. Ji ber ku sivîl damara civakê ne, pêwîst bû em bi cidî li ser daxwaz û pêkanîna pêdivîyên wan rawestin. Ew jî ji bo ku rewşa xwe ya civakî bilind û baştir bikin û ji bo ku xwe ji dîyardeya koçberîyê ya ku civakê aloz dike dûr bixin. Bi rêya vê yekê re em gihaştin komek pêşinyaran. Ew pêşinyar jî bi vî awayî ne:

1- Debara jiyanê baştir bibe û pêdivîyên jiyanê yên rojane pêk werin. Ji ber ku nan heybera bingeh e, pêwîst e baştir bibe.
2- Derfetên kar peyda bibin û dahata kesan zêdetir bibe.

3- Lêpirsîna bazirganan were kirin. Kêmkirin û yekîtîya bihabûna heyberan û kêmkirina bacan pêk were.
4- Peydakirina derfetên kar ên li gorî jinan guncan û yên ku rûmeta wan diparêze û wan dûrî nerêkên civakê dike.
5- Bi rêya peydakirina heyberên destpêkê û alîkarêya aborî re, handana aborîya gundewarî (çandin, karên destan).
6- Avakirina beşgeh (kompanya) û pirojeyên veberanînê di Rojava de.
7- Dûrketina ji rotînê di hundirê sazîyên Rêveberya Xweser de. Têkbirina gendelî û rawestana li hemberî her kesê ku gendelîyê belav dikin. Ew jî bi rêya damezirandina komîtene serbixwe re.
8- Peydakirina amûrên xweşîyê ji gêncan re.
Ji ber ku gel ji dehên salan ve ji alîyê derûnîyê ve ji koçberîyê re amade ye. Her wiha ji ber ku koçberî encamek ji encamên rewşa niha ye. Bi rêya wê re mirov li jiyaneke baştir digere. Her wiha ji ber erkê xwe yê neteweyî direve. Divê hizirîn û agahdarî, di nav gel de werin belavkirin. Her wiha divê li ser girîngîya rewşa dîrokî ya ku em tê re derbas dibin, werin hişyarkirin. Ev erk jî li ser pişta rewşenbîran e.
9- Divê çavdêrî li ser komîteyên hawarhatinê hebe, ji ber ku ev komîte bi pîvanên dijberî hev kar dikin. Ev jî nerazîbûnekê li cem gel çêdike, loma gerek e li ser rêbaza karê rêxistinên hawarhatinê, were rawestandin.

10- Divê çavdêrî li ser karê komînan hebe û bikevin tevgerê, da ku bighêjin asta ku tê xwestin.
11- Gerek e rêgeza dadwerêya civakî pêk were û astengîyên ewlehî sivik bibin.
12- Piştîvanîya çanda pêkvejiyanê, pejirandina kesê li hember xwe û biratîya di nav hemû niştecihan de, were kirin.
13- Dûrketina ji rêgez û dabunerîtên kevin û aloz ên ku li ser jinê tên bikaranîn. Ji ber ku ev sedem ji koçberîya piranîya jinan re a sereke ye.
14- Hin sedemên koçberîyê, ev in: Tirsa ji pêşerojê, zêdebûna rêjeya xizanîyê, tunebûna ewlehî û belavbûna malbatî.
15- Gerek e derfetên kar ji çîna xwendevanan re peyda bibin û giringîyeke bêhtir bidin wan.
16- Kesê guncav li cihê guncav bi cih bikin, ji ber ku hin karmend karînên pêwîst li cem wan peyda nabin.

17- Gerek e zanîngeh li Qamişlo ava bibin da ku zehmetîyên daravî û çûn û hatinê sivik bibin.
18- Gerek e girîngîyê bidin xwendin û agahdarkirinê.
19- Gerek e derfet ji kêrhatîyên gêncan re bên dayîn da ku koçber nebin.
20- Gerek e çareserîyek ji nakokîyên di navbera alîyên ramyarî de were dîtin.
21- Gerek e PYD dev ji sîyaseta xwe ya tekane (yak serwer) berde.
22- Gerek e mirov bi serbestî nêrîn û helwestên xwe eşkere bike.
23- Gerek e dest li ser samanên giştî bê dayîn û ji milet re werin bikaranîn.
24- Gerek e hemî berpirsîyarên sîyasî û leşkerî yên ku zarokên xwe derxistine derveyî Rojava, werin qewtandin.
25- Gerek e ewlehî û parastina zemîna Rojava peyda bibe. Her wiha derfet li pêşîya tu kesî nemîne da ku desthilatdarîyê bike.
26- Gerek e leşkerêya neçar rabe û tevlîbûna azad û alîkarêya xwebexş li şûnê be.
27- Her wiha piranîya malbatan tekez kir ku gerek e erka xweparastinê li dar be. Ji ber ku ev erkekî neteweyî ye. Loma gerek e her kes parastina zemîn û malbata xwe ji sawkarîyan bike.
28- Ragihandineke ku handana mayîna li welêt bike û li dijî kenalên ku koçberîyê li ber milet xweş dikin (Rudaw) nîn e. Loma gerek e pêşketinek di sazîyên ragihandinê de çêbe û li ser karê wan were rawestandin.
29- Banglêkirina hemî koçberan da ku vegerin welatê xwe û rê ji wan re were vekirin û handana wan were kirin da ku pereyên xwe di pirojeyên li Rojava û di xizmeta gelê Rojava de bi kar bînin.
30- Gerek e ragihandin bi hemû alav û rêbazên xwe, sîyaseta Dewletên Rojava (Ewrûpe...) û armancên wê ji vê handan û hêsankirina koçberîyê re, werin eşkerekirin. Jixwe daxwaza wan jî ew e ku armancên xwe yên sermayedarî pêk bînin.
31- Gerek e zagonên ku ji hêla Rêveberêya Xweser ve derketine ji nû ve werin sazkirin. Da ku li gorî hemû pêkhateyan gengaz bin.
32- Karê Rêveberêya Xweser pêngava yekem e di demokratkirina herêmê de û di pêkanîna jiyana hevpar û ewlehî de.
33- Birina destkarînên pêwîst da ku rê li ber tevger û daxuyanên neberpirsîyar ên ku koçberîyê handan dikin, werin girtin. Divê veguherandina van kesan li dadgehê bê kirin.

34- Bijîşk bi karê xwe yê mirovahî ranabin û tenê armanca wan bûye daneheva pereyan, loma gerek e bikevin bin çavdêrîyê.
35- Peydakirina misogerêya tendirustî.
36- Gerek e bergerîyên tund ji bo rawestandina koçberîyê werin kirin û qaçaxvan werin hesabxwestin.
37- Destyaw (qerz- deyn) bi misogerêyan werin dayîn.
38- Gerek e sûtemenî bi nirxên arzan bi taybetî ji bo çandinîyê peyda bibin.
39- Gerek e xwespartin li ser malbatên welatparêz û malbatên şehîdan be û jiyaneke birûmet ji wan re were peydakirin.
40- Bicihkirina pirojeya Dicle û perepêdana wê ji herêma Cinûb-Elred were standin. Her wiha vegerandina zevîyan li xwedîyê wan ê resen (herêma Kurdan).

Dîyar e ku nakokî di navbera pêşinyarên gel de hene, ew jî ji ber ku me hewl da em bi hemû çînên civakê û bi hemû endamêtîya wan a sîyasî, olî û neteweyî re, têkildar bin. Me hewl da em ne tenê bi helwestekê ve girêdayî bin û em pirsgirêkên wan ji gelek alîyan ve binasin.

Ji bo destpakîya zanistî, me pêşinyar bi giştî rêz kirin da ku em wekî rêyekê di navbera gel û alîyên berpirsyar de bin. Lê ne pêwîst e ku ev pêşinyar hemû bûnmendîyên li ser zemînê binimîne. Em jî weke girûpeke lêkolîner bi rêya ger û dîtina me ji rewşê re, hin têbînîyên me hene.

**Raporek der darê hevdîtina bi partî û alîyên berpirsyar re, ji bo koçberî û sedemên wê bên giftûgokirin û çareserî ji hêla wan ve werin pêşinyarkirin.**

Piştî em gihaştin encamên pirsîyarnameya koçberîyê yên jimarkî û pêşinyarên gel, girûpa me ev encam bi alîyên berpirsyar, partîyên sîyasî, desteyên Rêveberêya Xweser û dergehên sînorî, giftûgo kirin.

Partîyên ku hevdîtin bi wan re hat kirin ev in: (Partîya Demokrat a Pêşvero-Kurd li Sûrîye, Partîya Çep a Kurd li Sûrîye, Partîya Guhertina Demokratîk a Kurdistanî, Yekîtîya Lêbral a Kudristanî, Komeleya Çandî a Siryanî, Partîya Yekîtîya Demokrat, Partîya Demokratîk Kurd li Sûrî-Elpartî, ENKS, TV-DEM)

Deste: (Desteya Jinê, Desteya Cîbicîkirinê, Desteya Zagonsaz, Desteya Ragihandinê, Desteya Berevanîyê, Kenala Ronahî, Navenda Asayîşê û Dergehên Sêmalka û Dirbêsîyê)

Piştî pêşinyarên ji hêla gel û encamên ji hêla girûpa me ve hatin bidesxistin, pêwîst bû em hevdîtinan bi alîyên berpirsyar re çêkin. Bi taybet piştî tewankirina wan ji hêla gel ve ku bi karê xwe ranabin û hin ji wan bi dijminê şoreşa Rojava re alîgir bûn. Ji ber van sedema pêwîst bû em van hevdîtinan çêkin. Da ku em sedemên vê rewşê giftûgo bikin û xalên lawaz ên ku dewlet bi rêya wan re çavên xwe berdidin wizên welat, binasin û çareserîyên zû û qonaxî jê re bibînin, da ku koçberî were rawestandin. Loma pêwîst bû em nêrîna van alîyên berpirsîyar di vê mijarê de binasin. Encama ku me ji van hevdîtinan girt ew bû ku du şepêl di warê sîyasetê de hene"TEV-DEM û ENKS"ê.

Li gorî van partîyan, sedema koçberîyê ya sereke, djiberêya berjewendîyên partîyên ramyarî ye. Ev nêrîn jî ne weke nêrîna gel e, ku dibînin sedma aborî sedema koçberîyê ya sereke ye.

Şepêla yekem "TEV-DEM" dibîne ku berdewamkirina dijberî û nelihevkirinan di navbera partîyan de ji ber bandora destên derve, rê li ber yekîtî û lihevkirinê digire. Ew jî bi rêya ENKSê û tawankirina wê bi derengkirina pirojeyan dike. Ji ber tevî ku pirojeyên li ser zemînê bi TEV-DEMê re pejirandine jî, lê di kêlîya dawî de û berî pêkanîna van pirojeyan, vekişîya.

Vê partîyê (TEV-DEM) pêwîst didît ku divê kar û xebat ji bo bicîkirina hêza Kurdî di dema niha de, pêk were, da ku danpêdan û piştgirtina hêzên dewletî bi hebûna Kurdî çêbe.

Şepêla duyem ENKSê dibîne ku sedema sereke ya koçberîyê ev in: TEV-DEM, Rêveberêya Xweser û zagonên wê yên ku dixwaze bi rêya wan re herêmê ji Kurdan vala bike. Armanca wê ji van zagonan ew e ku berjewendîyên xwe pêk bîne û bi tena serê xwe desthilatdar be û tu kesî bi xwe re nepejirîne. Da xuykirin ku gel nerazîbûna xwe ji biryar û zagonên tund ên ku ji hêla Rêveberêya xweser va li ser wan hatine pêkanîn, da dîyarkirin. Her wiha tekez kir ku hemû destkeftîyên li ser zemînê ji hêla Rêveberêya Xweser û sazîyên wê ve hatine kirin, şeklî ne û tu

danpêdaneke navneteweyî pê nehatîye kirin. Yanî ENKSê hebûna Kurdî bi danpêdana navneteweyî ve girê dide û paşê dê kar li ser pêşxistina vê hebûnê were kirin.

Her wiha şepêlek heye nakeve bin sîya her du alîyan de, dibêje: Tevî nûbûna Rêveberêya Xweser û TEV-DEMê, her wiha tevî kêmasîyên wan, xizmeta şoreşa Rojava û gelê wê dikin. Bi hemû hêza xwe hewl didin ku parasina şoreşê bikin û armancên wê pêk bînin. Berovajî ENKSê ku li dijî şoreşê kar dike û hewl dide ku wê têk bibe. Ew jî ji ber ku ENKSê bi ecindeyên derve ve "Tirkîye" girêdayî ye. Jixwe em hemû dizanin ku Tirkîye dijminê Kurdan ê yekem e. Damezirandina statûyek Kurdî ku danpêdan pê hebe, ne ji berjewendîyên wê ye. Dawî jî kêmasîyên van şepêlan ji alîyê gel ve pir in. Ew jî ji ber ku nikarîbûn gel serwext bikin. Her wiha nikarîbûn wan ji şoreşê re amade bikin û bihêlin ku jiyana xwe li gorî guherînên vê şoreşê bidomînin.

Desteyên Rêveberêya Xweser û sazîyên wê, dibînin ku sedema sereke ya koçberîyê, ew e ku gel ji koçberîyê re amade bû, ji ber ku girêdana wî bi welatê wî ve lawaz e. Her wiha sedemine din ê girêdayî şer û şoreşê jî hene. *Mînak*: qelsbûna xizmetguzarî, qelsîya asta debara jiyana kesan, bihabûna heyberan, nehedarêya ewlehî û hwd. Lê ew dibînin ku ev nabin sedem ji koçberîya bi vî awayê ne asayî re.

Van desteyan bi hemû hêza xwe hewl da ku van pirsgirêkan bi rêya peydakirina kar, zêdekirina fonan, dispilînkirina nirxên heyberan û bazarê û hwd re, çareser bikin.

Di serlêdana me ya dergehên sînorî de (Sêmalka û Dirbêsîyê) me rêveberêya van dergehan û hin penaberên ku vegerêya bûn welêt, dîtin. Hemîyan tekez kir ku hemû penaber û koçber ji ber sedemên ewlehî, aborî û nezelalbûna pêşeroja Sûrîye, di nav de Rojava, revîyane. Lê piştî ku ewlehî, hedarî û vegeşbûn peyda dibin, dê gelek malbat vegerin welêt.

Di dawî de hemîyan tekez kir ku rewşa Rojava tê re derbas dibe, rewşeke asayî ye. Ji ber ku herêm, di gelek guhertinên ji kokê ve, derbas dibe. Lê dema em cudahîya di navbera rewşa Rojava û herêmên Sûrîye yên din de mêze bikin, em dibînin ku rewşa Rojava ji yan wan herêman ji alîyê ewlehî, hedarî û parastina bingeha jêrxaneyî, gelekî baştir e. Ya ku vê

tekez dike ew e ku gelek malbatên penaber ji parêzgehên din, Şingal û koçberên *Iraq*, li Rojava pena bûne. Di encamê de em gihaştin wê ykê ku cudabûna di rêza Kurdî de û neyekîtîya wê, hişt ku cudabûn û nepejirandin ji alîyê hin çînên gel ên girêdayî alîyên din, çêbe. Loma dema zagonek derdikeve ev çîn, ne ji ber ku ev zagon bi berjewendîyên wî re nealîgir e, lê belê tenê ji ber ku partîya wî di derxistina vê zagonê de ne beşdar bû, napejirîne. Her wiha ev partî hewl didin ku peyrewên xwe ji bo ku rewşeke nehedar biafirînin û wan zagonan reş bikin, bi kar tînin,. Ji her kesî re baş xuya ye ku pirsgirêk ne pirsgirêka van zagonan e bi qasî ku pirsgirêka nepejirandina alîyê din e.

Pêşinyarên van alîyan ên herî girîn ji bo rawestandina koçberîyê:

1- Peyketin û darizandina hemû qaçaxvan û bazirganên mirovan û rawstandina çalakîyên wan.
2- Gerek e dewletên Ewrûpayê piştîvanî û pêşwazîkirina koçberan rawestînin.
3- Kar li ser alîyê aborî were kirin, ew jî bi rêya vekirina pirojeyên veberanînê, peydakirina derfetên kar, zêdekirina dahatên kesan û peydakirina pêdivîyên jiyanê yên pêwîst (nan, av û kehrebe)
4- Hişyarkirina gel û handana wî da ku bi welatê xwe ve were girêdan û parastina wî bike.
5- Rola komînan xurtir bibe da ku xizmetan pêşwazî bike û li ser pirsgirêkên gel raweste û çareser bike.
6- Rewşeke ji lihevkirinê di navbera pêkhateyên herêmê de peyda bibe. Ji bo wê jî karekî zelal da ku ewlehî pêk were, pêwîst e.
7- Peydabûna ragihandineke azad ku dûrî berjewendîyên ramyarî be.
8- Zêdekirina wane û semînerên zanistî da ku gel were hişyarkirin.
9- Yekbûna alîyên ramyarî. Her wiha kar, ne ji bo berjewendîyên ramyarî lê belê ji bo berjewendîyên gel, were kirin.

10- Berî ku zagon derkevin, baş li ser wan were sekinandin. Her wiha gerek e gel ji pêşwazîkirina van zagonan re, were amadekirin.

Di dawî de, bi rêya rewşa jiyankirî û bi rêya têbînîyên me li ser wê rewşê, me dît ku alîyên li Rojava (TV-DEM û Rêveberêya Xweser), tevî ku

alîyên din dixwest wan reşîyan bikin û wêneyê wan li ber çavên gel nexweş bike jî, lê ev alî her tim bi bandor in.

Wan her tim alîkarêya şoreşa Rojava û parastina wê dikir û bi cidî li ser pirsgirêkên gel radiwestîyan û bi karînên xwe yên hêsan ên ku peyda dibûn, çareser dikirin. Ya girîngtir, rewşa ewlehî û aramî, ya ku bi saya hêza xwe ya leşkerî, peyda kir. Vê hêzê hişt hemû alîyên navneteweyî û herêmî danpêdanê pê bikin. Ev nayê wateya ku şaşîtî û kêmasî li cem nînin, lê wan tekez kir ku ew ê li ser van kêmasî û şaşîtîyan rawestin û çareser bikin. Ya ji me re girîng di vê mijarê de, ew e ku li kêmasîyên xwe mukir tên û rexnedayîna xwe didin, berovajî ENKSê ku tu bingeha wê li ser erdê nîne û tenê sozên bê misogerêya ejindeyên ku pê ve girêdayî, dide gel.

**<u>Kêmasîyên lêkolînê:</u>**

Dibe ku encamên lêkolînê li şaşîtîyên şens û lêhatinê vegerin.

- Heger encamên ankêtê, li ser kesine pispor bihata pêşkêşkirin, dibe ku wê demê encam bêhtir nimandina lêhatinê bikirana.
- Têghiştina şaş ji xalên ankêtê re û nêzîkatîya serveyî ji hêla lêkolînberan ve.
- Her wiha pêkanîna ankêtê bi awayekî dirust ji hêla girûpa kar ve nehat şîrovekirin.

# Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

(Beşa 3)

**Beşa duyem:**

## Binemayên Ewlekarîya Niştimanî Li Bakur Û Rojhilatê Sûriyeyê

Eger em li teybetmendiyên xaknîgarî û ciyolojîk ên bakur û rojhilatê Sûriyeyê binerin dê baş xuya be ku cihekî stratejîk e. Her wiha cihêrengiyeke çandî û etnîkî jî tê de heye. Dîroka têkiliyên civakî, aborî, çandî û ramyarîdi navbera pêkhateyên wê de vedigere hezarê salan; loma di xaknîgarêya niştimanî ya Sûriyeyê de yek ji cihên stratejîk e. Vê yekê jî girîngiyeke cyopolîtîkî lê bar kiriye. Ya ku vê yekê tekez dike hewildanên piranîya hêzên ku tev li kirîza Sûriyeyê bûne çi yên derveyîn bin çi jî yên hundirîn bin ku vê herêmê desteser bikin û yan jî kontrol bikin. Tevî ku piranîya binemayên geşepêdan û pêşveçûnê li vê herêmê hebûn jî, nasnavê herêmên nepêşketî yên nûhatî li vê herêmê ji hêla piranîya desthilatên Sûriyeyê ve lê dihat kirin. Xuya ye ku pirojeyên ramyarîyên desthilata navendî, xweî rolek bûn di vê yekê de. Ji aliyekî din ve malgirtina birciwazî ya şamî û helebî jî bi rolekê di vê derbarê de lîst. Lê tê zanîn ku ev herêm (herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê) di asta yekem de bû li seranserî Sûriyeyê ji aliyê hejmara tevgerên ramyarî. Her wiha gencîneyeke wê ya çandiniyê ya pir mezin heye. Jixwe ji bo her kesî kaniyên enerjiyê yên li herêmê (petrol, gaz, enerjiya kehrebeyê ya ku ji bendavên çemê Firatê tê bidestxistin) diyar in. Her wiha ev herêm di navbera du dewletên ku xwedî bandor in di ramyarî û aborêya Rojhilata Navîn de (Tirkiye û Iraq) ev herêm rastî yu pêşketinekê di warê pîşesazî, teknelojîk, bazirganî û perwerdeyê de nedîtiye û tenê aborêya herêmê girêdayî çandinî û xwedîkirina sewalan bû. Ji aliyê civakî ve, herêm ji ber hestên nijadperestî û olî yên ku carinan digihaştin asta şofînizm û tundrewiyê, rastî parçebûnên ramyarî û etnîkî hat.gihaştibû wê astê ku bûyerên dewletên derdorê û şerên bawerî û nijadî yên ku li wan deveran diqewimîn, bandoreke neyînî li hesên niştecihên herêmê dikir. Xuya ye ku danûstandina bi ewlekariyeke hişk bi hemû pirsgirêkên civakî, aborî û ramyarî û çewsandina azadiyan û binpêkirina mafan bi rolekê di gurkirina

van hestan de rabûn. Ji ber vê jî beşa herî gelek a çewsandin û zaordariyê ji para vê herêmê bû.

Li gorî vê yekê em dikarin bibêjin ku pêkhateyên vê herêmê tu ewlehî û pêşketin nedîtin. Ango tu rewşeke ewlehîyê ya mirovahî li vê herêmê nehatiye jiyankirin. Gelek kes di rewşekê ji tirs, hestên nehezkirinê ku hin caran dagirtî tolhildan bûn de dijîn û xwestekeke gurkirina şer li ba wan peyda dibû; eger ne şerê xwînî be, bi kêmanî şerê hizrî be. Ev yek berê û heya niha jî ji hêla hêzên ku herêm ji serdema dagirkerêya osmanî, ferensî û heya bighêje rêjîma îro desteser kirine ve tê meşandin. Loma xuya ye ku ramyarîya ''ji hev parçe bike tu yê bi ser bikevî'' xurt lidar e û tewereyeke şerê taybet pêk tîne; çimkî ev ramyarî rêbazê herî erzan ê desteserkirina gelan dihewîne. Bê guman ev ramyarî her tim xwedî bandoreke neyînî bû ku mirov gelek caran dikare wê weke ramyarîeke hilweşîner bi nav bike. Ya ku vê yekê piştrast dike hejmara koçper, girtiyê helwestan, xizanî, paşvemayîn û kirîza ku qewimiye. Di encamê de mirov dikare bibêje ku herêma bekur û rojhilatê Sûriyeyê di pirojeyên taybet ên ewlekarîya niştimanî ya desthilata Sûriyeyê de ne hazir bû. Tenê li herêmê weke baxçeyekî yan jî jêdereka komkirina samanan ji bo desthilatê dihan nihêrtin. Her wiha desthilatê ji dêvela ku xwe bispêre ewlekarîya niştimanî di ramyarîyên xwe yên hundirîn û derveyîn de, xwe spartibû pergala ewlekariye neteweyî, wisa lê hat ku têgiha ewlekariyê ketibû destê dezgehên çewsîner û bûbû weke teybetmendiyekê ji van dezgehan re. Ev yek careke din çîroka ''birayê Mezin'' a Corc Oroyîl tîne bîra e. Ev ramyarî xwedî bandoreke hilweşîner bû li ser rewşa derûnî û civakî ya welatiya bû. Her endamek di sazîyên dewletê de bûbû desthilatdar û di heman demê de di bin desthilatdarêya karmendê ji xwe mezintir de bû. Li hemberî vê yekî civak ketibû rewşekê ji bêhêvî û bixwenebaweriyê û regzên rexneyan li cem winda bûbûn. Gel di vê rewşê de beramberî hejmarek bijarte mabû; yan koçber bibe, yan xwe li gorî rewşa heyî eyar bike û yan jî serê xwe li hemberî desthilatê hilde, bê guman encama vê serhildanê jî dê girtin, îşkencekirin, girtine heta hetayê, bidarvekirin û yan jî windakirin be. Dibe ku rewş li gorî kirêya rên rêxistinên tundrew ên mîna Daişê, ne ewqasî zor be, lê gerek e neyê jibîrkirin ku ev destwerdana di welat de jî encama zordarêya rêjîm û pilanên wê yên pêkanîna desthilateke giştgirî û saman e.

Li gorî tiştên derbasbûyî em nikarin qala rewşa ewlekarîya niştimanî û rehendên wê li bakur û rojhilatê Sûriyeyê bikin ji ber ku di rastiyê de ev ewlekarî berî damezirandina Rêveberêya Xweser nebû û di pirojeyên hikûmî de ne xwedî girîngiyekê bû. Ev yek sedema sereke ye di lewazîya Pabendîya bi nasnameya niştimanî de ye. Ya ku vê yekê diyar dike ew e ku xwesteka niştecihên herêmê nîn bû ku alîkarêya desthilata navendî bikin û alîkariyê di vemirandina tevlîheviya ku 2011an li Sûriyeyê qewimîn, bikin. Her wiha gel di navbera bijardeyên ramyarî, civakî û leşkerî de tar û mar bûn û bûn êsîrê van aliyan; ji lew re hin herêm ketin bin desteserêya komikên radîkal de û hin man di bin desteserêya rêjîma navendî de û hinên din jî herêmên Rêveberêya weser hilbijartin. Rewş bi awayekî dramatîkî bi pêş ve çû heya ku rêxistina Daişê derket holê û herêm li ser hisabê rêjîm û rikberêya çekdar desteser kir. Di heman demê de Rêveberêya Xweser xurt û berfereh bû. Di encamê de şer di navbera her duyan de weke du hêzên sereke di bakur û rojhilatê Sûriyeyê de rû da. Dawî jî ji ber piştgirêya gerêlî, hebûna peojeyeke demokrasî li balê ku ji pirojeyên hêzên xwecihî yên dîtir baştir e, Rêveberêya Xweser bi ser ket. Loma em dikarin bibêjin ku qonaxa Rêveberêya Xweser qonaxeke ramyarîya geş û nû ye li herêmê, çimkî wê girîngî da hin tiştên ku berê li ser niştecihên herêmê qedexe bûn. Dibe ku ya ku hişt bijardeyên niştimanî yên ramyarî, civakî û leşkerî li hev bikin, ew be ku wan rêya aştî û jiyana hevbeş neqandibe. Ya ku amaje bi vê yekê dike ew e ku van bijardeyan li ser girêbesteke civakî li hev kir ku ji hêla piranîya niştecihan ve hat pejirandin. Ev girêbest xwe dispêre qewtandina şofînizm, tundrewî û çanda nehezkirinê. Di heman demê de xwe dispêre rêzdarêya tevahî çand, bawerî, maf û azadîyên di çarçoveya nirxên exlaqî de.

Rêveberêya Xweser hejmarek bergirî, prose û piroje ji bo xizmeta welatiyan û parastina wan di herêmê de bike. Tevî ku Rêveberiyê xwe bi awayekî rasterast nesparte têgiha ewlekarîya niştimanî jî, lê girêbesta civakî û karên hundirîn û derveyîn ên ku hatin cîbicîkirin, dikevin çarçoveya pergala ewlekarîya niştimanî bi têgeh û rehendên wê de. Em vê gotinê ne ku weke berevaniyekê di ber Rêveberiyê de dibêjin, çimkî ev rêveberî jî nikare ji hemû şaşiyan xwe rizgar bike û çimkî hê gelek metirsî û astengî li pêşberî wê hene, lê yak u dihêle em van gotinên li jor bibêjin ew e ku Rêveberêya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyeyê bûye penageh ji bo hemû

pêkhateyan û li gorî pirojeyên ramyarîyên opizisyona radîkal û rêjîmê, bûye bijarteya herî baş. Ji aliyekî din ve Rêveberêya Xweser bûye armanceke rasterast ji bo hêzên ku dixwazin herêmê dagir an jî desteser bikin, her weke Tirkiye, Rûsiye, Îran û Emerîkayê. Ev dewlet bûne astengiya sereke li pêşberî bidestxistina Rêveberêya Xweser ji pejirandinê re li ser asta herêmî û navneteweyî. Tevî rola Rêveberêya xweser di têkbirina Daişê de û peydakirina wê ji penageheke biewleh ji bo sedê hezarên sivîlan re û tevî piroje ya wê ya demokrasî yak u dikare çareseriyê ji piranîya pirsgirêkên Sûriyeyê re bibîne, van hêzan rê li ber çûna Rêveberiyê li piranîya civînên ramyarî, abrî û civakî yên girêdayî aloziya Sûriyeyê girt.

Pêkhateyên herêmê bi hemû awayan tên armancgirtin; her weke dorpêçkirina aborî û ramyarî û şerê derûnî û taybet ê ku çanda civakan û rewşa ewlehîyê armanc digire; loma pêwîstî bi sazkirina nerîneke diyar û hûrgil li ser ewlekarîya niştimanî ji aliyê astengî, metirsî û rûbirûyên ku li pêşberî wê derdikevin ve heye. Her wiha pêwîstî bi stratejiyeke guncav ji bo rê li ber van metirsiyan were girtin, heye. Di heman demê de gerek e ewlekarîya niştimanî bi rêya naskirina xalên hêz û lawazîyê û sûdwergirtina ji tecrubeyên gelên din, were xurtkirin. Jixwe gerek e ev yek di çarçoveya ewlekarîya niştimanî ya giştî de were meşandin, çimkî neberdana nasnameya niştimanî ya sûrî, xwesteka jiyana hevbeş di Sûriyeke demokrasî de, hewildana rizgarkirina xakên dgirkirî û pêkanîna demokrasî û dadmendiyê, pireke bihêz ava dike ku ev pir dikare ewlekarîya niştimanî ya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê û ewlekarîya Sûriyeyê ya giştî bi hev ve girê bide, loma her tiştê ku dê di ware ewlekarîya niştimanî de were gotin dê girêdayî ewlekarîya niştimanî ya Sûriyeyê be û dê beşeke jîndetî jê be.

Loma gerek e Rêveberêya Xweser têgiha ewlekarîya niştimanî bi awayekî rasterast di pilan û pirojeyên xwe de bi cih bike; her weke pirojeyên aborî, civakî, Tenduristî û leşkerî. Ev yek ji bo çêkirina sûretekî ji ewlekarîya niştimanî li ba berpirsiyar û welatiyan, pêwîst e. jixwe tê zanîn ku Rêveberêya Xweser geşepêdaneke baş di rehendên sereke yên ewlekarîya niştimanî de pêk anî. Di heman demê de xalên lewaziyê, şaşî û pirsgirêk çareser kirin. Nirxandina rehendên sereke yên ewlekarîya niştimanî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê pir girîng e ji peydakirina dîtineke giştî

ku karibe zemîna pêwîst ji bo pilankirina stratejîk a niştimanî peyda bike ku ev piroje karibe ji aliyekî ve danûstandinê bi metirsî, astengî û gefan re bike û ji aliyekî din ve pirojeyên geêepêdanê dayne. Ev mijar gelekî şaxdayî ye û mirov nikare di lêkolînekê de tevî li pêşberî xwîneran raxe, çimkî pêwîstiya wê bi dehên lêkolînan heye. Loma di vê lêkolînê de tenê dê behsa tiştên sereke yên giştî û yên pêşîne di çarçoveya ewlekarîya niştimanî de û yên ekûz û hevseng were kirin.

**Yek – Rehenda aborî:**

Çandinî û şivantî bingehên aborêya xwecihî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê ne, ew mîna pîşeyekê ne ku piranîya niştecihên wê tê de dixebitin, yên mayî jî di hin pirojeyên bazirganiyê û karên pîşesaziyê, her wiha di nava sazîyên hukûmetê de dixebitin. Lê belê di salên ziwahiyê de rewşa aborî lewaz bibû, ji ber ku ti pirojeyên rajeguzarî û geşedanê tune bûn, lewre gelek niştecihan berê xwe didan koçberiyê, hem li hundir mîna (Şam, Heleb û Humsê) hem jî li derve mîna (Libnan, Ewropa û Kendava Erebî);. Aborêya xwecihî tenê ji bo qedandina pêwîstiyên jiango yên rojane dihat bikaranîn. Li gorî nirxandinên bernameya Neteweyên Yekbûyî ya geşedanê di sala 2004an de ya taybet bi Sûriyeyê[1], rêjeya kesên ku pêwîstiyên xwe yê xwarinî û nexwarinî bi dest naxin 11.4% (ango 2.02 milyon kes) e û di sala 2005an de jî destnîşan kir ku piranîya hejaran di gundan de jiyan dikin û xwe disipêrin çandniyê mîna çavkaniyeke sereke ya pêwîstiyên jiango. Bi tevî ku welat di berhemên çandiniyê de gihiştiye asta xwebesiyê jî, lê belê dîsa jî rewş bi vî awayî ye. Di çarçoveya aloziya Sûriyeyê de û piştî ku hêza desthilatdarêya navendî li gelek herêman lewaz bû, niştecih gelek berhemên ku berê ti sûda wan jê tune bû, nû nas kirin û bi jêhatîbûn dikarîn van berheman bi rêbazên klasîk veberhênan bikin û jê qezencê baş werbigirin. Her wiha bazara kirîn û fortina erebeyan û diravguhêriyê jî geş bû. Niha jî pêkan e ku sermayeyên piçûk di pirojeyên bazirganî û pîşesaziyê de, di çarçoveya aborêya komînal a ku Rêveberêya Xweserêya Demokratîk daye pêş de, bi kar bînin. Rêveberêya Xweser a ku hewl da ku pergala aborî ya komînal û ekolojîk bi awayekî ne yekser ava bike ku di madeya 42yan ya hevpeymana civakî de ye, lê belê herêm

[1] Semîra El-Zuxbî: Rewşa ewlekariya xwarinî li Sûriyeyê, Navenda Niştimanî Ya Siyasetên Çandiniyê \ wezareta çandiniyê û çakirina çandinî, nîsana 2006an R1.

pêşveçûneke mezin di vê çarçoveyê de nedît, ev jî ji ber gelek sedemên hundirîn û derve bû.

Sedemên derve yên herî li pêş, ambargoya ku ji aliyê dewleta Tirk û komên radîkal ve li ser herêmê pêk hatiye, ku têkiliya herêmê ji bazarên Iraq û Tirkiyê, her wiha ji herêmên din ên Sûriyeyê qut kiriye. Deriyê sînor ê Sêmalka ango Fîş Xabûr mîna bêhinvedana bi tenê ji herêmê re ye, li gorî mezinbûna xebatên ku tê de tên kirin, piçûk e. Li kêleka vê ambargoya li ser herêmê jî, herêm rastî êrîşên ji aliyê komên radîkal (Daiş, Cebhet El-Nusra û Ixwan El-Mislimîn) ên girêdayî dewleta Tirk û carinan ji aliyê milîsên girêdayî desthilata navendî ve dihat, her wiha hin herêm jî bi awayekî yekser rastî dagirkerêya  dewleta Tirk hatin.

Her wiha sedemên hundirîn jî ew bûn ku xwediyên sermayeyan nikarîbûn gavên wêrekî di warê veberhênanê de biavêjin, pê re jî pirojeyên piçûk û navîn ên bazirganî, hilberîn û çandiniyê nikarîbûn berfireh bibin û bandoreke erênî û berçav bikin. Her wiha zemîna ku van piroje yan veguherîne pirojeyên stratejîk, ava nekirin. Nepêkanîna pêşketinê di aborêya  gundewarî de ji ber van sedeman e:

**1-** Lewazîya  asta rêveberiyê li gel kesên ku ketine nava vî karî de û kêmbûna pisporiyê; çimkî ev ezmûneke nû ye ku tê de derbas dibin. Her wiha kesên xwedî pisporî û jêhatî ji ber mûçeyên bilind, berê xwe didin komleyên karûbarên alîkariyê. Bi tevî ku bahewa baş e ji bo pêkanîna gavên serkeftî di vî warî de li ser astên takekesî û komelî jî, lê belê ramyarîya ku berê xwe didin mûçeyên bilind a ku hukûmetên Sûriyeyê yên li dûv hev pêk anîne, hîn jî bandora wê li ser xwediyên pisporêya n û hin beşên civakê heye.

**2-** Nepêkanîna bi temamî ya pergala aborêya  komînal li herêmên rêveberêya  xweser. Sedemên wê jî dibe ku ji ber zehmetiyên ku Rêveberêya  Xweser di nepeydabûna hevsengiyê di navbera aborêya leşkerî ya ji bo rûbirûkirinên leşkerî hatî terxandin ji aliyekî ve, ji aliyekî din ve jî karûbar û çalakiyên aborî yên giştî. Her wiha lewazîya  pergala dabînan a ji bo rûbirûbûna li hember binkeftin an jî bêperetiyê.

**3-** Kêmbûna hevrêziyê di navbera karmendên ku di van piroje yan de dixebitin û berpirsiyarên ku di warên aborî û diravî de ji aliyê hevkarêya  di pilansazî, veberhênan, piştevanî, çavdêrî û şêwrimendiyê de. Li kêleka wê

jî kêmbûna dayîna girîngiyê ji pisporî û veberhênana koçberan. Ev dihêlin ku parçebûn di pergala aborêya xwecihî de çêbibe.

**4-** Dualîtiya di navbera Rêveberêya Xweser û desthilata navendî de, bi taybet di warên piştevaniya diravî, bace, qoçan û mûçeyan de. Her wiha bandorên netebatiya pereyên biango û lîreya sûrî ji ber tunebûna hevrêziyeke xurt di navbera Rêveberêya Xweser û desthilata navendî de. Ji xwe pê re jî nehiştina desthilata navendî ku di herêmê de mîna herêmên din ku binesaziyek ji bo pirojeyên aborî yên stratejîk, pîşesazî û bazirganiyê çêbibin, lewma binesaziya aborî ya herêmê hejar e û bi salan ji Rêveberêya Xweser re divê da ku pêk bîne.

**5-** Êrîş, metirsî û gefên leşkerî yên dewleta Tirk û çeteyên wê mîna rikberêya çekdarî û rêxistina Daişê, her wiha desthilata navendî û milîsên wê, ji bo ku veberhênanker dest ji avakirina binesaziyeke aborî hilînin û berê xwe bidin bazara diravguhêriyê, roleke mezin lîst. Lewma pêwîst bû ku desteyên têkildarî karûbarên aborî gavine çalak ji aliyê perepêdanê ve, di vê derbarê de biavêtana. Lê belê hîn jî gavên wê di vê çarçoveyê de lewaz in, taybet di aliyê danûstandina wê bi ziwabûnê, parastina mafên samaniya ramanî û tunekirina malgiriyê de. Her wiha di xwespartina pilanên stratejîk di warê aborî de mîna tecrubeyên destpêka civakên mîna Japoniya, Korêya , Singafora, Taywan û hwd, de lewazî heye. Li kêleka wê jî ambargoya li ser herêmê û malgirtina hin aliyên derve ji hin tiştên ku ji herêmê re tên.

**6-** Tunebûna dezgeheke serbixwe ya saloxgêrêya diravî ku di karûbarên diravî û aborî de pispor be. Her wiha tevgera dirav, rêuresim û danûstandinê bişopîne û bi awayekî berdewam di tevgera sûcên aborî, çalakiyên gendeliya birêxistinkirî û kiryarên sûcên birêxistinkirî yên şaneyên razayî yên hêzên dijber û kesên bi wan re, her wiha sûcdarên xwecihî de, lêgerînê bike. Bi tevî serkeftinên ku beşa dijtewanên birêxistinkirî ya girêdayî dezgeha Ewlekarîya Hundirîn û komîteyên şopandin û çavdêriyê yên girêdayî desteya diravî û yên din jî, lê belê hîn jî pêwîstiya wê bi rêxistinbûneke kûrtir di karê wê de heye ku stratejiyên lêkolînkirî di şopandin, çavdêrî û vekolînê li serçalakiyên cihêwaz ên aborî de, amade bike. Her wiha dahûrandina sûcên aborî û komkirina bingehek ji agahiyan û li gorî wan tedbîrên parastinê bigire û li hember stratejî û tektîkên kesên sûcdar serkeftîtir bin û piştgirî, şêwirmendî û pêşniyaran pêşkêşî hemû

desteyên Rêveberêya Xweser bikin. Li kêleka wê jî agahiyên baş li ser çavkaniyên pertal û kelûpelan nas bikin. Li gorî wê çalakyên aborî yên Daişê di herêmên rizgarbûyî de nas bikin. Bi tevî vê yekê jî aborî xwegirtî ma û ti aloziyeke aborî mezin dernekt. Mînak, Rêveberêya Xweser dikarî çandiniyê biparêze, rêjeya zeviyên çandî li gorî hevrûkirina bi pîvandinên Komeleya Xwarinê ya Cîhanî (Fao)[2] ya di sala 2005an de, weke xwe ma. Di wê demê de welat ne di rewşa şer weke ya piştî sala 2011an de bû. Mînak, Komeleya Fao'ê destnîşan kir ku rêjeya zeviyên çandî di herêma Cizîrê (Parêzgeha Hesekê) de 28% ji rêjeya zeviyên çandî li ser asta welêt e ku bi qasî 5.74 milyon hektar e ango 1.6072 milon hektar e. Her wiha rêveberêya giştî ya çandinî û samana giyaneweriyê li herêma Cizîrê[3] di rapora xwe ya sala 2019an de destnîşan kir ku rûbera zeviyên çandiniyê yên hatine bikaranîn di herêmê de 1.605 milyon hektar e, bi tevî rewşa şer, ambargo û ziwahiyê ye. Her wiha raporê serjimarêya samana giyaneweriyê wiha destnîşan kir, 38586 serî çêlek, 1520000 serî pez, 181260 serî bizin, 2519 şaneyên mêşên hingiv, 3262 serî deve, 371 hesp, 1164 gamêş. Ev hemû jî pêwîstiya wan bi geşedan û pêşketinê heye; çimkî ev mijarên veberhênanê ne, ew jî mîna veberhênanên din ên ku derfetên kar pêş dixin, rewşa jiango baş dikin û piştgiriyê didin binesaziyê, ango piştgirêya ewlekarîya aborî dikin.

Bi tevî ku Rêveberêya Xweser dikare di mijarên hundirîn de disiplînê bike û derdora tewanên birêxistinkirî, her wiha peydakirina riyên bejahî, lê belê hin metirsî hene ku rê li pêşiya Rêveberya Xweser digirin ku karibe pilanên aborî bi pêş bixe. Hin ji wan jî pêmayên desthilata navendî ne yên ku li ser reftarên mirovan sepandibûn ku di encama wê de ezezîtî bi pêş xistiye û hiştiye ku mirov berjewendiyên xwe ji ser ên welat re bibîne, vê yekê hiştiye ku takekes bi tena xwe bê pêwîstiya wî bi civakê bijî. Lê belê pêwîst e em ji bîr nekin ku mirov ji guhartinê re vekiriye.

[2] Komeleya Xwarin û Çandiniyê ya NY – Komara Erebî ya Sûrî (Xaknîgarî – Hewa – Niştecih) link:
http://www.fao.org/nr/water/aquastat/countries_regions/syr/SYR-CP_ara.pdf

[3] Ajansa Hawarê ya Nûçeyan, bi hejmaran.. Samana çandiniyê û giyaneweriyê li herêma Cizîrê, 5ê îlona 2019an. Link:
https://hawarnews.com/ar//haber

Ji van metirsiyan jî, gendleiya diravî û rêveberî, ambargoya aborî û tunebûna rewşeke ramyarîbi danpêdaneke navdewletî ye ku mercên pêwîst pêk bîne da ku veberhênan bigire xwe, rê veke ku lihevkirin heango asta rêkeftinan pêk bînin, li kêleka wê jî girêdaneke diravî bi paytextê Şamê çêbibe û bi aloziya aborî li tevahiya welêt û lawaziya binesaziyê û pêwîstiya wê bi pêşxistin û berfirehkirinê bandor bibe.

Her wiha çalakbûna şaneyên razayî yên aliyên dijber ku ya herî girîng şewitandina zeviyan di hezîrana sala 2019an de, li herêmên seranserî sînorê bi Tirkiyê re ji Tebqayê heango Til Koçerê bû. Li gorî Desteya Çandinî û Aboriyê ya bakur û rohilatê Sûriyeyê[4] da diyarkirin, rûbera ku hatî şewitandin 4567 hektar ji tovên genim û ceh ku hilberîna wê bi qasî 13701 ton bûn, hatin şewitandin, ji xwe rêxistina Daişê ev sûc girt xwe. Lê belê ya herî balkêş ew e ku berêya dewleta Tirk bajarên Serê Kaniyê û Girê Spî, di meha dehan ji sala 2019an de dagir bike û kiryarên qirkirina nijadî û guhartina demogafîk pêk bîne, ev tişt pêk hat. Diyar e ku ji vê yekê mîna şerekî derûnî sûd girt.

Bi giştî herêm tijî dahatan e, herêmeke ji aliyê veberhênan ve xav e, dibe ku di jinûveavakirina welat de roleke girîng bilîze; lewma pêwîstiya wê hîn bêhtir bi rêveberiyeke baş heye da ku bikaribe zemîneke biewle ava bike. Di nava xwe de jêhatîbûna rêveberiyê, geşepêdana dahatan, pilansazîkirina baş, bikaranîna baş, birêvebirina lêçûnan û zelalbûnê bihewîne, ango endezyariyeke baş a aborî di aliyê pilansazîkirin, disiplîn û dahûrandinê de bihewîne. Ev yek mijarek e ku ne bi hêsanî pêk tê ye; çimkî pilan û pirojeyên aborî yên xwecihî bi gefên dewleta Tirk û desthilata navendî pir bandor dibe. Tê texmînkirin ku Rêveberêya Xweser dê li rêbazine din bigere da ku hevsengiyê di navbera aborêya şer û aborêya giştî de çêbike. Ev yek rûbirûneke herî zor e ku Rêveberêya Xweser rastî wê tê û bandoreke mezin li pirojeyên wê yên aborî dike, yên ji bo çar milyon kesên ku pêwîstiya wan bi peydabûna rabûnên ewlekarîya mirovî heye, ji xwe ev yek bê ewlekarîya niştimanî pêk nayê.

---

[4] Kamîran Ebdilezîz Hecî Mihemed – Lêkolîn der barê aliyek ji ziyanên aborî ku rêxistina Daişê û komên çete li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê pêk anîn. Serjimariyeke bi navê karmendên di warê aborî li bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji Komcivîna Navneteweyî ya li ser Daiş'ê (Rehend – stratejiyê rûbirûbûnê) ya ku bi serpereştiya NRLSê di tîrmeha 2019an de pêk hat, hatibû şandin.

Bi kurtayî, rehenda aborî pêwîstiya wê bi zemîneke ramyarîbiewle û astên xwebesiyê heye. Herî kêm di samanên heyî mîna enerjî, çandinî û samana giyaneweriyê ku bigihêje asta hinardekirinê. Her wiha dê binesazî û binyada bilind baş û saxlem bin, jêhatîbûna dezgehên çavdêriyên aborî yên fermî, zelalbûn, kişandina xwediyên jêhatîbûn û handankirina li ser lêkolîn û pirojeyên aborî, garantiya vê yekê bin.

**Du – Rehenda civakî:**

Di çarçoveya aloziya Sûriyeyê de ji sala 2011an, rastiyek heye divê ku neyê jibîrkirin, ew jî sistbûna têkiliyên civakî di seranserî xaknîgarêya Sûriyeyê de ye. Hestên nijadperestî û radîkal di qalibekî dogmatîk de mercên ji bo avakirina çanda nefretê da peydakirin. Her wiha veguherand mîna nexweşiyeke vegir hemû pêkhateyên Sûriyeyê pê ketin, ew jî tev li nava nexweşiya ku tevahî herêm û Rojhilata Navîn pê ketiye, bû. Bi tevî wê jî hin herêman dikarî xwe jê biparêze û dûr bikeve, ev yek hişt ku ev nexweşî baş belav nebe.

Piştî ku aloziya Sûriyeyê zor bû, herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê jî dê bûbana maydana şerê li ser desthilatdariyê di navbera rikberî û desthilata navendî de, li vê derê beşa welatparêz xwe li derdora YPG û YPJê kom kir û piştgirêya wê kir, her wiha xwe spart stratejiya xweparastinê. Rastî jî van yekîneyan dikarîbûn di herêmê de ewlehîyê pêk bînin û nasnameya niştimanî ya Sûrî biparêzin. Bi pêkoliya desthilata navendî li ser nedanpêdankirina bi mafên bingehîn ên niştecihên herêmê û nehiştina pêkanîna guhartina demokratîk û pêkoliya li ser bijardeya leşkerî û berdewamkirina ramyarîya zordarî û çewisandinê, her wiha dagerîna çîna derebegî û birjiwaya alîgirên desthilata navendî li ser pêkhateyên herêmê ku ew garantiya berdewamkirina desthilatiya li ser niştecihan, ji dagirkerêya Osmanî heango roja îro, bûn.

Ji ber ku wan ti aramî û pêşketin nexistin herêmê û çareserî ji pirsgirêkan re pêşkêş nekirin, beşa welatparêz li bakur û rojhilatê Sûriyeyê xwe li hev dan hev û di meha yekê ji sala 2014an de hevpeymana civakî ya Rêveberêya Xweser a Demokratîk[5] îmze kirin. Ev yek bû rastiyek li ser

[5] Encumena Zagonsaz li kantona Cizîrê – Hevpeymana civakî ya Rêveberiya Xweser a Demokratîk (Li kantona Cizîrê – Sûrî) Hemû herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê yên ku ji

erdê û dikarî heango asteke baş xwe ji çanda nefretbûnê bi rêya reşkirina nijadperestiyê û radîkaliya dogmatîk, rizgar bike. Ev yek jî bi xwespartina bingehê Neteweya Demokratîk ku xwe spart paradîgmaya ku hemû gelan li hev digire, pêk hat. Bi vê yekê nasnameya niştimanî xurtir û geştir bû.

**Di pêşgotina hevpeymana civakî ya Rêveberêya Xweser a Demokratîk li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê yên rizgarbûyî de, wiha hatiye gotin:**

*Em weke gelên herêmên Rêveberêya Xweser a Demokratîk Kurd, Ereb, Siryan (Asûri, Kildanî û Aramî), Tirkmen, Ermen û Çeçenan, bi vîna xwe ya azad, li gorî rêgeza hevsengîya îkolojî, wekheviya bê cudahiya nijad, ol, bawerî, rêbaz an jî zayend, bi armanca gihandina tevna ramyarî û sincî ya civakê ji peywira wê ya pêkvejiyana hevpar, rêzgirtina rêgeza mafên mirovan di biryardayîna mafên xwe de, garantiya mafên zarok û jinê, peydakirina xweparastin û bergirêya rewa û rêzgirtina azadiya ol û baweriyê, em vê hevpeymanê radigihînin.*

*Herêmên Rêveberêya Xweser a Demokratîk rêgeza netewe-dewlet, dewleta leşkerî û ya olî, her wiha ya navendî di rêveberiyê de napejirînin, her wiha ji hemû cureyên lihevkirina demokratîk û piralîbûnê vekirî ye; da ku hemû komên civakî, nasnameyên çandî, nijadî û niştimanî ku bi rêya rêxistinên xwe û rêzgirtina sînorên Sûriyeyê û hevpeymanên mafên mirovan, her wiha parastina aştiya gelêrî û cîhanî, xwe daberîn bikin. Ji bo pêkanîna rêgezêên hevpeymana civakî, avakirina civaka demokratîk bi rêya rêveberêya xweser a garantiya dadmendîya civakî dike û avakirina civakeke şaristanî, armancên hemû pêkhateyên civaka Rêveberêya Xweser a Demokratîk mîna Kurd, Ereb, Siryan, Ermen, Çeçen û her weke din, li ser bingehê yekîtî di piralîbûnê de, bûn yek. Her wiha bi vîna hemû pêkhateyên gelê Sûriyeyê yên din re li hev hatiye ku herêmên Rêveberêya Xweser a Demokratîk weke pergaleke ramyarî û rêvebirina civakî di nava Sûrêya ya piralî û demokratîk, cihê xwe bigire. Ji bo pêkanîna van armancan me ev hevpeyman derxistiye.*

---

destê desthilata navendî û komên radîkal hatine rizgarkirin girt nava xwe, bi awayekî fermî di rûniştina hejmar / 1 / dîrok 06.01.2014 de hatiye erêkirin. Link: http://www.encumenazagonsaz.com/

Ne ramyarîya reşkirinê, ne şerê taybet û ne jî êrîşên terorîstan û dagirkeriyê dikarî Rêveberêya Xweser û hemwelatîyên wê ji hev dûr bixe. Berevejî vê yêkê, hîn bêhtir bi pêş ket û gihişt asta pêşniyarkirina piroje ya federaliya demokratîk a bakur û rojhilatê Sûriyeyê, ev yek piştî rizgarkirina rojhilatê Sûriyeyê û tevlîbûna niştecihên wê di nava rêveberêya xweser de, hat derengxistin. Ji bo vê mijarê dihat xwestin ku bi beşên welatparêz ên herêmê re têkilî çêbibin da ku bi pêş bikeve. Ew jî di heman dema ku hin parçeyên herêmê rastî êrîş û dagirkerêya dewleta Trik dihatin.


Aloziya ku niha welat tê re derbas dibe, komeke din ji rûbirûbûn, metirsî û gefan li ser rehenda civakî disepîne. Ev yek piştî êrîş û dagirkerêya dewleta Tirk li ser bakurê Sûriyeyê, zêde bûn. Vê yekê nehişt ku niştecihên herêmê û hêzên civakî, ramyarî û leşkerî piştî şerê bi Daişê re û têkbirina wê, xwe vehezînin û hemû şiyanên xwe dîsa seferber bikin da ku li dijî êrîşkarên nû rawestin. Vê yekê hişt ku niştecihên herêmê ji şiyanên xwe yên ji pirojeyên rajeguzarî û geşedanê re, biherime. Tiştekî normal e ku hin bandoriyên din li ser pirsgirêkên heyî zêde bibin, mîna nearamiyê û kêmbûna veberhênanan di pirojeyên aborî yên xwecihî de. Ev mijar bi tevî ku têkiliya wê bi rehenda aborî re ye, lê belê dikarî ku têkiliyên civakî jî xurt bike, taybet di çarçoveya aborêya civakî ya komînal, dûrî ramyarîya malgirî ya li aliyê beşekê tenê bû ku dûrketin di navbera civakan de çêkiribû, her wiha koçberêya netebitî ku li ser çar qonaxan herêm tê de derbas bû, berêya damezirandina Rêveberêya Xweser a Demokratîk asta wê bilind bû, piştre kêm bû û pê re jî koçberêya erênî ku ji herêmên din ên Sûriyeyê hatin, hebû. Lê belê dîsa piştî êrîşên Daişê li ser herêmên Rêvberêya Xweser çêbûn û pêkanîna ramyarîya koçberkirina zordarî, zêde bû. Her wiha piştî têkbirina wê dîsa kêm bû da ku careke din piştî êrîşên dawî yên dagirkerêya Tirkiyê û çeteyên wê li ser herêmê û pêkanîna koçberkirina zordarî, bilind bibe.

Gefên herî mezin li ser rehenda civakî ramyarîyên qirkirina nijadî û guhartina demografîk li ser herêmê ne, ew jî bi rêya avakirina wargehan ji komên radîkal re. Li kêleka wê jî bandoriyên ji ber rewşên şer û aloziyê li ser rewşa derûnî û tenduristî ya hemwelatiyan, bi taybet ên ketin bin bandora desthilatiya komên radîkal ên ku rêgezine nû ku hîn ji kevin ve niştecihên herêmê dev jê berdane. Nimûne, çanda koletiya gewdeyî û cinsî

(cihada nikahê û sebî), pêkanîna teror û tirsê da ku desthilatdariyê li ser hişmendîya niştecihan bikin, her wiha neçarkirina zarokan ku rêgezên ku wan li ser mirinê geş dike, ango mirovan vediguherîne navgînên kuştinê, werbigirin.

Bi gotina "Ol efyona gelan e gava ku were keysbazkirin" hewldanên sazîyên şerê taybet ên li dijî niştecihên herêmê her timî hene, li kêleka wê jî hewldanên komên radîkal ên ku dixwazin bandorê li ser hestên hemwelatiyan bi rêya belavkirina têgehên îdolojîk ku kuştin û sitemkariyê û nûjenkirina dema berê bi rêya bikaranîna navan û rêbazên berê, bikin; da ku kiryarên xwe pê rewa bikin. Tê zanîn ku mijarên baweriyê di herêmê de vedigere berêya çar hezar sal ji dema mîtolojî û olan ve. Em bala xwe bidinê ku bi milyonan kes dikarin ji bo bawerêya giango xwe feda bikin, lê ji bo yên rastîyên zanistî xwe feda dikin li ser tiliyan tên jimartin.

Her wiha di civakên rojhilatî de û di nava wê de ya Sûrî jî, jin tewereya sereke ye. Komên radîkal ên ku cilûbergên faşîzm û çanda nefretbûnê li xwe kirine jin veguherandine navgîna xerîzet û çêkirina cîhdaîstan, ev yek weke xala hêzê ji wan re ye, her wiha mîna ramyarîya kapîtalîzm û derebegiyê li serjinê de ye jî. Lê di heman demê de xala lewaziyê ye jî li gel wan; da ku li dijî hişmendîya keysbazî û çewisandinê têbikoşin, ew jî bi rêya xurtkirina hêza jinê û fêrkirina civakê li ser nirxên exlaqî yên li dijî nefretbûn û kolekirinê. Ev yek di herêmên ku Rêveberêya Xweser û hevpeymana wê ya civakî de baş hatiye rûniştin. Lewre têkoşîna dijî çanda nefretbûnê û azadiya jinê di çarçveya nirxên exlaqî de, mîna sêgoşeya hêzê ji paradîgmaya neteweya demokratîk û kûrbûna di pêkanîna wê de ye, ji xwe ev yek misogerîya ewlekarîya civakî di tevahiya Sûriyeyê de dike. Ev mijar divê ku stûna hêza nerm a ji civakên bakur û rojhilatê Sûriyeyê re bin. Piranîya biyaniyên ku li dijî terorê, çi bi tevlîbûna xwebexşî û çi jî di nava hêzên koalisyonê de, her wiha rojnameger, mafnas, ramyarî tmedar û lêkolînerên ku hatine herêmê ev wêne gihandin civakên xwe.




**Sê: Rehenda tenduristî.**

Gelek ji rehenda tenduristiyê re divê, jê re tedbîr û mekanîzmayên ji Tenduristîya gewdeyî, derûnî, sinirî û ramanî di warê dermankirin û geşepêdanê de, divin. Bi taybet ku welat di aloziyekê re derbas dibe û zehmetî di pêkanîna yekbûnê di nakokiyan de li ser asta niştimanî bi giştî heye, pê re jî hebûna hewldanên xurtkirina hestên nijadperestî û kînê. Di demên şer de sê enerjî li ser reftarên takekesan bandorê dikin, ew jî têkiliyên zayendî, dirav û ol in. Hestên tepeserkirî li xweşî, xudanî û mezinkirina xwe digere, ev yek heman hicetgirtina ku di keysbaziya olê de bi kar tê, dixwaze. Ev yek ji encamên ramyarîya çewisandinê yên, mîna hejarkirin û tunekirina vînê (kedîkirin û bindestkirin), her wiha tirs û nefretbûn, li kêleka wê jî şerê taybet ê ku hişmendîya hemwelatiyan armanc digire. Her wiha alozî, bêkarî û mayîna di kampên penaberan de bandoreke wê ya neyînî heye û dihêle ku mirov ji rastiya xwe dûr bikeve, pey arezûyên xwe bikeve. Nivîskarê mezin Tolstoy wiha diyar dike ku zêdebûna demê enerjiyeke mezin ji mirov re dide ku pê bi dûv xweşiyên xwe bikeve, her wiha hiştina mirovan ku hertimî bikarbûyî be, nahêle ku dema hizirandin û pêşxistina hisên rexnekirinê jê re hebin.

Di heman demê de bindemayîna dadgehan di nava pirsgirêkên piçûk û yên nehêja de ku dihêle pirsgirêk kom bibin û zû çareser nebin, pirbûna tolstandinê di nava civakê de dijminatiyê bi pêş dixe û digihêje asta

radîkalbûnê. Her wiha nezaniya gel di warê zanistî de dihêle ku ji bipêşxistina şaristanî dûr bimîne û ti pêşketinan pêk nayîne. Lewre li kêleka tenduirstiyê pêwîstî bi pêkanîna hevsengiyê di navbera hizirandin, xebatên hilberînê, lîstik û erkên civakî de heye. Ev yek dihêle pîşe û tenduristî li gel hemwelatiyan û berpirsan xurt bibe û çareserêya n ji raman û têkiliyan re bibîne.

Li gorî derûnzan Adler[6], Tenduristîya derûna mirovan ne tenê li gorî xuberdanên hormonan rewşa mirovan tê diyarkirin ku bi madeyên kîmyewî[7] bandor dibe, lê belê nameyên ku ji jîngeha derdora xwe û awayê danûstandina mirovan pê re, her wiha şêwazê jiyankirinê bandoreke wê ya mezin li ser rewşa mirovan heye, girîngiya ewlehîya tenduristiyê di vir de diyar dibe. Li gorî vê jî rehenda tenduristî di herêmê de, bi hînkirin, jîngeh, bijîşkî û rêveberêya durist tê diyarkirin.

Li serperwerdeyê de jî, nabe ku exlaqên civakê bi armancên standina dirav û desthilatdariyê xirab bike. Nimûne: Daişê zarok li gorî rêbazên xwe yên kînkişandinê ji her tiştên ne li gorî wan, perwerde dikir. Her wiha xwendina desthilata navendî jî neteweperestî bi pêş dixist û xwendinên bilind dikirin para çînên dewlemend, ew jî bi rêya şande û diyarêya n. Her wiha xwendina di herêmên rikberiyê de jî ne kêmî wan e, nijadperestiya Tirk û Osmaniyan tê de baş rûniştiye. Lewre tê diyarkirin ku dê çanda nefretiyê bi rêya nifşên nû xwe baş xurt bike û di encamê de aloziyên herêmê dîsa çareser nebin û kûrtir bibin.

Bi armanca xwegihandina afirandinê ya ku dê rê li pêşiya çanda kînê bigire û rehenda tenduristî, civakî, aborî û pergala ewlekarîya niştimanî peyda bike, pêwîstî bi pêkanîna zanistî û exlaqî ya zanistên mirovî û suriştî heye, her wiha cudakirina wê ji olê, mîna ramyarîê çimkî zanistên olî yên taybet hene. Li kêleka wê jî girêdana lîstikê bi aliyê çandî û zanistên din ve. Dema ku em lîstikê weke bingehê perwedekirina zanistî û ramyarî ji bo parastina mekanîzmaya xweparastinê ya ku bi pêşketina zanebûna

[6] Alfred Adler, Xwezaya Mirovî. Werger: Adil Necîb Beşrî. Çapa yekem 2005. Weşanker: Encumena Bilind a Çandê, Qahire, r 180.

[7] Dr Ebdilhadî Misbah. Çekên kîmyewî û biyolojîk di navbera şer, istixbarat û terorê de. Pêşkêşkirin Dr.Usama El-Baz. Çapa yekem 2000. Dar El-Misriya ya Libnanî ya weşanê. Qahire.

mirovan û tedbîrên ku li hemberî metirsiyan standine, winda bûne, mîna geşedana gewdeyî û ramanî, karê kolektîv çi bi beşdarbûnê û çi jî bi temaşekirinê, bi rêya bîrkarî û geştiyariyê û çalakiyên cuda.

Li serjîngehê li bakur û rojhilatê Sûriyeyê de, ji xwe di pilanên hukûmetê yên berê de hatibû paşguhkirin, ji xwe di salên dawî yên aloziyê de jî hîn bêhtir xirab bû. Roleke mezin a niştecihan di vê yekê de hebû, ew jî bi rêya bikaranîna petrolê bi rêbazên klasîk ên bi navê "Şewatxane" û pirbûna hejmara erebeyên kevin ku bûn sedema qirêjbûna ba û xakê. Her wiha di herêminan de jî birîna bêserûber a daran ji bo xwegermkirinê. Ji xwe çalakî û operasyonên leşkerî yên komên radîkal jî sedemeke mezin a vê yekê bûn, ew jî bi rêya wêranî û komkujiyên ku pêk anîn ku di encamê de termên mirovan û organên wan avêtî bûn an jî di gorên komî de dihatin veşartin an jî di çeman de dihatin avêtin. Mîna ku niştecihên Girê Spî dema ku ji ber dagirkerêya Daişê koçber bibûn digotin ku sehên wê derê ji ber xwarina organên mirovên mirî hov bibûn. Ev hemû jî ji bilî dîmenên êşkence û jêkirina parçe û serêya n. Ji vê bêhtir jî belavbûna tiştên xwarinê yên nebaş di bazaran de, mîna goştê sarkirî. Rêveberêya Xweser li gorî madeyên di hevpeymana civakî de ji bo peydakirina rajeguzariyên paqijiyê û rêgirtina li ser qirêjiya ava vexwarinê, xwarin û bidûketina serpêçkeran, her wiha sepandina taybetmendiyên ji bo saxlemiya jîngehê li ser xwediyên şewatxaneyan, di nava şerekî de bû. Li hemberî wê jî serpêçker di ya xwe de bibiryar bûn, heango asta ku gule li ser şewatxaneyên serpêç hatin berdan, li gorî şahidan. Li kêleka wê jî, rêgirtina li pêşiya nederbaskirina erebeyên kevin û handankirina wergirtina erebeyên nûjen û sepandina qeydan li ser motorên ku li ser dîzelê tên bikaranîn û rêvekirina ji bo bikaranîna şiyana tavê di karên malê de. Her wiha karkirina ji bo çakirina stasyonên elektrîka sereke û torên wê di bendavên Firat û Tişrînê û bendava Siwêdiyê ya germahî de, her wiha pilanin hene ku stasyonên germahî yên din werin çakirin, vê yekê saetên bikaranîna jeneretorên taybet kêm kiriye û karin din jî hene.

Bi tevî vê jî em nikarin bibêjin ku pêşketin di ewlehîya jîngehî de pêk hatiye, hemû pêrabûnên ku Rêveberêya Xweser pêk anîne, mîna rewşeke xweparastinê li hember pêlên qirêjiya jîngehî tên dîtin. Ewlekarîya jîngehî piroje ne ji van mezintir dixwaze, mîna pêngavên darçandinê û parastina

gundan û jiyana çolê. Her wiha dikeve ser milê şaredarêya n ku jîngeha bajaran biparêzin, ew jî bi sepandina li ser xwediyên kargehan ku firehiyeke baş li derdora kargehên xwe daran biçînin, ji xwe ev yek hîn jî pêk nehatiye. Avahî veguharîne heykelên bêgiyan û nexweşbar. Her wiha li kêleka wê jî pêwîstî bi rêxistinkirina bermahiyên kargehan û avahîsaziyan û nûkirina torên avrêjiyê û ava vexwarinê û enerjiya elektrîkê heye. Li kêleka wê jî piştgirtina dezgehên çavdêrêya bijîşkî bi alavên taqîgehî yên nû, her wiha pêwîstî bi pêngavên hînkirinê û pojeyên jinûveçêkirina çopê heye. Ev yek jî binesaziyeke baş a girêdayî rehenda aborî ku bi rewşa ramyarîbandor dibe, heye. Ji xwe metirsiyên hilweşanê ji aliyê dewleta Tirk, komên radîkal û desthilata navendî ve hîn bi xurtî hene, li kêleka wê jî germbûna goganî ku tevahiya cîhanê pê bandor e. Her wiha rêveberêya baş jî mîna hemû rehendan ji bo rehenda aborî pir girîng e. biryaraên baş ên bi rêya şêwirmendiyê û zanistiyê dikarin civakê ji hemû aloziyan rizgar bikin, her wiha pêşkêşkirina çareserêya n ji hemû pirsgirêkên di vê çarçoveyê de.

**Çar – Rehenda Parastinê:**

Modernîteya Rêveberêya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyeyê û mezinbûna metirsiyên li hemberî wê, dihêlin ku rehenda parastinê ji mijarên stratejîk bin ku girîngî pê were kirin; çimkî ew bi her çar aliyên xwe (Parastina sivîl – parastina leşkerî – ewlekarîya agahiyarî – ewlekarîya çavdêrî) zemîneke baş ji geşedankirina rehendên din re ava dike. Nayê dûrxistin ku herêm beşek ji pevçûna herêmî û navdewletî ye, ger çi qasî xwe jê dûr bixe jî lê jê nayê veqetandin. Ev yek ramyarîeke baş jê re divê ku rewşa ramyarî û ya leşkerî ya ku herêm tê re derbas dibe û di demeke kurt de gelek guhartin dîtin ku tê de hemwelatî û welat bê parastin ma ku wan ji metirsiyên hem ên bi destê mirovan û hem jî yên bi destê xwezayê biparêzin, bikaribe rake.

Gelek dewletan aloziya Sûriyeyê weke derfet ji xwe re dît ku hemû pirsgirêkên xwe biavêjinê, ew jî bi rêya piştgirî yan jî rêvekirina ji statuyên ku weke xirabker li hemberî pirojeyên dijber pêk dianîn. Ji aliyekî din ve jî xilaskirina ji kesên ku li ser wan metirsî çêdikrin ku mîna komên terorîst an jî gurên bitenê tev bigerin, pêwîst bû ku berê wan bidin derveyî welat û tev li nava komên ku li gorî ramanên wan in, bikin. Mîna hesinkêşekê çend rêxistinên ku ti armancên wan ên nûjen û di xizmeta mirovan de ava kirin û

hemûyan berê xwe danê û nava wan jî tijî çanda kîn û nefretê bû. Vê yekê zemînek ji bo tunekirina wan di herêmên cuda de ava kir, an jî xwe ji wan xilas bikin da ku şiyanên xwe yên neyînî li dûr vala bikin, mîna rêxistinên El-Qaidê, El-Nusra û Daişê, her wiha Boko Heram, Ensaro li Nêcîrêya yê, Enesar Beyt El-Meqdes (Hesm), Partiya Tirkistanî ya Islamî, Cîhadîstên Qoqaz û koma Ixwan El-Mislimîn û hwd. Her wiha handarkirina geştiyarêya zayendî li hin welatan jî dikeve nava vê çarçoveyê. Bi taybet di civakên ku dijminatiyê û netêrbûna cinsî weke metirsiyên li ewlekarîya  niştimanî ya welatên xwe dibînin, taybet a dawî jî weke çavkaniyeke din a kişandina mirovan bi ser Daişê li Sûriye û Iraqê ve bû.

Gelek hêzên xwecihî yên li Sûriyeyê nikarîbûn ku bi temamî parastinê ji hemwelatiyan re peyda bikin, bi tevî serkeftina rêjeyî ya parastinê di herêmên Rêveberêya  Xweser de ku bû wargeheke biewle ji hezaran mirov re, lê hîn jî em nikarin bibêjin ku hemwelatî bi temamî parastî ne; çimkî hîn metirsiyên ji hêza Rêveberêya  Xweser mezintir hene gefan lê dixwin ku girêdayî pevçûnên navdewletî û herêmî ne. Lê belê ev yek nayê wê wateyê ku Rêveberêya  Xweser vîna xwe radestî hêzên mezin ên navdewletî bike, ji xwe Rêveberêya  Xweser vê metirsiyê dizane û ev yek di têkiliyên wê yên bi hêzên cuda re di çarçoveya şerê li dijî terorê û şerê li dijî dûvikên dewleta Tirk û parastina hevpeymana civakî de, tê diyarkirin. Geşedana her çar aliyên rehenda parastinê dikeve ser milê hêzên niştimanî yên ramyarî, aborî, leşkerî, civakî, çandî û zanistî.

### 1. Li ser parastina sivîl:

Sûriye bi giştî û bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi taybetî, ti bername û derfetên wê yên parastina sivîl li hemberî hemû bobelatên cihêreng û bandoriyên wê tune ne. Tenê xwe disipêre tîmên normal ên agirkujiyê. Dema ku bobelat jî çêdibin xwe disipêrin ked û makîneyên gel ên xwebexş, bi tevî ku ev yek girîngiyeke mezin di bernameyên hukûmetê de dixwaze. Dibe ku ev paşguhkirin sedema wê tunebûna bobelatan ji ber dûrbûna ji xeta sereke ya erdhejan û bablîsokan e. Her wiha ti ramyarîeke niştimanî ji bo rûbirûbûna nexweşîyên  vegir tune ye û her tim xwe disipêrin Komeleya Tenduristiyê ya Cîhanî û hwd.

Ji destpêka vê sedsalê ve û bi pêşketina navgînên çûnûhatin û firehbûna bazaran û pirbûna cengan, di cîhanê de guherînên jîngehî yên mezin pêk hatine. Di encama goganiya germê, belavbûna nexweşîyên vegir ên nû û anîna kelûpelên kwalîteya wan ne baş, pê re jî qirêjiya bayê û pirojeyên dagirkeriyê, hilweşandinek di bahewayê de çêbûye, li gorî wê jî pêwîstiyeke mezin bi pergaleke pêşketî ya parastina sivîl heye. Ji sala 2011an heya niha gelek bobelatên ku çêbûne bê ku danûstandineke baş pê re were kirin, ev in:

- Tunebûna stargehan ku kesên ji ber zordestiya dagirkeriyê mîna dewleta Tirk û Daişê reviyane di nava xwe de bihewîne û pê re jî pirbûna hejmara sêwî û mişextan, her wiha kêmbûna lojistîkê jî.
- Pirbûna gumanên bikaranîna çekên kîmyewî û biyolojîk û pirsgirêkên ku zeviyên mayînan bi xwe re tînin, ew jî bi armanca sivikirina parastina sivîl ji barê li ser milê hêzên çekdar di vê li serde.
- Nekarîna kontrolkirina agirên ku bi dexilan dikeve, taybet ên ku di werzê sala 2019an de çêbûn.
- Tunebûna binesaziyeke bijîşkî ku çavdêrêya dermanên dikevin herêmê de bike û li hemberî nexweşîyên vegir ên mîna şewba çûka û Koronayê bisekine.
- Avrêjiya gelek tax û bajaran ne baş e û ev yek dibe sedema ku gelek mal di bin ava baranê de bimînin.
- Di dawiya sala 2013an û destpêka sala 2014an de berfeke mezin li herêmê barêya û ev yek jiyan rawestand bê ku ti tîmên taybet ku pê ve rabin, hebin û alîkariyê pêşkêşî hemwelatiyan bikin, tune bûn.
- Di mehên havînê de li gelek herêman ziwabûn û kêmbûna avê çêdibe û li gorî wê jî şaredarî dayîna avê dixin kontrolê de, lewre alozî di peydakirina avê de derdikeve.
- Nêzîkbûna herêmê ji xeta erdhejan a ku di anatoliyayê re derbas dibe. Ew jî di dema ku pirojeyên dagirkeriyê yên qirkirina nijadî derheqê Kurdan de bi rêya ramyarîyên avakirina bendavan û binavkirina erd û gundan ku dibe sedema zexteke hîdrostatîkî li ser qatên erdê çêdike û dide gumankirin ku bobelat çêbibe.

Her wiha bi dehan ji van mînakan hene, ev yek ked û xebateke mezin ji Rêveberêya Xweser dixwaze ku di warê parastina sivîl û avakirina

artêşeke ji xwebexşan û kesên ku xwe vala bikin jê re de geşedanê pêk bîne. Ya herî baş di vê derbarê de ku endamên Erka Xweparastinê li ser mekanîzmaya parastina sivîl werin perwerdekirin û alav û pilanên pêwîst werin amadekirin, da ku ji her tiştên awarte û bobelatan re amade bin. Her wiha gel jî di vê derbarê de were perwerdekirin, ew jî bi rêya dewre û belavokan, çi di nava saziyan de û çi jî di nava tax, kolan û gundan de. Girîngiya vê yekê ew e ku hin bobelat sedema wan hêzên dijminê xelkên herêmê ne û li gorî xwe di aliyê şerê taybet de, van bobelatan bi kar tînin. Tê zanîn ku zanebûna niştecihên herêmê ji vê yekê re heye ku pergala parastina sivîl pêk bîne, tenê vîneke domdar a sazîyên fermî dixwaze.

**2. Li ser parastina leşkerî:**

Di welat de pirsgirêkek rastî di aliyê newekhevî û olperestiyê de heye, ev yek bû makîneya sereke ya şer û pevçûnên di herêmê de piştî ku ji aliyê çekdarên biango ve hat bikaranîn û bûn dûvikên hêzên derve. Her wiha artêşa welat jî xwe li aliyê desthilatê girt û beşek jê jî xwe li rikberêya çekdarî girt, ne mîna artêşên Tûnis û Misirê di dema şoreşa wan de, kir. Di heman dema ku welat bûye qada şerê herêmî û navdewletî de, gelek nuqteyên leşkerî bûn armanca bombebaran hêzine ku berê ti bihaneyeke yasayî ji dijminatiya xwe ya ji herêmê re nedîtin. Niştecihên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji sala 2011an ve rastî gelek êrîşan hatin û qurbanî jî bi hezaran bûn. Bi tevî rêxistinbûna saxlem a YPG, YPJ û QSDê û karîna wê bi alîkarêya koalisyona navdewletî di dema dawî de ji têkbirina terorê re, lê belê hovîtiya artêşa dewleta Tirk û çeteyên wê û rêznegirtina wan ji hevpeymanên navdewletî re, her wiha hevpeyman û bazarên wan û tunebûna artêşeke niştimanî li ser asta welat, rê da ku hin herêm li bakurê welêt werin dagirkirin. Ev yek roleke mezin lîst ku hêza leşkerî û ya ramyarîya berxwedanê stratejî û tektîkên pêwîst deyne. Di van şeran de berxwedaneke mezin çêbû û hîn jî li cihinan berdewam e. Her wiha xelkên herêmê gelek qurbanî dan û hîn jî gel ji bo vegerandina xaka xwe ya dagirkirî, bibiryar e.

Hêzên bakurê Sûriyeyê ango QSDê di şerê li ser desthilatdariyê de xwe spartin stratejiya parastina rewa û xwe pabendî nasnameya niştimanî ya sûrî mîna baweriyeke leşkerî, kir. Ev yek di gelek helwestan de hat diyarkirin, mîna helwesta ji bo jinên revandî yên Siwêdayê ku ji aliyê Daiş’ê

ve hatbûn revandin, her wiha helwesta ji bo şerê Idlibê û şerê li dijî dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên radîkal û rizgarkirina gelek herêman ji destê wan.

Hêzên çekdar li bakur û rojhilatê Sûriyeyê jêhatîbûn û hêza wan ya rêveberiyê heye, lê belê çekên wan yên stratejîk ku hevsengîya hêzê bi hêzên ku dixwazin herêmê dagir bikin re di mijarê de çêbike tune ne. Lê belê ev nayê wê wateyê ku êdî vîna xwe bisipêre hêzên derve, her timî hêzên parastinê rêbazên wê yên xwefedakirinê û tirsandina dijmin hene. Hebûna çekên tektîkî yên mîna balafirên bêpîlot, dijfirokeyên li ser milan, moşekên dûrbûna wan kurt an jî navîn, dezgehên şaşkirinê û saloxgêrêya elektronîk û hwd, mîna çekên stratejîk tên dîtin li dijî êrîşkarên ku çekên mezin bi wan re hene, lê ew neçar in ku çekine diyarkirî li dijî hêzên berxwedanê yên piçûk bi kar bînin. Çekên tektîkî ew çekên ku ji aliyê kesekî heango sê kesan ve tên bikaranîn û divê ku çekên tektîkî di firehiyeke diyar de bi kar werin û xwedî ziyanên diyrakirî be, her wiha divê kesê ku bi kar tîne neyê xuyakirin (winda yan jî dûr be). Dibe ku ew bibe çekên stratejîk jî gava ku bandora wê li ser veguhartina berê şer hebe, bi taybet di şerê bajaran de gava ku gelek zirarên madî, mirovî û giango li dijmin bike.

Dibe ku peydakirina van çekan di bazarên çekan ên cîhanî de, zehmet be, lê belê bi rêya  hin çavkaniyên vekirî yên li ser internetê tên peydakirin. Her wiha zanebûna di bakur û rojhilatê Sûriyeyê de têrê dike ku çekên bi vî awayî xwecihî werin çêkirin eger derfet û madeyên pêwîst peyda bibin. Li kêleka vê jî bo sedan şervan hene ku dikarin di şer de, di kezeba dijmin de xwe feda bikin û lê bixin. Ji aliyekî din ve jî rola lihevkirin û hevpeymanên bi dewletên heval re pir di vê yekê de heye, her wiha yekhiştina hêza dijmin an jî hiştina wê ku ramyarîyên xwe nû ve berçav bixe, rêbazekî bibandor e di aliyê peydakirina parastina leşkerî de.

Li gorî vê jî pêwîstiya parastina leşkerî bi gelek tedbîr û mekanîzmayan heye, mîna avakirina pirojeyên avakirina leşkerî, amadekirina hemwelatiyan li ser rêbazên şerê gel ê şoreşgerî, mezinkirina hêzê û saloxgêriyê, kêmkirina hêza dijmin bi rêya  lihevkirin û hevpeymanên diplomasî li ser asta leşkerî, peydakirina çavkaniyên derve yên kirîna çekan û alavên leşkerî, her wiha pêşxitina endezyarêya  avahîsaziya leşkerî mîna avakirina

stargehan, kolandina tunelan, amadekirina daf û kemînan, peydakirina alavên parastinê li hemberî êrîşên bi çekên kîmyewî û biyolojîk û hwd.

**3. Li ser ewlekarîya agahîdariyê:**

Bi hevrûkirina bi mezinbûna pilanên li dijî welat re tê diyarkirin ku di binesaziya ewlekarîya agahîdariyê de lewazî heye, ev jî di heman dema ku desthilata navendî ev yek ji xwe re mîna navgînekê ji bo çewisandina rikberan û çavdêrêya hemwelatiyan bi kar anî, her wiha sepandina qeydan li ser tora elektronîk û torên pêgihandin û internetê. Dibe ku yek ji sedemên vê paşverûtiyê jî ew be ku nebûye pergaleke pevgihandinê di hemû sazîyên rajeguzariyê ji hemwelatiyan re, mîna sazîyên nufûsê, bank, pergala mûçeyan û tunebûna bernameyeke guhdana tenduristî û civakî û hwd.

Li aliyekî din jî aloziya Sûriyeyê mezinbûna şerên taybet ên ku li dijî hemwelatiyan hatin meşandin bê ku pilanên parastina niştimanî ji bo parastina nasnameya niştimanî hebe, tekez kir. Heango asta ku hemwelatî ji şerê taybet ên desthilata navendî bi xwe jî yên ji bo qirkirina hemwelatiyan jî xilas nebû. Dibe ku ev yek sedemên sereke bin ku berê wan da radîkalbûnê û pejirandina jiyankirina di bin siya kîjan desthilatê de be, yan jî koçberkirin piştî ku xwe li ser xaka xwe koçber dît. Her wiha xirabûna exlaqan, bûyerên xwekujiyê, jirêderketin û sûcên birêxistinkirî dikevin vê çarçoveyê.

Bi pêşketina dramatîk a aloziya Sûriyeyê re, binesaziya ewlekarîya agahîdarî a pevgihandinê hat rûxandin. Torên internet û telefonan li gelek herêman di encama xirabkirin, dizî, paşguhkirin û nenûkirinê de hatin qutkirin. Êdî hemwelatîyên li herêmên li ser sînor neçar man ku torên welatên derdor bi kar bînin ku di encamê de hişt li pêşiya hemû dezgehên istixbaratan ên wan welatan eşkere bibin, bi taybet ên ku dixwazin desthilatê li ser welat bikin. Ev yek di piştgirêya elektronîk a ku dewleta Tirk ji çeteyên xwe re di şerê dijî gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê de, pêşkêş kir. Ew jî bi rêya kontrolkirina wê ji torên telefon û internetê û belavkirina agahiyên derew re. Di şopandin û çavdêrîkirina çalakiyên dijberî ewlekarîya niştimanî û astengkirina wan de lewazî hebû. Ji aliyê xwe ve Rêveberêya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê hewl da ku çarerserêya n ji vê

pirsgirêkê re bibîne, ta ku peymanek bi kompaniyayeke taybet a Ewropî re pêk anî ku toreke pevgihandinê ya hundirîn ku heango astekê biewle ye bi teknîka 4G pêk bîne ku ji ya ku rêjîm dida baştir be, peyda bike. Ew jî di çarçoveya piroje ya pvgihandina hemû sazîyên rajeguzariyê, ji xwe pêkanîna vê yekê demeke dirêj dixwaze.

Li serewlekarîya agahîdarêya giştî de pêwîstî bi gelek piroje û pilanan heye ku tiştên tên arşîvkirin werin parastin û rê li pêşiya sûcên birêxistinkirî were girtin. Her wiha rijdbûn li ser zelalbûna di gilînameyên girêdayî şaredarî û desteyên dadmendî de û avakirina bankeke agahiyan ku tê de serjimariyên asayî di hemû warên demografîk, aborî, zanistî, rajeguzarî û pîvanên rast li ser astên xeta hejarî û nîşanên geşedan û bêkariyê û hwd piştrast bike.

Li kêleka wê jî pêşkêşkirina piştgiriyê ji navendên lêkolîn û rapirsînan re û garantiya mafên samaniya ramanî û çandî û samaniya mafî ya taybet. Her wiha pêwîstî pir bi avakirina navendên niştimanî yên wergerê heye ku tê de lêkolîn û jêderên piştrast hebin da ku zanyariyên rast peyda bibin. Her wiha xurtkirina rêbazên perwerde û hînkirinê di dibistan, peymangeh û zanîngehan de, bi rêya pêşkêşkirina agahî û zanyariyên baş û li gorî pisporêya n, her wiha girêdana bernameyên perwerde û hînkirinê bi zanistên bingehîn ve (Mirovî, siruştî û ezmûnî) mîna pêvajoya destpêkê û li gorî temen, piştre jî derbasbûna zanistekê heango asta pisporiyê.

Dibe ku hêza Rêveberêya Xweser têrê neke ku vê pêşketin û geşedanê di demeke kurt de pêk bîne; çimkî hîn nû ye û di mercine ramyarî û leşkerî yên nearam de ne. Lê belê ev nayê wê wateyê ku pilan û pirojeyên di vê derbarê de pêşkêş neke, ev yek di rêdana wê ji bo avakirina toreke pevgihandinê ya internetê û guhdan û piştgirêya wê jê re de, tê diyarkirin. Her wiha rêbazên perwerde û hînkirinê jî ji nû ve li ber çavan tên xistin. Garantiya aliyê ewlekarîya agahîdarî pêwîstiyeke mezin e ku nikarin çavan jê dûr bixin; çimkî ew jî di stratejiya avakirina ewlekarîya niştimanî de rolekê dilîze.

### 4. Li ser ewlekarîya çavdêrî:

Di gelek dewletên sitemkar de, ewlekarîya çavdêrî bûye girêdayî rêbaza desthilatê û bûye mîna çav û guhên wê da ku pilan û ramyarîyên wê pêk

bîne. Ev yek dihêle ku mirov du nêrînên dijî hev ji bo çavdêriyê derxe. Yek jê çavdêrêya desthilatî ye û ya din jî çavdêrêya nîstimanî ye. Çavdêrêya desthilatdarî ew e ya ku ti pîvanên exlaqî û mirovî tê de tune ne û li gorî olîgarşiya heyî dixebite. Lê belê çavdêrêya niştimanî ew e ya ku pilan û pirojeyên pêşketin û geşedana ewlekarîya niştimanî jê re pêwîst in, her wiha rêgirtina li pêşiya kiryarên neyînî û li dijî welat, ango çavdêrêya ku li ser bingehên exlaq, bawerî û zelaliyê pêk tê. Girîngiya vê çavdêriyê di pêşketina teknîkî û pergala pevgihandinê û cîhangêrî jiyan dike, her wiha pirojeyên desthilatdarî û dagirkeriyê de, diyar dibe.

Divê ku çavdêrêya niştimanî bi hêzdarî di nava hemû dezgehên têkildarî vê mijarê de mîna dezgehên saloxgêrî û şopandin û çavdêriyê, yên ku çalakiya hêzên dijber mîna şaneyên razayî, sîxurî, sûcên birêxistinkirî, başiya kelûpelên hawirdeyî, aramiya trafîkê, her wiha kalîteya nûçe û agahiyên ku li ser internet û li bazar û derdorê tên derxistin dişopînin, hebin. Mînak, hin hêz dixwazin bi rêya mûzîk û film, her wiha dîmenên ne di rêzê de hin ramanên bi armancine pîs belav bikin, tê zanîn ku her temenek xweşî û nexweşîyên wê hene û dibe ku ev yek bandorê lê bike dema ku xwestekên xwe têr neke.

Nabe ku çavdêrêya niştimanî dogmatîk be, lê belê divê ku nerm be û li ser cîhana nerm vekirî be. Mînak, dema ku radîkaliya Daişê analîze dikin, em dibînin ku hemû kombûna du hezar sal ji dijminatiya di nava civakê de ye û ji aliyê hêzên desthilatdar û hegemonîk ve bi kar anîne. Li aliyê din jî em dibînin ku hêza civakî Daiş nepejirand û dijî wê têkoşîn kir. Dibe ev yek têkiliya wê bi dualîtiya xêr û şer re heye, her wiha tirs û aramiya di çanda kûr a civakê de.

Bi gelemperî, çavdêrêya niştimanî dikare rê li pêşiya demgokan an jî yên ku zordestiyê ji bo pêkanîna dadmendiyeke nebaş û exlaqan xirab dikin, rewa dikin, bigire; di heman demê de jî hestên rexneyî bi pêş dixe. Ev mijar dihêle ku mirov serbixwe bibe û ji şerê taybet dûr dixe, lewre divê ku hestên rexneyî bibe mîrateyeke çandî da ku hewayeke bîrdozî baş pêk bîne. Ev ne mijareke zikmakî ye, lê belê xwe disipêre kombûneke zanistî; dibe ku ev sedema sereke ya ronesansê di civakên Ewropî de bû û ev yek ji encamên erênî yên çavdêrêya niştimanî ye. Her wiha dikeve ser milê navend û dezgehên têkildar de ku nehêlin aliyê hestiyarî yê hemwelatiyan ji

aliyên din yên aborî, îdolijî, bawerî yan jî ji aliyê hêzên derve ve bi rêya arandina hestên wan ku analîzekirina hişmendî û hestên rexneyî dikupîne, keysbaz bikin ku di encamê de rê li pêşiya ramanên cuda vedike û nerehetî, zorkirin û reftarên cuda di mejiyê wan de tên çandin. Bandoriyên wê yên herî berçav jî xwelomkirin, poşmanî û di lixwegirtina berpisiyarêya binketinê de bi çavekî piçûk li xwe dinêrin, ku xwebawerêya mirov kêm dike û di hêz û şiyanên xwe de dixe gumanan. Êdî garantiya neredkirina şoreşê yan jî serhildana li dijî gendelî, zordestî û kedxwariyê bi dest dixe. Bi demê re hejmara kesan mezin dibe ku di encamê de civakê hemûyî dixe nava xwe û ev dibe kevirê bingehîn ê avakirina kerî; çimkî di hişê hundirîn ên mirovan de reftar tên guhartin da ku kes li şûna pêşketinê bike, dide dûv karên komê. Diyar e ku gelek fîlozof, zanyar û rewşenbîr di serdemên cuda de, rastî vê rewşê hatine. Ji aliyê din ve jî divê ku çavdêrêya niştimaî derfet û mercên guncav ji hemû hemwealtiyan re peyda bike û başî û diyarêya n pêşkêşî kesên pispor û afirîner bike, ev jî piştî ku wekheviya mirovî ji hemû hemwelatiyan re pêk were. Ev yek li hemberî paşverûtiyê xwedî bandor e. Di danîna ramyarîyên ku di hin aliyan de xwe disipêrin diyalektîkê di mijarên cuda de, her wiha di danîna pilaname û pirojeyên stratejîk û derxistina biryaran û garantiya pêkanîna rast jê re, ewlekarîya çavdêrî weke hêmanekî sereke ye. Lewre pêwîstiya wê bi guhdaneke taybet ji aliyê hemwelatî û berpirsiyaran ve heye.

Li gorî tiştên bûrî em dibînin ku çi qasî ewlekarîya niştimanî û rehendên wê ji bo pêkanîna serxwebûnê û serwerêya niştimanî, her wiha têkoşîna li dij pirojeyên dagirkeriyê, girîng in. Di vê mijarê de berpirsiyariyeke exlaqî dikeve ser milê Rêveberêya Xweser û çîna berpirsiyar. Di vir de wateya rast a şoreşa ji bo gel û welat tê diyarkirin, her wiha tişta ku Rêveberêya Xweser ji kom û rêxistinên radîkal û desthilata navendî cuda dike jî, ev e. Her wiha sedemek ji sedemên garantiya ewlekarî û aşitiya navneteweyî û têkbirina çanda nijadperestiyê ye.

**Dawî:**

Tişta herî metirsîdar serdestiya dîtaneya rasteqînî di têkiliyên navdewletî de li ser hişmendîya xwediyên biryarê di seranserî cîhanê de ye. Dibe ku ev yek ji ber gotina ramyarî ye ya ku dibêje "Ne hevaltî didome, ne dijminatî didome, tenê berjewendî didomin". Dewlet li ser bingehê ihtimalên nebaş

stratejiyên xwe bi hêzên din re datînin, mîna ku bi Paranoya ketibe û dibe ku ev yek çarçoveya yasaya "Kar û bertek" de xurtir be. Dibe ku ev sedema sereke be ya tunebûna ewlehî û aşitiya navdewletî û xurtbûna pevçûna imperyalîzimê di gelek dewletan de û pê re jî stratejiyên nû yên hegemonyayê bin. Taybet piştî tecrubeyên biêş ên ku di şerên sedsalên bûrî yên di navbera dewletên bihêz de derketin. Arastekirina wekelan bû bijardeyeke baş ji bo desthilatê û şerê bi dijminan re. Mînak, ji stratejiyên baş di ramyarîya derve ya dewletan de, serkeftina stratejiya mijûlkirinê di stratejiya ewlekariyê ya rojava de ku guherînên bingehîn di hişmendîya mirovê rojhilatî de çêkir û destserkirina welatê wan misoger kir, ew jî bi rêya avakirina dijminekî din ku di encamê de rojava bû dijminê duyem.

Cara yekem ku ev stratejî derket, bi dayîna Filsetînê mîna welatekî neteweyî ji Israilê re bû, piştre jî şeytankirina komunîstê, da ku hestên misilman û hestên baweriyê wiha li Israil û komunîstê binêrin ku metirsiya stratejî ya yekem e. Serkeftina wê hîn bêhtir bû gava ku Îran weke dijminê yekê yê misilmanên Sinna re hat diyarkirin ku li hemberî wê jî berteka Îranê heman tişt bû. Di heman demê de avakirina dewleteke Xilafetê ya Islamî berêya rizgarkirina Filestîn û derxistina desthilata rojavayî jê, be. Ev yek di hemû stratejiyên ewlekariyê yên dewletan li seranserî cîhanê bûye tiştekî normal, ne tenê li ser rojava. "Bazara Serdemê" ya ku Trump pêşkêş kir jî di vê çarçoveyê de ye. Nepejirandina hêzên rojavayî û paşverû ku danpêdanê bi Rêveberêya Xweser a li ser bingehê Neteweya Demokratîk bikin, dikeve nava vê çarçoveyê de. Çimkî ew hemû bandorên vê stratejiya li ser hemwelatîyên xwe nahêle û di heman demê de jiyana hevpar û hevpejirandinê xurt dike û serxwebûna niştimanî pêk tîne. Lewre divê ku hemû çînên berpirsiyar li tevahiya Sûriyeyê hevpeymaneke civakî nû saz bikin ku tê de hemû xelkên Sûriyeyê li hev kom bibin û nasnameya niştimanî xurt bike. Her wiha garantiya maf û azadiyan, weke destpêkeke sereke di pêkanîna pergala ewlekarîya niştimanî û mirovî di welat de, bike. Ezmûna Rêveberêya Xweser a ku di demeke kin de pêk hatiye, weke pêşengtiyekê tê dîtin ku lê xwedî derkevin. Her wiha binkeftina wê dê du bijardeyan bi xwe re bîne, yan vegera zordestiyê yan jî parçebûn û tevlîhevî di welat de.

# Bîrdoziya Şer Li Cem Kurdan

**(Beşa 1)**

- **Destpêk**

Şer di serdema nûjen de ji tundûtûjiya xwezayî ji bo parastin, ewlehiya xwarin û zayînê zêdetir bûye hevrikiyeke di navbera nirxên ramyarî û exlaqî yên aliyên dijber de. Ji ber vê yekê tundûtûjî ji çarçoveya xwe ya xwezayî derkete çarçoveyeke pragmatîk a destdirêjî û wêrankerî, ku li ser mirovan ferz kir ku bîrdoziyên xwe yên leşkerî pêşbixin da ku karibin bi vê tundiyê re rûbirû bimînin ji bo parastina ewlekariya xwe ya mirovî. Ev yek dibe bingeha şer, ku General Clausewitz bi nakokiya di navbera berjewendiyên mezin ên ku bi xwînê têne lihevkirin bi nav dike ye; ku siyaset weke malzaroka wê û şer jî weke amûreke siyasetê tê pejirandin, ji ber ku ew siyaseteke ku li şûna pênûsê şûr dide pêş e. Şer jî tenê wêrankirin e. Lê tevî vê yekê jî, parastin armanca dawî ya şer e. wisa xuya ye ku ev mijar tewreya bîrdoziya şer a nûjen e.

Kurd weke gelên din ên cîhanê jî xwedî bîrdoziyên leşkerî û şerker in, welatê wan Kurdistan jî bihuşta Rojhilat e û welatê qehremanan û armanca dagirkeran e. Hema bêje hemû lêkolîner hemfikir in ku Kurd gelê çiyayî yê kevnar û şerker e, bi serhişkî li hember her desthilatdareke ku hewl daye wî bindest bike li berxwe daye, lê belê, kurdan nikarîbûn ku statûyeke xwe ya siyasî ava bikin, sedema vê yekê jî dibe ku ji ber sosyolojiya çiyayî a ku bandora xwe li ser hest û hişmendiya wan kiriye be û her weha hevrikiya eşîrî yan jî bîrdozî, ku sedema nakokiyên bi hezaran salan ên di navbera civakên Kurdî de ye, ya ku hinek ji wan gihêştine pevçûnên bi xwîn, Ku bû sedema windakirina yekrêziyê ji bo berxwedana li dijî dagirkeran û rizgariya ji zaliman. Kurdistan hîn jî di bin bandora vê nakokiyê de ye, ya ku piştgirî dide dagîrkirina wê ji aliyê rejîmên zordar ve, heta radeya ku profesorê tirk Îsmaîl Beşîkcî, Kurdistanê weke mêtingeha navdewletî bi nav dike.

Serdema piştî Şerê Cîhanê yê Yekem bû şahidê veguherînên mezin ên siyasî û çandî li Rojhilata Navîn û cîhanê, û Ji bo hin gelan zemîn afirand ku ji bindestiyê rizgar bibin û welatên xwe azad bikin; Lê belê şoreş û serhildanên kurdan di vê çarçoveyê de nikarîbûn xewna azadî, serxwebûn û aştiyê ya kurdan pêk bînin. Hin kes sedema vê yekê dispêrin nakokiyên dijwar ên ji ber nakokiyên eşîrî û bûrdozî di navbera hin Kurdan de; wisa Xuya ye ku ev mijar bi giranî girêdayî windbûna bîrdoziya şer a yekgirtî ya Kurdan e, û bi vî awayî jî nebûna rêberên stratejîk ên xwedî pirzaniya şer a mezin, nemaze di serdema ku dêde pêşketinên teknolojîk ên ecêb di amûrên zordestî û destdirêjiyê de çêbûn.

Di vê çarçoveyê de jî wisa xuya ye ku xwendin û nirxandina hêmanên bîrdoziya şer a Kurdan, ji ber girêdana wê ya rasterast bi yekbûn an parçebûna jiyana siyasî, aborî û çandî ya Kurdan re, xwedî girîngiyeke stratejîk e. her weha Ji ber nebûna vekolîn û lêkolînên pêşketî yên leşkerî û têgehên girêdayî wê di Pirtûkxaneya Leşkerî ya Kurdî de, dê vekolîn û xwendina ramanên hin fermandarên leşkerî yên Kurd û nerînên hin lêkolîner û ramyarên leşkerî yên navneteweyî, ji bo nirxandina ramanên wan û pêşkêşkirina berhevkirina wan di çarçoveya xwendineke nû ji bîrdoziya şerê ya kurdan de, dê bikêr be, digel sûdwergirtina ji agahiyên berdest bi rêya peywendiya rasterast bi hejmareke ji şervanên Rojava re û jiyankirina hin êrîşên li dijî herêmên Rojava. her weha di gel sûdwergirtina ji nerîn û agahiyên ku di çarçoveya herdû forumên navneteweyî yên di derbarê (Qirkirina Etnîkî û Guhertina Demografîk li Efrînê) û (Foruma navneteweyî ya derbarê DAIŞ ê de) derketine de, yên ku ji aliyê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk NRLS li herêma Cezîrê di sala 2018 û 2019 P.Z de hatibûn damezrandin. Ev lêkolîn, bi giştî, nikare bi kûrahî têkeve nav jiyana leşkerî ya kurdan a ku dirêjahiya wê nêzîkî 4000 sal berê tê texmînkirin e, lewra dê bal li ser hin mijarên ku ji bo lêkolînê girîngin were kişandin; bi armanca xuyakirina nêrîneke giştî ji bo yekrêziya leşkerî ya kurdî bi riya nîşandana bîrdoziyeke şer a yekgirtî li ser bingeha armanca stratejîk a hevpar ku di çarçoveya azadî û demokrasiya Kurdistanê de û berxwedana li hember dijminê hemû Kurdan e. Ev yek jî di çarçoveya peymaneke rûmet a netewî ya kurdistanî de ye. Di gel balkişandina lêkolînê di hin beşên wê de li ser Rojava û ezmûnên wê yên siyasî û leşkerî yên ku heya radeyekê nû ne.

**Yekemîn- Wateya bîrdoziya şer**

Di serdema nûjen de qadên zanistên mirovî, xwezayî û ezmûnî bûn şahidê şoreşeke di biwêjên zanistî de, yên ku di sedsala bîstan û piştî wê de gelek zêde bûn, ku karîbûn gelek têgehan di biwêjên watedar û berfireh de, yên ku bi riya dehan ferhengan têne pênase kirin, kurt bikin, beşa leşkerî jî di vî warî de para xwe ya biwêjan hebû, ku bi sedan biwêj hene weke erdnîgariya leşkerî, bîrdoziya leşkerî, ewlehiya parastinê, stratejî û taktîkên leşkerî, lêdana pêşîlêgirtinê, bîrdoziya şer û hwd. Tê zanîn ku piraniya van biwêjan ji hêla ramyarên stratejîk ên cîhana rojavayî (Ewropa û Emerîka) ve hatine çêkirin, û li gorî şirovekirin an nêrîna herêmî ya her çandê bi piraniya zimanên cîhanê hatine wergerandin; tê zanîn jî ku van ramyarên rojavayî, bi mîrateya leşkerî ya dîrokî ya civakên mirovahiyê bandor bûne, Hunera Şer a Sun Tzu ku (zêdeyî 2000 sal) e û tecrûbeyên fermandarên leşkerî yên navdar di dîrokê de, çavkaniyên sereke ji bo pêşketina ramana leşkerî ya nûjen in.

Ji ber ku cîhan gelek aloziyên siyasî û aborî jiyan dike, piraniya çavkaniyên niştimanî yên welatan di xizmeta bihêzkirina hêzên xwe yên çekdar de ne, weke stratejiyeke berevaniyê ya girêdayî pirsgirêka hebûna û nebûna piraniya civakên mirovahiyê ye. Ev mijar ne encama vê sedsalê ye, lê destpêka wê, li gorî pîvanên demê, vedigere dawiya serdema neolîtîk (derdora 5000 B.Z) weke encameke guherînên hewayî û pêşveçûnên ramanî yên mirovan, hin lêkolîner şêweyên şerê yekem wekî çalakiyeke nêçîrê ku ji aliyê mirovê pêşîn ve li dijî birayê wî bi awayekî hovane hatiye kirin, Ji bo kolekirina wî, bikaranîna wî ji bo pêdiviyên çandinî û avahîsaziyê, desteserkirina mal û milkên wî û hwd, şîrove dikin. Ji aliyê xwe ve lêkolîner (Dyakov) jiyana mirovê pêşîn weke jiyana şidet û tundiyê ji aliyakî ve bi nav dike, ku bi êrîşên candarên din re, yên ku mirovan nikarîbûn bi bazdanê û hêza fizîkî bi wan re hevseng bin, rûbirû ye. Ji aliyê din ve jî, jiyana mirovên pêşîn bi belangazî bi nav dike, ku bi birçîbûn û serma re rûbirû ye; Lê, bi saya pêşketina hişmendiya wî û çêkirina amûran, mîna rimên kurt ên ji serê fîlan an ji kevirê hesinî, xençerên ji strûfan û bikaranîna agir û hwd, wî karîbû xwe biparêze, û hêza xwe ji bo peydakirina pêdiviyên hebûna xwe xurt bike di warê parastin, dûndehdan û xwarinê de, yên ku weke tê xuyakirin stûnên bingehîn ên bîrdoziya şerkirinê ne.

Ramyarên leşkerî yên bi nav û deng, weke mînak, General Clausevitz, di pirtûka xwe ya bi navê “kûrte di Şer de” (The Brief in War) ramanên di derbarê têgeha bîrdoziya şer de bêyî ku wekî biwêj binav bike pêşkêş dike, ev yek jî bi riya şîrovekirina hêza exlaqî û bandora wê weke hêmanên bingehîn ji xwezaya tevgera şerkirinê, ku şer weke xebateke ji xebatên tundiyê û vegotineke derveyî ji hestên dijminatiyê ye, bi nerîna wî, şerê serkeftî bi riya bikaranîna hêza fizîkî û ramanî ya hevseng pêk tê, û Yek ji handan an stûnên wê yên herî girîng hovîtî ye, ji ber ku di şer de dilnermbûn windakirina hêz û çewtiyeke mezin e, her weha hest û niyeta dijminatî a li hemberî dijmin çavkaniya metirsiyê ye, wêrekî weke hêza bilind a giyanê, ku diyarkirina wêrekiyê, baweriya bi serkeftinê ye. Li gorî Klawsvîts (Clausevitz) du beşên wêrekiyê hene: wêrekiya kesane û wêrekiya wijdan. Wêrekiya kesane jî li ser du cureyan dabeş dike: cureya yekem bi taybetmendî û rewişta kes ve girêdayî ye di çarçoveya biçûkxistina metirsî û mirinê yan jî jêhatîbûn danûstandina bi her metirsiyan re û vê yekê weke beşek ji xwazaya kes dipejirîne. Cureya duyem jî bi coş û daxwaza di xizmeta bîrdoziyê an îdolojiyê, giyaniyê an siyasetê ve girêdayî ye; hemahengiya van her du cureyan jî dibe sedema wêrekiya herî tekûz, her weha kîn û hêrs jî weke hêzeke xurt tê pejirandin, û daxwaza şeref û rûmetê jî di vê çarçoveyê de tê pejirandin; Lê belê, ew jîrbûna bi karanîna hêzê bi awayekî herî çalak weke şertek di şerê serkeftî de dipejirîne, ji ber ku jîrbûn di şer de gelek hêz, dem û windahiyan peyda dike.

Klawsvîts (Clausevitz) her weha cewherê giyanê şerkeriyê bi berxwedana di bin agir û wêraniyê, paşguhkirina tirsên xapînok, xweragirtina li hember tunebûnê û keda berdewam, amadebûna fedekariyê, rêzgirtin û baweriya bi rêber û rêhevalan û rewabûna şer û bidestxistina serkeftinê ve, girê dide; ji ber keda fîzîkî û psîkî pêdiviya şer in, mîna avjeniya di deryaya xeter, biguman û êşan de be, yê ku bixwaze berxwedan û xweragiriyê bike dibe ku xwedî hêzeke bedenî û exlaqî be ku karibe zehmetiyê û êşan hilgire û zîrekî, wêrekî û tedbîran pêwîst dike.

Hevkariya di navbera wêrekî û zîrekiyê de jî çavkaniya wêrekiya raman û biryardariyê ye ku dikare li hember gumana neyînî ya ku di kêliyên krîtîk ên şer de derdikevin holê bisekine, ji ber ku xeterî û dîmenên êşê hestên ku

bi hêsanî baweriyên ramanî dixe bin bandora xwe derdixînin holê; ku dihêle şervan di wan kêliyan de ji ramanên xwe zêdetir guh bide hestên xwe. Her weha nirxandina rast ya dijberan, cesaret û wêrekiya bi lez û bez di berevanî an êrişê de, pêwîstiyeke şer e; ev yek ji sedemên serketinê ye û rasterast vegotineke ji hêza moralê ya ku raman û vîna saxlem, hêza kesane û hêza xweragirtinê, diyar dike. Wisa xuya dike ku mijara hatiyê behs kirin, têgeha bîrdoziya şer a li ser nerîna General Klawsvîts (Clausewitz) bi zelalî vedibêje.

Têkildarî Kurdan di serdema nûjen de, fermandarên leşkerî yên herî navdar ên Tevgera Azadiya Kurdistanê, bîrdoziya şer bi danasîna tundiyê li gorî paradigma Rêberê Kurd Ocalan rave dikin û destnîşan dikin ku destpêka diyarbûna bîrdoziya şer bi destpêka derketina kilanên mirovî ve, destpê dike, ku wê demê şer tunebû, lê belê parastin û xweparastina jixweber ku xwe dispêre tundiyê ji bo berdewamkirina jiyanê bi riya peydakirina parastin, xwarin û dûndanbûnê hebû; ji ber Ku operesyonên nêçîr û berhevkirina berheman cureke tundûtûjiyê ye li dijî candarên din, û her candarek ji bo parastina xwe li hember candarên din cureyeke tundûtûjiyê bi rêbazeke cuda bikar tîne û di heman demê de nêçîra candarên din dike, ji ber vê yekê tundûtûjî qanûneke jiyana xwezayî tê pejirandin. Ji ber ku di destê mirovan de çekên xwezayî ji bo parastina jiyana xwe tunebûn, hem raman û hem civak an jî kilan çavkaniyeke ji bo parastina ji tundûtûjiya dijber, û hêzek ji bo arastekirina tundiya xwe ji bo berjewendiya civakê ava kirin. Ev yek di xebatên parastin, nêçîr û çandiniyê de ku bi awayekî komî dihatin kirin û bi dadmendî û wekhevî dihatin parvekirin, diyar dibû. Tundûtûjiya ji bo xweparastinê tiştekî rewa û xwezayî ye û her tiştê ku derveyî vê çarçoveyê ye weke barbarî tê dîtin, ji ber ku xweparastin mafê jiyanê ye û mafê her mirov, civak û gelî ye, Her weha tundûtûjî cureyeke şer e ku şêwaz, amûr û armancên wê yên taybet hene, ji ber vê yekê sedemên tundûtûjiyê hêza potansiyela ya bîrdoziya şer a mirovan e. Di dawiya serdema neolîtîk de bi hilweşîna pergala jin-dayîk re û guhertinên hewa, zêdebûna neştecîhan, zêdebûna hestên çavnebarî di nav mirovan de û derketina ramana Xweda û perestiyan, tundûtûjî kete qonaxeke din, û ji bo nîçîrkirina hêza mirovên din hate bikar anîn ji bo zêdekirina hilberîna çandiniyê û avakirina avahiyan di çarçova civaka çînî an koletiyê de, û ji bo rewakirina tundûtûjiyê ji aliyê mirovatiyê ve, da ku

birêkûpêk bibe li ser bingeha mîtolojî û olan qanûn hatin amadekirin, vê yek jî zemîna damezrandina desthilatdariya dewletan ava kir û bi vî awayî tundûtûjî bû xwedî sazî û pergal. Bi pêşketina hêzdariya mêr a şerkirinê re bi pêşxistina amûrên tundûtûjiyê di Serdema Metalî de, ku hovtir bûn wek şûr, xencer, bêr, rim û hwd, pêwîstî bi hebûna mirovên pispor ji bo bikaranîna wan amûran hebû, ji ber vê yekê çîna şerkeran rûda û bi rêya bikaranîna tundûtûjiyê ya birêxistinkirî û arastekirî bûn bingeha damezrandina artêşê, ya ku wisa xuya dike veguherî amûreke têkbirina vîna mirovan û serweriya li ser erd û cihan, û pêşxistina, desthilatdarî, koletî û destdirêjiya li ser jiyanê û talankirina çand û gencîneyan; Ji ber vê yekê em dikarin li gorî nerîna van pêşengan du cureyên tundûtûjiyê pênase bikin: tundûtûjiya xwezayî û ya qirêj; tundiya xwezayî ji bo jiyana azad, parastina şeref, namûs û çanda civakî, pêkanîna wekhevî û demokrasî û dadmendî tê kirin. û xuya ye xweparastin wê îfade dike. Tundûtûjiya qirêj jî, ji bo kuştin an jî bindestkirina mirovan ji bo berjewendiyên maddî tê terxankirin û hovîtî jî nasnameyeke wê ya eşkere ye. Ji ber vê yekê, ev her du cureyên Tundûtûjiyê xwazaya bîrdoziya şerkirinê ya her kes û komekê diyar dikin, û ew hêza ku şer û cengan kontrol dike ye; Ji bo vê jî bîrdoziya şer hewcedarî bingehên bîrdozî û çandî, zanîn û ezmûnê ne. Ev paradîgma dibîne ku hîna jî li Kurdistanê civaka xwezayî tê hîskirin û li ser vê bingehê bîrdoziya nû ya şer ji bo Kurdan di nava çil salên borî de li ser bingeha xweparastina rewa hatiye avakirin, û bi berxwedana xwe li hemberî hêzên herî xurt bandora xwe piştrast kiriye, heya asta ku gelek şervanên Kurd çalakiyên fedayî yên parastinê pêk anîn û endamên rêxistinên tundrew bixwe jî ji ber vê yekê matmayî man, wek ku hin ji wan ji me re gotin; bîrdoziya xweparastinê jî bûye xaleke bingehîn di rêziknameya yekemîn a peymana civakî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de.

Bi giştî bîrdoziya şer beşeke sereke ya bîrdoziya leşkerî ye, bêguman her statûyek jî bîrdoziyeke xwe ya leşkerî heye ku pêkhateyên hêzên wê yên çekdar, çawaniya rêvebirina pêkhateyên wê yên rêxistinî, armanc, bîrdoziya wê ya şer û hwd diyar dike. Biwêja bîrdoziya Leşkerî (Military Doctrine) gelek bala ramyarên leşkerî kişandiye, û hema bêje hemî bi pênaseyek sereke ya ku ji hêla pisporên NATO-yê ve hatî pênase kirin re têkildar e, ku dibêje, "Ew komeke prensîbên bingehîn e ku hêzên leşkerî araste dike ku erk û armancên xwe pêk bînin". Tevî ku bîrdozî xwedî

prensîbên sabîte jî, lê ji bo rûbirûbûna bi dijwarî, gef û xetereyên ku kêm zêde derdikevin pêş re, her dem di bin lêvegerê de ye, û li gorî vê yekê jî ew di xwazaya xwe de her ku diçe pêş dikeve, ji ber ew pira di navbera raman û tevgerê de ye; ango bi wateya rêvebirina karûbarên leşkerî li gorî ezmûna zanistî û pratîkî di dema aştî û şer de. Di bîrdoziya leşkerî de gelek rêgez hene, ya herî balkêş jî bîrdoziya Şerkiriniyê (Fighting Doctrine) û bîrdoziya şer (Combat Doctrine). Tevî şibandina xuyanger ya van her du biwêjan jî, di têgeha her yek ji wan de cudahî heye; ji ber ku di bîrdoziya Şerkiriniyê de prensîbên ku asta çalakbûnê ya hêzên leşkerî birêkûpêk dikin heye, ku tê wateya bikaranîna bi rêxstinî ya hêzên leşkerî ji bo bêkanîna armancên stratejîk bi riya plansazkirin, birêxistinkirin, yekgirtin û pêkanîna çalakiyên leşkerî piştî destnîşankirina armancan û bikaranîna çavkaniyên pêwîst û girtina tedbîrên guncaw, bêyî ku bikeve nav ziraviyên biçûk ên bicihanînê, û bi vî awayî ew rêbaza ku ji hêla hêzan ve tê bikaranîn ji bo pêkanîna erkên xwe yên şerkeriyê yên ku bi hêzên wan ên leşkerî (mirovî, çekdarî û lojîstîkî) re hemaheng in, diyar dike, bi rengekî ku têkbirina hêzên dijmin misoger dike. Lê belê bîrdoziya şer prensîbên ku asta taktîkî (seferberî) ya hêzên leşkerî birêkûpêk dike ye, ku tê wateya asta ku tê de şerê rasterast di piratîk de diqewime, û tevgera hêzên cihêreng di dema şer de û rêvebirina karûbarên lojîstîk diyar dike, û bi armanca serkeftina di şer de rasterast piştgiriya hêzên beşdarî şer dibin dike. Wisa xuya dike ku têgehên jorîn taybetî ji bo artêşên birêxistinkirî ne, lê ew di heman demê de jî yekîneyên leşkerî yên piçûktir jî di nav xwe de digre, ji ber ku ew bi plansazkirina çalakiyên leşkerî û diyarkirina armanc û erkên şervanan ve têkildar in, û tevgerên ku di pevçûnan de têne kirin birêve dibe. Bi giştî, pêwendiyek nêz di navbera bîrdoziya şer a kes û bîrdoziya leşkerî ya yekîneya ku ew di bin sîwana wê de ye de heye, çi êl be, çi gund be, çi dewlet be, çi civakeke bawerî be û hwd; ji ber ku bîrdoziya şer navenda serkeftinên leşkerî yên dîrokî ye. weke mînak, rêberên mîna Kêxisro (Kekhsrow) yê Medî, Hanîbeel (Hannibal) û Spartakûs (Spartacus) weke rêber û şervan rizgariya ji koletiyê, sedema sereke ya bîrdoziya şerê wan bû. Ema Îskender û serkêşên navdar ên artêşên îslamî û Napolyon, sedema wan ew bû ku bawerî û çanda xwe xwecih bikin, û ev yek jî sedema sereke ya bîrdoziya şer wan bû, her weha bi dehan nimûneyên din jî hene.

- **Taybetmendiyên bingehîn ên bîrdoziya şer**

Şer tevgereke westiyan e, ku hemû xerîzeyên laşî, derûnî û ramanî seferber dike ye, û ji bo têkbirin dijberan pêwîstiya wê bi bîrdoziyeke ku moralê biparêze û di şer de zehmetiyan bikişîne heye; her çandek jî bîrdoziya wê ya parastin û êrîşê di şer de hebû. Bingeha bîrdoziya şer di asta kesane de di çarçoveya du pirsan de dizivire: Çima ez şer dikim? Ez ê çawa şer bikim? Wisa xuya ye ku bersiv bi giranî li ser motîvên ku kesek bi sedema wan perwerdehiya leşkerî werdigire, guh dide ferman û perispektîvan, çek hildide û şer dike, û armanceke pêşîn dide ber çavên xwe ku li gorî wê ew amadeye were kuştin, birîndarkirin, seqetbûn û heta mal û milkê xwe wenda kirin, an jî ziyanê bide kesên din ku wekî dijmin têne pênase kirin; Weke mînak, di bîrdoziyên olî de, bîrdoziya şer di çarçoveya cîhadê de bû û hîna jî li dora wê dizivire da ku xwedawendê xwe razî bike û taybemendiyên ku xweda soza wan daye bidest bixe; hin caran ol bûye meqam ji bo rewakirina tundûtûjiya sîstematîk û hovîtiya sadîstî ya hin padîşahên serdemên berê, û carinan jî bûye meqam ji bo rewakirina şoreşa li hemberî zorbazan; di netew dewletan de jî giranî li ser parastina dewletê bû weke yek ji garantorên berjewendîyên aborî, û di pêkhateyên eşîran de jî giranî li ser parastina êl û milkê wê bû, hin motîvên din jî hene weke coşa şoreşgerî, daxwaza rizgarbûna ji bindestîyê bû, û her weha ji bo tolhildan, dadmendî, bidestxistina rûmeta kesane, parastina şeref û rûmetê, Gengaz e jî ku armanc maddî bin, ango şerkirin bibe pîşeyek ji bo bidestxistina pereyan, ku di serdema nûjen de weke pîşeya çetetî tê zanîn, ku şer ji bo bidestxistina xenîmet û xelatan tê kirin. Bîrdoziya şer reftarên tên bikaranîn ji bo parastina xwe û gihandina ziyanê bi dijminan di nav xwe de digre, bi taybetî yên girêdayî alavên şervanan. Gelek rêbazên şer hene, wek lêdan-vekişîn, pevçûna ji dûr ve bi çekên rast-avêtinê, pevçûna şer a rasterast, dorpêçkirin, şerê gerîla (Guerrilla warfare) û hwd. Ev mijar rêzeke rêjeyî ya çalakiyên parastin, êrîş û wêrankirinê ne, lewra li ser kesên ku dê bibin şervan hat ferzkirin ku perwerdehiya taybet û guncaw ji her rêbazê re bigrin, ji ber vê yekê bû beşek bingehîn ji bîrdoziya şer. Cûdahiyeke mezin di navbera ku kujer (wek çete) û şervanbûnê de heye, ji ber ku ev mijar li gorî asta pabendbûna exlaqî ya kesane ya bi xwezaya mirovî re diyar dibe. Di serdema nûjen de jî gelek saziyên sivîl yên ku girîngiyê didin nirxdariya jiyanê li ser asta navdewletî hin prensîn û dîspilîn weke rêgez û peyman ji

bo xurtkirina hizira kesê şervan di bîrdoziya şerkirinê ya piraniya yekîneyên leşkerî de, pejirandin.

Li gorî vê yekê, em dikarin li ser bingeha tiştên ku hatine behs kirin bîrdoziya şer rave bikin, wekî reftar, hest û tedbîrên ku dihêlin şervan bi coş û moraleke bilind şer bike da ku bigihîje armancên ku ji bo wan zehmetî û ziyanên ku dike rewa bike (çi ziyanên ku dike an jî yên bi dijberan dike). Roleke bi bandor ya bîrdoziya giyanî û ramanî ya ku ji aliyê civaka ku wê diparêze, di bîrdoziya şer de heye. Windabûn an qelsiya wê yek jî, yek ji karîgerên sereke yên têkçûn û heta bêje derbazbûna nav xiyanetê ye jî. Motîva şer, giyanê û şêwaza şerkirinê, stûn û pîvanên sereke yên bîrdoziya şer in. Armanca şer tunekirin, rûreşkirin, dagirkirin, talankirin an jî parastin e. Lê belê giyanê şerkirinê di moral, wêrekî, hêza hilgirtina zehmetiyên şer, awayê danûstandina bi girtiyan re û bi jin, zarok û kal û pîrên dijmin re, û asta zordestî û destdirêjî ji karîgerên bi bandor in. Lê li aliyekî din şêwaza şer bi reftarên danûstandinê ku di şer de bi dijmin re têne kirin ve girêdayî ye, di warê rêbaza şer, rêvebirina pevçûnê, hêza danûstandina avaker a bi kemîn û hîleyên xapînok û pêkanîna çalakiyên êrîş, parastin û vekişînê. Bi gelemperî, tu kes bêyî bîrdoziyê nikare şer berdewam bike. bîrdoziya şer jî di nav rêberan de digihîje asta herî jor, ji ber ku rêbertî tê wateya şerê profesyonel, ango rêber şer dike û di heman demê de jî şer birêve dibe. Her weha gengaz e ku bîrdoziya şer bi hêza xerîzeyî ya dirav an olê ku mirovên qels dixapîne bandor bibe, mîna hêza daxwaza rizgarbûna ji desthiladarên zorbaz ya ku xwediyên vîna hêzdar radike ser piyan. Krîza Sûriyê gelek nimûneyên vê yekê dide, weke mînak, hûn dibînin ku hemwelatiyên Sûriyê yên ku berê erka mecbûrî ya artêşa Sûriyê rednedikirin, ji nişka ve di qeyrana ku welat têre derbas dibe de, bûn tundrew ji bo armancên ku ne girêdayî êş û azarên wan di bin desthilata navendî ya rêjîma Sûriyê de û di heman demê de jî tu çareseriyan pêşkêş nakin, û piştî şerê bi salan tê dîtin ku ew çawa bûne çete ji bo berjewendiyên hin hêzên herêmî û xwecihî li dijî prensîbên xwe û li deverên din ên dûrî herêmên xwe şer dikin. Lê li aliyekî din em şervanên ku ji bo rêgezên xwe yên di çaçoveya bidestxistina dadmendiyê û berxwedana desthilatdariya zorbazî xwe feda kirine, dibînin. Hema bêje hemû hêz û rêxistinên leşkerî yên li erdnîgariya Sûriyê çalak in, ji vê hêza xerîzeyî rizgar nebûn.

Bi giştî, bîrdoziya şer li ba kesekî cûdayî ya kesê din e, ev yek jî li gorî şiroveya wî ji diyardeyên heyî û yên li hawîrdora wî, asta bandorbûna wî bi hêza xerîzeya drav, ol an azadîxwaziyê re, nirxandina wî ji xetereyan û gefên diqewimin an jî dibe ku biqewimin re, çawaniya danûstandina bi wan gefan re, asta hêza wî ya ramanî û laşî. Ya herî girîng jî çanda civaka ku tê de dijî ye, ji ber ku hêzên moralî yên hevgirtî enerjiya ku di westandinê de winda dibe tawîz dike û şervanan xurt dike; wisa xuya ye ku ew karîgera diyarker a serkeftin an têkçûnê ye. Ji ber vê yekê, stratejiya serkeftî bi giranî bi hêza diyarkirina bîrdoziya şer a bi bandor, yekbûyî û guncaw ve girêdayî ye ji bo piştgiriya çavkaniyên hêzên din ku dikarin armanca stratejîk pêkbînin. Di vir de rola rêber û pirzaniya leşkerî derdikeve pêş, ji ber şer weke fermandarê ku birêve dibe ye û weke dîtina ku birêve dibe ye, li gorî nêrîna General Klawsvîts (Clausewitz), yê ku diyar dike “... her ku tevgerên şerkirinê yên gelekî zêde hebin, ew qas jî şansê pirzaniya şerkirinê zêde ye, ji ber ku ew bi pêşveçûna ramanî û moralî ya gel bi giştî ve girêdayî ye, ku em di nav gelên pêşîn yên ku meyla wan şer bû de hejmareke zêde ya mêrên şerker ji ya ku em di nav gelên medenî de dibînin e, ji ber ku hemû şerkerên di nav gelên pêşîn de bi şer handan dibûn. Lê piraniya girseya gelê medenî ji bo şerkirinê dema ku hewce bike têne leşker kirin, ne ji ber meyla wan ya şer. Lê belê em tu carî nabînin ku rêberekî pir mezin ji hêla gelên pêşîn ve hatî afirandin, û pirzaniya şerkeriya wî ya leşkerî kêm e, ji ber ku pêdivî bi pêşketina ramanî heye...", Tevî vê nerînê jî, di nav hin gelên pêşîn de hinek rêberên leşkerî yên navdar deketin, mîna Atilla, serkirdeyê Hunan, Cengîz Xan, serkirdeyê Mongolan û hwd.

# Bandora ziwabûnê li ser rewşa josiyasî ya Rojava

- **Destpêk.**

Ziwabûn li hember pêşketina erdnîgariya mirovahiyê rolek neyînî mezin lîstiye, vê diyardeyê hişt ku bi sedên miletan koçber bibin an şerê hev bikin, mîna gelên ku hatine kevana zêrîn û hin gel jî neçar mane ku bendav û deboyên berhevkirina avê; ava bikin. Di heman demê de ew dibe yek ji sedemên rasterast ên derketina civakên çînî bi rêya kontrolkirina çîna jorîn li ser jêderên avê û serçimandina gelên koçber, mîna ku li Geliyê Nîlê û Mezopotamyayê, bajardewletên li peravên çem û Golan çêbû, di heman demê de bû sirûşkek ji bo daraştina efsaneyên afirandinê. Ev jî bû sedema hilweşîna şaristaniyan û têkçûna çandan, Lewma di erdnîgariya siyasî û têkiliyên josiyasî de xwedî roleke bibandor e. bêguman, ziwabûn ji bo gelekan bûye sedema êş û azarê û ji bo yên din jî bûye çavkaniya dilxweşiyê. Wisa dixuye ku ev senaryo di dîroka me ya hemdem de hê jî berdewam e. Di serdema ku cîhan di şoreşeke aborî jiyan dike, li gel geşbûna berdewam a bilindbûna serjimêriyê û germbûna gerdûnî, ziwabûn bûye metirsiyeke mezin li ser aştî û ewlehiya navneteweyî. jixwe welatin hene, çavkaniyên avê yên di destê xwe de, mîna alaveke şantajê ji bo pêkanîna planên komploger li dijî hin civak û welatan bikar tînin. Ji ber vê yekê, di çarçeweya wan mijarên girêdayî ewlekariya avê de, bi taybetî li Rojhilata Navîn, bûye karîgerek sereke ku ewlehiya neteweyî ya gelek miletan dixe metirsiyê û qeyranên avê li Misir, Iraq, Sûriye, Urdin û yên din nîşaneyên vê rastiyê ye

Li Rojava jî, piştî ku diyardeye ziwabûnê dubare dibe, metirsiya wê ji metirsiya gefên leşkerî ne kêmtir e, Ji ber girêdana wê bi armancên josiyasî ve û ji ber ku bandora wê li ser ewlehiya xwarinê[1] û aboriyê û li ser erdnîgariya josiyasî ya herêmî karîgerek têkdar e, dibe çavkaniyek stratejîk a metirsîdar. Ev tişt gelek rewşên guncav ji hin hêzan re peyda dike ku herêmê dagîr bike. Li gorî rîxistina xurek û çandiniyê(FAO) ya bi ser

1 http://www.fao.org/3/Y6067A/Y6067A.htm

Neteweyên Yekbûyî ve, ziwabûn ne tenê birçîbûnê bi xwe re tîne, lêbelê kujerekî sewdar e, ji ber ku dibe sedema gelek nexweşiyan; mîna nexweşiya çavan, Malarya, gurîbûn, şehrî, şewata daristanan û hwd, bixwe re tîne[2].

di vê lêkolînê de em ê bi giştî ronahiyê bidin ser ziwabûnê û bandorên wê yên pêkan li ser rewşa josiyasî ya herêmê û em ê pêşniyaran li gorî lokolînên cûr bi cûr yên têkildarî ziwabûnê û bandora wê li ser herêmê pêşkêş bikin .

- **Pênaseya ziwabûnê:**

**Dema behsa peyva ziwabûnê tê kirin, yekem tiştê ku tê bîra mirov, dîtina dîmena çolekê yan rûbera axeke qelişî, tevî wilo jî di warê pênasîn, dabeşkirin û rêjeyê de, têgehên zanistî yên ziwabûnê hene. Ji ber vê yekê beriya ku rewşa ziwabûnê li Rojava were nirxandin û karîgerên xetereyê û bertekên wê bêne lêkolînkirin, zelalkirina têgeha ziwabûnê pêwîst e.**

Ziwabûn diyardeyek xwezayî ye ku bi çolbûnê ve girêdayî ye û xwedan rehendeke gerdûnî ye, bi rêjeyên cûda; sal bi sal li deverên nîv ziwa[3] û bandorên wê ji herêmekê bo herêmek din ciyawaz e, bi giranî bi guherîna avhewayê û bi hebûna çalakiyên mirovî ku bandore li ser jîngehê zêde dike girêdayî ye. Ew diyardeyek kevnar e ku hem li ser çand û hem jî li ser josiyasî bandor kiriye, nemaze li erdnîgariya ku ji Okyanûsa Atlantîk heya digihêje Asyaya Navîn ku dihêle nakokî di navbera civakan derkeve û dewletên xwedî sîstemên çînî ava bibin, ji ber vê yekê weke qanûneke xwezayê belî dike.

Bi giştî, diyardeya ziwatiyê bala cîhanê kişandiye, Di vî warî de li gorî Peymana Neteweyên Yekbûyî ya li dijî ziwatiyê, lihevkirinek rêjeyî li ser pênaseya wê hat kirin. Madeya(1)- benda(C) ji vê pymananê[5] têgeha ziwatiyê diyar dike ku "Ziwabûn diyardeyeke bi awayekî xwezayî çêdibe û dema ku baran kêm dibare û asta wê di bin astên normal ên tomarkirî de dibe, tê dîtin, ku ev yek dibe sedema bêhevsengiyek metirsîdar a hîdroolojîk ku bandoreke xirab li pergalên hilberîna çavkaniyên erdê dike". Ev jî yek ji pênaseyên ku ji hêla Rêxistina hewanasî[6] (Meteorolojiy) ya Cîhanê ve hatî pejirandin e. Li rex pênasiyeke din ku wiha pênase dike"

2 http://www.fao.org/3/Y6067A/Y6067A.htm

Baran demeke dirêj nebariye, an jî bi awayekî şaş tê belavkirin" Ji bo rûbirûyeke rasteqîne li hember ziwabûn, çolbûnê û hişyarkirin ji bo metirsiya wê, 17'ê pûşberê weke roja cîhnî ya tekoşîna li dijî çolbûn û ziwatiyê hat pejirandin .

Piraniya lêkolînên ku li ser vê diyardeyê rawestiyane, destnîşan dikin ku çend dabeşkirinên wê hene[7] wek avhewa yan ziwabûna demsalî ku bi barîna kêm (baran an berf), kêmbûna kalîteya hewayê, ziwabûna axê ya ji ber kêmbûna rewayê, ziwabûna hîdrolojîk ku bi kêmbûna çavkaniyên ava sererd û binerd ve girêdayî ye, ziwabûna ekolojîk ku bi xerabûna jîngeha xwezayî ya daristan û deverên hêşîn ve girêdayî ye, ji ber ku şênkatî rêjeyke ji hêwîtiya hewayê di encama pêvajoya xunavê[8] peyda dike. jixwe nebidestxistina her mirovekî salane 1000 $m^3$ ava paqij, dikeve bin pîvana xizaniya avê.

Li kêleka bandora avhewayê û jîngehê li ser rêjeya ziwabûnê, nezanebûn an xemsariya di rêvebirina biaqilane ya çavkaniyên avê de û lawaziya siyasetên neteweyî yên têkildarî çalakiyên aborî yên ku dibin sedema têkçûna jîngehê û sedema qirêjiya avê, rolek mezin di zêdekirina ziwabûnê de dilîze. Ewlehiya avê dibe beşeke bingehîn a ewlehiya aborî, bi taybetî di warê ewlehiya xwarinê û ewlehiya enerjiyê de, bi vî rengî dibe karîgerek bandorê li ser rewşa josiyasî ya her herêmekê.

- **Rewşa josiyasî ya Rojava**

Ji bo ku nêrînek giştî ya josiyasî were dariştin, pêwîste ku têgeha giştî ya erdnîgariya siyasî were ronîkirin .

Têgeha erdnîgariya siyasî têgeheke berfireh û tevliheve[9] û dibe yek ji şaxên erdnîgariya mirovî û têgeha wê bêtir bi wateya herêma siyasî[10] tê naskirin û di rêya pevbandorkirina di navbera ax û mirovande ku karîgerên hêza pergalên siyasî peyda dike, tevdigere. Cihê erdnîgarî, herêmên xwezayî, serjimêr, çalakiya aborî, şêweyên xanî, bajar û pêkhatina şaristanî ya mirovan weke nijad, komên zimanî, rêxistina çîn û hêmanên jîngeha xwezayî yên wekî teşeya rûyê erdê, avhewa, ax, şînkatiya xwezayî, rêyên avê û gol, ev hemû dibin hêmanên sereke ya erdnîgariya josiyasî ya her herêmê. Bi vê yekê komên mirovî li dora xwe çêdike û statuyek hevgirtî ava dike û li gorî berjewendiya van kesan tev digere.

Di heman demê de, di rêya rola erdnîgariyê de ku parastina gel an civakê misger dike, xwedan pîvanek ewlehiyê ye, ji ber wilo dibe pîvana hêzê. Ji erdnîgariya siyasî du alîyên paradîgmatîk derdikevin: josiyasî û jestratejîk ku rêgeza siyasî, ewlekarî, leşkerî û aborî (hundirîn û derve) ya her desthilatekê diyar dike. Ji bo josiyasîyê jî pênaseyeke wê ya taybet nîne û hema bêje her netewe yan jî pirgaleke dewletî perspektîfa xwe ya josiyasî ya taybet heye[11], ew jî li gorî metirsiyek an gefa ku cewhera wê tê dariştin. Ji ber vê yekê, bi guhertina dem û bingehên pergala gerdûnî re, dibe sedema guhertinê. Ev têgeh li gel lêkolîneran bi têgeha imperyalîzma Rojava û siyasetên mêtinker ve hatiye girêdan, bi mebesta serdestkirina herêmên erdnîgarî li seranserê cîhanê; ji bo dabînkirina ewlekarî û berjewendiyên netewî. Em dikarin xuyabûna wê di siyaseta navneteweyî de bi derketina netewdewletan û sînorkirina wan bi sînorên siyasî yên hatine ferzkirin ve girêbidin û li gorî wê planên stratejîk tên danîn, da ku bingeha ajandayên siyasî çêbikin, jixwe Nazî di dariştina stratejiyên xwe de,dibin yên herî zêde jê bandor bûne. Xuya ye ku ev yek dibe sedema bingehîn a nakokiyên navneteweyî, herêmî û heta hundirîn yên li herêmê diqewimin, ji bo ku erdnîgariyekê kontirol bike û siyaseteke aborî pêk bîne, hewcedarî bi berfirehbûneke ji derveyî sînorê siyasî ya welat an herêmê heye, Ji ber vê yekê, hewli dide erdnîgarîyê biguncîne û têxe xizmeta armanc û daxwazên bîrdozî. dîtina josiyasî, sînorên fizîkî û giyanî yên ku cîhanê di qada me û wan de dabeş dike, diyar dike.

Ango tîkiliya wê bi hemû bîrdoz û tundirewa siyasî heye û berberiya berjewendiyên aborî dike, Ji ber vê yekê, di navbera erdnîgarî, siyaset, aborî û leşkerî de têkiliyek hevjiyan (symbiotical)ava dike, lê ev tişt nerîna reşbînî rew nake, ji ber ku di siyaseta neteweyî ya bergiriyê ya her pirgaleke siyasî de, berjewendiyên josiyasî û kêmkirina gefên josiyasî di ber çavan re derbas dike, weke mînak, li rex pêşkêşkirina piştgiriyeke tam ji aliyê Yekîneyên Parastina Gel û Jinan ve ji bo rizgarkirina civakên Erebî ji destê DAIŞ û rejîmê, rizgarkirina bajarên Reqa û tevahiya herêmê ku dikeve aliyê rojhilatê Çemê Firatê û Şingal, ji bo şêniyên herêmê girîngiyeke josiyasî bû, di haman demê de gefên dewleta Tirk, ên cidî ku ji nerînek josiyasî li hemberî herêmê dertê ku dixwaze tevahiya Rojava dagir bike û dest deyne ser çavkaniyên Dicle û Firat. Bi vê yekê girîngiya josiyasî bidest dixe û derfetê didêyê ku li gorî ajandeyên xwe di mijarên josiyasî de rolekê bilîze.

Ji bo jostratejiyê, ew asta stratejîk a pergala siyasî bi deh hêmanên erdnîgarî analîz dike, ew jî ev in: Cih, qebare, dirûv, girêdana deryayî, sînor, girêdana zeryayî, erdnîgarî, avhewa, dahat, û serjimêr. Ji ber vê yekê av, ax û şînatî wekî beşên jîngeha xwezayî, hêmanên erdnîgarî ne; bandorê li hêza her pergaleke siyasî dikin.

Bi giştî û li gorî me li jor anî ziman, rewşa josiyasî yan jî jostratejîk a herêmekê bi hesabên wê yên stratejîk ên taybet di hawirdora wê ya siyasî û asta cihê wê ya di plan û hisabên stratejîk de ên welatên din, dikare were şirovekirin, ji vê re dibêjin pirsgirêkên josiyasî û jostratejîk.

Hevrikiya Navneteweyîli ser jêderên enerjî, rêkên bejayî û deryayî û bazarên cîhanî hevdem bi xirabûna avhewa,  zêdebûna germahiyê, ziwabûn û çolbûn li gelek welatên ku bi navê cîhana sêyemîn tê binavkirin, geşbûna serjimêriyê û pêre çalakiyên aborî, pirsgirêka avê derket hole.

Bi demê re, tê çaverêkirin ku av bi yekdestdîkirin, an qirêjkirina wê di nakokiyên siyasî û aborî de bibe amûrek bi bandor, tevî ku gelek biryarên Navneteweyî li ser vê babetê derketin û teqezî li ser girêdana mijara avê bi mafên mirovan ên civakî, aborî û çandî [11]. Ji ber wilo, tgîna "Hydro-polîtîk"[12] dê di salên pêş de zêde bibe, ji ber ku av çavkaniyek stratejîk e ku domdariya civakî, aborî û jîngehî ya her civakê misoger dike.

Loma, ziwabûn û têkçûna çavkaniyên xwezayî dibe yek ji karîgerên ku bandoreke neyînî li ser erdnîgariya herêmê ya  siyasî û gefeke josiyasî çêdike û ev yek dihêle ku koçberiyeke komî encam bide û rewşa aborî ya navxweyî têk here û ewlehî lewaz bibe û bibe derfet ji bo pêkanîna armancên siyasî ku peymana civakî tarûmar bike û herêmê rastî dagirkirinekê yan jî rastî çewisandin û serweriya hêzeke din were ku vîna xwe li ser neştecihan ferz bike. Gelek lêkolînan[3], di serî de Akademiya Neteweyî ya zanistê li Amerîkayê, teqezî li ser rola ziwabûnê di pêxistina şoreşa Sûriyê de; sala 2011 an, kir.

3 Bêtir naskirin:Colin P. Kelley, Shahrzad Mohtadi, Mark A. Cane, Richard Seager, and Yochanan Kushnir; Climate change in the Fertile Crescent and implications of the recent Syrian drought; PNAS (Proceedings of the National Academy of Sciences of the United states of America); First published March 2,2015; Link:


Wê bal kişand ser wê yekê ku têkçûn an xemsariya rêjîma Sûriyê di çareserkirina qeyranê û encamên wê de ku bû sedema koçberbûna bi hezaran ber bi bajarên mezin û peydabûna civakên xizan û perîşan, yên ku êş û azarên wan ji ber destdirêjiya zordar û yekdestdariya olîgarşî li ser ewlehiya mirovî ya welatiyan zêde bû, vê yekê hişt ku atmosfereke vekirî li ser ramana radîkal peydabibe û bibe sedema lewazbûna aboriya çandiniyê ku piraniya welatiyan xwe dispêrin ser. Hişt ku alozî bêtir gur bibe û bi hezaran mirov tevlî serhildanên gelirî bibin û doza rûxandina rêjîmê bikin.

Lewra, rewşa josiyasî ya bakur û Rojhilatê Sûriyê û derdora wê, ji ber ziwabûnê pêşberî du kêşeyane, Yek ji wan ajandayên siyasî yên ku li dijî wê hatine plankirin û ya duyemîn jî bi siyaseta navxweyî ya girêdayî dabînkirina ewlehiya xwarin, av û enerjiyê ve girêdayî ye. Ziwabûn zexteke mezin li ser Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û helwesta wê ya siyasî ya li hember pabendbûna bi rêgezên lawaz dike û ji bo parastina ewlekariya av û xwarinê, wê neçar dike ku tawîzan bide. Dibe ku di rêya lawazkirina projeyên aborî û geşepêdanê, pirbûna rêjeya hejariyê ya metirsîdar, bandore li ser hevkêşeyên josiyasiya herêmê bike. Ji ber vê sedemê lawazbûna Rêveberiya Xweser her ku diçe zêdetir dibe, hevdem bi hêsankirina pêvajoyên guhertina demografîk û têkbirina aramiya herêmê. Ev yek fişareke ewlekarî û aborî ya mezin li ser Rêveberiya Xweser dike, ya ku xizmetguzariyan pêşkêşî nêzîkî çar milyon welatî, aware û penaberan dike, ku pêwîstî bi wê yekê heye çalakiyên xwe yên dîplomatîk ligel rêxistinên navdewletî yên têkildarî mijarên av, ziwabûn, çolbûn, tenduristî, xwarin, penaber û avhewa, zêde bike..

- **Diyardeya ziwabûnê li Rojav**

Erdnîgariya Rojava dibe beşeke girîng ji herêma bakurê kevana zêrîn(başûrê rêzeçiyayên Torosê), her wiha dibe dergûşa şoreşa çandinî, sewalvanî û pêkanîna pîşeya şivantiyê. Li rojava du hawizên avê yên sereke hene, Deşta Dîcle û Xabûrê û hewza Firatê, ku li gorî hin lêkolînên ku beriya sala 2010an[14] hatine kirin, depoyeke mezin ji ava bin erda li wir heye. Dema ku em cihê wê li ser nexşeyê lêkolîn bikin, em dibînin ku ew di navbera du herêmên erdnîgarî de ye, yek ji wan bakurê Kurdistanê ye ku pir bi şilî û çavkaniyên avê gelekî dewlemend e û ya duyemîn jî Badiya Sûrî ye ku dikeve seranserî sînorê Îraqî ku ew dever bi berdewambû rastî çolbûn û

pêvajoyên ziwabûnê tê. Ev rewş li ser herêmê rewşeke josiyasî taybet ferz dike, ji ber ku dewleta Tirk bi avakirina dîwaran û leşkerîkirina sînoran hewl dide cudahiyê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de kûrtir bike û di qonaxên paşerojê de jî plan dike ku ger derfet bê dayîn tevahiya herêmê mîna (Efrîn - Girê Spî -Srê Kaniyê) dagir bike û li wir jî qirkirina nijadî li dijî kurdan pêk bîne. wisa tê xuyakirin, ziwabûna ku dewleta Tirk di rêya kontrolkirina stasyona avê ya Elok û herkîna çemê ferêt, van pêvajoyan hêsan dike. Têkildarî bandorên ku ji aliyê başûr ve tên, herêm ji ber ziwabûnê rastî krîzeke demografîk tê. Dibe ku rêjîma Sûriyê û hevalbendên wê sûdê jê werbigirin û jîngeheke guncaw ji tundûtûjiyê re peyda bikin û aramiya herêmê têk bibin. Ji ber vê yekê em têkiliyekê di navbera encamên jîngehê yên ziwabûnê û pîlanên komplogerên ku dixwazin herêmê kontrol bikin, dibînin. Xuyaye ku kêmbûna avê û şert û mercên giran ên avhewayê rasterast rola xwe di têkçûna aborî û têkiliyên civakî û siyasî yên herêmê de dilîze. Tê pêşbînîkirin ku di pêşerojê de şer li ser avê, mîna şerê ku niha li ser çavkaniyên enerjiyê tê kirin, derkeve holê. Ev yek dihêle ku mirov avê jî weke jêderekê li rex petrol, gaz, komir û yoranyomê bide nasîn.




Delavên avê li ser erdnîgariya Sûriyê.([4])

Der barê diyardeya ziwabûnê ya li Rojava, tu lêkolînên rast nînin. Piraniya lêkolîn û amarên ku mijûlî çarçoveya erdnîgariya Sûriyê dibin;

[4]https://water.fanack.com/wp-content/uploads/2019/04/Syria_Water-Basins_3000px-950x750.png

dibêjin Rojava herîmeke nîv ziwa ye. Parçeyên wê yên başûr dikevin deverên ku weke ziwabûnê têne binav kirin û piraniya baranê ji ber dûkel û dêrandinê winda dibe. Ew ji sala 1930 ve gelek caran rastî ziwabûnê tê. Yek ji nîşaneyên herî berbiçav ku vê yekê piştrast dike, daketina rêjeya keskatî û nebûna wê li gelek deveran, germahiya zêde, nebarîna baran û berfê û pirbûna toz e, û gelek çem rastî ziwabûnê bûn, bi taybetî jî çemê Xabûr ku girîngtirîn şaxê çemê Firatê ye . Zehmetiya peydakirina avê li gelek deveran peda bû, nemaze piştî ku dewleta Tirk herêm dagir kir, ava ji stasyona Elok dertê dibire û bû sedem ku asta çemê Firatê di demên dawî de dakeve asta nizm û xeternak. Siyaseta avê ya Tirkiyê[16] li hember Sûriye û Iraqê dimeşîne, dibe yek ji karîgerên sereke yên geşbûna diyardeya ziwabûnê li van her du welatan. Di sala 2007an de, herêm rastî ziwabûnek dijwar hat ku ev 12,000 sal in herêmê wiha nedîtiye, li gorî tiştê ku ji hêla Akademiya Zanistî ya Neteweyî ya Amerîkayê[17] di sala 2015-an de hate weşandin ku dibêje: Pêşeroja avhewayê dê li Rojhilata Navîn ziwatir û germtir bibe. Lêbelê, ji ber dijwariya pêşbînkirina tevgera xwezayê û avhewayê ku bi diyardeyên stêrnasî yên bi tevgera gerstêrkan ve girêdayî ye, sedemek xwezayî ya zelal a vê baweriyê tune ye, nemaze di mijara mutasyonên avhewa de, yên wekî mutasyona Buşan[19] û bahoz û deng û teqereq û hwd. Tiştê ku vê yekê piştrast dike, guherandina rêjeya baran û berfê li Rojava ji sala 2010 heta sala 2020-an. weke nimûne, di zivistana 2013/2014 de, li herêmê berf bariya ku ji mêjde li herêmê nebariya bû. Lêkolîneke avhewayê[19] dide zanîn ku ziwabûna li Sûriyeyê bi ziwabûna li Rojhilata Navîn a ji sala 1931'an vir ve girêdayî ye,

Rêjeya barîna baranê ne westar e, li gorî lêkolînê tu belgeyên teqez ên zêdebûna hino hino ya ziwabûnê û berdewamiya wê ya bi dehan salan tune û xwest ku angaştên pêkan û misoger tevlihev nekin, tevî wilo, nîşaneyên avhewayê hene ku li herêma Rojhilata navîn û bakurê Afrîkayê dê di demek bê de baran kêm bibe. Germahiya navîn ya havînê dê hêdî hêdî ji 0,5 heta 0,9 pileyî serê dehsalekê li piraniya havînê li herêmê, zêde bibe û Tirkiye û Sûriye dê ji krîza ziwabûnê bêtir zirarê bibînin.

- **Sedemên ziwabûnê li Rojava**

Li Rojava, diyardeya ziwabûnê gelek sedemên xwe hene, bi giştî dibe diyardeyek avhewayî û xwezayî. Lê gelek karîger hene dibin sedema pydabûna wê, ev karîger girêdayî ne siyaseta Tirkiyê ya der barê avê,

lewaziya rêveberiya avê ya herêmê, çi ji hêla dezgehên berpirsyar û çi jî ji hêla welatiyan ve be. Ev yek bi bandora mirovî di rûdana ziwatiya dijwar û berdewam li herêmê tê binavkirin. Em Karin sedemên vê bandorê dabeşî bandorên derveyî û hundirîn bikin.

Di der barê karîgerên derveyî de, bêguman girêdayî siyaseta Tirkiyê ya avê , bi taybetî piştî ku karîbû projeyên mezin ên avê li ser çemên Dîcle û Firatê ava bike û qebareya wê gihîşt astekê ku kare asta herduyan wek bixwaze kêm bike, wek me dît çawa ava Feratê de di havîna sala 2021 birî, ji bilî dagîrkirina stasyona avê ya Elok û rawestandina demkî ya berdana avê ber bi bajarê Hesekê û gundewarên wê.

Dema em êş û azarên niştecihên herêma Cizîrê dibînin ku çawa bi zehmetî avê ji bo bikaranîna malê û çandiniyê di şert û mercên belavbûna vîrusa koronayê û ziwabûna herêmê de peyda dikin, em asta terora avê ku dewleta Tirk a dagirker anîne serê gelên herêmê; asta binpêkirina mafên mirovan[21] û peymanên navneteweyî[22] dibînin.

Çemê Dîcle û firat dibin girîngtir çem li Rojhila Navîn, li peravên wan, komek şaristaniyên herî kevnar hatine avakirin, Bi hezaran sal ku hemû nijad û bawerî li vê herêmê bûne damarên jiyana mirovan, bûne sedema naskirin û hevgirtina çandan, ji bilî rola wan di şoreşa çandiniyê deli herêmê. Lehiyên wan jî di belavbûna efsane û baweriyên olî yên ku li çaraliyê cîhanê belav bûne de, roleke mezin lîst. Di serdema nûjen de, girîngiya wê pir zêde bûye, her çiqas girîngtirîn çavkaniyên ava şirîn û masîyan, niha jî bûne çavkaniyên girîng ên hilberîna elektrîkê. Dewleta Tirk di dîrokê de, yekem welat e ku ev taybetmendiya çandî ya her du çeman ji hev qetand û av ji bo mebestên siyasî û veberhênana wê ji bo tunekirina gelê Kurd li Bakurê Sûriyeyê bi pêvajoyên guhertina demografîk û bi zorê ji warên wan ên resn rakirin, bi kar anî[23]. Li ser van kiryarên wê, mirov dikare bîje ku mîna yên Barbarên Mongolî ne ku şaristaniyên herêmê wêran kirin.

Di sedsala 20an de, bi rêya siyaseta avê kurd li ser destên herdu rejîman Tirkiyê û Sûriyê, rastî mezintirîn pêvajoyên guhertina demografîk hatine. Li Tirkiyê projeya "GAP"[24]ê bû sedema koçberkirina bi hezaran kurd ji warên wan. hêjaye bi bîrxistinê ku gelê Kurd berê jî rastî eynî pilanê hatiye ku di rêra qaşo Îslahata Rojhilat(Îslahûlşerq)[25] ku ji aliyê damezrînerê Komara Tirk; Ataturk ve piştî tepisandina şoreşa Şêx Seîd a sala 1925'an hate

meşandin, di encamê de, bi hezaran kurd ji bakurê kurdistanê koçî rojava kirin. Li Sûriyê jî, pirojeya Bendava Firatê û Gola el-Esed hate bi kar anîn, ku bi sedan malbatên Ereb neçar kirin ku ji cihên xwe bi darê zorê koçî deverên kurdî li bakurê welêt bibin ku wan re dibêjin (Erebê Xemir). Di encamê de, di bin navê Zagona Çakirina Çandiniyê de gelek erdên kurdan hatin desteserkirin û li ser erebên Xemir belavkirin. Tevî siysetên nijadperest ên her du rêjîman li hemberî herêmê, wan nekarî dijminatiya etnîkî têxin di navbera Kurd û Ereban û Kurd û Tirkan. Lê ta niha her du rejîman jî dest ji kiryarên xwe bernedane û di rêya siyaseta xwe ya zordar hewil didin nefreta etnîkî û mezhebî û şerê derûnî li dijî gelên herêmê xurt bikin.

Li gorî Peymanader barê Qanûna Bikaranîna Rêyên Avê yên Navneteweyî, yên girêdayî armancên nederyayî[26] ku di sala 1997 de hate pejirandin, madeya (2) xala (B) ("çemên avê yên navneteweyî" tê wateya çemê ku di çend welatên re derbas dibe) . Her wiha Benda Duyemîn ya rêgezên Helsinkî ya 1966[27], çemên Dîcle û Ferat wekî çemên navneteweyî têne hesibandin û ji bo welatên ku ev her du çem di wan re diherikin, pabendî vê peymanê dibin.

Lê dewleta Tirk berovajî vê yeke tev digere û li ser binavkirina wan weke du çemên Tirkî rijd e ku ji mafê wê ye wan kontrol bike û avên wan yekdestdar bike, da ku projeyên xwe yên hîdrosiyasî li ser wan rewa bike. Bi zanebîn rêjîmên Tirk rêgezên pêwîst ji bo damezrandina bazara avê, mîna bazarên enerjiyê yên Navneteweyî danî, ramanên firotina avê ji bo welatên ku astengiyan ji kêmbûna avê dikişînin ku asta karînên wan gihiştiye asta GAP[28], derxist pêş. Ji bo wê jî pirojeya GAP avakir ku di rêya wê rê avê kontirol bike, encama wê jî me dît dema di havîna 2021 ê, ava çemê firatê ziwa kir, her wiha pirojeya bi navê Boriyan ku armanca wê çemên Sîhan û Cîhan ku dikevin rojavayê Tirkiyê veberhênan bike, ji bo avê bifiroşe Israîlê, lê ev piroje ji ber lewaziya peredanê , astengiyên pêkanînê û redkirina Sûriyê, neçû serî. Welatên herêmê , ev siyaset û kiryarên Dewleta Tirk red kirin. Deraberî wê jî pirsgirêkên mafê mirovan û binpêkirinên mafê welatan bo çemên navneteweyî derxistin pêş. Niha jî ev kiryar li ser destê hikûmeta Erdogan tê birêvebirin, di dîrokê de ev cara yekê ye ku Firat hem li Sûriyê hem jî li Iraqê dikeve asta herî nizim û bi milyonan sivîlan li herêmê dixe bin

metirsiyê, zirareke aborî mezin li zeviyên çandiniyê, pîşesaziya masîgiriyê, kerta avên şîrîn û hilberîna hîdrolektrîkê kir. Tevî bihaneyên rayedarên Tirk ên li ser pirsgirêka ziwahiyê, her wiha bipêkirnên wan ên têkildarî qutkirina ava stasyona Elok ya dagirkirî li ser miletê bajarê Til Temir û Hesekê û gundewarên wan bi mebesta şerê terorê, angaştên dewleta tirk eşkere dibin.

Bi dehan rêxistinên mafnasî[30]û xêrxwaziyê vê rastiyê nas dikin. Tevî ku rêjîma Sûriyê mîna dewleta Tirk şerê Rêveberiya Xweser dike, der barê binpêkirinên Dewleta Tirk li Neteweyên Yekbûyî kilî kir. jixwe dewleta Iraqê jî li ser van binpêkirinan bê deng nema û helwesta xwe dijî dewleta Tirk nîşan da. Dewleta Tirk yek ji wan welatên cîhanê ye ku bi çavkaniyên avê (çem, baran, berf û avên bin erdê) dewlemend e. Ji ber vê yekê ava wê ji hewcedariya wê zêdetir e, loma jî projeyên wê yên avê li ser çemên Dîcle û Firatê ne ji ber hewcedariya wê ya lezgîn bi avê ye, dibe ku ji bo pêkanîna terora avê li dijî cîranên xwe yên başûr bikar tîne û serweriya xwe ya josiyasî li herêmê dabîn dike ku bi rêya wê dikare li dijî ewlekariya neteweyî ya cîranên xwe siyasetek êrîşkar bimeşîne û wan serçimandî bike. Tevî wê yekê jî, Tirkiyê ji vê siyasetê tu sûd wenegirtiye ji bilî zerer û ziyana gelên herêm. Bi vê siyasetê piraniya rûbarên herêma Cizîrê bi taybet çemên Xabûr û Ceqceq miçiqîn û herêm ber bi ziwabûn û çolbûn ve çû, newilo tenê, ew kar li ser ziwabûna ava binerdê ya di navbera her du aliyên sînorê siyasî yên Tirkiye-Sûriyê dixebite, bîrên bêbinî dikole û berê herkiîna ava kaniyan dide nava Tirkiyê, ku bû sedema kêmbûna asta ava binerd li herêmên sînorî, bi taybetî bakurê Sûriyê.

Projeya GAPê di siyaseta avê ya Tirkiyê de jî roleke stratejîk dilîze, ji ber ku yek ji mezintirîn projeyên avê li cîhanê tê dîtin û yek ji projeyên stratejîk ên dewleta Tirkiyê ye, ku ji bo wê jî bûdceyeke mezin terxan kiriye. li rex armancên xwe yên berbiçav; mîna dabînkirina elektrîk, ava şirîn û avdana zeviyan. Ev proje di bingehê xwe de armancên wê yên din jî hene ku avê weke çekekê di siyaseta derve ya Tirkiyê ku ji sê arasteyan pê tê, bikar tîne. Arasteya yekem, ev proje karînek wê ya mezin heye ku kengî bixwaze herikîna çemê Firatê, yan jî çemê Dîcle ber bi Iraq û Sûriyê ve bibire, bi depokirina ava wê an jî guhertina rêya wê, bi vî rengî dorpêçek avê li ser Sûriyê û Iraqê ferz bike, ji bilî lawazkirina dewlemendiya çandiniyê ya herdu

welatan û kontrolkirina wan. Ji ber vê yekê ewlehiya xwarinê li Iraq û Sûriyê dikeve destê Tirkiyê de. Gelek hemwelatiyên Sûriyê gotina Wezîrê Berevaniya Tirkiyê di sala 1988an di bîra wan de ye ku gef li Sûriyê xwaribû: “ji bo gemkirina Sûriyê, du çekên me hene, av û hêza leşkerî ye”, ev gegf hat dema Sûriyê ji hêla siyasî, leşkerî û aborî xurt bû û daxwaza vegerandina herêma Îskenderûnê ya dagirkirî û destwerdanê di şerê wê yê bi Dewleta Îsraîlê re neke, kir. Ev proje dê bihêle dewleta Tirk zêdetirî %80ê ava çemê Firatê kontrol bike û ev yek dê ewlehiya neteweyî ya Sûriye û Iraqê bixe bin metirsiyê.

Arasteya duyem, bi rêya dabînkirina dana ava şirîn a berdewam mîna bankek avê ji bo welatên di bin xeta hejariya avê de ne, wek Îsraîl, Urdun û welatên kendavê, û heta firotina wê ji bo Sûriyê û Iraqê. Arasteya sêyem, garantiya serweriya Tirkiyeyê di warê xwirek, enerjiya û elektrîkê de; li Rojhilata Navîn. Rejîma Tirk dixwaze Tirkiyeyê li Rojhilata Navîn bike zembîla xwarinê û bibe serdesta herêmê ku vîna gelên herêmê kontrol dike.

Dewleta Tirk heta vê gavê tu rêzê ji Peymana Navnetewî ya taybet bi bikaranîna Rêyên Avê yên nederyayî nagire ku di sala 1997’an de ji aliyê komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve hatiye pejirandin û rêgezên Peymana Helsînkî ya 1966’an û rêgezên ku paşê li ser hatine zêdekirin, ji bo çemên Dîcle û Firatê, jixwe berê jî dewleta Tirk tu pabendiyê bi peymana di nav wê Sûrî û Iraqê de nagire. Ev kiryar yek ji karîgerên ku metirsiyên li ser aştî û ewlehiya navdewletî dike û mafên mirovan û ewlehiya niştimanî ya Sûrî û Iraqê gef dike. Ev tişt, hem li ser mafên mirovan û hem jî li ser ewlekariya niştimanî ya Sûriye û Iraqê metirsiyekê çêdike û jîngehên hejar û paşverû diafirîne ku dikarin ji bo bîrdoziya tundrew a bêsînor bibe bingeh û hevrikiya mezhebî û nijadî gur bike, li milekî din jî, bikaranîna şert û mercên jiyanê yên dijwar û hikûmeta xwecihî ya ku nikare kirîza avê çareser bike, dibe ku jîngehek nû ava bike ku tê de bîrdoziya DAIŞ careke din geş bibe. Îro, gelê bakurê Sûriyê, yên ku piştgirî dan civaka navneteweyî û dewleta Daişê rûxand, ji hêla hikûmeta Erdogan ve rastî gefeke mezin tên, ji ber ku ev hikûmet, avê weke çekeke terorîstî li dijî Rêveberiya Xweser pêk tîne. Ev yek di şerê li dijî terorê ku bi sedan qurbanî dane, xizmeta doza civaka navneteweyî nake.

Ji aliyekî din ve, lêkolîneke ku ji aliyê Akademiya Zanistî ya Netewî ya Amerîka[29] ve hatiye weşandin, nîşan dide ku guhertinên di barîna baranê de li Sûriyê girêdayî ye bi bilindbûnabi fişara asta rojhilatî deryaya Spî, bandora gazên temirandî ku jêdera wan kargeh in û bayê ziwa û bi toz ku ji başûr ve tê .

Der barê bandorên hundirîn ku ji lewaziya bi rêvebirina jêderên avê, ne pisportî, gendelî û rewşa ewlehî ya ji ber aloiya welêt, pêk tê. Çendîn lêkolînan diyar kirin ku rola siyaseta rêjîmê, ji dema ketiye ser desthilatê tempoya ziwabûnê bilind kiriye, ji ber ku tenê teqezî li ser çandiniya dexlûdanan û xwedîkirina sewalan ku gihiştibû nêzî milyon seriyî[30] û çalakiyên aborî yên din , mîna avakirina kargehan, çandiniya darên mêwan û çêkirina xaniyên bilstîkî, pişguh dikir. vê yekê hişt ku bikaranîna ava binerd a bê rêk û pêk, piraniya neştecihan ji bo debara jiyana xwe dispartin ser xwedîkirina sewalan, hişt ku hevdem bi pêlên koçberiyêyên di salên 2003-2007 an de, bêtir ziwabûn çêbibe ku sedema wê jî guhetina diyardeya avhewayê, pê re nabarîna baranê li herêmê. vê yekê bandoreke mezin li rewşa jiyanî ya welatiyan kir(Berhema genim %67 daket, û %47 ji berhema ceh kêm bû)[31], jimara sewalan di sala 2007an de kêm bû, hişt gelek kes ji bo peydakirina kar, ji gundan koçî bajaran bibin.

Ji alike din ve jî çanda civakî roleke mizin di ziwabûnê de dilîze, ziwabûn di demsala havînê de zêde dibe ku ji ber mezexta avê di şûştin, bikaranîne basarkên li ser avê, avakirina xaniyn, avdana gulîstanan û hin sedemên teknîkî di tora avê de. Ji aliyekî din ve, li gorî hin çavdêran, birêvebirina çavkaniyên avê li herêmê ji aliyê hikûmeta Sûriyê ve bi xirabî tê meşandin, çi ji ber ne pisporî, gendelî, yan jî xemsariya di pêşxistina karên çandiniyê yên nedomdar de bi balkişandina li ser hin cureyên çandiniyê ku tibabek mezin a avê dixwaze, wekî genim û pembû, ne pêşxistina rêbazên avdanê, na avakirina pirojeyên avê li ser çemê Dicle û Firatê û veberhênana enerjiya rojê, na çandina daristanan ku bandora bahozên qûmê rawestîne û wdn. Ev tişt hemû diyar dike ku rejîma Sûriyê, di siyasetên xwe yên aborî de li herêmê, tu guhdanê nade geşepêdan û parastina ewlekariya avê ya li gorî zêdebûna nifûsê û guhertina avhewayê.

Li gorî tişên ku me li jor anî ziman, xuya ye ku rejîm xwe ji berpirsyariya vê yekê dûr xistiye,nîşana wê jî, wezîrê sûrî yê çandiniyê[32] ku di tîrmeha

2008an de bi eşkere ji berpirsên Netewên Yekgirtî re got ku encamên aborî û civakî yên ziwabûnê ji karînên wan zêdetir e.

Bi giştî, em dikarin bi kurtî sedemên zêdebûna ziwabûnê li herêmê bi çar sedeman ve girê bidin:

1- Zêdebûna daxwaza avê ji ber berhemanîna çandiniyê, ji bo dabînkirina debara jiyanê û bilindbûna serjimariyê.
2- Kêmbûna barîna baranê di van salên dawî de, ji bo qerebûkirina kêmbûna yedekên avên bin erdê û bendavan de, bi awayekî guncaw.
3- neçareserkirina encamên ziwabûna slên berê
4- Terora avê ya ku dewleta Tirk li dijî şêniyên herêmê pêk tîne.

Pişgukirina van sedeman ji hêla dewlet, civak û sazîyav ve, dê pêkana encamdana dijwarbûna ziwabûnên zêde bibe, dibe ku bi salan berdewam bike.

Ji bo Rêveberiya Xweser, ji ber metirsiyên ewlehî û leşkerî, dorpêçkirin û pêlên koçberî û penaberiyê yên ku herêm di çarçoveya qeyrana navborî de rû bi rû ye, zehmet e ku karibe encamên ziwabûnê çareser bike. ji bo çareseriyê, Rêveberiya Xweser hin hewildan kirin, xwest ku bîrên bêserûbin kontirol bike, nêzî 4000 dar bi nave(Keziyên kesk) biçîne û rê da pirojeyên çandiniyê. Lê ev tedbîr ji bo çareserkirina encamên xirab têrê nakin, nemaze ji ber lawazbûna karînên wê yên aborî, dorpêçkirin û gefên berdewam ên dewleta Tirk û çeteyên bi ser wê ve. Lê tişa ku vê rewşê aloztir dike ku gelek rêxistinên navneteweyî yên ku bi av, xwarin û jîngehê re têkildarin, ji ber nerazîbûna hin welatên weke Tirkiyê, Rûsya, Qeter û yên din, bi Rêveberiya Xweser û rêxistinên civaka sivîl ên herêmê re danûstandinê pişguh dike. divabe ev rêxistinên ku di warê alîkarî û geşepêdanê de dixebitin, rastî zextên siyasî yên hin welatên ku peymanên navneteweyî binpê dikin weke terorîzma avê ya Tirkiyeyê li dijî herêmê, nebin.

- **Encamên ziwabûnê**

Ziwabûn her dem bi kêmbûna avê û çolbûnê ve tê girêdan û bandora wê ya neyînî bêtir giraniya wê li ser pêşkeftina aborî û hilberîna cûrbecûr ya xwarinê heye. windakirina çareseriyê, dê bibe sedema birçîbûn û koçberiyek girseyî, dibe ku bandore li tevahiya civakan bike. Ziwabûna

tundrew dibe ku civakek ji hêla siyasî ve tengezar be, wê bajo ber bi hilweşînê û tundûtûjiyê de. Ji ber vê yekê, ziwabûn karîgera derketina qeyranan e, hin kes wê dikin sedema sereke ya derketina şer di pêşerojê de. Bi giştî, ziwabûn dibe sedema zêdebûna zextên aborî ku di encamê de, zextên civakî, siyasî û ewlehiyê li ser civak û saziyên wan ên îdarî yên cihêreng dikin.

Pêla ziwabûnê ya ku niha herêm tûşî wê dibe, ya herî dijwar e û dibe ku ji wilo zêdetir bibe ku di encamê de û ji ber zêdebûna serjimêriyê ku çalakiyên avakirina avahiyiyan dixwaze û avakirina pirojeyên aborî di qonaxa piştî şer de, daxwaza li ser avê pir xurt bibe. Bi giştî, rêjeya bandorên encamên ziwabûnê, bi zirarên li ser jîngeh, neştecî û têkiliyên siyasî girêdayî ye. berztirîn encamp:

1- Ewlehiya xwarinê ya herêmê gef dike, her wiha ziwabûn ewlehiya çandiniyê têk dibe, ji ber ku berhemên demsalî kêm dibe, çolbûnê berfireh dibe, û dewlemendî û jimara sewalan ji ber nebûna çêrê û şînkatiyê kêm dibe.

2- Têkbirina aboriya gundan û bilindikirina rêjeya bêkariyê, ji ber ku gelek ji neştecihan ji gundan koçî bajaran bûn ku di encamê de hêza kirînê daket û nirxê kelûpelan bilind bû, ji ber rêjeya xwebesî, di warê berhemdayîna xwarinê ji berhemên dexlûdan, şîr, şekir û rûn kêm e û herêm neçar dimîne ku ji derve bikire. ne tenê wilo, ji ber ziwabûnê gelek malbatan ji bo debara jiyana xwe, ji neçarî milk û mewdanên xwe firotin[33].

3- Kêmbûna hilberîna elektrîkê, ji ber encamên ziwabûna vê dawîyê û bikarîna van encaman ji hêla dewleta Tirk ve ku av kir amûrek siyasî li dijî Rêveberiya Xweser, enerjiya hîdroelektrîkê ya ji bendavên çemê Firatê dertê, lawaz kir.

4- Kêmbûna asta ava binerd ku tê dîtin gelek bîr dikin ziwa bibin, ji bilî têkbirina jîngeha xwezayî ya herêmê û pêkana derketina şewatê û peydabûna gelek nexweşiyan. Li gorî Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, nîvê qurbaniyên karesatên xwezayî, sedema wê ziwabûn e.

5- Li ser ziyandaran, bandorek neyînî û derûnî hişt. Derketina çavkaniyeke nû yên ku metirsiyê li ser ewlekariya niştimanî ya herêmê çêdike, wek derketina hin tawanên organîze yan jî koçberiyê, dûrketina ji dibistanê û pîrozkirina pereyan û destbelavî. Ev reftar ji girîngtirîn karîgerên wêranker

in ji bo çanda kevnar a civakên herêmê ku dibe encama wendakirina nasnameya çandî û reşkirina xwezaya peywendiyên civakî. Weke rev û koçberiya ji ber şer, dibe ku pêlek koçberiyê ji ber ziwabûnê çêbibe û ev tişt pêwîstîya wê bi kampan û kampanyayeke alîkariyê ya niştimanî heye ku bargiraniyên zêde dixe ser mile Rêveberiya Xweser, dibe ku ji karînên wê zêdetir be.

- **Karîgerên gurkirina ziwabûnê.**

**Di Li gorî tiştên ku me li jor anî ziman, ziwabûn weke rastiyekê xwe ferz kiriye û dibebe ku bandora wê ya neyînî li ser avê û çavkaniyên mirovî jî bidome. Ev yek dihêle ku hevsengiya dinavbera ava heyî û ya tê xwestin tek here. ji bo heremê, pir zehmete ku tirkiyê dev ji terora xwe ya avê berde, ji ber wilo pêwîste hin tedbîr were girtin û herêm bi rewşêre bigunce û nehêle bêtir ziwabûn bandora xwe li ser microvan û jîngehê bike. Dema ku mirov vê diyardeyê bişopîne, em ê bibînin ku factor û kiryar hene vê diyardeyê geş dikin, weke pişgukirina diyardeyê ku ta niha tu komele yan navendên lêkolînan tu çareserî yan jî pêşniyar nekirine ji bo metirsiya vê diyardeyê. Jixwe berztirîn pirsgirêkên ku dihêle ev diyarde kûr bibe, lewaziya binesaziya ku Kariba avê kom bike û wê belav bibike, her wiha nebûna pirojeyên avakirina bendavan ku ava baranan kom bikin, yan jî pirojeyên paqijkirina ava cokên avrêjan û bikarnîna pişka wêlêt ji ava dicleyê. li aliyakî din jixwe gelek windabûn di toreyên avê , yên di bajar gundan de heye.**

Bikaranîna avê ji bo avdana gulîstanan bê serûber e û avdana zeviyan hîn bi şêwazên kevn tên avdan û pilanên anternatîf ji bo şêwazên nû ji bo vê yekê nînin, tu pilanên demdirêj ji bo berfirekirina kerta çandiniyê , mîna bikaranîna xaniyên pilastîkî tene ye. Xuyaye çareserkirina vê diyardeyê di çarçova aboriya ekolojîk a civakê de ku çavkaniyên xwezayî, parastin û pêşxistina wê weke hêzekê ye, ji bo dabînkirina mafên nifşên paşerojê. Tedbîrên û dermanê pêwîst ji bo rûbrûbûna ziwabûna avahewa yan demsalî û encamên ziwabûna hîdroolojîk, çandina daran e ku bi awayekî sîstematîk daristan û gulîstan werin damezrandin, nemaze darên ku li hember ziwabûnê li ber xwe didin.

Karîgereke din heye dibe ku dijwariya ziwanê hiekî kêm bike, ew jî bikaranîna teknîka "barandina bararanê"[35] ku rêya neçarkirina ewran

barîna baranê(di sala 2016 an de, 56 welatan bi vê pêvajoyê rabûn), jixwe ev kiryar jî gelek erêman pê pehr dihêle, weke ku bi alîkariya pisporên Birîtanî, li dewleta Îmarat çêbû ku di encamêde rojhilatê kendavê ziwabûn zêde bû, û herêma Ehwazê (Xuzistan) ji nebûna avê derketin Xwepêşandanan.

Li ser pêkana bikaranîna vê teknîkê ji bo encamdana lehiyê li hin herêmên taybet, he ger şert û merc gunca peyda bibin. hinkan destnîşan kir ku Amerîka ev teknolojiyê di Şerê Viyetnamê de[36] bikar anî. Ji ber vê yekê, heger hin welatên cîran vê teknolojiyê bikar bînin, dê bandoreke neyînî li ser Rojava çêkin, ji ber ku şiyanên teknolojiyê, ku li hember vê teknolojiyê derkve pir liwaz e.

- **Çareseriyên gengaz ên ji bo rûbirûbûna encamên ziwabûnê**

Hêjayî ye gotinê ye ku em dubare bikin ku ziwabûn metirsiyek stratejîk e ku metirsiya wê ji gef û êrîşên leşkerî ne kêmtire. Bandora wê jî li ser erdnîgariya siyasî û rewşa josiyasî a herêmê heye, encamên wê bandore li siyaset, aborî û têkiliyên civakî jî dikin. Dibe ku di pêşerojê de, bibe jêdereke serke ji bo encamdana şerekî. Jixwe aloziya îro di navbera Misir û Sûdanê de li aliyekî û Etyopya li aliyê din, her wiha terora avê ya ku dewleta Tirk li dijî Sûriyê û Iraqê bikar tîne, nîşaneyên vê yekê ye

Gelek lêkolîna dan zanîn ku ava bin erd li bakue û Rojhilatê sûriyê û gelek herêm li cîhnê, gelekî bê sûd tê rijandin. heger ev rewş, li pirbûna serjimariyê, nebpna barîna baranê û gefên Tirkiyê bi birîna ava çemên Firat û Dicleyê, bi vî awayî berdewam bike, dib ku ta sala 2050 bigihêje asteke pir metirsîdar û wêranker

Gelek beroirsên Tirk tînin ziman ku pêwiste ku her bermîlek av bi bermîlek petrolê were guhertin, Ji ber vê yekê hovîtî û siyaseta dewleta Tirk û bikaranîna avê li dijî gelên herêmê, dibe ku pêk were. Tevî ku Tirkiye dikare asta herikîna çemên Dîcle û Firatê kêm bike jî, lê nikare barîna baranê li ser çavkaniyên Dîcle û Firatê yên li ser çiyayên Bakurê Kurdistanê û Sûriyê kontrol bike, dibe ku bendavên wê karibe di demsaliyekê de avê bigire, ema di demsaliyên pir baran de wê nikaribe. ji ber vê yekê pêwîstî bi tedbîr û siyasetek bergiriyê der barê avê de hebe. gelek welat, li hemberî ziwabûnê seferberî û rewşên awarte radigihînin, ji ber ku ziwabûn

pirsgirêkeke cîanî ye diware, lê mirov dikare hinekî bandora wê kêm bike. Tevî karînên rejîma Sûriyê ku dikare li hember vê diradeyê raweste, lê bê çareyê. Ji ber vê yekê, Rêveberiya Xweser pêwîstiya wê bi piştevaniya navneteweyî heye; ji bo peydakirina pisporî, peredana pêwîst û sepandina peymanên navneteweyî derbarê parvekirina ava çemên navneteweyî, her wiha bikaranîna çavkaniyên din ên avê li li seranserî erdnîgariya Sûriyê. Niha jî, ji ber nebûna helwesteke navneteweyî ya zelal derbarê kirîza Sûriyê de, ji erkê Rêveberiya Xweser e ku çareseriyên awarte, tedbîrên rêlêgirtinê, amadekirina plansaziyên guncav ji bo kêmkirina bandorên ziwatiyê li ser welatiyan û hem jî li ser aboriya çandiniy pêşkêş bike. Jixwe ezmûnek Rêveberiya Xweser di têkbirina diyardeya şewitandina berhemên dexlûdana de heye, ji ber ku civakê di demsala 2019an de, bersiv da pirsgirêka şewata zeviyan û karîbû mil bi mil bi Rêveberiya Xweser re serkeftinekê li ser avhewa germ û kesên bizanbûn zevî şewitandin, bi dest bixe. xuyaye ziwabûn ji bo xurtkirina têkiliyê Rêveberiyê û civakê; li ser bingeha xweparastinê ku dibe rêgezeke sereke ji pymamna civakî ku dibe der barê pirsgirêka avê xwebesîyê pêk bîne.

Çavkaniyên avê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, girêdayî ava baran, avên bin erdê û ava çemên Dîcle û Firatê ne. Ji ber zêdebûna daxwazê, hin ji van çavkaniyan têrê nakê. Eva av jî ji bo sideman tê bikaranîn, a yekem ji bo xizmeta malan û duyem jî, ji bo xwedîkirina sewalane. lê dive em xerckirina ava zêde di pêvajoyên avakirinê, şûştinxane û çalakiyên aborî û pîşezaziyê, ji bîr nekin.

Li gorî rewşa avê ya niha li herêmê, çareseriyên gengaz xwe dispêre ser sê stûnên sereke, ew jî ev in:

- Rêvebiriya çê û bikêr ji bo çavkaniyên avê yên heyî.
- Çareserkirina karîgerên ku ziwabûnê zêde dikin.
- Ji bo hawirdekirina avê, diyarkirina siyaseteke aborî ya neteweyî.

**1- Rêvebiriya çê û bikêr ji bo çavkaniyên avê yên heyî.**

Ji bo vê rêveberiyê sê sitûnên serekê henê dive xwe bispêre ser: bikaranînek şalak ji bo avê- parastina avê- parastina çavkaniyên avê. jixwe, Ji bo vê yekê pêdivî bi xurtkirina binesaziya avê heye û Pêkanîna pilansaziyeke taybet ji bo birêvebirina kirîza ziwabûnê û derxistina yasa û zagonên guncav.

- Geşepêdana binesaziya avê du rehendan li xwe digire, ya yekem bi pêkanîna pêvajioyên nûkirina binesaziya heyî ya stasyon û torên boriyên veguhestina avê, pergalên avrêjiyê, û neçarkirina xwediyên çalkiyên bazirganî ku alavên pêşketî li di vê derbarê de wawirde bikin. Her wiha çandina daran li peravên golan, birkên xwezayî, an li pişt bendavên ava baranê, dê atmosfera li ser rûyê wan sar bike û pêvajoya dûkelê kêm bike. Rehenda duyemîn bi danîna projeyên nû ve girêdayî ye ji bo bidestxistina avek zêde, ji bo vê yekê jî du pêvajo gerekin, a yekê paqijkirina ava avrêjiyê û bikaranîana wê careke din, jixwe ev xebat hinekî bar li ser çankaniyên avê sivik dike û dike ku ji bo avdanî û karûbarên avakirinê were bikar anîn. Li milekî din jî , avek bin erd ya şor li herêmê pir tê dîtin, ev av jî dibe ku bi rêya alavên teknîkî şêrîn bibe û ji bo ava vexwarinê were bikar anîn. Dibe ku ev xebat jî, ji bo pirojeyên ava berf, lehî û baranan were bikar anîn, ava wan di çal û deboyan de; di bin erdê de were komkirin, paşê were bikaranîn.
- Çareserkirina karîgerên ku ziwabûnê zêde dikin.

Dijwariya ziwabûnê li her herêmekê û li her demsaliyekê, her wiha bandora wê jî li ser her çalakiyekê cuda ye. ji ber wilo, li gorî pile, dijwariya ziwabûnê, rewşa demografî û aborî û dema her qonaxeke ziwabûnê, pêwîstî heye ku herêm dabeşî lîsteyan bibe. Ji bilî peydakirina amarên salane yên demkî yên avê, hevdem ligel amarên taybet bi serjimêrî, jimara sewal û rûpîvên çandiniyê yên avdanî û texmînkirina hewcedariyên avê ji bo zanîna rêjeya mezaxtina avê ya salane û berhevkirina wê bi rêjeya texmînî ya heyî re. avê û diyarkirina herêmên ku pêwîstiya wê bi piştgiriya avê heye.

Li gorî tiştên me anî zima, pêwîstiya wê bi navendeke lêkolînê ya neteweyî ya taybet bi mijara ziwabûnê heye ku pisporiyê pêş bixe, alîkariya siyasetên têkildarî çareserkirina ziwabûnê bike û pêşkêşkirina pilansaziyên rûbirûbûna encamên ziwabûnê ku karibe tedbîran bigire û rewşê zelal bike û pêşniyarên pêwîst pêşkêşî encumena cîbicîkar û zagonsaz a Rêveberiya Xweser bike.

- Nê pêkane rêvebiriyek çê û bikêr ji bo çavkaniyên avê yên heyî, were avakiriin bê ku yasa û zgonên pêwîst hebin ku pêvajoyên mezextina avê bisînor bikin, bi taybetî di ware kolandina bîran de û pêkanîna pirojeyên taybet bi avakirina binesaziya avê û parastina wê ji rijandinê di warê

pîşesazî, bazirganî, xweşguzarî û xizmetguzariyî, alîkariya aboriya pişkdarî, dana rêdanê ji bo pirojeyên aborî yên taybey bi çavkaniyên avê û dana wamên(qerz) bê sûd heger pêwîstî hebe

**2- Çareserkirina karîgerên ku ziwabûnê zêde dikin.**

Jixwe karîgera herî zêde dihle ku bandora ziwabûn zêde bibe, karîgera mirovî ye, ew ji ji ber netêgihiştî, çavbirçîbûn, lewaziya karînan an jî rêvaberiya neçê û bêkêr, an jî pişguhkirina zagonên têkildar ku nêzîkatiya civakê bi avê re mîna kerteke veberhênanî bê pere. Ji ber wilo, pêwîstî bi danîna siyasetek taybet bi avê heye, her wiha pêwîstî bi şaneke aloziyê ji bo aloziya ziwabûnê jî pêwîste ku sedem û metirsiyên ziwabûnê li gel civakê zelal bikin û bihêle hemwelatî biryarên girêdayî vê aloziyê bipejirînin û pabendiyê pê bikin ku di encamê de dijwariya ziwabûnê hinekî sivik bikin.

Bi giştî, sê jêderên sereke hene ku vê aloziyê li herêmê gur dikin: Çandinî, xwedîkirina sewalan, pirbûna serjimêriuyê, rewşa ewlehî.

Jibo çandiniyê û xwedîkirina sewalan, piraniya neştecîyên herêmê, ji bo debara jiyana xwe çandiniyê dikin û sewalan xwedî dikin. lê kar û xebata di van her du waran de dibin, ne li gorî şert û mercên ziwabûnê ye, ji bo ku bûtir qezencan bidest bixin, gelek rûpîvan diçînin ku di encamê de di rêya bikaranîna şwazên kevn gelek av dirije, ji bilk u hinek hene ava vexwarinê didizin û pê ziviyan av didin ûan jî didin sewalan.

Krîza ziwabûnê dihêle ku rûpîvên çandiniyê, li gorî xwebesîyê werin diyar kiri, bi karanîna teknîkên nûjen ên avdanê, imbarkirina tovên guncav ji bo salên paşîn, çandina darên mêwedar ên ku dikarên li hember ziwabûnê li ber xwe bidin, handana çandiniya di xaniyên plastîk de, handana xwedîkirina sewalan di qadên sînorkirî de, ev yek wê bihêle ku hevsengiyek di navbera rêjeya bikaranîna avê û dahatên madî ya ji çandiniyê de pêk were.

Ji ber bilindbûna rêjeya jidayikbûnê û ji ber peydabûna ewlehihiyê; koçberiya bi hezaran mirov bo herêmê ku di encamê de çalakiyên aborî, civakî û xizmetguzarî geşbûn, hişt ku serjimêrî li hin bajaran mîna bajarê Hesekê pir bibe û bibe sedema mezaxtina zêde ya avê û aloziya ziwabûnê zêde bibe.

Loma, hişyarî li ser bikaranîna avê û sînordarkirina rêjandina wê ku jêdereke jiyanî ye û bikaranîna teknîka nûjen di çalakiyên avakirin, hilbirandin û xizmetguariyê de, ya ku nahêla av zêde birije, ev yek dijwariya ziwabûn sivik dike.

Ji milekî din ve, xuyaye ku rewşa ewlehî pir bandora xwe di dijwartiya ziwabûnê dike. kontirolkirina dewleta Tirk ava Dicle, Firat û ava stasyona ava Elok, roleke neyînî mezin di aloziya ziwabûnê de heye, her wiha gefên berdewam bi êrîşeke leşkerî li ser herêmê û Redkirina rêjîma Sûriyê danûstandina kompanyayên navneteweyî ligel Rêveberiya Xweser, dibe rêgirî li ber pirojeyên avêû xurtkirina biesaziya wê.

Eşkere ye ku ji bo çareserkirina vê aloziyê, pêwîstî bi diyaloga navxweyî ya Sûriyê û karekî dîplomatîk li ser asta navneteweyî heye, da ku dewleta Tirkiyê pabendî peymanên mafên mirovan û avê bibe û rê li ber kompaniyên navdewletî yên ku di kerta avê de kar dikin, vebe.

**Der barê danîna siyaseteke aborî û niştimanî ji bo kirîna avê**

Kêmbûna çavkaniyên avê yên li Rojhilata Navîn, wê bibe sedem ku av jî weke neftê bibe madeyeke binirx. Jixwe hin welat hene ku neçar in avê ji derve bikirin, weke mînak Urdun herî dawî bi Îsraîlê re li hev kir ku 50 milyon metrekup av bikire. Niha jî gelek welatiyên Rojava ji bo pêdiviyên xwe yên avê yên rojane bi peyda bikin, neçar in ku avê ji xwediyê bîr, sarinc û dikanan bikirin ku dihêle barekî din zêde were ser mile hemwelatiyan. Di çarçoveya pêvajoyên hawirdekirinên bazirganî yên ji derveyî herêma Rêveberiya Xweser de, av bi pakêtên girtî tê hawirdekirin. Ji ber berdewamiya ziwabûnê li herêmê, pêwîstî bi siyaseteke aborî ji bo kirîna tibabek zêde ya avê heye, dibe jî ku jêder dewleta tirk be yan rêjîma Sûriyê be. Helbet ev yek ji ber bihabûna nirx û nebûna çandinî û sewalkariyê, ji bilî şantajên siyasî ku avê dike karteke fişarê, wê bandorê li aboriya herêmê bike.

- **Di dawiyê de**

Naskirina bandora ziwatiyê li ser rewşa josiyasî li herêmê, bidestxistina nêrînek giştî û zelalkirina têgeha vê diyardeyê, sedem, encam û karîgerên ku giraniya wê zêde dikin, û lêgerîn ji bo çareseriyên pêkan ji bo rûbirûbûna encamên wê yên li ser ewlehiya neteweyî ya herêmê. Ev yek dê ji bo

biryarderan bibe alîkar ku di vî warî de siyasetek berevaniyê ya guncaw pêk bînin. Avakirina navendek an saziyek lêkolînê li ser ziwabûnê li Rojava, yek ji mijarên girîng û sereke ye ku biryar û çareseriyên saxlem **pêşkêş bike.** Di çarçoveya lêkolîn, rapor, amaran û çalakiyên diyalogê yên ku dê li ser vê diyardeyê bên kirin, dikare bi rêya danûstandinên bi hikûmet û rêxistinên navneteweyî re, piştgiriya dîplomasiya Rêveberiya Xweser bike, Di çarçoveya lêkolîn, rapor, amaran û çalakiyên diyalogê yên ku dê li ser vê diyardeyê bên kirin, dikare bi rêya danûstandinên bi hikûmet û rêxistinên navneteweyî re, piştgiriya dîplomasiya Rêveberiya Xweser bikepêkana herî xirab nîşan dide ku ev diyarde dê di salên pêş de; bi zêdebûna serjimêrî û peydabûna pirsgirêkên aborî yên wekî bilindbûna rêjeyên bêkariyê, lawazbûna demsalên çandiniyê, kêmbûna hilberîna sewalan, zêdebûna çolbûn û dijwariya peydakirina xizmetguzariyan,  zêde bibe. Ev mijar jîngeheke vekirî ji îdyolojiya tundrewî û tundûtûjiyê re peyda dike û Rêveberiya Xweser dixe binezmûneke dijwar ku pêwîste tedbîrên pêwîste ji bo encamên ziwabûnê li ser ewlehiya herêmê tedîrên gunav bistîne